












Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ



- Durûtî û qerekerê civaka me **Suleyman Çevik**
- Serfermandar Esededdîn Şêrkoh **Emîn Narozi**
- Dersa wêneçêkirinê **Nizar Qebbanî**
- “Hêsirên Selaheddîn”... **Rohat Alakom**
- Reşika çavên te **Cemîl Denlî**
- Rêgezên heyînê **Adnan Fîrat**
- “Pêşeroj” an “Paşeroj”? **Deham Ebdulfettah**
- Kurteceribandîn **Husein Muhammed**
- Nexweşiya siyasetê û Xaricîti **Zilkîf Xweşhêvî**
- Şêx Tahirê Şoşî û **Gulzara wî Tehsîn Îbrahîm Doskî**
- Li ser şehadeta Şêx Bahaeddîn û wefata Ebdulmelîk Efendî **Abdulîlah Fîrat**
- Adat û Rusûmatnameê Ekradiye... **Murad Celalî**
- Bi serokê Komela Nûbiharê re... **Paşa Amedî**
- Eşîrên herêma Botan... **M. Munîr Tîmurtaş**
- Ez mamoste **Hesen Polat**
- Reşikê Reşikan **Hatîce Mollakendî**
- Hin navên li ber windabûnê **Dilazad ART**
- M. Eliyê Baqustanî... **M. Zahir Ertekin**
- Şorbe û Fedî; Xela û Xeyîdî **Ayhan Meretowar**

Klasîkên Nûbiharê!



Büyük Reşitpaşa Cad. Yumni İş Mrk. No 22/29 Vezneciler / Beyazıt İstanbul
Tel: (0212) 519 00 09 Web: www.nubihar.com e-mail: nubihar@gmail.com

Ji Nûbiharê bi silavên germ

Rayedarên Tirkîyê ji bo zarokên Kurdan çiqas li hemberî perwerdeyiya zimanê Kurdî derkevin jî ev helwesta wan hewldaneke bê feyde ye.

Weke zarokên hemî cîhanê dê zarokên Kurdan jî vî heqê xwe yê tebîî bi dest bixin. Ev heq çawa ku heqê hemû însanên cîhanê be, herweha heqê me Kurdan e jî.

Di cîhana îro de weke her milletî Kurd jî dê zû-dereng bigihêjin van heqên xwe.

Xwestina perwerdeya bi zimanê dayikê mafekî têra xwe masûm e. Heqê bikaranîna zimanê dayikê, di peymanên navnetewî de cihê xwe girtiye. Ev peymanên navnetewî hemî jî perwerdehiya bi zimanê dayikê heqekî meşrû dibînin. Kesên ku vî heqî qedexe dikin di çavê milletên dunyayê de wekî sûcdar têne hesibandin. Telebkirina vî heqî di çavê hemî cîhaniyan de heqekî fitrî û însanî ye...

Li gelek cîhên dunyayê jî ev pirsgirêk hebû, lê îro em dibînin ku van milletana meselên xwe yên bi vî hawî çareser kirine/dikin.

Psikolojî û pêşdeçûna zarokên ku bi zimanê dayikê perwerde dibin ji her hêlê ve ji yê ku bi zimanê biyanî perwerde dibin serkeftîtir e. Lewra ziman di çêbûna şexsiyeta meriv de xwedî fonksiyonekê ye.

Kurd diçine mekteban û bi zimanekî biyanî dest bi perwerdeyê dikin û li gor zarokên xelkê li pey dimînin. Herweha dereng dest bi meşa jiyanê dikin.

Ji bo milletekî ji zimanê wî muhîmtir tu tişt tune ye. Ziman îşareta herî muhîm e ji bo milletekî. Zimanê we li rûyê erdê zimanê herî dewlemend be jî, dema ew ziman di jiyanê civakê de neyê xebitandin ew ziman bi pêş de naçe û wenda dibe.

Ji me re dibêjin, ma di dunyayê çî qîmeta zimanê we heye, hûnê bi vî zimanî çî bikin?

Çawa ku ji hêla rayedarên Tirkîyê ve jî tê ziman ku asîmilasyon sûcekî însanî ye. Belê rast e, asîmilasyon sûcekî însanî ye lê çima ev ji bo zarokên Kurdan nayê gotin û ev sûcê însanî li ser wan rewa dibe? Em vê rewşê hewaleyî ehlê însafê dikin!

Wekî din, dibêjin ku hûnê bi kîjan zaravayî, bi Kurmancî yan bi dimilî perwerdeyê bibînin?

Ji bo ku ev mesela me çareser nebe virde- wêde dibin û tînin. Kurd bila heqê xwe bi dest bixin, vî heqî bikar bînin an neynin ew bi kêfa xwe nê. Dema Kurd vî heqî bi dest bixin helbet dê hem bi kurmancî hem jî bi dimilî zarokên xwe perwerde bikin. Eger dilê wan bixwaze dikarin bi zaravayên din jî perwerdeyê bibînin; ev meseleya wan e...

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ

(KÜLTÜR SANAT EDEBİYAT DERGİSİ)

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler/Beyazıt - İstanbul

Tel&Fax: (0212) 519 00 09

www.nubihar.com • nubihar@gmail.com

Navnîşana Name û Nivîsan

P.K. 80 Fatih - İstanbul

•

Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık Ltd. şti. (adına)

Xwedî û berpirsiyarê Nivîsaran (Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)

Süleyman Çevik

•

Nûnertiya Almanya

Burhan Kaya

kizilkaya_burhan@yahoo.de

Tel: 0234 - 7922968

•

Kovara Nûbihar ji 3 mehan carekê; Payîz, Zivistan, Bihar û Havînê tê weşandin

•

Berg û rûpelsazî

ŞemalMedya

semalmedya@gmail.com

•

Çapxane

Kilim Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti

Orta Mh. Fatin Rüstü Sk. No: 1-3/A

Bayrampaşa/İSTANBUL

Tel: 212 612 95 59

•

Yayın Türü:

Yerel Süreli

•

Mesûliyeta ramanên nivîsaran aîdê nivîskaran e.

Berhemên hatine şandin bi şûn de nayên vegerandin

•

Wêneyê Berga pêş: Medresa Sor -Faruk Önervarlı

•

Berdêla abonetiya salane:

Türkiye: 25 YTL

Welatên din: 25 EURO, 30 \$

•

Jimareyên Hesaban:

Hundir Türkiye: Postgiro (Posta Çeki H.) Süleyman Çevik: 658265

Süleyman Çevik, İş Bankası Laleli Şubesi: 1084-0363459

Derveyî Türkiye: Süleyman Çevik, İşbankası Yavuz Selim şubesi: 1079-30100-3118770

Durûti û qerekerê civaka me Suleyman Çevik	5	Nexweşiya siyasetê û zihniyeta Xaricîtiyê Zilkîf Xweşhêvî	42
Serfermandar Esededdîn Şêrkoh Emîn Narozî	7	Ji çelengê şagirdên Rîsaleiyên Nûr: Şêx Tahirê Şoşî û kitêba wî Gulzar Tehsîn Îbrahîm Doskî Latînîzekirin: Ayhan Geverî.....	45
Dersa wêneçêkirinê Nizar Qebbanî Ji Erebî: Selman Dilovan	18	Bo celebên serbixêlî Bamed Serdar	47
“Hêsirên Selaheddîn” di çavkaniyên Swêdî de Rohat Alakom	19	Li ser şهادeta Şêx Bahaeddîn û wefata Ebdulmelîk Efendî Abdulîlah Fîrat Werger: Rêbaz Şoreş	48
Reşika çavên te Cemîl Denî	27	<i>Adat û Rusûmatnameê Ekradiye</i> û çend gotin Murad Celalî	50
Meleka Gewre Şemoyê Memê	28	Tîr Meh Jan Ziryan	54
Rêgezên heyînê Adnan Fîrat	33	Hevpeyvîn: Bi serokê Komela Nûbiharê re hevpeyvîn <i>Hevpeyvîn: Paşa Amedî</i>	55
Şahbanû Pablo Nerûda Werger: Mihemed Jiyan	35	Eşîrên herêma Botan (I) Eşîra Harûna M. Munîr Tîmurtaş	59
Bulanik Kopa rengîn e Nevzat Eminoğlu	36	Çîma Pîrê Kal	63
Têgeha demê di navbera “Pêşeroj” û “Paşeroj” de Deham Ebdulfettah	37	Ez mamoste Hesen Polat	64
Goyîna xizokê Hamid Omerî	40	Reşîkê Reşikan Hatîce Mollakendî	67
Kurteceribandin Husein Muhammed	41		

Çîrokek ji Kabûsname, Îskender bîn Kavûs (Keykavûs)	
Ji Farisî: Mihemed Jiyan	69
Bexçey bi gulên a Medîne bi to ya weş a Ö. Faruk Çetinkaplan	70
Ji çanda Kurdî hin navên li ber windabûnê Dilazad ART	72
Jiyana me ya xewn Bargiran Şanaz	73
Wexta ez zarok bûm Harun Aykaç	74
Ez te dibînim Kenanê Nado	75
Ji kaniya edebiyata Kurdî, edîbekî nenas Mele Eliyê Baqustanî û helbestek wî: Ey felek M. Zahir Ertekin	76

Dilopek azadî Janda Serfiraz	78
Mela Muştî (1936-2009) Sîpanî	79
Werin em ji dil dua bikin Mele Dawud	81
Perçeyak ji jiyana pîroz M. Burhan el-Hedbi	82
Deriyên cîhanê ji Kurdî re vekin: Ez Kurdî Hîn Dibim – Pratik Kürtçe Dersleri bi Almanî derket!	87
Şorbe û Fedî; Xela û Xeyîdî Ayhan Meretowar	88
Mol Axa Rojbin Ozkan	91
Pelda û Zehra Selman Dîlovan	92

Durûtî û qerekerê civaka me!

Suleyman Çevik

ceviksuleyman@hotmail.com

Eger mensûbên civakekê bikaribin xwe bi rehetî û azadane îfade bikin, di nava wê civakê de hem qabiliyeta wan bi pêş dikeve, hem jî şexsiyeta wan bi esasî cihê xwe digre...

Malûmê herkesî ye ku şexsiyeta însanan encax di dinyayek azad de rêya xwe dibîne û dikemile.

Hebûna azadiyê helwestek weha xurt û bi şeref dide însanên wê civakê. Lewra azadî dike ku însan bi rehetî xwe îfade bike û tiştê jê bawer dike bêyî tirs û xof bibêje... Însanê ku bi vê rehetiyê dizane, qet ji xwe re nake derd ku ka gelo dê îdara dewletê ji kîjan gotina wî rik bigre, û dê kîjan gotinên wî bibin sebebê serêşî û teşqeleyan. Ji ber vê, dema ev însan rastî nexweşiyêke îdareyê têt, bêyî tirs fikra xwe tîne ziman û vê helwesta xwe bi azadane nîşan dide... Bi gotineke din, însanên vê dinyayê xwe venaşêrin, durûtiyê nakin, tiştên dizanin bi serbestî dibêjin.

Di rejîma serbest de welatî û dewlet her yek wazîfeya xwe dizane. Ji ber vê, di meseleyên wiha fikrî de encax di halên îstîsnayî de dewlet li însanê xwe mudaxelê dike...

Bereksê vê di rejîma dîktatoriyê de ev serbestiya han tune ye û ev rejîm bi her awayî hukmê xwe li

ser însanên di bin îdara xwe de dibarîne... Di vê rejîma dîktatoriyê de her tişt, yanê îdare, qanûn û mehkeme di destê kesekî de yan jî di destê quwetekê de ye. Di vê îdarê de rayedar fikr û bawerîya xwe bi destê zorê bi meriv didin qebûlîkirin û nahêlin li van diyaran dengê muxalefetê derkeve.

Di rejîmeke weha de, welatî û rejîm herdu jî ji hevûdu ditirsin, herdu jî bi şubhe û guman in. Welatî ji belaya ku dê bête serê xwe, rejîm jî ji têkçûn û hilweşîna xwe ditirse...

Bi salan e ku li dibistanên vî welatî her sibê, sondeke ji derî fitretê bi zarokên me didin xwarin.

Eger hûn li naveroka vê sondê binêrin hûn dê bibînin ku çiqas ji pîvanên fitreta însaniyê der û dûr û faşîzane ye... Ji bo me, ji bo zarokên me û ji bo merivekî heqperest tu tiştî îfade nake.

Bi gotinên "Tirk im, dirust im, xebatkar im..." dest pê dike û bi gotina "hebûna min bila bibe qurbana hebûna Tirkên. Xwezî bi wî kesî ku dibêje ez Tirk im..." dawî lê tê.

Ev sonda ku di piçûkahiyê de hînî me dikirin, îro jî hînî zarokên me dikin...

Bi salan e ku li dibistanên vî welatî her sibê, sondeke ji derî fitretê bi zarokên me didin xwarin.

Eger hûn li naveroka vê sondê binêrin hûn dê bibînin ku çiqas ji pîvanên fitreta însaniyê der û dûr û faşîzane ye

Me di zarokatiya xwe de bêyî maneya wê bizanibin weke wird ev sond dixwar û her sibê me xwe dikir qurbana Tirkên.

Em mezin bûn, me dora xwe dît û dinya nas kir. Jiyanê şanî me da ku ev gotin çiqas bê mane û beredayî ye...

Li mekteban her sibê bi hezaran zarok vê sondê dixwînin û dest bi dersê dikin. Ev sond, mîna kek piçûk e, lê naveroka vê sondê bi me xweş eşkere dike ku ev rejîm çawa li ser hîmên xeyrî însanî û nijadperestiyê hatiye avakirin.

Em li salên derbasbûyî dinêrin û dibînin ku gotina resmî mudaxeleyî rewşa me, fikra me û li sekna me ya di nav civakê de dikir û hê jî bi awayekî dike...

Ewan, bi qanûnan tayîn dikir ku emê jî kê hez bikin û jî kê hez nekin. Ewan em mecbûr dikirin ku li gor kêfa wan, li gotin û tevgerên xwe sînoran deynin.

Ewan bi kêfa xwe qîmet didan hebûnên xwe û hezkiriyên wan li dora wan kom dibûn. Ji me jî bi darê zorê sêdaqet dixwestin. Rêxnekirina vê sîstemê cesaret dixwest; te jê hez nekira jî, te jî tirsê dilê xwe newêrîbû bigota. Herkesî jî li tembûra wan dixist. Wan bi kêfa xwe, me jî ji mecbûrî jî tiştina hez dikir û mecbûrên di nav refên wan de cih digirt. Îro jî zarokên me mecbûrî vê hezkirinê ne...

Weke ku me li jor îfade kir, însan li cihê ku azadî lê heye tiştê dilê xwe bêyî tirsê dibêje û bi vî hawî ew kes dibe kesekî jixwebawer.

Çawa ku hebûna azadiyê serbestiyetê dide însanan, nebûna azadiyê jî helwestek li dijî vê, xof û tirsê dide însanan. Ev însan jî bo serê wan nekeve belayê û jî



ber tirsê gelek caran mecbûr in ku weha hereket bikin jî. Lewra baş dizanin ku dema rastiye bibêjin, wê çî bela bêne serê wan...

Li welatekî wiha, der û hundirê mirovan ne yek e. Tiştê li ser û rûyê wan xuya dibe tişteki dibêje, niyet û hundirê wan li pey hesabekî din e...

Merivên li dîktatoriyê, li her cihî eynî tewrî nîşan nadin. Ji ber tirsê li mekteban, li meydan û kuçeyan tişteki dibêjin, li malê jî tişteki din dibêjin... Li van însanan dema piçek teng bibe, ji bo ku xwe xelas bikin, yan jî di çavê hinekan de xwe paqij bikin xwe mecbûrî derewan dibînin. Ji tiştên hez nakin, bi derewan dibêjin, em hez dikin. Di çavê wan de xwe şêrîn dikin... Di civatek wiha de însan dibin durû yanê du qereker; ev "durûtiya mecbûrî" gelek caran dibe sebebê xerabbûna psîkolojiya merivan jî.

Însanê ku şexsiyeta wî rûneniştîye her hereketa wî li gor kêf û xwestina hinekan şekil digre. Ev kes di atmosfereke musaîd de bi rehetî dikarin durûti û riyakariyê bikin. Ji bo însanên wiha şelaqî tişteki normal e. Dema têkevin çavê efendiyan xwe, ji wan "aferînekê" bibihîzin çiqas kêfa wan tê! Mese-

len li gund dixwazin têkevin çavê axê xwe. Li cihê xebatê, dixwazin têkevin çavê amîrê xwe. Li dewletek zordest û ceberût dixwazin têkevin çavê rayedarên xwe...

Zarokên rejîmeke wiha jî salên piçûkahiye pê ve pêşî hînî derewan dibin. Ew derew piştî demekê jî bo wan dibe xûy û adet û êdî ew kes xwe bi hinekan bi awayekî din nîşan didin. Ev tişt jî dibe sebek ku dawîya dawî ev meriv bibin "durû" û "riyakar".

Eger zarok li malê terbiyekê bibînin û li dibistanê jî rastî perwerdeya resmî bînin de çawa bibe? Terbiya ku malbat li zarokên xwe dike û perwerdeya mektebê yek bin, pirsgrîk tune; wê demê zarok di navbera nakokiyê de naçin û nayên. Weke ku dê û bav dixwazin zarokên xwe mezin dikin, mekteb jî perwerdehiya ku malbatê daye wan temam dike...

Îro terbiya malê û perwerdehiya dibistanan hev nagirin, ji ber vê zarok dikevin nakokîyan. Însanê di navbera dubendî û nakokîyan de dimîne li gor her mekanî, li gor şert û mercên hazzir û hakim, li hember her însanî tewrekî datîne. Ev zemîn jî ji bo gelek însanan dibe zemînê durûtiyê... ■

Serfermandar Esededdîn Şêrkoh

Emîn Narozi

Ebû'l Haris Şêrkohê [mirin: M 564/1168-69] kurê Şaziye¹ kurê Merwan ku bi bernavkê Melîk el-Mensûr Esededdîn binavkirî ye, apê Sultan Selaheddîn e, (rehma Xwedê lê be.)

Şadî/Şaziye bavê wan ku yek ji giregirên Kurdên Rewadî yên herêma Divînê bûye, [çawa ku di jînenîgariya Selaheddîn de jî bihurî li ser vexwendina Mucahîdeddîn Behrûzê esayîşgêrê Bexdayê ku berê li Divînê di nav wan de dostaniyeke germ hebûye], bi herdu kurên xwe Necmeddîn Eyyûb û Esededdîn Şêrkoh ve ji Ecdeneqana devera Divîna ku dikeve dawîya tixûbê Azerbaycanê yê hêla Gurcistanê û navçeya Erranê, derketiye û çûye Bexdayê cem Behrûz. [Demek piştî piştî pêşwaziyeke germ û qedirdaneke zahf] wî ew ji dêla xwe ve daniye ser mîrgeha xwe ya Tîkrîtê².

Demek dû re gava Şadî li wê derê miriye, hingê Behrûz, Necmeddîn kiriye dizdarê keleya Tîkrîtê û ew û Şêrkoh pêkve li Tîkrîtê mane. Piştî gava Îmadeddîn Zengî bi Mesûdê Selçûqî re ku dixwest deshilatdariyê ji biraziyê

xwe Dawidê kurê Mehmûdê ku Xelîfe jî piştgiriya wî dikir bistîne çûye avêtiye ser Bexdayê û dora wê girtiye, lê piştî ew ji ber Saqî Qeraca ku hatibû hawara Xelîfe, li hindava Tîkrîtê li ber Dicle [birîndarbûyî] şikiyaye û reviyaye çûye xwe avêtiye cem Necmeddîn û Şêrkoh. Wan pê re alîkarî kirine, keştî [kelek?] jê re amade kirine, wî û hevalên wî ji çem derbas kirine, qedrê wan girtine û dûv re ew şandine cihê wan.

Gava Behrûz bi vê yekê hisiyaye pir li zora wî çûye û gotiye: "Çawa te neyarên me girtine û ji dêla tu dest deynî ser wan te qencî bi wan kiriye û ew berdane?" Bes Necmeddîn bi nameyeke lêborînê rewş jê re diyar kiriye û dilê Behrûz xweş kiriye, lê çend sal piştî gava Şêrkoh mirovekî [Behrûz] ku di nav wan de gelşek derketiye kuştîye, hingê Behrûz hew qedandiye û rabûye ew ji Tîkrîtê derxistine. Ew jî hema yekser rabûne çûne cem Îmadeddîn Zengî, wî qenciya wan bibîr anîye, qedrê wan girtiye, mîrgehên baş dane wan û ew xistine nev koma serdarên xwe yên bijare. Piştî mirina Îmadeddîn jî Şêrkoh li cem

Şaziye bavê wan ku yek ji giregirên Kurdên Rewadî yên herêma Divînê bûye, bi herdu kurên xwe Necmeddîn Eyyûb û Esededdîn Şêrkoh ve ji Ecdeneqana devera Divîna ku dikeve dawîya tixûbê Azerbaycanê yê hêla Gurcistanê û navçeya Erranê, derketiye û çûye Bexdayê cem Behrûz

Esededdîn di çarşema 17ê meha rebî'elaxera sala 564/19ê Çileyê 1169an de [li Misrê] bûye wezîr û 2 meh û pênc rojan wezîrtî kiriye. Di pey de ew şemiya 22yê, li gorî Rewehî yekşema 23yê Cemadelaxera sala 564/25ê Adara 1169an ji nedî ve li Qahîreyê miriye

kurê wî Nûreddîn Mehmûd Zengî maye heya ku dû re ew bi mîrxasî û gernasîya xwe, zîrekî û pêbawerîya xwe bûye serekfermandar û cihgirê wî.³

Jixwe hinek jî behsa wî di nav bûyerên Şawer de ku di sala 559/1163-64an de hatibû Şamê û hawara xwe gihandibû Nûreddîn, derbas bû. Lêbelê Behaeddîn îbn Şeddad di [berhema xwe ya] "Sîret Selaheddîn" rehma Xwedê lê be de ji bo hatina wî [Şawer] ya Şamê tarîxa 558/1162-63yan dide û diyar dike ku ew di 2yê Cemadelaxera/8ê Gulana sala gotî de jî çûne gihîştine Misirê.

Wî [Nûreddîn Mehmûdê kurê Zengî] hinek ji leşkerên xwe pê re şandine, Esededdîn Şêrkoh jî kiriye fermandarê wan û ew çûne Misirê. Piştî lihev-rastkirina rewşa xwe, Şawer bi wan re xedîr kiriye, soza ku bi wan re dabûye neaniye cih û ew jî piştî xirecîreke pir rabûne veşariyane Şamê. Vegera wan ya ji Misirê di 7ê Zîlhecceya/26ê Çiriya sala gotî de bûye. Piştî ew dîsa ziviriye Misrê û çûna wî ya ber pê ve di meha Rebî'elûlûya sala 562/Kanûn-Çiriya 1166an de bûye ku hê di cara pêşî de dilê wî bijiyabû desthilatdariya wê. Ew di rêya Wadî-l-Xezlanê de çûye û di Îtîfîhê de ketiye ku bûyera el-Babeynê ya cem devera Eşmûnan jî hingê qewimiye. Piştî serkeftina cenga Babeynê wî Sultan Selaheddîn şandiye Îskenderîyeyê ku wê biparêze û Şawer jî bi leşkerê Misrê û yê frengan ve dora wî girtiye û ew pir eşandiye.

Piştî Esededdîn ji Seîdê ziviriye Bilbîsê⁴, li wê derê ew û Misrî li hev hatine û wan Selaheddîn jê re şandiye û ew veşariyane Şamê. Vêca gava di sala 564/1168-69an de Freng çûne Bilbîsê vegirtine û xelkê wê kuştine, hingê wan şandiye pey Esededdîn, qencî pê re kirine, xwe avêtine wî û dilê wî xweş kirine da here alîkariya wan. Dawiyê ew rabûye çûye alîkariya wan û Freng jî wê derê derxistine ku gihîştina wî ya Misrê ya hingê di rebî'elûlûya sala gotî de bûye. Lêbelê Şawer dû re dîsa xwestiye ku

xwarinekê bide wan û tê de fenekê li wî û serdarên mezin yên pê re bike, wan bigire û bikuje, lê çawa ku di jînenîgariya wî [Şawer] de jî bihurî, ew jê bi leztir derketine û berî ku pê re bigihîje gerefenekê din jî bîne serê wan, ew kuştîye.

[Piştî kuştina Şawer] Esededdîn di çarşema 17ê meha rebî'elaxera sala 564/19ê Çileyê 1169an de [li Misrê] bûye wezîr û 2 meh û pênc rojan wezîrtî kiriye. Di pey de ew şemiya 22yê, li gorî Rewehî yekşema 23yê Cemadelaxera sala 564/25ê Adara 1169an ji nedî ve li Qahîreyê miriye û lê hatiye veşartin. Demek paşê li ser wesiyeta wî rehma Xwedê lê be, ew bo Medîneya Pêxember (s.) hatiye veguhartin û Selaheddîn ketiye cihê wî.

Îbn Şeddad di *Sîret Selaheddîn* de gotiye: "Esededdîn pir xwire bûye û ji goştê xurt î bi bez zahf hez kiriye; ji ber vê jî carê xwarin lê diket û êşa xeneqîtkê ew digirt, lê piştî êşeke dijwar ew baş dibû. Bes vê carê gava ew êşa xedar bi ser ve hatiye û xeneqîtkê kambax ew girtiye hingê ew jê ranebûye û di tarîxa gotî de jî wê ew kuştîye.⁵ Wî ji Nasîreddîn Mihemedê kurê Şêrkoh yê bi Melîk el-Qahir bernavkirî pê ve tu zaro li pey xwe nehiştine.

Gava Esededdîn miriye hingê Nûreddîn di Receba sala 564/Nîsana 1169an de Himsê jê [Nasîreddîn] sitandiye ku Selaheddîn dema vegirtina erdê Şamê Himsê dîsa li Nasîreddîn veşandiye û heya mirina wî ya êvara sala 581/1185an di destê wî de maye. Gava miriye jina wî Sîtişama keçapa wî ew veguhaztiye goristana xwe ya ku li medreseya wê ya piştî bajarê Şamê bûye û ew li cem birayê xwe Şems el-Dewle Tûranşahê (Torîşah?) îbn Eyyûb veşartiye.

Piştî wî jî Hims gihîştîye kurê wî Esededdîn Şêrkoh ku di 569/1173-74an de hatibû dinê û di sêşema 19ê meha Receba 637/15ê Sibata 1239an de li Himsê miriye û di gora xwe ya nav bajêr de hatiye veşartin. Her wiha Rehbe, Tedmur û Makîsîn jî ku deverên herêma Xabûrê bûn, di destê wî de bûne.

Wî komek zarû li pey xwe hiştine, ji nav wan kurê wî Melîk Mensûr Nasîreddîn Îbrahîm ketiye cihê wî û ew heya mirina xwe ya îna 10ê Sefera sala 644/29ê Gulana 1246an li Neyruba dora Şamê, her li ser hikum maye. Wextê ew miriye jî wê derê bîriye Himsê û li piştî bajarê li başûrê mizgefta Xizir (e.s.) hatiye veşartin.

Kurê wî melîk Eşref Muzafer el-Dewle Ebû-l-

Feth Mûsa kete cihê wî. Eşrefê navdayî di dawîya salên 661/1262yan de li Şamê ji min re got ku: "Jidayîkbûna wî sala şikestina Harzemiyên Rûmê bûye û wextê vegera wan ji wê derê mizgîniya bûna min gihîştîye bavê min". Ew bûyer jî li gorî ku di jînenîgariya Eşrefê kurê Adil de rave kiriye, di meha Remezana sala 627/1229-30yî de qewimiye. Wî gotiye ku: "Gava bavê wî mizgîniya bûna wî girtiye hingê ji Melîk Eşrefê kurê Adil re gotiye: 'Ey xwend [xwedawend] yek li koleyên te zêde bûye.' Wî jî gotiye: 'Navê wî li navê min deyne!' Wî jî navê Eşref Muzafereddîn Ebû-l-Feth Mûsa li min daniye.

Wefata Eşrefê kurê Mensûrê behskirî di roja îna 10ê Sefera 662/14yê Çirîya 1263yan de li Himsê bûye û ew li cem gora bapîrê xwe Eseddîdîn Şêrkoh [II] li Himsê hatiye veşartin. Nexwe jidayîkbûna wî bi nêzîkayî dibe şewal yan jî Zîlhecceya sala (6)27/ Tebax yan jî Îlona 1230yî.

Şêrkoh: Gotineke biyanî ye ku ji peyva "şêr" û "koh" yanî çiya pêk tê û mana wê dibe şêrê çiya.

Şêrkoh [I] di sala 555/1160î de ji Şamê di rêya Tîma û Xeyberê de çûye hecê ku ew sal Zeyneddîn Eliyê kurê Bektekin (Begtekin/Tekin Beg?) jî di ser Îraqê re çûbû hecê û li wê derê gihîştibû Xelîfe.⁶

Li gorî el-Ziriklî ku ji kitêba *Muntexebat min Kîtab el-Tarîx* r. 256-260 wergirtiye: "Şêrkoh û birayê xwe Eyyûb ji bajarê Divînê hatine Îraqê û ketine ber xizmeta Mucahiddîn Behrûzê şihneyê (serekê asayîşa) Bexdayê. Dû re gihîştine Îmadeddîn Zengî û piştî mirina Zengî, serê pêşî Şêrkoh bi kurê wî Nûreddîn Mehmûd Zengî re maye û gava Nûreddîn tê de mîrxasî, pêbawerî û zîrekî dîtiye, hingê rabûye ew kiriye serekfermandarê xwe û Hims û Rehbe jî bi mîrgehî danê.

Îmadeddîn el-Katib ev şîra han li ser nivîsiye:

Ey Şêrkohê kurê Şaziyê Melîk, gaziya gazîwazan!

Wî binase, ew qencîrîn kurê qencîrîn bavi ye!"

Li ser hatina wan ya Bexdayê ya ku herdu bira ne bi bavê xwe Şadî/Şazî re lê bi xwe hatine û pêwendiyên wan bi malbata Atabeg Zengî re, Îbn el-Esîr, Ebû-l-Fîda û Ebû Şame (herduyên dawî jî agahên xwe) bi kurtî ji Îbn el-Esîr veguhaztine, wiha dibêjin: "Ew [Şêrkoh] û birayê xwe Necmeddîn Eyyûbê kurên Şazî ji xelkê Divîna welatê Azerbaycanê ne, eslê wan

Gava Şehîd (Zengî) hatiye kuştin hingê leşkerê Şamê dora Baalbekê girtine ku ew (Eyyûb) jî lê dima û cih lê teng bûye, bes Seyfeddîn Xaziyê kurê Zengî jî bi lihevastkirina deverên xwe yên din ve lepikî bûye û nikaribûye here hawara wî

Kurd e û ji eşîra Zewadî/Rewadî ne ku eşreftîrîn eşîra Kurdan e. Ew hatine Bexdayê û ketine ber xizmeta şihneyê wê Mucahiddîn Behrûz. Wî di Necmeddîn de ku birayê mezin bûye, hişmendiyeke pir û xuyekî qenc dîtiye û ew kiriye dizdarê keleya Tikrîtê ku mîrgeha wî bûye û ew û birayê xwe Şêrkoh çûne wê derê.

Vêca wextê Atabegê şehîd Zengiyê kurê Aqsenqer di sala 526/1131ê de li Îraqê ji ber Qaraca el-Saqî şikîyaye çawa ku me li pêş diyar kir, hingê ew şikîyayî çûye gihîştîye Tikrîtê ber çemê Dicle. Gava gihîştîye wê derê Necmeddîn Eyyûb jî rabûye pê re alîkarî kiriye, keştî [kelek?] ji wan re amade kirine ku ew bi hevalên xwe ve bi wan li cem derbas bûne. Necmeddîn Eyyûb bi [naskirina] wan şa bûye, qedrê wan girtiye û dûv re ew şandine cihê wan. Bêguman ev yek li zora Behrûz çûye û gazin ji Necmeddîn kirine, lê çendak piştî îcar gava Şêrkoh di ser de jî yekî ku di nav wan de xirecîrek derketiye, li Tikrîtê kuştîye hingê Behrûz rabûye şandîye ew ji kelê derxistine û ew jî hima ji wir rabûne çûne cem şehîd Zengî. Zengî baş pêşwaziya wan kiriye, qenciya ku pê re kiribûn bi bîr anîye, mîrgehên hêja dane wan û dema Baalbekê jî vegirtiye hingê Eyyûb kiriye dizdarê wê.

Gava Şehîd [Zengî] hatiye kuştin hingê leşkerê Şamê dora Baalbekê girtine ku ew [Eyyûb] jî lê dima û cih lê teng bûye, bes Seyfeddîn Xaziyê kurê Zengî [ku ew der piştî mirina bavê wî para wî ketibû] jî bi lihevastkirina deverên xwe yên din ve lepikî bûye û nikaribûye here hawara wî. Ji ber vê yekê ew bægav maye û rabûye ew der daye wan û ji dêlva wê ve hinek mal û milk û mîrgehên din li şamê ji wan standîye û çûye Şamê cem Mu'îneddîn Unîr [Onur?] ku li wê derê bûye mezintîrîn fermandarê wî.

Birayê wî Şêrkoh jî piştî kuştina Zengî gihîştîye Nûreddîn Mehmûd ku ji xwe hê di dema bavê wî de jî xizmeta wî dikir. Wî ew nêzî xwe kiriye, daye pêş û tê de mîrxasiyeke ku di tu kesê din de tunebû,

Bêguman weke her karbidestên wê serdemê herdu biran jî çavên xwe li payeyên bilindtir gerandine û xwestine ku di nav tevliheviyên serdema xwe de li gorî pîvanên hingê beşdarî desthilatdariyê bibin

dîtiye, ji ber vê mîrxasiyê wî zêdetir qencî pê re kiriye, Hims, Rehbe û hinek deverên din jî danê û ew kiriye serfermandarê xwe. Gava Nûreddîn xwestiye ku Şamê vegire, hingê lê ferman kiriye ku ji birayê xwe Eyyûb re bişîne û daxwaziya alîkariyê jê bike, wî jî erê kiriye û ji dêl ve jî ji xwe û birayê xwe re hinek mîrgeh û gund jê xwestine. Nûreddîn jî daxwaziya wan pejirandiye û Şam vegirtiye; wî sozê xwe aniyê cih, daxwaziyên wan pêk anîne û ew kirine mezintirîn fermanدارên dewleta xwe. Vêca dema ku xwestiye leşker bişîne Misrê jî hingê ji bo wî karê giran û vê rêya bi xeter jê [Şêrkoh] çêtir tu kesê din nedîtiye û rabûye ew şandiye".⁸

Li gorî Elî Beyyûmî û Ebû Şame gava Îmadedîn Zengiyê bavê Nûreddîn hatiye kuştin hingê ji ber dostaniya navbera Şêrkoh û Nûreddîn ya berê wî li himberî zarûyên Zengî yên din [Seyfedîn Gazî û Qutbedîn Mewdûd] piştgiya Nûreddîn kiriye. Ew bi lez çûye xergaha⁹ Nûreddîn, şîreta çûna Helebê lê kiriye, gustîla mîrîtiyê xistiye tiliya wî û çend roj piştê gava ew di 16ê Îlona 1146an de çûye Helebê hingê bi hêsanî dest daniye ser.

Ji ber vê yekê wî jî weke bavê xwe ku qenciya wan ya Tikrîtê ji bîr nekiribû, çêyiya Şêrkoh ji bîr nebir. Îbn Ebî Teyy li ser vê yekê wiha dibêje: "Ev çêyiya Şêrkoh hertim di bîra Nûreddîn de bû û Esededdîn Şêrkoh jî carê behsa arîkariya xwe ya bi Nûreddîn re ji bo destdanîna ser Helebê û minêkariya xwe, dikiir."¹⁰

Li gorî Ebû Şame ku li ser devê Selaheddîn gotiye: "Piştî Eyyûb li cem Nûreddîn Şêrkoh kesê duyemîn bûye û hatiye bihîstin ku heya Nûreddîn pê neşewiriya tu biryar nedidan." Herwiha ev gotina îbn el-Esîr jî vê yekê xurt dike: "Şêrkoh mezintirîn serdarê Nûreddîn bû û cihê wî yê cem Nûreddîn ewqas bilind bû ku xelkê ew di desthilatdariyê de hevbeş dizaniya."¹¹

Tevayiya gotina Selaheddîn ya ku Elî Beyyûmî bi kurtî ji Ebû Şame girtiye wiha ye: "Min ji serekqazî Behaddîn [Îbn Şeddad] bihîst ku Melîk el-Nasir Sultan Selaheddîn jê re qal kiriye: Rojekê Melîk el-Adil Nûreddîn min şande cem apê min Esededdîn Şêrkoh ku bê şêwra pê tu tiştêkî nedikir û ji min re got: 'Here ji Esededdîn re bibêje ku dilê min heye ez van deman hemî û azik (zewade) û bacên rêyan gişan rakim, ka ew çî dibêje?' Ez çûm cem û min gotina wî gihîştandê. Ji min re got: 'Here jê re bibêje: 'Serwerê me ger ku tu vê yekê bikî tu dê qûtê leşkerê ku em di cengan de hewceyî wan in û erzaq û xercên wan li ser van bacan e, ji ku bînî?' Min ji apê xwe re got: 'Madem Xwedê ev kar di dilê wî de sêwirandiye, jê bigere bira bike!' Ew bi min de xeyîdî û got: 'Tu here gotina min jê re bibêje!' Ez vegeriya cem Nûreddîn û min gotina apê xwe gihandê. Wî got: 'Here bibêje 'Gava cenga me bes li ser wan be emê dev jê berdin û rûnin, dernakevin.' Ez zivîrîm cem apê xwe û min gotina wî gihandê, wî got: 'Here bibêje; 'ger ew jî dev ji te berdin hingê fermo rûnê.' Min jê hêvî kir ku zêde bi ser ve neçe lê ew xeyîdî û got: 'Here gotina ku dibêjim jê re bibêje!' Ez çûm cem û min ew jê re got. Wî demekê dev jê berda lê piştê dîsa weke xwe kir."¹²

Ji bilî piştgiya Şêrkoh bi Nûreddîn re li hemberî birayên wî û hevalbendên wan, piştî mirina bavê wî di serê pêşî de wî li pêşberî Frengan jî welatê Nûreddîn parastibû. Jixwe hê di serî de Caslin (Joscelyn) çûbû ser Rihaya ku bavê wî ew jê sitandibû û xwestibû ku wê bi paş ve bistîne lê bi ser neketibû, her wiha mîrê Antakyayê Raymund (Raimund) jî çavê xwe berdabû erdê Musilmanan û leşker şandibû ser Hema û Helebê û di rê de gelek kes kuştibûn û talan kiribûn. Lê Şêrkoh pê hisiyabû û rabûbû bi sipaha Helebê ve çûbû dabû pey wan, dîlên Musilmanan ji wan sitandibû, êrîş ser deverên ku vegirtibûn jî kiribû û serkeftî zivîrîbû Helebê. Dû re dîsa Nûreddîn xwestibû weke bavê xwe ku xanedaniya Rihayê ya frengan vegirtibû ew jî mîrîtiya Latîniyan ya Antakyayê ji wan bistîne, lê ew li Famyayê şikiyabû. Bes piştê dîsa ew li der û dorên Entab û Dilokê hatibûn pêşberî hev û bi xêra mîrxasiya Şêrkoh ve carê Nûreddîn bi ser ketibû, çiku Şêrkoh bi xwe di cengê de Raymond kuştibû û sipaha wî şikandibû.¹³

Çawa ku Elî Beyyûmî diyar dike ji xwe hê ji dema Tikrîtê ve çavên Necmeddîn Eyyûb û Esededdîn

Şêrkoh li desthilatdariyeke mezintir bûye ku loma ji alîkarî bi dijminê mezinê xwe Behrûz re kirine û gava ku xwestiye wan ji Tikrîtê derxe ji lê lava nekirine û li ber negeriyane, ew hima ji nerma xwe ve bê xirecir yekser rabûne çûne cem Îmadeddîn Zengiyê ku berekî fireh dabû ber xwe. Jixwe hatiye gumankirin ku Behrûz ji bi vê yekê hisiyabûye û loma ji ew ji mîrgeha xwe derxistine.

Bêguman weke her karbidestên wê serdemê herdu biran ji çavên xwe li payeyên bilindtir gerandine û xwestine ku di nav tevliheviyên serdema xwe de li gorî pîvanên hingê beşdarî desthilatdariyê bibin û xanedaniyeke fermanrewa ava bikin.

Jixwe herdu bira ji bê hev nedibûn û hev temam dikirin. Eyyûb bi şarezayî, hişmendî, serwextî, tevdişkarî û siyasatmedariya xwe ya di cih de hertim hem li cem desthilatdaran û hem ji li cem leşker û xelkê, xwedî rûmeteke hêja û gotineke giranbiha bû û gava diqewimî ji timî ji xwe re rêyek didît û pê karê xwe xweş li hev dianî. Şêrkoh ji bi çeknasî, mîrxasî, zîrekî, pêbawerî, bêtekepekî û cengaweriya xwe hercar xwe digihande rêzên pêş û di nav refên bilind de cihê xwe digirt.

Încar gava ev herdu xeysiyet dibûne yek hingê gelek encamên bi rêkûpêk yên mîna Selaheddînê Eyyûbî ku bi xuyê herduyan ji hatibû perwerdekirin û avêtina hîmê dewleta Eyyûbî ya Kurdî derketin holê.

Her wiha ev hevtemamkirina wan di dema nexweşiya Nûreddîn ya sala 1149an de ji hate dîtîn, çiku gava nexweşiya wî giran bû, hat radeya mirinê ku herkesî destê xwe jê şûst û nûçeya mirina wî ji belav bû hingê Şêrkoh ji mîrgeha xwe ya Himsê bi lez hate Şamê da ku dest daye ser û armanca dilê xwe ya sazkirina dewletekê bîne cih. Lêbelê waliyê Şamê Eyyûbê birayê wî nehişt lez bike û jê re wiha got: "Tu bi vê yekê me dikuji! Ji me re baştir e ku tu herî Helebê; îcar ger Nûreddîn sax be ji xwe tu dê karê xwe bikî, lê ger ku miribe hingê ez li Şamê me û tiştê em bivên ez dê pê bikim." Li ser vê ew rabû çû û dît ku wa Nûreddîn sax e; hingê wî li karê xwe domand û nehişt mîratxwîrên wî [Nûreddîn] nêzî milkê wî bibin û ew jê re parast. Vêca ger Eyyûb ji weke Şêrkoh lez bikira û Nûreddîn ji piştî başbûna xwe pê bihisiya hingê siyaseta wan têk diçû, ew dê ji hev belav bibûna û nedigihîştin armanca xwe.¹⁴

B. H. Newbay ji li ser xuyê herdu biran wiha dibêje: "Eyyûb û Şêrkoh dijberê hev bûne, Şêrkoh

Jixwe bi saya van kar û xebatên hêja yê herdu biran û armanca wan ya payebilindiyeke ku wan ber bi desthilatdariyê ve dibir malbata Şazî di dewleta Nûreddîn Mehmûd Zengî de gihîşte bilindtirîn radeyê

yekî bejinkurt î bêpaxav î zîrek î xwire yî qelew bû ku ev xuyên pirrên Kurdan in. Ew leşkerekî bijare bû û ji şiyana xwe ya serdariyê hez dikir, wî ew bi kar anî ta ku bû serdarekî hosta yê zîrek. Lê Eyyûb bi xwe bêhtir îdarî bû û ji pend, baldarî, agah û nasîna mirovan hez dikir, çî di dema mezinatiya xwe de bûye û çî ji gava li nik serwerekî bûye wî her tim girîngî daye xwe û malbata xwe. Jixwe divê ji ber vê yekê be ji gava ku Zengî ji bo alîkariyê xwe lê girtibû, wî ew fersend bi kar anîbû û pê re alîkarî kiribû digel ku diviyabû li hemberî mezinê xwe pê re alîkarî nekira ji. Lê çawa dixuyê ji ber ku wî di Zengî de pêşeroja malbatê dîtibû, loma pê re alîkarî kiribû, bes piştî ji Behrûz re ji nameyek nivîsibû, ew li ser sedemê alîkariya bi neyarê wî re agahdar kiribû û dilê wî xweş kiribû."¹⁵

Texreberdî ji di behsa Şêrkoh de dibêje: "Esededdîn Serdarekî hişmend, mîrxas, gernas, xwedîtevdiş, çeknas, bîrbir, zêhntûj û bêhnfireh bû."¹⁶

Beyyûmî li ser devê Ebû Şame ku ji Îbn Ebî Teyy wergirtiye diyar dike ku di dema teslîmkirina Eyyûb ya Baalbekê bo Mû'îneddîn Unir [Onur?] de di navbera Şêrkoh û wî de dilsariyeke nihênî çêbûye û ji xwe ew yek ne bi dilê Nûreddîn bûye ji. Ew li bendê bûne ku ji dêlva çûna cem Mû'îneddîn ew çûbûna Helebê da ku li cem du desthilatdarên hember nehatina pêşberî hev. Lê piştî gava ew dibe fermandarê kurê Mû'îneddîn yê Şamê û wê bê şer dispêre Şêrkoh û Nûreddîn hingê hikmetê kirina wî tê zanîn û ew li cem wan bi rûmettir dibe.¹⁷

B. H. Newbay ji li ser vê rewşa ji hevveqetîna wan wiha dibêje: "Digel ku Şêrkoh û Eyyûb li cem desthilatdarên cuda yê dijber bûn ji dîsa pêwendiyên wan tu carî ji hev qut nebûne û ji ber vê yekê ji Eyyûb di sala 1152yan de Yûsufê [Selaheddînê] kurê xwe şande Helebê cem apê wî ku Nûreddîn hingê mîrgeh danê û wî ji ew karê girîng yê ku di pêş de dê wî bikira serdarê Nûreddîn, girte ser xwe."¹⁸

Jixwe bi saya van kar û xebatên
hêja yê herdu biran û armanca wan
ya payebilindiyeke ku wan ber bi
desthilatdariyê ve dibir malbata Şazî
[Eyyûbî] di dewleta Nûreddîn
Mehmûd Zengî de gihîşte
bilindtirîn radeyê

Jixwe bi saya van kar û xebatên hêja yê herdu biran û armanca wan ya payebilindiyeke ku wan ber bi desthilatdariyê ve dibir malbata Şazî [Eyyûbî] di dewleta Nûreddîn Mehmûd Zengî de gihîşte bilindtirîn radeyê. Lewra Esededdîn Şêrkoh bûbû serekfermandarê sipaha wî û cihgirê wî yê Siltaniyê, Necmeddîn Eyyûb jî ku jê pê ve tu kes bêdestûr nikaribû li civata Nûreddîn rûnişt, hem bûbû walî û hem jî fermanarê Şamê û serekê asayîşa Şamê jî hê di destpêka temenê xwe de (18 salî) bûbû Yûsufê ku dê piştî bibûya Siltan Selaheddîn Eyyûbî [ku hê berî wî jî Tûranşahê birayê wî ew kar dikir] û gelek ciwanên wan jî bi lehengiyên xwe yên cengawerî di nav sipaha Nûreddîn de xwedî paye bûn.¹⁹

Îbn el-Esîr li ser destpêka çûna Şêrkoh ya Misrê wiha dibêje: "Di vê salê (559/1164) de Nûreddîn Mehmûdê kurê Zengî leşkerekî pir di bin serdariya Esededdîn Şêrkohê kurê Şazî de ku serekfermandarê wî, mezintirîn serdarê dewleta wî û mîrxastirînê wan bû çawa ku di sala 564/1169an emê sedemê gihîştina wî ya Nûreddîn û bilindbûna payeya wî ya cem bibêjin, şande Misrê. Sedemê şandina vê sipahê jî hatina Şawerê wezîrê el-'Adid Lîdinîllahê 'Elewî yê xwediyê Misrê bû ku li ser wezîrtiyê di navbera wî û Dîrxam de şer derketibû û Dîrxam zora wî biribû. Şawer jî ber reviyabû Şamê û xwe avêtibû cem Nûreddîn û jê alîkarî xwestibû. Wî ew xweş qebûl kiribû, qedir dabûyê û qencî pê re kiribû. Ew di Rebî'elulaya/Sibata salê de gihîşte wê derê û jê hêvî kir ku leşker pê re bişîne Misrê da wî vegeirîne ser textê wî û ji bo vê yekê jî sêyeka dextê welêt piştî derxistina mîrgehên leşker jê, pê re soz dabû û xwestibû ku Şêrkoh jî bi leşkerê xwe ve li ser navê Nûreddîn bi fermanarî li Misrê bimîne.

Li ser vê hêviyê Nûreddîn geh gavê xwe bi pêş ve davêlê piştî dîsa bi paş ve dikişiya; heçî xwelêgirtina Şawer, zêdekirina milk û xwe pêxurtkirina li pêşberî frengan wî ber pê ve dibir, lê talûkeya rê, hebûna

frêngan di rê de û tîrsa bêbextiya Şawer piştî lihevastbûna rewşa wî û bicihneanîna sozê xwe, wî bi paş ve dida.

Piştî dilê wî li ser şandina leşker qewî bû û ji bo amadekariya wê û jîholêrakirina sedemên neçûnê ferman kir. Heçî dilê Esededdîn jî bi vê rêwingiyê ve hebû û jixwe ew jî mîrxas û bixwebawerekî wisa bû ku qet tîrs jê re çenedibû. Wî xwe amade kir û di cemadelûlaya sala (5)59/nîsana 1164an de bi Şawer re kete rê. Nûreddîn ji Şêrkoh xwest ku her wî vegeirîne cihê wî, heyfa wî ji hemberên wî bistîne û ew bi xwe jî bi leşker ve kişiya hêla welatê frengan yê hêla Şamê da freng têkevin heyra parastina welatê xwe ji Nûreddîn û neçin pêşiya Şêrkoh û sipaha wî.

Gava Esededdîn bi leşker ve gihîşt bajarê Bilbîsê Nasiredînê birayê Dîrxam bi leşkerê Misrê ve hate pêşiya wan, lê ew şikiya û zivirî Qahîreyê. Di dawîya cemadelaxerê/serê gulanê de Esededdîn çû ser Qahîreyê û Dîrxam jî di dawîya mehê de derkete pêşiya wan û li cem goristana xatûna Neffise hate kuştin û du rojan li wê derê ma, piştî ew li Qerefayê hat veşartin. Birayê wî Faris el-Muslimîn jî hat kuştin û Şawer jî di destpêka meha Recebê/25ê Gulanê de li cihê xwe hate vegeandin û ji nû ve bû wezîr.²⁰

Yanî li gorî Îbn el-Esîr sedemê hîlbijartina Şêrkoh ji bo çûna Misrê ew bû ku ew hem serekfermandarê (sipahsalarê) sipaha wî, hem jî mezintirîn serdarê dewleta wî û lehengtirînê wan bû jî û her wiha ew fermanarekî mîrxas û bixwebawer û bêtîrs bû jî.

Herwiha Ebû Şame jî ji bilî tiştên jorîn ku ji Îbn el-Esîr û ji Îmad el-Katib girtiye, ji Yehya îbn Ebî Teyy jî wiha lê zêde kiriye: "Ji ber ku Nûreddîn heya hingê çî karê ku Şêrkoh pê ve şandibû ew jê serkeftî vegeiriyabû û çî tengasiya ku wî ew xistibûyê jî wî xwe jê xelas kiribû, rabû ew şande vî karê zehmet î giran jî."²¹

Lê her wiha dixuyê ku Şêrkoh bi xwe jî di çûna xwe ya Misrê de roleke baş leyîstiyê, çiku ew ji bo danîna dewletekê ji malbata xwe re timî li fersendekê digeriya û Misr jî bi aqarê xwe yê zahf, bi dewlemen-diya xwe ya pir û bi îdareya xwe ya bê ser û ber ji bo armanceke wiha bi dest nediket. Çawa ku li jor jî hat dîtin Îbn el-Esîr li ser vê yekê wiha dibêje: "Dilê Esededdîn bi xwe jî bi êrîşê ser Misrê ve hebû û ji xwe ew xwedî kesayetiyeke xurt û qewî û dilêriyeke bêhempa bû û tîrs jî qet li cem peyda nedibû"²²

Herwiha Stevenson jî bi gotina xwe ya jêrîn vê yekê qewî dike: "Şêrkoh timî difikirî ku ger ew bibe desthilatdarê Misrê dê ew serbixwetir bibe û ku rewş jî jê re li hev bê dê karibe xanedaniyeke fermanrewa ava bike."²³

Îbn el-Esîr li ser vê bûyerê piştî wiha didomîne: "Esededdîn li piştî Qahîreyê ma, Şawer xedre pê re kir û ji sozê ku pê û bi Nûreddîn re ji bo welatê Misrê dabû xwar û xeber jê re şand ku vegere here Şamê. Esededdîn bi vê yekê aciz bû û jê xwest ku sozê xwe bîne cih, lê şawer guh nedayê. Gava vê yekê jê dît rabû cihgirên xwe şand ku dest deynin ser Bilbîsê û desthilatdariya navçeya rojhilatê xiste destê xwe. Şawer jî rabû ji frengan alîkarî xwest û ew bi vegirtina Nûreddîn ya Misrê tirsandin û ji xwe ew jî berê ditirsiyan û qenc dizaniya ku ger Nûreddîn Misrê vegire dê bibe mirina wan. Vêca gava Şawer ji bo derxistina Esededdîn ji Misrê alîkarî xwest ew bi lez çûnê, çiku dilê wan jî bi Misrê ve bû û ji xwe ji bo çûnê bi wan re sozê mal jî hatibû dayin.

Gava freng çûne Misrê Esededdîn bi leşkerê xwe ve kişiya Bilbîsê ku xwe lê biparêze û leşkerê Misrê û yê frengan jî li hev civiyan û çûn avêtin ser bajarê Bilbîsê, dora Esededdîn girtin û 3 mehan li ser man. Digel ku sûra bajêr kin bû, bê xendek bû û more bû jî, lê dîsa wan xwe tê de ragirt û carna jî êrîşî wan dikir. Di wê navê de nûçe gihîşt frengan ku Nûreddîn li 'Harimê freng şikandine, kela wê vegirtiye û berê xwe daye Banyasê jî. Hingê milên wan sist bûn û xwestin ku berî vegirtina Nûreddîn herin xwe bighîjinîn Banyasê, lê berî ku bigihîjinê wî ew vegirt. Wan ji bo lihevhatin û derketina ji Misrê, vegera li erdê Şamê û vegerîna mal û erdê Misriyan li wan, mirov şand cem Esededdîn û ji ber ku haya wî jî ji têkçûna wan ya ji ber Nûreddîn tunebû, rabû daxwaza wan pejirand.

Yekî ku dema derketina Esededdîn ji Bilbîsê ew dîtibû ji min re got: 'Min dît ku hevalên wî li pêşiya wî derdiketin, ew jî li pey wan bû û di destê wî de jî teberek (tevrek ?) hebû ku ew diparastin û musulman û frengan jî hemî lê dinêrî. Frengêkî rojhilatî hate cem û jê pirsî: 'Ma tu ji van musulman û frengên ku dora te û hevalên te hemî girtine natirsî ku bi te re bêbextî bikin?' Şêrkoh bersîv da: 'Xweziya bikirina, hingê dê te tiştekî ku qet nedîtibû bidîta, bi Xwedê min dê şûr têxista nav wan û heya ku tibabek ji wan telef nebûna jî ez nedihatim kuştin. Hingê dê Melîkê

Gava freng çûne Misrê Esededdîn bi leşkerê xwe ve kişiya Bilbîsê ku xwe lê biparêze û leşkerê Misrê û yê frengan jî li hev civiyan û çûn avêtin ser bajarê Bilbîsê, dora Esededdîn girtin û 3 mehan li ser man

Adil (Nûreddîn) jî bihata, wan bikuştî û welatê wan vegirta, ji xwe ew qels bûbûn û pahlewanên wan jî çûbûn. Bi Xwedê ger van, mebest jê hevalên wî bûn bi ya min bikira ez dê roja pêşî bihatima we, lê nehiştin.' Yê freng li ser rûyê xwe xaç çêkir û got: 'Em li pir pesndana frengên vî welatî ya te û tîrsa wan ji te şaş diman, lê niha em doza lêborînê ji wan dîkin' û piştî zivirî çû." Şêrkoh jî bi saxlemî vegeriya Şamê.²⁴

Piştî sefera pêşî êdî Şêrkoh ji Nûreddîn zahftir dilê xwe berdabû Misrê û dilbijîna wî ya bidestxistina wê derdikete ser rû. Di vî warî de Hesên Îbrahîm hinekî din jî bi pêş ve diçe û wiha dibêje: "Piştî vegera Şêrkoh ya Şamê ya piştî rêwîtiya pêşî êdî wî bi hêviya avakirina **împaratoriya** (dewleta) xwe ji bo cara duyemîn jî xwe amade dikir."²⁵

Îbrahîm el-Henbelî jî li ser dilbijîna Şêrkoh ya Misrê wiha dibêje: "Di pey ku Şêrkoh vegeriya Şamê de jî Misir ji dilê wî derneket, çimkî wî Misir ecibandibû û têgihîştibû ku desthilatdariya wê li ser tîrs û gumanan e û jixwe xapandina Şawer jî qet ji bîra wî nedîçû. Ji ber vê jî çî gava ku bi Nûreddîn re bi tenê dima ji bo vegirtina Misrê ew han dida ta ku Nûreddîn jî qayîl kir; ji xwe wî jî bêbextiya Şawer hê ji bîr nekiribû."²⁶

Ebû Şame jî li ser lêkudîna Şêrkoh ya rêwingiya duyemîn wiha dibêje: "Di vê salê (562/1167) di 9ê Rebî'elaxerê/2yê Sibatê de Esededdîn zivirî Misrê ku jixwe wî piştî vegera xwe ya ji Misrê hertim behsa vegera lê û hesreta ketina wê ji herkesê ku pêbawer bû re digot. Lêkudandina wî ya bêhtir ji bo çûnê jî aciziya wî ya zahf ya ji Şawer bû ku ew jî ji ber bêbextiya pê [bi Şêrkoh] re dihat. Ew rabû wî di vê salê de xwe amade kir û ew derkete rê, gava ku dê here Nûreddîn rabû hinek serdar jî danê ku biraziyê wî Selaheddîn jî di nav wan de bû.

Esededdîn welatê frengan li hêla xwe ya rastê hişt

û ber û berê çolê çû heya gihîşt welatê Misrê, berê xwe da devera Îtîfihê û li wê derê li Nîlê derbas bû çû hêla rojava, dakete girava himberî Misrê, dest danî ser rojavayê welêt û pêncî û çend rojan lê ma.

Gava Şawer bi hatina Esededdîn hisiya hingê xeber şand cem frengan û ji wan alîkarî xwest; ew bi zorê û bédil hatinê, lê dudiliya wan jî ew bi paş dixistin, heçî dilbijîna wan ya milkê Misrê ew ber pê ve dahf didan, lê tirsê lezkirina leşkerê Nûriye û vegirtina wê berî wan jî ew radiwestandin. Vêca gava ew gihîştin Misrê wan xwe da hêla rojava ku hingê Esededdîn jî bi leşkerê xwe ve çûbû hêla jorê ya Se'îdê û gihîştibû cihekî bi navê el-Babeynê û frengan jî da dû wan; ew di 25ê cemadêlûlayê/19ê adarê de gihîştin wan û li wê derê şerê el-Babeynê di nav wan de derket".²⁷

Ev Bûyereke navdar e ku Esededdîn li wê derê bi hêza xwe ya hindik [li dor du hezar leşkerê xwe] zora sipaha frengên qeraxê û ya misriyan hemî bi carekê biriye û ew şikandine. Serpêhatiya wî şerê navdar jî wiha çêbûye: "Şêrkoh gava digihîje Misrê berî ku xwe li şerekî bide dixwaze pêşî ji xwe re hinek hevkarîyan peyda bike û ji bo vê yekê jî hinek giregirên Îskenderiyeyê yên weke Necmeddîn Îbn Masil û Şerîf el-Îdrîsî ku gelek caran li hemberî bac û zordariyên dewleta fatimîyan û wezîrên wan yên dekbaz î çavbirçî serî hildabûn re name şandiye û daxwaza piştgiriye ji wan kiriye.

Vêca gava bersiva erênî ji wan bihîstîye piştî wî xurtir bûye, kêfa wî hatiye û ji ber ku bihîstîye freng jî li Nîlê derbas bûne, rabûye berê xwe daye aliyê başûr. Freng û Şêrkoh li başûrê Mînyeyê bi qasî 10 mîlan nêzî el-Babeynê rastî hev hatine. Jixwe berê jî ji bo fêrbûna rewşa Şawer û frengan wî sîxurên xwe şandibûn dora wan, îcar gava ew vegeriyan û li ser piriya hejmara wan, hêza wan ya xurt û xwdîbiryariya wan agahdarî dabûn, hingê çokqurf li leşkerê Şêrkoh ketibû û ew tirsîyabûn, nexwestibûn têkevin şerekî ku li gorî wan encama wî têkçûn bû.

Lê ji nav wan yekî bi navê Şerefeddîn Bozkuş²⁸ belkî bi tilîdana Şêrkoh yan Selaheddîn be jî rabûye ser piya û wiha gotiye: "Kesên ku ji kuştin, girtin û birîndariyê bitirsîn bira nekevin ber xizmeta Siltanan, bira yan herin ji xwe re cotkariyê bikin, yan jî li mal li cem jinên xwe rûnin. Bi Xwedê ger ku hûn yan serkeftî yan jî bêsedemekî berkeftî yê lêborînê bi ser Melîkê Adil (Nûreddîn) ve venegerin dê mîrgeh

Gava frengan reva hevkarên xwe yên Misrî dîtiye û pê hisiyane ku Şêrkoh wan xistiye nav çemberê ew jî gavo ha gavo reviyane, dane pey hevkarên xwe û berbi bakur ve baz dane

û malê we yê ku heya vêga we daye hev ji we bistîne û bibêje: 'Hûn çawa malê misilmanan dixwin, lê bi neyarên wan re şer nakin û welatê wan pêşkêşî kafiran dikin?' Dû re Şêrkoh jî eynî tiştî gotiye, Selaheddîn jî bi wan re bûye hevraman û li i ser vê yekê jî biryara şer hatiye dayîn.

Piştî biryara şer, Şêrkoh rabûye hiner û taktîka xwe ya şer nîşan daye û bi leşkerekî hindik sipaha misrê ya di bin femandariya Şawer de û ya Frengan ya di bin femandariya Amoury [çawa ku li jor jî bihurî] de bi yek carê şikandiye û ew şerpeze kirine. Wî di şer de sîpaha xwe kiriye sê beş: Selaheddîn xistiye navendê û lê ferman kiriye ku gava şer germ bibe bira ew hêdî hêdî bê ku xwe biwestînin bi paş ve vekişin, beşek jî şandiye hêla çepê û wî jî aliyê rastê girtiye. Herdu sipah di 18ê nîsana 1167an de ketine pêşberî hev û dest bi şer kirine. Weke ku şêrkoh jî li bendê bû, neyar bi niyeta ku Şêrkoh di nîvî de ye zor daye navendê, lê mina ku berê biryar dabûn Selaheddîn hêdî bi paş ve vekişiyaye û frengan jî daye pey; hingê Şêrkoh jî ji hêla çepê ve êrîşî leşkerê Misrê kiriye, zor daye wan, ew ji hev belav kirine û mecbûrî revê kirine.

Gava frengan reva hevkarên xwe yên Misrî dîtiye û pê hisiyane ku Şêrkoh wan xistiye nav çemberê ew jî gavo ha gavo reviyane, dane pey hevkarên xwe û berbi bakur ve baz dane. Ew herdu sipahên mezin ji ber hêza Şêrkoh ya hindik şikiyane û gelek ji wan hatine kuştin. Bêguman ev yek ji Şêrkoh re bûye serkeftineke mezin û ji bo pêşerojê ji Selaheddîn re jî bûye tecrûbeyeke giranbiha.²⁹

Piştî Rêwîtiya Şêrkoh ya duyemîn ku Selaheddîn jî pê re bû, nivîskar û şairê mezin Îmad el-Katib helbesteke wiha li ser wan û Necmeddîn Eyyûb nivîsiye ku pê xwestîye rewşa wan û hêvî yan jî planên wan diyar bike û ji xwe weke wî jî çêbûye:

Roja jêdûriyê ji temenê min nayê hesabê

*Û roja cudabûnê jî ne ji jiyana min e
Bira û kurê te bi dirustî xwe spartin Xwedê
Û serkeftin jî sozekî rast e, nabe derew
Ew lehengên cengê û yên rojên zehmet in
Ew fêrî lêdana qoqên serê xayînan bûne
Ewê sibê di nav kafiran de pêlîdana agir bilind
bikin*

*Ku bi germiya wî dê can pîr bibin
Yûsuf dê li Misrê bi cih bibe û piştî navbireke
dirêj*

*dê çavên Yaqûb pê rohnî bibin
Yûsuf dê li wir bigihîje birayên xwe,
bêguman dê Xwedê wan bigihîjîne hev.³⁰*

Digel ku Şêrkoh zahf dixwest dîsa vegere Misrê jî, lê Şawer û kurê xwe Şucca' hem bi nameyên xwe yên diyarkirina beremriya wî û hem jî bi (sozdana) şandina mal û diravan jê re dixwestin ku bala Nûreddîn ji ser Misrê bidin alî ta ku nehêle Şêrkoh jî here ser û heya radeyekê bi ser jî ketin, çiku herdu aliyên jî kêr zêde ya dilê Şêrkoh fêr kiribû. Lêbelê ev daxwaziya Şawer û nehiştina Nûreddîn bi girtina frengan û qralê Qudsê Amoury bi ser Bilbîsê ve, vegirtina wê, talan û tajan kirina xelkê wê, kuştin û kirêtiyên wan yên li wê derê serûbin bû.

Hingê Xelîfe el-'Adid bi xwe digel lavelavên Şawer jî nameyeke ku porên jinên saraya xwe jî xistibûyê, ji bo şandina Şêrkoh bo hawara wan ji Nûreddîn re şand û ji bo mayîna Şêrkoh li Misrê jî pê re sozda ku sêyeka hatîna Misrê bide Nûreddîn û gelek mîrgeh jî bide sipaha wî. Herwiha nameyeke di vî warî de jî ji Şêrkoh re hatibû şandin ku ji xwe ji bo vê yekê Şawer jî xwe avêtibû el-'Adid û ji bo şandina nameyê bi taybetî jê hêvî kiribû.

Vêca ji ber ku Şawer berê bi nameyên xwe yên li ser Şêrkoh û armanca wî dilê Nûreddîn bi xişûş kiribû gava ji Himsê ew ji bo rêwingiyê xwest, rabû berbiçav ji bo alîkariyê, lê bi rastî hem ji bo sexîtiyê û hem jî ji bo ku wî li ser rewşê û tevgera Şêrkoh agahdar bikin ji bilî Îsayê Hekarî û Selaheddîn hinek serdarên xwe yên giregir yên mîna Ezeddîn Cûrdik, Şerefeddîn Berguş, Eyn el-Dewle el-Yarûqî, Qutbeddîn Yenal ibn Hesên el-Menbecî û hinekî din jî pê re şand.³¹

Li ser van xirabiyên Şawer ku ji ber bêbextî û çavnebariya xwe bi destê frengan bi xelkê Misrê dabû kirin gava Şêrkoh di çileyê 1169an de piştî reva frengan jî berê, mîna lehengekî gihîştibû Qahîreyê xelk

daketibû pêşiya wî, jê re kêf kiribû û hem el-'Adid û hem jî Şawer ew bi diyariyan xemilandibûn, hingê kêfa Nûreddîn jî pir bi vê yekê hatibû û xwestibû ku ev serkeftina wî li her derê bê belavkirin.³²

Li gorî Îbn Ebî Teyy el-'Adid bi şev çûye, ketiye çadira Şêrkoh û li ser rewşa Misrê giş heya bigihîje kuştina Şawer pê re peyiviye. Ji hêla din ve Şawer jî her xwe nêzî Şêrkoh kiriye, lê her wiha li ber keysa xwe bûye jî ku ka çawa Şêrkoh û hevalên wî têxe dafikekê û derbekê li wan bixe û xwe ji wan xelas bike.³³

Bêguman ev fêlbaziyên Şawer ji Şêrkoh re nedîtî nehatin ji xwe berê jî ev bêbextî jê dîtibûn û jê re eseyî bûbû ku Şawer tu carî dev ji tevliheviya xwe bernade û bi vî awayî jî tu kar pê re nameşe. Ew rabû wî civînekê bi serdar û leşkerên xwe re çêkir, wan jî rewşê agahdar kir, gerr û fenên Şawer ji wan re diyar kir û li gorî Îbn Ebî Teyy wiha domand:

"Jixwe hûn bi rewşa hizkirin û dilbijîna min ya Misrê qenc dizanin û ji we ve eyan e ku ev dilbijîn û daxwazî bi frengan re jî heye. Her wiha ez eseyî jî dizanim ku wan rê û dirbên wê naskirine û çî gava ez ji vê derê herim jî ew dê yekser werinê. Weke hûn jî dizanin Misir yek ji welatên Îslamê yê mezintirîn û xwediye gencîneyên dewlemendtirîn e. Încar hê berî ku freng werin wê vegirin divê ez wê vegirim û wê têxim destê xwe; her wiha divê em ji Şawerê ku bi me dileyîze û me û frengan hemî dixapîne, berdide hev jî xilas bibin.

Bêguman Şawer dewlemendiya welêt belawela kiriye û pê freng li ser me xurt kirine, lê dîsa jî ji me re vegirtina vî welatê ku mîrxas û şervanên wî kêr bûne û nehiştina ketina wî ya bin destê frengan, pêwîst e û hertim bi dest nakeve."³⁴

Bêşik ji vê gotina Şêrkoh jî armanc û daxwaziya wî û malbata wî ya desthilatdariya devereke û bi taybetî jî ya Misrê diyar dibe. Li ser vê yekê şewra kuştina Şawer hatiye kirin, piştî ew ji aliyê Selaheddîn û Cûrdik ve hatiye kuştin û el-'Adid jî Şêrkoh bi fermannameya wezîrtiyê û diyariyên wê perû kirine ku li gorî Îbn Ebî Teyy Şêrkoh çend caran ew eşkere daye xwendin.³⁵

Jixwe çawa ku ji van bûyeran jî tê fahmê, dixuyê ku bingehe dewleta Şazî û xanedaniya Nasirî (Eyyûbî) ji aliyê Şêrkoh ve lê bi rêşnasiya Eyyûb, hatiye danîn û ji xwe lêkudandina êrîşên ser Misrê û vegirtina wê jî ji bo vê yekê bûye.³⁶

Belê li jor di biwara ketina Şêrkoh ya Misrê û pêşwaziya jê re de qala şabûna Nûreddîn bi vê yekê hate kirin, lê çendî ku Ebû Şame bi xwe jî ev yek nivîsiye lê hima çend rêz piştî jî wî ji Yehya îbn Ebî Tey el-Helebî wiha veguhaztiye: "Lê gava [Nûreddîn] bihîst ku Şêrkoh bûye wezîrê el-'Adid hingê kêfa wî tê de şikestiyê, pir li zora wî çûye, ji ber zahf qilqiliye û gelek gotinên kirêt jî kiriye. Xuya ye ku vê yekê xewê şevan lê herimandiye û ew wisa pir ponijandiye ta ku razên xwe ji Mecdeddîn îbn Daye re jî gotiye û ji xwe piştî wezîrtiya Selaheddîn êdî qilqilandina wî hê bêhtir diyar bûye.

Hinekan ji Şemseddîn Elî îbn Daye re ku birayê Mecdeddîn Daye ye, û ji zanayê Helebî Muweffeq Mehmûd îbn Nuhas veguhastiye ku gava ji vegirtina Misrê û şabûna Nûreddîn pê hatiye qalkirin, gotiye: 'Bi Xwedê ew qet pê şanebû û wî dixwest ku ew nê vegirtin û Şêrkoh û Selaheddîn jî negihîjin cihê ku hatibûnê. Jixwe jê aciziya wî hem di gotinên wî de û hem jî di ruyê wî de diyar dibû û ji bo xerakirina rewşa Şêrkoh û Selaheddîn gelek fen jî kirin, lê ew bi ser neket; bi taybetî jî gava destê Selaheddîn gihîşte gencîneyên Misrê hingê heya sê rojan tu kesî nikaribû pê re bipeyiviya. Vêca ger vegirtin ne li ser navê wî bûya dê qet saman nekira. Jixwe ji bo rewşa Şêrkoh û Selaheddîn gelek caran ji 'Adid re name şandiye û jê xwestiye ku wan bi paş ve bişîne, lê bi ya wî nebûye.³⁷

Li ser vê acizî û xeyda Nûreddîn ya ji bo wezîrtiya Şêrkoh B. H. Newbay wiha dibêje: "Bêguman ev wezîrtiya Şêrkoh di hisabê Nûreddîn de tunebûye; çawa xwegirtiye wî dibe wezîrê femandariyeke biyanî û kafir? Ji ber vê yekê jî ev xeber pir li zora Nûreddîn çûye û wisa pê hêrs bûye ku dest daniye ser temamê milk û malê Şêrkoh yê Sûriyê. Lê digel vê jî di vî warî de tu agahên ku Nûreddîn ji bo vî karê Şêrkoh ji Necmeddîn Eyyûb re gelşek derxistibe di destê me de nînin. Bes hingê rewş jî pir bi lezgîni hatiye guhartin ku 9 in (heftî) piştî Şêrkoh di ziyafetekê de bi xwarineke giran î pir nexweş ketiye û jê ranebûye.

Vêca çî gava hêza Sûrî ji ber vê bûyera ji nedî ve bi ser xwe ve hat, ji bo yekî ku têkeve cihê wî di cih de dest bi tevgerê mezin kir û nekete bîra yekî ji wan jî ku bi Nûreddîn bişewirin ka ew ji sipahsaliya leşker re kê dixwaze. Jixwe diviyabû ku biryareke lezgîn jî bihata dayîn, lewra ew ji ber bêserîbûna xwe bi xetera êrîşê hêza Fatimî ya din re ku piştî mirina Şawer ew jî bêserî mabûn, rû bi rû bûn û di

rewşên wiha de jî bêguman ya girîngtirîn parastin û hevgerîna sipahê bû.

Di nav sipahê de jî bereke Kurdî û yeke Tirkî hebû û her yek ji wan jî dixwest ku cihgirê Şêrkoh ji wan be û herdu ber jî têngihîştîyê talûkeya rewşê û lezgîniya çareseriyekê bûn. Di navbera Kurdî de kesê payedar î mezintirîn Şehabeddîn Mehmûdê Harimî yê xalê Selaheddîn bû û di nav ya Tirkî de jî serdar Eyn el-Dewle el-Yarûqî bû. Bi ser herduyan ve jî meylarî hebû, lê ji ber ku berendamê Şêrkoh bi xwe Selaheddîn bû ji bo wî dest bi kûlîsan hate kirin.

Di vî warî de qaziyê Kurd Îsayê Hekarî ku miftiyê sipahê bû, hunera xwe ramî dabû û pêşî jî Şehabeddîn re diyar kiribû ku Kurd hemî Selaheddîn dixwazin û ger ku yekî li ser çenebe dê ew wê bidest nexê û jixwe Tirk jî dê mirovê xwe hilbijêrin. Ji ber vê jî ma qey ne baştir bû ku wî jî giraniya xwe bida ser hêla kurê xwiha xwe? Şahabeddîn jî erê kir. Piştî Hekarî lê xebitibû ta ku di nav serdarên Tirk de jî Selaheddîn bi şertê ku serdarê mezin Şehabeddîn jî li cem Xelîfe xwarziyê xwe pêşniyar bike weke berendamê navbeynê hatibû parastin".³⁸

Lê mixabin ku Şêrkoh bi wezîrtiya xwe ya ku weke hîmê bingeîn yê dewleta Eyyûbî yî Kurdî tê zanîn mirad nekiriye û çawa ku li pêş jî bihurî piştî 2 meh û 5 rojan ew di ziyafetekê de bi xwarinê ketiye, piştî ew lê bûye êşa xeniqokî (xeneqîtkê) û pê miriye. Çendî ku nehatiye eseyîkirin jî, lê li ser vê ketina wî ya bi xwarinê [bi nihênî gumana jarîdanê hatiye kirin û ji ber vê gumanê bûye jî ku] Selaheddîn jî piştî mirina apê xwe bi xwarinê, dev ji xwarina goşt berdaye, kêman caran jî beşdarî xwarinên civatkî bûye û pirrê caran xwarina wî gelekî sade bi tenê jê re hatiye pêhtin û bi tenê jî xwariye. Gelek kesên ku ji xwarina xweş î bi goşt hez kirine gava carina wî ew ji bo xwarinê vexwendine jî yan nexwestine herin yan jî bê dilê xwe çûne.³⁹ ■

ÇAVKANÎ

- 1- Li gorî notêke ser berhema îbn Texrîberdî di hinek berheman de Şazî û di hinekan de jî Şadî hatiye nivîsin, (binêre Ebû-l-Mehasin Yûsuf îbn Texrîberdî, *el-Nicûm el-Zahîre fî Milûk Misr we-l-Qahîre*, Dar el-Kutub el-Îlmiyye, Beyrût, 1992, c. 5, r. 367, sal 564, not 3) Jixwe "d" ya zimanê Îranî di hinek berhemên erebî yên klasîk de gelek caran bûye "z", mîna Hemedan û Hemezan, Abad û Abaz, Bad û Baz, Şadî û Şazî û gelekî din.
- 2- Li gorî Ehmed Muxtar el-'Ebadî hingê Tîkrît bajarekî Kurdan bûye û xelkê lê jî hemî Kurd bûne, lê mixabin ku ji bo vê agah-

- dariya xwe tu çavkanî nedaye. Herwiha Namik Kemal jî di kitêba xwe ya *Ewraq-i Perîşan de*, di beşa *Ji Navdarên Îslamê* de nivîsarekê li ser Selaheddîn Eyyûbî jî nivîsiye û tê de dibêje: "Selaheddîn Eyyûbî di 532/1137-38an de li bajarê Kurdistanê yê Tîkrîtê çêbûye". (Binêre Ehmed Muxtar el-'Ebadî, *Fî Tarîx el-Eyyûbiyyîn we-l-Memalik*, Dar el-Nehd el-Erebiye, Beyrût, 1995, r. 42; *Namik Kemal, Ji navdarên Îslamê Selaheddîn Eyyûbî*, Bedir Yayinevi, 1964, İstanbul, wergera bo Tîrkîya nû jî aliye Erol Öncül ve, r. 7)
- 3-Îbn Xelîkan, *Wefeyat el-E'yan we Enba' Ebnâ' il-Zeman*, Dar el-Kutub el-Îlmiyye, Beyrût, 1998, c. 5, r. 495-499.
- 4-Çendî ku Îbn Xelîkan li vê derê navê Bilbisê dide jî lê xuya ye ku ew tevlihev dike, lewra berhemên din bes dibêjin: "Gava wan Selaheddîn li Îskenderiyê xiste hesarê hingê Şêrkoh ji Seîdê çû wan" lê ew qala Bilbisê nakin, nexwe divê ya rastî Îskenderiyê bûya çûku Şawer û Frengên hevalên xwe li Îskenderiyê dora Selaheddîn girtibûn ne li Bilbisê. (Binêre Îbn el-Esîr, *el-Kamil fî-l-Tarîx*, Dar el-Kutub el-Îlmiyye, Beyrût, 1987, c. 10, r. 5, sal 562)
- 5-Her ev teksta ser hazîrkirina Şêrkoh ji goştê xurt î bi bez û xwarina bi rûn û mirina wî pê di berhema Ebû Şame ya *Rewdeteyn* de jî heye ku wî jî ji Îbn Şeddad girtiye. (Binêre Şehabeddîn Ebdurrehman îbn Îsmâil el-Meqdesî, *el-Rewdeteyn fî Exbar el-Dewleteyn el-Nûriye we-l-Selahiye*, Dar el-Kutub el-Misriye, Qahîre, 1998, c. 1, beş 2, sal 564, r. 406.
- 6-Îbn Xelîkan, *Wefeyat el-E'yan*, (berhema navdayî, c. 2, r. 397, hejmar 298). [Heya vê derê jî Îbn Xelîkan hatiye wergerandin lê ji ber ku wî pir kin girtiye û bi ya min ew Şêrkoh bi xebat û jiyana wî ve baş nade nasîn, ji ber vê yekê min jî çend çavkaniyên din yên ku li cem min hebûn, ev agahî jêrîn lê zêde kirin. E. N.]
- 7-Binêre Xeyreddîn el-Zirîklî, *el-E'lam Qamûs Teracim li Eşhurî-l-Rical we-l-Nisa' min el-Ereb we-l-Muste'ribîn we-l-Muste'riqîn*, Dar el-Îlim li-l-Melayîn, Beyrût, 1998, çap 13, c. 3, r. 183, not 1
- 8-Îbn el-Esîr, *el-Kamil fî-l-Tarîx*, c. 10, r. 16, sal 564; Ebû-l-Fîda, *el-Muxteser fî Exbar el-Beşer*, Dar el-Kutub el-Îlmiyye, Beyrût, 1997, c. 2, r. 123, sal 564; Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 329-31, sal 559
- 9-Gotina xergah bi Farsî [Îranî] ye ku serê pêşî jî bo cihên fireh hatiye gotin lê piştî ew jî bo konên mezin yên serdarên Kurd û Ereb û Tirkmenan bi taybetî hatiye bikaranîn û dû re jî ji bo çadîrên şah û wezîran hatiye xebitandin. (Binêre Seyyid Eddî Şîr [Şêr], *Mu'cem el-Elfaz el-Farîsiye el-Mu'errebe* (A Dictionary of Persian loan-words in the Arabic Language), Mektebet Lubnan, Beyrût, 1990, r. 53.
- 10-Elî Beyyûmî, *Qiyam el-Dewle el-Eyyûbiye fî Misr*, Dar el-Fîkr el-'Hedîs, Qahîre, 1952, Wergera Tîrkî Abdulhadî Timurtaş, [bi navê] Kurulus Devrinde Eyyubiler, Kent Yayınları, İstanbul, 2005 r. 72; Ebû Şame, b. n. (berhema navdayî) c. 1, beş 1, r. 119-120
- 11-Elî Beyyûmî, b. n. (berhema navdayê), r. 81 ku jî Îbn el-Esîr, *el-Dewle el-Atabekiye*, r. 215, 305, girtiye.
- 12-Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 1, r. 37
- 13-Elî Beyyûmî, b. n. r. 77-78, jî Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 1, r. 269-76, sal 552; eynî berhem sal 554, r. 305-306; B. H. Newbay, *Selaheddîn we 'Esrihi* [Selaheddîn û Serdema wî], Dar el-Cindî li-l-Neşr, Dîmeşq [Şam], 1993, wergera Memdûh 'Udwan, çap 1, r. 32
- 14-Elî Beyyûmî, b. n. r. 66-72
- 15-B. H. Newbay, b. n., r. 32
- 16-TeXrebirdî, b. n., c. 5, r. 381, sal 556
- 17-Elî Beyyûmî, b. n., r. 75
- 18-B. H. Newbay, b. n., r. 37
- 19-Elî Beyyûmî, b. n., r. 90
- 20-Îbn el-Esîr, *el-Kamil*, c. 9, r. 465-66, sal 559
- 21-Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 469, sal 564
- 22-Îbn el-Esîr, *el-Kamil*, c. 9, r. 465, sal 559
- 23-Elî Beyyûmî, b. n. r. 104, not 239 ku jî Stevenson, *The Crusaders In The East*, Cambridge, 1907, *Saladîn*, r. 187, girtiye.
- 24-Îbn el-Esîr, *el-Kamil*, c. 9, r. 466-67, sal 559; Ebû Şame *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 466, sal 559.
- 25-Elî Beyyûmî, b. n., r. 113, not 272 ku jî Hesên Îbrahîm Hesên, *el-Fatimiyûn fî Misir*, el-Metbea el-Emîriye, Qahîre, 1942, r. 303, girtiye
- 26-Elî Beyyûmî, b. n., r. 114; B. H. Newbay, b. n., r. 54
- 27-Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 363-364, sal 562
- 28-Li gorî Îbn el-Esîr "Burxuş [Berxwêş?]" e, binêre Îbn el-Esîr, *el-Kamil*, c. 10, r. 4, sal 562; li gorî Ebû Şame "Buzxuş [Bezwxêş?]" e, binêre Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 365, sal 562; li gorî Îbn Xelîkan "Burxuş" e, binêre Îbn Xelîkan, *Wefeyat el-E'yan*, c. 2, r. 366
- 29-Elî Beyyûmî, b. n., r. 116-119, Ebû Şame, *Rewdeteyn* c. 1, beş 2, r. 363-65, sal 562; Îbn el-Esîr, *el-Kamil*, c. 10, r. 34, sal 562
- 30-Elî Beyyûmî, b. n., r. 112-114, ku jî Hesên Îbrahîm Hesên, *el-Fatimiyûn*, r. 303 û Îbrahîm el-Henbelî, *Şîfa el-Qilûb*, r. 10 girtiye; Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 369, sal 562
- 31-Elî Beyyûmî, b. n., r. 123-130
- 32-Elî Beyyûmî, b. n., r. 132; Îbn el-Esîr, *el-Kamil*, c. 10, r. 14 sal 564; Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 437, sal 564.
- 33-Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 434-35, 436-37, sal 564
- 34-Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 435-36, sal 564
- 35-Elî Beyyûmî, b. n., r. 132-136; Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 436-37, sal 564
- 36-Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 438, sal 564
- 37-Ebû Şame, *Rewdeteyn*, c. 1, beş 2, r. 427, sal 564
- 38-B. H. Nawbay, b. n., r. 62-63
- 39-Tarik Ali, *The Book of Saladin* (Selahaddin kitabı), Everest Yayınları, İstanbul, 2000, wergera Tîrkî, Mehmet Harmancı, r. 92, 176.

Dersa wêneçêkirinê

Nizar Qebbanî

Ji Erebî: Selman Diloan



Kurê min qutiya rengan datîne ber min
Dixwaze ku ez çivîkekî jê re çêbikim
Firçê li rengê gewr dixim
Û çarkoşeyekê çêdikim, li ser jî qufl û şûr.
Lawê min çavê wî tije dehşet dibêje:
"Hema ev hebs e!
Bavo, ma tu nizanî çivîkekê çêbikî?"

Kurê min qutiya qeleman datîne ber min
Dixwaze ez jê re deryayekê çêbikim
Ez qelema risas digirim
Û daîreyeke reş çêdikim.
Kurê min dibêje:
"Hema ev daîreyeke reş e, bavo!
Ma tu nizanî deryayê çêbikî?"
Ez dibêjim: "Lawo!
Berê, di çêkirina wênayê deryayan de pir hos-
ta bûm
Lê îro... Şewk û qeyika nêçîrê
ji min stendine
Û têkiliyên min birîne ji rengê şîn
Û girtina masiyê azadiyê."

Kurê min deftera wêneyan datîne ber min
Û dixwaze ez jê re simbileke genim çêbikim
Ez pêûsê digirim destê xwe
Û jê re demançeyekê çêdikim.
Kurê min henekên xwe
Bi wêneçêkirina min dike
Û ecêbmayî:
"Bavo, ma tu ferqa navbera simbil û demançê
nizanî?"
Ez dibêjim: "Lawo, berê
Min şiklê simbilê dizanî
Şiklê nan,
Û yê gulê
Lê di vê dema metalîk de

Ku darên daristanan
Tevlî milîsan bûne
Êdî gul cilên belek li xwe dikin
Simbil bi çek in
Çivîk bi çek in
Çand bi çek e
Ol bi çek e
Û her nanekî ku dikirim
Tê de demançekê dibînim
Her guleke ku ji gulistanê dikim
Berê çeka xwe dide min
Her kitêba ku ji kitêbfiroş dikirim
Di nav tiliyên min de diteqe.

Kurê min li keviya nivînên min rûdine
Û dixwaze ez qesîdeyekê jê re bibêjim
Hêstirek ji çavên min dikeve ser balîv
Kurê min şaşmayî lê dinêre û dibêje
"Hema ev hêstir e bavo, ne qesîde!"
Jê re dibêjim:
"Dema tu mezin bibî, lawo
Û tu dîwana şîra Erebî bixwînî
Tê bizanibî ku peyv û hêsir xwişkên hev in
Û qesîdeya Erebî
hêsiroke ku ji tiliyan diniquite pê ve ne tiştêkî
din e."

Kurê min qelem û qutiya xwe datîne ber
min
Daxwaza çêkirina welatekî dike ji min
Firçe di destê min de dilerize
Û ez bi girîn dikevim erdê...



"Hêsirên Selaheddîn" Di çavkaniyên Swêdî de

Rohat Alakom

Destpêk

Ez bawer dikim ev cara pêşîn e ku îmaja Selaheddîn di lîteratura Swêdê de tê analîzkirin. Ev lêkolînên wiha dikarin bi giştî alîkariya tîkiliyên Kurd û Ewropîyan ên dîrokî jî bikin. Heta niha tîkiliyên Kurd û Ewropîyan ên kevn bi berfirehî nehatine dokumentekirin. Ev tîkiliyên Kurdan bi welatên lê dimînin re xwediye dîrokeke gelekî kevn in. Bi taybetî tîkiliyên berî koçberiya wan îro baş nayên zanîn. Ev yeka di warê lêkolînên dîrokî de kêmasiya Kurdên diasporayê nîşan dide.

Gelo di çavkaniyên dîrokî û berhemên edebî yên Swêdî de îmaja Selaheddîn çawa hatiye boyaxkirin û çêkin? Emê di vê lêkolîna dîrokî-edebî de angorî hin çavkaniyên Swêdî bersiva vê pirsê bidin. Yek ji wan armancên vê lêkolînê jî ew e ku listeyeke çavkaniyên li ser Selaheddîn (yên bi zimanê Swêdî) derxe holê û ji Selaheddînnas û Selaheddînzezan re bibe alîkar. Ev danasîn û analîzkirina van çavkaniyan xebateke wisa bi rêkûpêk nîne, tenê hewldayîn, ceribandinek e. Armanc, dewlemendkirina bîbliyografîya Selaheddîn e.

Ev hezar sal in hem li Rojhilatê û hem jî li Rojavayê destan û mîtekî Selaheddîn hatiye avakirin ku muhteşembûna kesayetiya wî nîşan dide. Heta niha ji sedî zêdetir pirtûk wek lêkolîn, biyografi û tezên akademîk li ser wî hatine amadekirin. Selaheddîn yek ji wan kesên herî navdar ên van hezar salên dawîn (millenium) hatiye hilbijartin. Kurdê ku li cîhanê û di dîrokê de herî zêde hatiye nasîn, béguman Selaheddîn e (1138-1193).

Dema Selaheddîn di sala 1187an de kete bajarê Qudisê, ji ber vê serketina wî hemû Ewropa û cîhana Filehan kete şokê. Bi gaziya papa, serekên dewletên hêzdar ên wek qralê Almanya-Prusayê, Fredrik Barbarosa, qralê Fransayê, Filip II August û qralê Îngîlterê, Rickard I (Rickardê Dilşêr) pêşengiya Sefera Sêyem a xaçperestan (1189-1192) kirin. Mirov bi kurtî dikare bêje ku hemû Ewropa li hemberî Kurdekî, li hemberî Selaheddîn radibe ser piyan. Ev cara yekem bû ku bala cîhanê bi vî tehrî dişemiti yan jî diherikî ser Kurdekî. Di nav van Ewropîyan de zêdetir qralê Îngîl-

Gelo di çavkaniyên dîrokî û berhemên edebî yên Swêdî de îmaja Selaheddîn çawa hatiye boyaxkirin û çêkin? Emê di vê lêkolîna dîrokî-edebî de angorî hin çavkaniyên Swêdî bersiva vê pirsê bidin

terê Rickardê Dilşêr li hemberî hêzên Selaheddîn li ber xwe dide. Paşê di navbera wan de peyma-neke aştîyê di sala 1192an de pêk tê. Dîroka sefera xaçperestan ya sêyem, mirov dikare bêje ku bi qismî dîroka Selaheddîn e. Dema Selaheddîn ketiye Qudisê, wî ev bajar xelas kiriye tu wext têkilî mirovên sade nebûye, ew parastine, paşê serbest berdane û yên ku xwestine koç nekin jî li bajêr mane. Li Qudisê dilopek xwîn nerijiyaye! Vê yekê Selaheddîn li hemû cihanê, bi dilmezîni, edalet û bi camêriya xwe daye nasîn. Qudis piştî zeftkirina Selaheddîn careke din neketiye destê hêzên Filehan û hemû seferên din bêencam mane.

Piştî mirina Selaheddîn (1193) Sefera çarem a xaçperestan di sala 1204an de pêk hatiye. Lêbelê xaçperest tu car negihîştine Qudisê, tenê heta Constantînoplê hatine, gelek cihên li ser rêya xwe talan kirine, wê demê xaçperest zêdetir bi hovîtiya xwe hatine nasîn. Mijara seferên xaçperestan bala hin lêkolerên Swêdî kişandiye¹ û hin werger hatine weşandin.² Di dîrokê de gelek seferên xaçperestan çêbûne û her welatekî navek li van seferan kiriye. Bi Swêdî ev sefer bi korståg hatine navandin. Ji hemû kesan ku li tevî van seferan bûne, ji wan re xaçperest (korsfarare) û ji esilzadeyan re ku pêşengiya van seferan kirine jî esilzadeyên xaçperest (korsridare) hatiye gotin. Di çavkaniyên Erebi de xaçperest bi giştî bi navê "frank" hatine nasîn.

HÊSIRÊN SELAHEDDÎN Şovalyekî ku ji kuştinê zêdetir dixwest bigrî!

Ne tenê bi nûçeyên serketin û binketinên şer û polîtîk, zêdetir mirovahî, qencî, pakî, edalet, şîrhelalî û dilmeziniyê gelek caran hêsrên Selaheddîn anîne. Lêkolerekî Swêdî Prof. Jan Hjärpe di nivîseke xwe de Selaheddîn wek şovalyeyekî ku ji kuştinê zêdetir dixwest bigrî, dide nasîn: "*Şovalyeyê ku girî tercihî kuştinê dikir*".³ Mirovek, bi baweriya min tenê bi gotin evqas xweşik dikare bêkêmasî bê romantîzekirin! Tê gotin ku dema Qudis dikeve destê Selaheddîn, gelek jin û keçên şovalyeyên Fileh ji bo xelasiya mêrên xwe tîr çadira Selaheddîn, dema Selaheddîn dîtîye ku ew jin giriyanê, bûye kurîniya Selaheddîn, ew jî giriyanê. Di sala 1184an de dema hêzên Selaheddîn êrîşê dibin ser qelayekê, Selaheddîn dibihîze ku li wir dawet û dîlana prensesê bi navê Isabella çêdibe, Selaheddîn derhal fermanê dide mirovên xwe wekî wê êvarê êgir bera aliyê odeya bûk û zavê nedin. Di romaneke Swêdî de dema Selaheddîn kesekî bi navê Johan efû dike ku here bighêje dilketiya xwe, di romanê de tê gotin ku: "*Di çavê Selaheddîn de herwiha hêsrêk biriqî*" (....i Saladins öga glänste äfven en tår).⁴ Ez bawer dikim ku mezinahiya Selaheddîn di kaniya van hêsirên wî de veşartîye. Ev hêza rûhî û hundirîn ku

di vê bîrê de kemiliye, di dawiyê de bûye sedemê van hêsirên ku gelek caran ji çavê vî Kurdî hatine xwarê.

Di kesayetiya Selaheddîn de xemxurî, dîlpêşewitîn û qabiliyeta têgihîştineke mezin hebûye. Selaheddîn wek mirov bi empatî û bi sempatiyê mezin nêzîkî mirovan, hemcinsên xwe û heta cihekî bi van hestan nêzîkî dijmînê xwe bûye. Belê, Selaheddîn bi giriyanê xwe, bi hêsirên çavên xwe navdar bûye. Ji ber van dîmenên mirovî, ji şabûnê gelek caran çavên wî şil bûne û hêsir ji çavên wî hatine xwarê. Selaheddîn bi vî aliyê xwe hatiye nasîn. Ev hêsiyan di dîrokê de bi "*Hêsirên Selaheddîn*" (Saladins tårar) hatine navandin. Vê yekê di dawiyê de efsaneya Selaheddîn a muhteşem afirandiye, rutba wî, nav-nîşanên wî bilind kiriye: "*Selaheddînê mezin*" (den store Saladin).

Selaheddîn piştî salan di nav dijmînên xwe de jî hatiye hezkirin, ev yeka di dîrokê de tenê bûye nesîbê Selaheddîn. Wek mînak wî tu car nexwestiye ku qralên dijmînê xwe di meydana şer de rencîde bike, wan piçûk bixe, herwiha dema firset ketiye dest jî tu car nefikiriye kesên wiha mezin û navdar bikuje: "*Qral qralan nakuje!*" (Kungar dödar inte kungar!).⁵ Di Şerê Yaffayê de dema hespê qral Rickardê Dilşêr birîndar dibe û bêhesp dimîne, di vê rewşa diwar de Selaheddîn du hespan jê re dişîne. Carekê jî dema Rickardê Dilşêr nexweş dikeve, agirê wî bilind dibe, Selaheddîn di wê germa havînê de jê re hirmî û şeftaliyan

1 Sören Wibeck, *Korståg, Historiska Media*, 2005.

2 Joseph-François Michaud, *Korstågen*, Niloe, 1978.

3 Jan Hjärpe, *Riddaren som hellre grät än dödade*, Arbetaren, nr 6/2003.

4 Edvard Fredrik von Saltza, *Johan von Tournejsen*, del II, Linköping, 1811, r. 243.

5 Sören Wibeck, *Tempelriddarna*, Populär historia, nr 2/2004.



Selaheddîn,
li milê çepê,
ligel Arnê Swêdî
(Ji filmê Tempelriddaren)

dişîne û berfê ji çîyan dide anînê. Nivîskar û lêkoler Johannes Salminen ku di 800 saliya mirina Selaheddîn de nivîseke bîranînê ya gelek xweş nivîsiye, wî Kurdê dilovan ji her şêwe fanatîzmê bi dûr dixê û Selaheddîn wek "*Camêrê Rohilatê*" (Österns gentleman) bi nav dike: "*Camêrê Rohilatê Selaheddîn, Qudis ji bo Xwedê xelas kir, lêbelê di nav ola xwe de dema gavên şaş dihatin avêtin, xwe nikaribû bigirta*".⁶ Divê em li vir diyar bikin ku Selaheddîn yek ji wan serleşkeran e ku bi xwe rasterast li tevî şeran nebûye, tenê şer bi rê ve birine. Di kesayetiya Selaheddîn de rijandina xwîna bêmane û zihniyeta tolhildanê qet tunebûye. Dema Qudisê werdigire, dikeve bajêr nahêle dilopek xwîn birije. Lêbelê berî sedsalî, di sala 1099an de dema

di sefera xaçperestan ya yekem de kengî hêzên Xiristiyan êrîş birine ser Qudisê, wan qasî pêncî hezar mirov kuştine.⁷

Ji ber van kirin û çalakiyên xwe Selaheddîn di dema xwe de gelek caran hêsirên beşdarên li dora xwe jî anîye xwarê. Ez bawer dikim ev yeka piştî sedsalan ji bo xwendevanên Selaheddîn jî derbas dibe. Dema kesek wek xwendevan van aliyên Selaheddîn dixwîne, ew jî gelek di bin bandora kesayetiya wî ya bêhempa de dimîne, meziniya Selaheddîn xwendevanan û kelecana wan jî tevdigerîne, di dilê wan de jî livîn û leqînekê peyda dike. Bi kurtî mirov dikare bêje ku Selaheddîn di dawiyê de bûye hêzeke fezîlet û mirovahiyê ya bêhempa. Eger mirov bi zimanê gundiyan sade û dilpaqij bipeyive, em dikarin bêjin ku

"*Xwedê hema nîmetek daye Kurdan*", mirovekî wek Selaheddîn li para Kurdan ketiye. Dîrok cara pêşîn li rûyê Kurdan kenîyaye!

Kurdbûna Selaheddîn angorî çavkaniyên Swêdî

Piraniya nivîskarên Swêdî Kurdbûna Selaheddîn bi taybetî nîşan didin. Nivîskarê navdar Viktor Rydberg (1828-1895) di barê Selaheddîn de gelek tiştên balkêş dibêje û Selaheddîn wek xizmê Swêdiyan dibîne: "*Koka Selaheddîn Kurd bû, ne Semît, Lêbelê yek ji xizmên me bû, mirovekî xwîn-Arî, çimkî Kurd xelkekî Îranî ye*".⁸ Yek ji wan dîroknasên Swêdî ku di xebatên xwe de Kurdbûna Selaheddîn û Kurdbûna Eyyûbiyan derdixe pêş, dîroknasê naskirî û nûjen Dick Harrison e, wek mînak Eyûbiyan bi "*Eyûbiyên Kurd*" (Kurdiska

6 Johannes Salminen, *Då blev islam västmänniskans trauma*, Dagens Nyheter 17/12 1993.

7 Jan Hjärpe, *Riddaren som hellre grät än dödade*, Arbetaren, nr 6/2003.

8 Viktor Rydberg, *Kulturhistoriska föreläsningar*, vol.6, 1906, r. 351.

Ayyubiderna)⁹ û Selaheddîn jî wek "...siyasetmedarê dewletê û serleşkerê Kurd" (Kurdiske statsmannen och härföraren Saladin) bi nav dike.¹⁰ Akademisyen û Îslamolog Jan Hjärpe, di nivîseke xwe de dinivîse ku Saladin di netewetîya (nasyonalîzm) Kurdî de pir nêzî hev bûne.¹¹ Ew Selaheddînê ku di dewra xwe de hemû Misilman anîne bal hev û gihandine hev îro ji bo hemû Kurdan bûye semboleke yan jî wek semboleke ber xwenûkirinê ye. Kurdbûna Selaheddîn bala gelek kesên Swêdî kişandiye. Hin çavkaniyên Swêdî dema xwestine koka Selaheddîn a etnikî pêşkêş bikin, îfadeyên wek "*bi eslê Kurd*" (Kurd till bördén), "*...bi koka Kurd*" (...av Kurdiskt ursprung), "*ji aliyê etnikî de Kurd*" (... var Kurd till etnicitet) bi kar anîne. Carina em rastî îfadeya "*...den Kurdiskättade sultanen*" (...siltanê kok bi Kurd) jî tên.¹² Dema qala bavekalên wî tê kirin, hin kesan îfadeya "*...ji Kurdistanê hatine*" (härstammande från Kurdistan) bi kar anîne.¹³

Lêbelê wek tê zanîn gelek caran nasyonalîstên Tirk yan jî Erebbewl dane ku li mirovekî wiha bêhempa wek Selaheddîn xweyî derkevin, wî bikin Tirk

yan jî Erebbewl. Carina hin lêkolêr, dîroknas û nivîskarên Swêdî jî di bin bandora vê şaşnîşandanê û desinformasyonê de mane, bi zanetî yan jî bi nezanî koka etnikî ya Selaheddîn wek "Tirk" û "Erebbewl" nîşan dane. Hin caran jî Selaheddîn wek mînak bi danasîneke nezelal, hem Erebbewl û hem jî bi Kurd wisa bu dualî tê nasandin: "*Mêrxasê Erebbewl Selaheddîn, ku Kurd bû*" (... den Arabiska hjälten Saladin som var Kurd...)"¹⁴

Epitetên Swêdî di derbarê Selaheddîn de

Dizimanê Swêdî de Selaheddîn bi gelek epitetan (taybetmendiyên ku ligel navekî tên bikaranîn) hatiye nasandin. Ev yeka mezinahî û muhteşembûna kesayetîya wî nîşan dide. Taybetmendiyên ku di zimanê Swêdî de zêdetir ji bo Selaheddîn hatine bikaranîn, wek mînak peyvên *heqdar* (rättfärdig) û *dilmez* (ädelmodig) in. Hin çavkanî Selaheddîn wek "*Selaheddînê mezin*" (Den store Saladin) didin nasandin.¹⁵ Wek mînak aliyên Selaheddîn ên qenc û baş di sedsala 19an de di ansîklopediyeke Swêdî de yek bi yek wiha hatine rêzkirin:

högslinnad (esilzade, kesê ku bi tîştên piçûk ve mijûl nabe)
gifmild (comert, destvekirî)
strängt rättskaffens (gelek dilrast, rastgo, bi edalet)
from (nerm wek milyaketan)
äterhållsam (bipîvan, bisînor)

kunskapsälskande
 (zanyarîhez).¹⁶

Hin lêkolêr û nivîskaran di berhemên xwe de gelek epitetên din jî bo Selaheddîn bi kar anîne, wek van mînakên Jan Hjärpe ku di nivîseke wî de derbas dibin:

ridderlig (bi şovalyeyî)
hövisk (nazik)
ordhållig (sozgir)¹⁷

Selaheddîn di pirtûkên dersên dîrokê de wek kesekî nazik (torin), giran (ridderlig) û dilmezin (ädelmodig) tê nasandin.¹⁸ Çawa tê xuyan di zimanê Swêdî de listeya epitetên ku ji Selaheddîn re layîq hatine dîtinê, her diçe dirêjtir dibe.

Ne tenê ev gotinên ku hin aliyên kesayetîya wî nîşan didin, kesayetîya wî bi xwe jî hatiye nasandin. Angorî nivîskarê Swêdî yê navdar August Strindberg zêdetir ew aliyên berbiçav, kesayetîya Selaheddîn pêk tînin:

mod (cesaret)
ädelmod (torinî)
storsinhet (fêmdarî)
barmhärtighet (merhemet)
skönt framträdande
 (xwenîşandana bi esil).¹⁹

Selaheddîn di çavkaniyên dîrokî û edebî de bi gelek super-

9 Dick Harrison, *Slaveri: 1800 till nutid*, Historiska Media, 2008, r.256.

10 Dick Harrison, *Gud vill det*, Ordfront förlag, 2005, r.52.

11 Jan Hjärpe, *Riddaren som hellre grät än dödade*, Arbetaren, nr 6/2003.

12 Anna Larsson, *Sultanen som krossade korsriddarna*, Allt om historia, nr 4/2010.

13 Nils Ignell, *Mänskliga utvecklingens historia*, femte delen, korstågens period, Stockholm, 1862, r.15.

14 Sören Wibeck & Anna Larsson, *Verkligheten bakom Arn-templetriddaren*, Populär historia, 12/2007.

15 Otto Sylwan..., *Svenska litteraturens historia*, 1923, r.192.

16 *Nordisk familjebok-Konversationslexikon och realencyklopedi*, 1897. (binêre mijara Selaheddîn)

17 Jan Hjärpe, *Riddaren som hellre grät än dödade*, Arbetaren, nr 6/2003.

18 Göran Andolf, *Historien på gymnasiet: Undervisning och läroböcker 1820-1965*, Stockholm, 1972, r.226.

19 August Strindberg, *Samlade skrifter*, 1920, vol.54, r. 355.

latifan t  nasandin. Wek m nak niv skar  navdar Rydberg di niv seke xwe de Selahedd n wiha dide nas n: "*Siltan Selahedd n yek ji wan xwe iktir  d rok  ye, yek ji wan efrandey n ku her  z de sempatiy  peyda dike*".²⁰ Niv skar N. Ignell di xebetake xwe de li ser gelek aliy n Selahedd n  n qencit n disekine.²¹

Selahedd n di d roka Sw d  de

Selahedd n Kurd  her  p   n e ku bi nav di d roka Sw d  de ci  girtiye. Ketina Selahedd n li Qudis , mirina Selahedd n   pi  i ko kirina Selahedd n dengday na kesayetiya w  wek s  mijar n ku her  z de bala l koler, d rokna   niv skar n Sw d  ki andine, dika-rin b n hesib n. Gelo  avkaniy n Sw d  cara p   n k jan dem  nav  Selahedd n bi kar an ne? Nav  Selahedd n mirov dikare b je ku cara p   n di yek ji wan salnamey n Sw d  y n her  kevn ya bi nav  *Chronologia Vetus* de derbas dibe. Wek m nak dema b yer n sala 1187an t n r zkirin, bi lat n  li wir t  gotin ku "*Bajar  Qudis  ji aliy  Selahedd n ve w ran b , serekmetran Johannes li Almare St ket hat ku tin   Sigtuna  ewit *" (Iherusalem vastatur a Saladano rege. Occisus Johannes Archiepiscopus Vpsaliensis apud Almarnum pridie idus Augusti et Sigtuna combusta). Ew kes  ku ev r z niv   ne, xwestiy  b je ku di v  sal  de  end qeza   belay n me-zin wek w rankirin, ku tin    e-

wate li ser hev qewim ne. B yera Selahedd n li welatek  gelek  d r, l bel  herdu b yer n din li Sw d , li n z  bajar  Stockholm  p k hatine. Ev salnameya ku bi ziman  Lat n  di dawiya sedsala 12an de hatiye niv   n b yer n sal n 916-1263 rapor dike.²²

Di sala 1187an de ji aliy  Selahedd n ve zeftkirina bajar  Qudis  wek b yereke mezin ha-tiy  d tin   v  b yer  li hem  Ewropay , her wisa j  li welat n bakur , Danmark, Norwe    Sw d  gelek deng daye. Dema ev n  e gih  tiye welat n Bakur, n  e b ye sedem  xemg niyeke mezin. Ji bo sefereke s yem n a xa pereziy  tevger n mezin li hem  Ewropay  dest p  kirine, ji hem  welatan al kar  hatiye xwestin, pir caran al kar    bac hatine berevkirin, yek ji wan bacan bi nav  "*Saladinstionden*" hatiye na-vandin. Ji gel hatiye xwestin ku ji hatina xwe sed  deh bidin alikari-ya ji bo sefera li dij  Selahedd n.²³ Pi  i ku Selahedd n Qudis  zeft dike,  awa t  zan n ev yeka b ye sedem  Sefera s yem a xa pe-restaurant (1189-1192). Di nav van s  salan de bi hezaran kesan bi r ya re ay    bi r ya deryay  ber  xwe dane Axa P roz.

Dema di sala 1187an de n  eya wergirtina Qudis  gih  tiye Bakur, wek m nak qral  Danmark , Knut di civ nek  de li gel be daran gi-riyaye, keser vedaye, kiriye ax n,

lal b ye, nikarib ye bersivek  bide.²⁴ Di sala 1189an de komeke Danmark , Norwe    Sw d  di in Axa P roz, aliy  bajar  Akkay  wek  li dij  h z n Selahedd n  er bikin   al kariya Filehan bikin. Pi  i du salan, di sala 1191an de ev bajar dikeve dest  Filehan. Ne ten   avkaniy n niv   , del l n arkeoloj k j  v  yek  pi trast di-kin. Wek m nak em ji keviyek  (k l) gora kesek  Sw d  ku di v   er  de be dar b ye f r dibin ku jina w  Thora j  di  er de can daye.²⁵ Ji Danmark , Norwe    Sw d  gelek kesan xwestine herin Axa P roz, tev  v  sefera xa perestan a s yem bibin   li dij  Selahedd n  er bikin. Wek m nak du kes n bi nav   ke   Alexander ji devera Sk ne ligel komeke Danmark  ber  xwe dane Axa P roz. L bel  dema ew t n wir, dib nin ku Selahedd n bi Rickard  Dil  r re peymaneke a tiy  ji bo s  salan gir daye, ew careke din vedigerin Bakur.²⁶ Hin agah    zanyariy n din j  hene n  an didin wek  Sw d  di sefer n xa perestan de bi akt f  be dar b ne. Wek m nak papa, di sala 1222an de ji qral  Sw d , Sverker Carlson al kariy  dixwaze   di nameyeke xwe de wiha diniv se: "*Ti tek  nemaq l e ku Sw diy n ku ber  kirib n adet xwe didan p  , niha xwe bi   n de bik  nin*". L koler Ebbe Samuel Bring van gotinan, di  er  li dij  Selahedd n de wek n  ana be darb na

20 Viktor Rydberg, *Kulturhistoriska f rel sningar*, vol.6, 1906, r.350.

21 Nils Ignell, *M nskliga utvecklingens historia*, femte delen, korst gens period, Stockholm, 1862, r.15-16.

22 Gunnar Bolin, *Stockholms uppkomst: Studier och unders kningar r rande Stockholms f rhistoria*, 1933, r.466.

23 Ebbe Samuel Bring, *Om valfarterna och korst gen fr n Skandinavien till Heliga landet*, Lund, 1827.

24 Anders Magnus Strinnholm, *Svenska folkets historia*, vol.4, 1852, r.328.

25 Ebbe Samuel Bring, *Om valfarterna och korst gen fr n Skandinavien till Heliga landet*, Lund, 1827, r.140.

26 H.b, r.146.

Swêdiyan dihesibîne.²⁷ Mijara di seferên xaçperestan de bi giştî beşdarbûna bakuriyan û bi taybetî mijara beşdarbûna Swêdiyan wek Ebbe Samuel Bring, bala lêkolerên biyanî jî kişandiye, wek mînak lêkolîneke Fransî di sala 1868an de vê carê bi wergera Danmarkî hatiye weşandin.²⁸ Dîrokna Dick Harrison jî di van salan dawîn de li ser mijarê kar kiriye.²⁹

Yek ji wan çavkaniyên herî kevn ku behsa Selaheddîn dike, lêkolîneke metran û etnologê Swêdî Olaus Magnus (1490-1557) e ku di sala 1555an de bi navê *Dîroka Ser Gelên Bakur* hatiye weşandin. Nivîskar li vir cih dide çend gotinên Selaheddîn ku berî mirina xwe, dema di sala 1193an de li ber sekeretê gotine. Çawa li vir jî xuya dibe Selaheddîn li pey xwe tu mal û milkê dinê nehiştiye: "*Di sala 1193an de dema Selaheddîn hîs kiriye ku mirina wî nêzîk dibe gazî alahilgirê (beyreqdar) xwe kiriye û jê re gotiye: Te ku ji xwe re kiribû adet alayên min di şer de hildida, niha perçe-alayeke mirina min hilde, kevnêbêzekî sade bi serê rimekê ve bike, li hemû Şamê bigerîne û bêje: Binêrin, dema mirinê Siltanê Rojhilatê tenê vî kevnîkî bi xwe re dibe" wisa got û çavê xwe girt".³⁰*

Ev xebata Olaus Magnus ji 22 pirtûkan û her pirtûk jî hin beşan pêk tên. Qala Selaheddîn di beşa

48an a pirtûka 16an de tê kirin. Her pirtûk û her beş li ser mijareke cihê ye. Ew beşa ku nivîskar mînak Selaheddîn dide, li ser taybetmendiyên goran (qebr) û şahidiya dinya fanî de ye. Di vê beşê de tê gotin ku meziniya mirovan ne bi mal û milk, ne bi gorên mermer û xemilî, tenê bi qencî û pakiyan ve tê pîvan û peyama fezîletê tenê bi vê rêyê dikare bigihîje nîfşên pêşerojê. Di dawiya vê beşê de vî nivîskarê Swêdî wek mînak tenê cih daye koçkirina Selaheddîn û çend gotinên wî. Nivîskar diyar kiriye ku wî ev serpêhatiya Selaheddîn ji berhemeke dîndarê Îspanî Vincentius (1350-1419) wergirtiye. Ev rastiyên dîrokî jî nîşan didin ku Selaheddîn di van salan de ji başûr bigre heta bakur li hemû Ewrûpayê gelek deng daye. Mijara îmajê Selaheddîn di çavkaniyên Ewrûpî de bi alîkariya hin lêkolînên danberhevî ve dikarin gelek tiştên giranbiha derxin holê û dîroka Kurdan ronî bikin.

Selaheddîn di edebiyata Swêdî de

Selaheddîn bala çend nivîskarên Swêdî yên navdar wek Viktor Rydberg³¹, Selma Lagerlöf³², August Strindberg³³ û hin kesên din kişandiye. Çend helbestvanên Swêdî, ên wek Axel Gabriel Silverstolpe³⁴, Carl Jonas Love Alm-

qvist³⁵, Verner von Heidenstam³⁶ di berhemên xwe de motiva Selaheddîn bi kar anîne, kesayetîya Selaheddîn a rengîn ji xwe re wek mijar hilbijartine. Selaheddîn her wisa jî bûye mijara çend romanên Swêdî yên nivîskarên wek Edvard Fredrik von Saltza, Verner von Heidenstam, Kerstin Ekman û Jan Guillou.

Romana Swêdî ya pêşîn ku qala Selaheddîn dike, di sala 1811an de bi navê *Johan von Tournejsen* hatiye nivîsîn.³⁷ Kesê ku bala me kişandiye ser vê romana kevn, ku berî 200 salan hatiye weşandin, lêkoler Stefan Johansson e. Ew di lêkolîneke xwe de wiha dibêje: "*Berhema dawî gelek ronîdar e û bi qismî Selaheddînê bi edalet û esilzade pîroz dike*".³⁸ Di vê romanê de serpêhatiya kesekî bi navê Johan heye ku bi salan e welatê xwe û cîlketiya xwe ya bi navê Edda nedîtiye. Xwe davêje ber bextê Selaheddîn. Dema Selaheddîn rastî Johan tê û dixwaze ku wî efû bike, kelogirî dibe, çavên Selaheddîn tijî dibin: "*di çavê Saladin de herwiha hêsiyek biriqî*" (...i Selaheddîns öga

27 H.b, r.141.

28 Paul Edouard Didier Riant, *Skandinavernes korstog og andagtsreiser til Palæstina (1000-1350)*, Kjøbenhavn, 1868.

29 Dick Harrison, *Gud vill det*, Ordfront förlag, 2005.

30 Olaus Magnus, *Historia om De nordiska folken*, tredje delen, 1916.

31 Viktor Rydberg, *Kulturhistoriska föreläsningar*, vol.6, 1906, r.351.

32 *Tu lär mig att bli fri: Selma Lagerlöf skriver till Sofia Elkan*, 1996, r.159.

33 August Strindberg, *Efterslätter-Berättelser, dikter, artiklar*, samlade skrifter vol. 54, 1920. August Strindberg, *En blå bok*, samlade skrifter vol. 44, 1918.

34 Axel Gabriel Silverstolpe,

Skalde-stycken, Stockholm, 1801, r.67-68.

35 Carl Johan Almquist, *Amorina eller historien om de fyra*, Jonköping, 1839, r.147, 217.


36 Verner von Heidenstam, *Endymion*, andra upplagan, 1894. Verner von Heidenstam, *Dikter*, Albert Bonnier, 1947. Otto Sylwan..., *Svenska litteraturens historia*, 1923.

37 Edvard Fredrik von Saltza, *Johan von Tournejsen*, del I-II, Linköping, 1810-1811.

38 Stefan Johansson, *En omskriven historia. Svensk historisk roman och novell före 1867*, Uppsala, Acta Universitatis Upsaliensis, 2000, r.68.

glânste äfven en tår).³⁹ Çawa li vir jî xuya dibe, hêsrên Selaheddîn kengî qala qencî, xweşî û pakiyê dibe, wê demê hatine xwarê! Selaheddîn wî efû dike, jê re bi alîkariya mirovên xwe keştiyekê dide peydakirinê, gelek xelat û diyariyan pêşkêşî wî dike û berê wî dide Ewrûpayê. Johan ji şabûna êdî nizana çi bike. Di dawiya romanê de em Johan li Almanyayê dibînin. Berî mirina xwe, Johan êdî ji xwe re dike adet, hersal di eynî roja ku Selaheddîn azadiya wî şûn de dayê, mirovên belengaz ên bajêr têr dike û zekatan li kesên xizan belav dike. Navê Selaheddîn heta mirinê di mêjû û dilê Johan de cihekî taybet digire.⁴⁰

Di hin cihên romana Verner von Heidenstam a bi navê *Endymion* de qala Selaheddîn tê kirin, wek mînak lehengê romanê Emîn, di cihekî de li ser dîlfirêhî û nepêshikimiya Selaheddîn li hemberî Filehan deng dike.⁴¹ Bûyerên vê romanê zêdetir li bajarê Şamê, bajarê Selaheddîn derbas dibin. Çawa tê zanîn Selaheddîn piştî mirina xwe li wir tê veşartin û gora wî niha li Şamê ye.⁴² Ev berhema, romana nivîskar a pêşîn û di sala 1889an de hatiye weşandin. Yek ji wan nivîskarên Swêdî ku hê di ciwani-



Piştî Şerê Hittînê, Selaheddîn û Guy Luzînyayî.

ya xwe de bûye dildar û heyranê Rojhilatê, Verner von Heidenstam e. Rojhilatê wek "*Rojhilata ku bi zîncîran hatiye lêdan*" dide nasîn.⁴³ Verner von Heidenstam di çend helbestên xwe de jî nav dide, Şamê wek "*bajarê Selaheddîn*" (Saladins stad) dinavîne.⁴⁴ Di helbesteke din de Heidenstam, di barê xwebawerî û mêrxasiya Selaheddîn de wiha dibêje: "*Selaheddîn sekiniye bi kincên hesin*" (Saladin stâr klädd i järn...)⁴⁵ Çawa çavkaniyek diyar dike, Heidenstam qiymetekî mezin daye Selaheddîn, bi efsûnkarî wî ji gorê radike, qasî qralê Swêdî Karl XII bi majeste û bi haşmeteke bilind ve wî dinirxîne.⁴⁶

Di edebiyata nûjen a Swêdî de jî mijara Selaheddîn heye, wek mînak yek ji wan nûnerên edebiyata Swêdî Kerstin Ekman di cihekî romana xwe ya bi navê "*Min careke din zindî bike*" (Gör mig levande igen) de bi kurtî be jî

Selaheddîn bi xwendevanan dide nasîn û lehenga xwe ya jin, Sigge li Qudisê di qesra Selaheddîn de digerîne.⁴⁷ Salonên mezin xuya dibin. Ji kuçeyên Qudisê wek pêlan mirov tî Qesra Selaheddîn, mirovên ku tiştêkî dixwazin, tîka dîkin, mirovên ku digirîn û mirovên ku di derbarê bûyerên nexweş ku di vê dinya hov û neheweskar de hatine serê wan, tiştan dibêjin.⁴⁸ Ne tenê ev silava mirovan, herwisa jî wek mînak ew şekirokên ku bi navê "Şîrîniya Sela" (Saladins konfekt) hate nasîn û "Xalîçeya hevrîşîm a Selaheddîn" (Saladins silkesmat-ta) bala mêvanan dikişîne. Lêbelê çavên Sigge zêdetir bi dilbijîn li ser van şîraniyên Selaheddîn in, dema wan dibîne av ji devê wê tê. Di romanê de Selaheddîn bi fîzîkî jî tê nasandin. Di cihekî de tê gotin ku rengê rûyê wî mîna qemeriya zeytûnan û kesekî "ecêb pir torin -xweş" e (kolossalt ädelvacker).⁴⁹ Di cihekî din de tê gotin Selaheddîn bi çavên xwe yê

39 Edvard Fredrik von Saltza, *Johan von Tourneisen*, del II, Linköping, 1811, r.243.

40 H.b, r.295.

41 Verner von Heidenstams, *Endymion*, 1894, r.72.

42 H.b r.59. Navê romanê ji gotineke yunanî tê, Endymion kesekî ciwan û xweşik bûye, ji xwe re kiriye edet li serê çîyan razaye. Xwedêya bi navê Selene wî dibîne û dibe evîndarî wî. Ji vê zewacê çil zarokên wan çêdibin.

43 Verner von Heidenstams dikter, Albert Bonnier, 1947, r.81.

44 H.b, r.81-93.

45 H.b, r.243.

46 Otto Sylwan, *Svenska litteraturens historia*, 1923, r.192.

47 Kerstin Ekman, *Gör mig levande igen*, 1996, r.382.

48 H.b, r. 382.

49 H.b, r. 385.

reşe-qedîfe mînanî ku ew dikare helbestan binivîse, xuya dike. Di Selaheddîn de mêraniyeke rind, di bedena wî de ruh heye.⁵⁰

Kerstin Ekman di vî beşê romana xwe de lehengekî bi navê Nathan ku di berhema nivîskarê alman Gotthold Ephraim Lessing de heye, di vê romana xwe de bi cih dike. Mirov dikare bêje ku vî lehengî ji berhema Lessing "deyn" dike. Lessing ev piyesa xwe ya navdar di sala 1779an de nivîsiye û bi navê "*Nathanê aqil*" (Nathan der Weise) weşandiye û bi hemû dinyayê hatiye nasîn. Ev berhema paşê emê li jêr jî bibînin herweha bi zimanê Swêdî bi navê *Nathan den vise* çend caran hatiye çapkirin. Kerstin Ekman di vê romana xwe ya bi navê "*Min careke din zindî bike*" xwendevanan dibe diyarekî din, diyarê miriyan û zemanekî din. Sigge, cara pêşîn di pirtûkxaneyê nêzîkî Stockholmê de rastî Nathan tê û dibin nasên hev. Angorî vê beşa fantastîk, xeyalî keça Nathan di qesra Selaheddîn de wek girtî dimîne. Sigge bi Nathan diçe qesra Selaheddîn wekî vê keçikê xelas bikin, Lêbelê ev gera wek xewnan bi dilê Sigge nîne. Di romanê de Selaheddînekî xeyalî heye ku ew-qas naşibîne Selaheddînê dîrokî û rastîn. Selaheddîn di romanê de wek "*hukimdarê Misirî yê bi koka xwe Kurd*" (...den egyptiska härskaren av Kurdiskt ursprung...) tê nasandin.⁵¹

Romana ku cara pêşîn cihekî gelek fireh daye mijara Selaheddîn, romana nivîskarê navdar Jan Guillou ye ku di sala 1999an de bi navê *Tempelriddaren*

(Şovalyeyê parestgehê) hatiye weşandin.⁵² Ev romana beşeke trilogiya wî pêk tîne.⁵³ Ev trilogi bi giştî behsa jiyana şovalyekî Swêdî Arn Magnusson dike. Di romana *Tempelriddaren* de Arn diçe, di sedsala 11an de tevî sefera xaçperestan a sêyem dibe. Jina wî Cecilia li Swêdê dimîne. Beşeke romanê qala Arna dike, beşek qala Cecilayê dike, roman bi vê formê hatiye nivîsîn. Carekê çawa diqewime, dema Selaheddîn bi birayê xwe Fahkr û hevalê xwe Mousa li Sûriyê rêwitiyekê dikin, di rê de wek çîrokan rastî Arn tên. Her çiqas ol û dîtînen Selaheddîn û Arn cihê bin jî, ew wek dijmin li hev nanêrin û di dawiyê de dibin dostên hev. Di navbera wan de dialokeke germîn peyda dibe. Di destpêka romanê de Selaheddîn Kurdbûna xwe bi eşkere diyar dike: "*Em hersê ji Kurd in*" (vi är Kurder alla tre....).⁵⁴ Şervanê Swêdî (Arn Magnusson) ku di romanê de wek bi navê Arn al Ghoutia tê nasîn, xwe wiha dide nasandin: "*..Lêbelê navê min Arn de Gothia*"⁵⁵, ango Arnê ji Götelandê. Çawa tê zanîn Göteland navê herêmeke başûrê Swêdê ye. Berê bi latînî jî vê heremê re Gothia û bi Erebi Al Ghoutia hatiye gotin.

Piştî vê hevdiîtinê, ew paşê di meydana şer de jî rastî hev tên. Di vî şerî de Arn birîndar dibe. Selaheddîn ew rasthatina xwe li gel Arn a berî salan ji bîr nekiriye, doxtorên xwe yên herî baş-

tir dişîne wekî birînen Arn qenc bikin. Li wir di nexweşxaneyê de dimîne û tenduristiya wî li wir berdewam dike. Selaheddîn wî li Şamê wek mêvan diezimîne. Kurê Selaheddîn, Afdal jî li Şamê diçe serdana vî dostê bavê xwe yê Swêdî. Dema Arn qenc dibe, êdî dixwaze ber bi welatê xwe, ber bi Swêdê here. Selaheddîn dema vê xatirxwestinê Arn dibîne, ew hev hembez dikin û Selaheddîn şûrekî wek diyarî dide Arn. Êdî Arn berê xwe dide welatê xwe ku li wir tu wext nefikire ku bi hinceta kuştinê, careke din çekan hilde destê xwe. Roman bi vê mesaja diji-şer ve diqede.

Di berdewama vê romana *Riket vid vägens slut* de jî navê Selaheddîn derbas dibe. Di vê romanê de êdî piştî 20 salan vê carê em Arn li li Swêdê li bal jina xwe Cecilayê dibînin. Di romanê de tê gotin ku dema Cecilia li Swêdê di manastirekê de girtî dima, wê, ji devê rahîban û keşişan bi hezaran lanet û nifirên ku li Selaheddîn dihatin kirin, bîhistibû.⁵⁶ Arn di vê romanê de bi kurtî be jî careke din vedigere wan rojên berê ku ew û Selaheddîn bûbûn destbirak û dostên hev. Wan jiyana hev xelas kiribûn. Di romanê de tê gotin ku ji bo ku mirov qala van hemûyan bike, tam vebêje, gelek şevên zivistanê tên xwestin.⁵⁷ Tişteki herî balkêş jî dema ev romana di sala 2000an de hatiye weşandin, li ser bergê paşîn ê pirtûkê wêneyê şûrekî cih girtiye. Li ser şûr hatiye nivîsîn ku Selaheddîn ev şûra di sala 1191an de wek diyarî daye Arn.

52 Jan Guillou, *Tempelriddaren*, 1999.

53 Jan Guillou, *Vägen till Jerusalem*, 1998. *Tempelriddaren*, 1999. *Riket vid vägens slut*, 2000.

54 Jan Guillou, *Tempelriddaren*, r.24.

55 H.b, r.23.

56 Jan Guillou, *Riket vid vägens slut*, 2000, r.294.

57 H.b, r.296.

50 H.b, r.386.

51 H.b, r.382.

Çawa me li jor jî dît, di navbera romana Edvard Fredrik von Saltza ku berî 200 salan hatiye nivîsîn û ya Jan Guillou de hin nêzîkahî û hevşibandin hene. Wek mînak mêrxas, lehengên herdu romanên ji aliyê Selaheddîn ve tîne efûkirin. Selaheddîn diyariyan dide wan û wan bi silameti dişîne welatên wan. Yek diçe Almaniyayê, yê din diçe Swêdê. Di herdu romanên de jî evîn heye. Ji herdu lehen-gan Johan, dixwaze dilketiya xwe Eddayê bibîne, Arn jî dixwaze zûtirekê bigihêje Ceciliaya xwe. Belê, herdu kesên Ewrûpî jî bi saya vê aştîheziya Selaheddîn ji mirinê xelas dibin û digihîjin mirazên xwe.

Ev romana Jan Guillou her wisa jî bûye mijara filmekî. Ev filmê dirêj bi kadroyeke pir-netewî di sala 2007an de hatiye kişandin. Di rolê Selaheddîn de hunermendekî bi navê Milind Soman lîstîye. Çawa em dibînin Jan Guillou bi roman, bi film û bi hewldayînên medyatîk, di dawiyê de Selaheddîn kiriye malê çanda Swêdê. Eger mirov naveroka romanê û film bide hemberî hev, mirov dibîne ku film zêdetir bûyerên ku li Swêdê diqewimin, nîşan dide.⁵⁸ ■

58 Sören Wibeck & Anna Larsson & Dick Harrison, *Verkligheten bakom Arn-tempelriddaren*, Populär historia, 12/2007.

Reşika çavên te

Cemîl Denlî

Bayê penabertiyê ketibû bin baskên min
Barê jiyanê li pişt
Rêwîti dikir li pey xewnên xwe
Tavê pala xwe dabû serê daran
Dengê kevokurk û pepûkan dihat
Li nêzî wargeha evînê
Ku bext û werîsê wê porkurê kin mabûn
Karxezalek pekiya rastê
Reşika çavên te rêya min guhert

Minê guhê xwe danibûya ser sînga çiyê
Di girmîna şevê de
Li bager û tofanan
Dem û dewranan
Dilavêtina siruştê
Dengê lingên hov û teban guhdarî bikira
Li pêlên sedsalên bihurî xista
Di ser şopa pezkoviyên dilodîn re
Vegeriyama
Li ser dilê wê kêlîka şahiya şînê daniya
Ji ser spîka berfînî
Reşika çavên te rêya min guhert

Minê nalîna birîndarekî ji binê bestan
Şerpezetiya yeka din li serê latan
Nebûna hêviya hilatina heyvê
Ew roj û ev roj li ber mirêka zemên danîna
Tengbûna qederê
Di navbera mirad û bêmiradiyê de
Girrê heft biran
Giranbûna hezkirinê ji tûjbûna serê heft şûran
Minê hêsirên wê bijimartina dilop bi dilop
Kevirek ji cihê xwe leqiya
Reşika çavên te rêya min guhert

Minê dest bida ser hinarikên rû li ber çong bida
Bêhna îskeîskên wê bikişanda hundirê xwe
Jê re qala serdemên berê
Çêbûna av û axê
Milyarên stêrkên di zikê ezmên de
Minê ducanîbûna wê bi bîr bixista
Qala yekcarbûna jiyanê
Hevalbendiya qergêtran
Aramiya yekemîn giriyê lorîkan bikira
Bi destan bigirta bi xwe re baniya
Çîroka xwe vegota ji zarokên min û te re
Lê reşika çavên te rêya min guhert
Û wê xwe di latê wer kir

Zurich, 2010

Meleka Gewre

Şemoyê Memê

Lawê Betal Begê dibêje:

Kuro Êso lawo xeberê bide Meleka Gewrê yo,
Êso lawo, bila bikute dîbega qewê yo,
Êso, bila dîbega qewê bikute, deng bê aliyê di odê yo,
Êso lawo mêvanê me hene, mevanê şermê yo,
Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê
Dibê, sûret sorê, çav belekê.

Dibê: "Kuro Êso, ev ne dengê dîbega Meleka Gewrê yo,
Êso lawo ev ya ku heye, tepe-repa dêla, di Fatê yo,
Êso lawo we çî kiriye, Meleka Gewrê yo,
Êso lawo were bide min, ji vî cabêyo yo,
Êso kuro we çî kiriye Meleka Gewrê yo"
Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê
Dibê, sûret sorê, çav belekê.

Dibê: "Lawê Betal Begê, tu çûyî bajara Meletiyê, kirîvatî yo,
Meleka Gewrê xwe re ûmîşbûbû, bi xortê xelqê yo,
Xwe re diçû nava ormîn dikir bi kêf û di zewqê yo,"

Lawê Betal Begê digo: "Kuro Êso lawo, Meleka Gewrê ne ya vê yekê yo,
Werê bide min cabê, we çî kiriye Meleka Gewrê yo,
Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê,
Dibê, sûret sorê, çav belekê.

Lawê Betal Bege şûr dikişîne, ji qebzê yo,
Destê Fatê, Êso bi hev ve girêdide,
Lawê Betal Begê, wana qemê ve hûr dike, datîne wê derê yo,
Niftê serda dike, cendekê herda jî dişewitîne,
Wana dişewitîne, kûla wan jî dide bê yo,
Dîsa dernaxîne heyfa Meleka Gewrê yo,
Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê,
Dibê sûret sorê, çav belekê.



Meleka Gewrê li bajarê Meletiyê ke-
çikeke pir bedew,
spehî, şixulker û
jêhatî bûye. Navê
diya wê Gewrê
bûye... Mînanî
mêra gotina wê di
nav cimaetê de der-
basdar bûye. Loma
ji Melekê re gotine
Meleka Gewrê

Di civatê de gelek bûyer hene ku bûyerên tebîî ne. Bûyer diqewime û tê jibîrkirin. Lêbelê hinek bûyer jî hene ku li ser civatê bandoreke mezin çêdikin. Ev bûyer diqewimin, xilas dibin, di ser re gelek wext derbas dibe, lêbelê nayên jibîrkirin. Dibin çîrok, stran, serpêhatî û bi dehên salan, bi sedan salan di nav gel de tên gotin. Wekî; Siyabend û Xecê, Derwêşê Evdî, serpêhatiya Gelyê Zîlan, Hesên û Asê û hwd.

Bi qasî bist-sî sal berê ev serpêhatî, di şevên Kurdistanê yê zivistanê dirêj de dihatin gotin. Hatina dengbêjekî an jî çîrokbêjekî, di gund de dibû sedemê şahîyeke mezin. Dengbêj li kîjan malê mêvan bima, êvaran hemû şênîyên gund li wê malê dicivîyan. Di cemaetêke pir mezin de ev hikayet, çîrok, serpêhatî û stran dihatin gotin û hemû guhdaran bi baldaneke mezin li dengbêj û çîrokbêj guhdarî dikirin.

Lê mixabîn îro edebiyata Kurdistan ya devkî hêdî hêdî tê jibîrkirin. Sebebê vê yê herî mezin jî em bi xwe ne. Me heta çend sal berê guh nedida stranên xwe û çîrokên xwe. Yê ku me guhdarî dikirin jî me dixwest bizivîrînin zimanê Tirkî. Loma gelek berhemên gelê me kete nav edebiyata Tirkî, Ece-man û Ereban.

Salên min gelek nînin, min heta şeş heft sa-liya xwe li çîrokên diya xwe û amojna xwe Cêro guhdarî dikir. Li gund elektrîk tunebû. Radyoyên bi pîla dixebitîn, di çend malan de hebûn. Dema dibû êvar em li ber diya xwe, gelek caran jî li ber amojna me Cêro digeriyan. Cêroyê gelek çîrok û hikayet zanîbûn. Bi rastî xezîneyeke folklorê bû. Lêbelê ez

wan wextan zarok bûm, edebiyata Kurdistan, folklorê Kurdistan çî zanim. Paşê elektrîk hat gundê me. Birayê min yê mezin, li Enqerê dima, ji me re televizyona xwe ya bêreng şand. Em li ber televîzyonê ecêb man. Me rûyê xwe jî çîrokên mezinan guherand. Wextê elektrîk biçûya, me dîsa berê xwe dida çîrokan. Ez ketime hejdeh saliya xwe şûn de min bala xwe da edebiyata gelê xwe. Min dest pê kir stranên gelêrî, çîrok, destan qeyd kirin û çiqasî ji destê min hat min nivîsîn. Niha mezinên me yê çîrokan û adetên me zanin hindik in û her diçe kem dibin. Heyfa min bi tiştêkî tê, di dilê min de ma ku min çîrokên Cêro qeyd nekirin. Belê Cêro sala 2004an çû ser dilovaniya xwe. Xezîna folklorê tevî xwe bir, çû. Divê em pirr bixebitin, gotinên pêşîyan, meselan, çîrokan, bûyerên mezinan qeyd bikin. Hêj kal û pîrên me yê van çîrokan dizanin hene.

Berê çîrokbêjên gelekî navdar hebûn. Ew li hemû gundan dihatin hezkirin. Wexta biçûna gundekî, li mala mêvanhezêkî navdar û bi rûmet diman. Wê rojê jê re xwarinên herî xweş dihatin çêkirin. Wextakî Xelo (li hêla me Çîrokbêjekî navdar bû) dihat mala me, jê re goştê qazê dikirine ber bilxur. Jê re şerbet çêdikirin, şênîyên malê wê rojê kêf û şahî dikirin. Ez wan wextan çar an jî pênc salî bûm. Xelo mîna xeyalekî tê pêş çavê min. Hemû şênîyên gund qala wî dikirin.

Wexta kalikê min serpêhatiya Meleka Gewrê bi stranê ve digot, hemû jinên li odê digiriyan, bûyerên

wisa bêbext guhdar pirr xemgîn dikirin û bandoreke pir mezin li ser wan dihişt. Qîz û bûkên malê û yên cînaran jî ji ber ku ode tişî dibû, li pişt deriyê odê li van çîrok û stranan guhdarî dikirin. Gelek mesele, çîrok, serpêhatî jî bi şevan berdewam dikir. Ji bo nûgihîştîyan di nava stran û çîrokê de gelek gotinên pêşîyan û kurteçîrok ji bo dersildanê dihatin gotin.

* * *

Meleka Gewrê li bajarê Meletiyê keçikeke pir bedew û spehî bûye. Keçeke şîxulker û jêhatî bûye. Navê diya wê Gewrê bûye. Diya wê jî mînanî wê şîxulker, jêhatî û navdar bûye. Gewrê xanimek bûye. Mînanî mîra gotina wê di nav cimaetê de derbasdar bûye. Loma ji Melekê re gotine Meleka Gewrê. Melek di nav keçikên Meletiyê de keça herî bedew û xanim bûye. Bedewbûna wê û şîxulkeriya wê li derûdora Meletiyê belav bûye.

Lawê Betal Begê, zengînekî bajarê Meletiyê bûye. Gelek erd û zeviyên wî hebûne. Merivekî mîrxas, camêr, birûmet û zana bûye. Jineke wî hebûye ku nave wê Fatê bûye. Lawê Betal Begê çiqasî baş û xwînşîrîn be; Fatê jî jineke ewqasî netutişt, mirdar, malgerok û xain bûye. Hezkirina wê ji lawê Betal Begê re hîç tunebûye. Li gor hinek gotinan qisir bûye, loma zarokek jî nedaye Lawê Betal Begê.

Lawê Betal Begê dinêre ji Fatê xêr tune û salê wî derbas dibin, jê re lawekî dewsa wî bigire lazim e, biryar digire ku jineke din bîne ser Fatê. Bedewbûn û jêhatîbûna Meleka Gewrê jî bihîstiye. Li gor adet û toreyan xwezgîniyan dişîne mala bavê Melekê û wê dixwaze. Daweta wan dikin û bûkê tînin mala wê ya teze.

Melek di rojê rojîn de dikeve çavê Lawê Betal Begê. Jê pirr hezdike û wê diparêze. Qedr û qîmetekî pir mezin didiyê. Di hemû şîxulên malê de berpirsiyariyê didiyê. Melek jî qet qusûrek an jî rûreşiyekê paş wî dernaxîne û navê mîrê xwe di nava xelqê de bilind dike. Lawê Betal Begê roj bi roj ji Melekê pirtir hezdike û hertim li ba wê dimîne. Fatêya ku di tebîeta wê de fesadî û rûreşî hebûye, ji wê rewşê zû aciz dibe. Gelek çavreşîyan li Melekê dike.

Me li jorê jî got, gelek mal û milkên Lawê Betal Bege hebûye; zevî, dewar, pez... loma jî gelek xulamên wî hebûne. Serxulamê wî yekî fesad, nan-
kor, mirdar û xerab bûye. Kêfa wî ne ji Lawê Betal

ne jî ji Meleka Gewrê re dihat. Navê wî merivê xerab Ûso bûye. Dibêjin merivên xerab, xeraban dibînin; merivên çê jî yên çê dibînin. Ûso û Fatê di berdabûn hev. Li ser vê jî çav berdabûn malê Lawê Betal Begê. Fatê bibû hevalê Ûso û ji Lawê Betal Begê re hîç jinîti nedikir. Haya Lawê Betal ji vê rewşê tunebû.

Wî wextî kirîvatî, di civatê de, bi taybetî di civata Kurdan de roleke pir girîng digirt. Ger du kes bi hev re bibûna kirîv mîna bira nêzîk dibûn, kirîv dibûn mîna malekê, qîz û lawên wan jî dibûn mîna xwişk û bira. Ji ber vê qîz û lawên kirîva ji hev re nediketin, navbera wan de zewac nedibû. Li ser vê meselê gelek stran jî hene. "Bişewite mala kirîvantiyê" dibêje keçika kirîvê, dilgirtiya wî. Kilama "Sînano" gelo dilê kê naşewitîne? Ji vê kilamê baştir gelo derdê evîna qîz û kurê kirîvan çi dikare bîne ziman? Roja îroyîn herçiqasî ev adeta nemabe jî, dîsa bi taybetî li gundan ev adet tê cih. Kirîv diçûn mala kirîvan, bi heftekî an jî bi qasî deh rojan diman. Malxwê malê, xizmeteke pir mezin ji wan re dikir. Heta ku roja mevanê wan biçûna xwarinên herî xweş ji wan re dihat çêkirinê. Li ser mêvandariya kirîva meseleyek heye, bavê min qal dikir: Rojê merivek kurê xwe hildide diçe mala kirîvê xwe. Kirîv gelekî şa dibe. Merivekî feqîr bûye. Li malê tiştêk nemaye. Hema kurê xwe dişîne dikanê ku hinek tiştên xwarinê bistîne, rojek, du roj kirîv naçe. Li gor adetan, heta mêvan biçe divê xwediyê malê xizmeteke mezin jê re bike. Lêbelê deynê kirîv jî pirr zêde bûye. Rojê dîsa malxwê ji kurê xwe re dibêje: "Here dikanê hinek tiştên xwarinê bistîne." Gede serê xwe berjêr dike dibêje: "Bavo xwediyê dikanê dibêje, heta hûn deynê xwe nedin, êdî tiştêkî nadim we." Kirîv wan gotinan li pişt derî dibihîze, diçe bi destê kurê xwe digre û jê re dibêje: "Heydê kurê min em herin, êdî kirîv tirpan li qir xist."

Lawê Betal Begê jî dibe kirîvê camerekî, li gor usûl û adetan, mala xwe teslîmî Ûso û Fatê dike, tevî çend merivên xwe diçe mêvandariya kirîvê xwe. Wana digihîjin mala kirîvê xwe, kirîvê Lawê Betal gelekî kêfxweş dibe. Xulam direvin, hefsarê hespê wan digrin, hespan dikişînin tewlê. Mêvan derbasî oda mêvanan dibin. Wextekî rûdinin, ji aliyê aşxanê dengê dîbega qehwê te. Wî wextî usûlekî

wisa hebû; mêvan bihatana malekê berî her tiştî, qehwe ji bo wan amade dibû. Ger qehwa teze di dîbegê de bihata kutanê û dengê dîbegê bihata aliyê oda mêvanan, mêvanan fêhm dikir ku qawa teze ji bo wan tê amadekirin.

Lawê Betal li mala kirîvê xwe, li mêvandariyê ye, li mala wî jî meydana dibe meydana Fatê û Ūso. Fatê û Ūso her tim li ba hevdu ne, şixulên xerab dikin. Lêbelê Melek bi kirinên wan dihesê. Melek jineke bîaqîl bûye. Fêhm kiriye ku wana çav berdane malê mêrê wê. Gelek caran di jî van şixula tevdigere. Fatê fêhm dike ku Melek pê hesiyaye ku tevî Ūso dixwazin tiştêkî bînin serê Lawê Betal, loma Fatê çarekê difikire. Diçe ba Ūso, dibêje: "Ūso, malxirabo! Melek bi vî şixulê ku em dixwazin bikin hesiyaye.. Ewê Lawê Betal Begê re bibêje û wê serê me herduyan jêbibe. Gereke em ji vî şixulî re çarekê bibînin. Ger tu bi ya min bikî emê tiştêkî bînin serê Melekê." Ūso hinekî ditirse, tiştêkî nebûyî... Paşê dinêre xencî vê çarê çareyeke din tune. "Ê" dibêje "emê çawa bikin." Fatê dibêje: "Sibe em bi mehnakê Melekê hildin û herin daristanê wê bikujin. An jî wê Melek bibe sebebê me herduyan jî.

Ūso dibê: "Ê..., me Melek kuşt, lê Lawê Betal bê, vî şixulî hîn bibe dê me herduyan jî bikuje." Fatê dibêje: "çawa wê jî heye, wextê mêvanê Lawê Betal Begê hatin emê qehwê çêbikin, jehrê bavêjine fîncana wî, hê berî bi Melekê bihesê wê bi jehrê bimire. Emê jî li ser mal û milkê wî rûnin.

Sibetirê Ūso diçe ber oda Melekê, dibêje: "Melek xanim, îro çend roj in Lawê Betal Begê tune, hûn niha gelekî aciz bûne. Ez, hûn, Fatê hinekî bigerin û bila bêhna we jî vebe. Emê qala rewşa malê jî bikin."

Xanima malê, an jî qîza malê tevî çend hevalên xwe, bi taybetî tevî xanimên began, qîzên began diçûn seyranê, digeriyan, dilîstin û gul û sosin berhev dikirin. Melek her çi qasî ji wan hezneke jî dîsa jî daxwaza Ūso qebûl dike û qet tiştêkî xirab nayê ber dilê wê.

Ew dikevîne rê, ber bi daristanê diçin. Ūso hem rewşa Melek xanimê dipirse, hem jî qala rewşa karên malê dike. Ew bi xebirdanê dikevîne nav daristanê, ji daran qet cihek nayê dîtî. Ūso qameya Lawê Betal tevî xwe aniye, ji piştê xwe qamê dikşîne û lêdixe Melekê dukuje. Ūso bi wê heyecanê qama bi xwîn dixê qevza wê. Ji tirsan Melekê wisa li wir dihêlin û tên malê.

Mêvandariya Lawê Betal bi qasî deh rojan digire û roja dehan xatirê xwe ji şênîyên mala kirîvê xwe dixwaze, paşê jî kirîvê xwe dawetî mala xwe dike. Kirîvê wî jî tevî wan tê. Kirîvê wî jî gerek heftekî an jî deh rojan bibe mevanê wî. Wana xwe digihînin ber mala Lawê Betal, xulam direvin hespê van dikşînin tewlê, mêvanan derbasî oda wan dikin. Lawê Betal Begê jî li kêleka kirîvê xwe rûdine. Ūso tê xêrhatinê dide mevanan û xwesteka wan dipirse. Lawê Betal Begê dibêje: "Kuro Ūso xeberê bide Meleka Gewrê; bêje mevanê me yên ezîz hene, bila qehwa mevanan hazir bike. Bila di dîbegê de qehwê wisa bikute ku dengê dîbege bê aliyê oda mêvanan." dibêje: "Ser seran begê min." û derbasî aşxanê dibe. Me li jorê jî qal kir, Melek jineke jêhatî û şixulker bû, qehwe hazir kirina wê û dîbeg kutana wê jî pirr dihate zanîn. Wexta Melek di dîbegê de qehwe dikuta tepe-tepa dîbegê heya malên cînanan diçû.

Dibê:

Kuro Ūso lawo xeberê bide Meleka Gewrê yo,
Ūso lawo bila bikute dîbega qawê yo,

Ūso, bila dîbega qawê bikute, deng bê aliyê di odê yo,

Ūso lawo mêvanê me hene, mêvanê şermê yo,
Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê

Dibê sûret sorê, çav belekê.

Ūso bi tirseke mezin, dizivire te cem dêla Fatê, dibê: "Fatê, ocaxa te kor be. Lawê Betal Begê emir kir, got bila Melek dîbega qehwê bikute, deng bê aliyê odê. Mêvan bira bizanibin ku qehwa teze ji wan re tê amadekirin."

Fatê radibe diçe aşxanê, dîbegê hildide, qehwê dike hundire dîbegê û dest bi qehwe kutanê dike. Lawê Betal Begê guhdarî dike, tepe-repekî giran ji aliyê aşxanê te, dibêje ev Melek nîne, bi dizîka ve gazî Ūso dike, Ūso tê cemê, Lawê Betal Begê di guhê wî de dibêje:

Dibê: "Kuro Ūso va ne dengê dîbega Meleka Gewrê yo,

Ūso lawo eva ku heye tepe-repa dêla di Fatê yo,
Ūso lawo we çi kiriye, Meleka Gewrê yo,

Ūso lawo were bide min ji vî cabê yo,

Ūso kuro we çi kiriye Meleka Gewrê yo,

Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê,
Dibê sûret sorê, çav belekê.

Ûso bersiva Beg nade, dizivire te cem Fatê. Lawê Betal Bêgê, fêhm dike ku xerabiyek xuya ye. Melek tune, vana şixulek anîne serê Melekê. Ji cihê xwe radibe bala xwe didê, Ûso çû cem Fatê û bi dizî jehr kirine fîncanekê. Piştî hat cem mevanên xwe rûnişt.

Qehwê tînin aliyê odê, Ûso hemû fîncana belav dike, fîncana ku jehr avêtibûyê datîne pêş Lawê Betal Bêgê. Lawê Betal qawê venaxwe û bi dizîka dirijîne binê sewkiyê. Paşê fîncana xwe bilind dike wekî qawê vedixwe ku bila Ûso li kêleka wan sekiniye pê nehese. Piştî qehwevexwarinê mehnakê dibîne, ji kirîvê xwe misadê dixwaze û dibêje: "Mêvanên ezîz, li qisûra min nenêrin, karekî min î pirr girîng derketiye, divê ez bi wî karî mijûl bim, hûn dixwazin herin mala xwe, careke dinê ezê we bikim mêvane xwe. Mêvan fêhm dikin ku rast e, yan na wî bi xwe ew dawetî mala xwe kiribûn, dê çawa wisa zû bişanda. Lawê Betal Bêgê mêvanên xwe rêdike. Gazî Ûso dike dibêje: "Ûso lawo kanî Meleka Gewrê". Ûso hinekî disekine, aciz dibe û ji aliyekî ve jî şaşmetal dimîne gelo qehwa bi jehr çima tesîrek neda beg, paşê dibêje: "Begê min nizamî çawa bibêjim, tu çûyî, neçûyî, Melek ûmîşî xortê xelqê bûye. Çend roja berê jî tevê xortekî reviya çû.

Dibê:

"Lawê Betal Bêgê, tu çûyî bajara Meletiyê, kirîvatî yo,

Meleka Gewrê xwe re ûmîşbûbû, bi xortê xelqê yo,

Xwe re diçû nava ormîn dikir kêf û di zewqê yo,"

Lawê Betal Bêgê digo: "Kuro Ûso lawo, Meleka Gewrê ne ya vê yekê yo,

Were bide min cabê, we çî kiriye Meleka Gewrê yo,

Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê,

Dibê sûret sorê, çav belekê.

Lawê Betal Bêgê Melekê baş nas dike, zane ku Melek tişteki wisa nake û wisa xuya ye vana tişteki vedişêrin. Paşê digre Ûso dikute, Ûso toys nade, ji destê Lawê Betal xilasbûn tune, gazî Fatê jî dike, tevê

beg derdikevin derve û Ûso dibêje: "Begê min xortê ku tevî Melekê reviya gundê wî li aliyê daristanê ye. Beg dibê kuro ger gotinên te rast bin ezê Melekê, ger tişteki dinê be ezê we bikujim. De here qama min bîne" Ûso qamê tîne, beg qamê dikişîne, dinêre qame bi xwîn e. Dibêje: "Kuro Ûso ev çîye?" Ûso dibêje: "Do gayê cînarê me nigê xwe kenaştibû, min qame bir çûm, me ga şerjêkir. Qame ji bo wê xwîn e." Lawê Betal begê fêhm dike ku wana Melek kuştine, dibêje: "Ûso lawo we çî kiriye Meleka Gewrê, li ku ye, bide peşiya min, cihê ku we kuştîye şanî min bidin."


Ev dikevîne rê, têne nava daristanê, rastî cenazê Melekê tên. Wexta Lawê Betal Beg vê rewşê dibîne kelogirî dibe. Van bê namûsan Melek kuştine, cenazê wê li binê darê hiştine, tîrêjên tavê di nav daran re daye ser cenazê Melekê. Xwîn ser de sor dike. Lawê Betal cenaze hildide tîne mal. Qama xwe hildide, Ûso û Fatê şerjêdike. Li gor hinek gotinan niftê li ser laşê wan dadike, agir bera wan dide, xweliya wan jî dide ba.

Lawê Betal Bêgê şûr dikişîne, ji qebzê yo, Destê Fatê, Ûso bi hev va girêdide,

Lawê Betal Bêgê, wana qemê va hûrdike, datîne wê derê yo,

Niftê serda dike, cendekê herda jî dişewitîne, Wana dişewitîne, kûla wan jî dide bê yo, Dîsa dernaxîne heyfa Meleka Gewrê yo, Heylûr, heylûr, heylûr, hey Melekê,

Dibê sûret sorê, çav belekê. ■



Rêgezên heyînê

Adnan Firat

Gava em di jiyana xwe ya rojane de rastî tişteki tîn, em tişteki dibînin, em di heqê wî de nakevin şubhê, em wî wek rastî qebûl dikin û çawa ku em ji xwe ne di şubhê de ne; tê de jî nakevin şubhê. Herwiha, tê zanîn ku ev yek, ji bo zanistê jî bi heman awayî tê qebûlîkirin û zanist, gava lêkolînên xwe li ser mijara xwe dike, li ser wê mijarê û wê objeyê nakeve şubhê.

Lêbelê wextê ku bi awayekî gelemperî li serê tê sekinîn, têkiliya wî bi "heyîn"ê re tê çêkirin, wî çaxî çend astengî derdikevin holê. Jixwe ew tişt li ber çav e, xwediyê hinek taybetiyan e, em bêjin hişk e, an herikbar e, an germ e û hwd. Lê gava em meraq dikin ku ka ev hebûna xwe ji ku distîne, şert û mercên hebûna xwe çawa li dar dixê, çawa çêdibe; wî çaxî em bivê nevē li ser hebûna wî ya xuyayî dikevin nav şekan. Em çavê xwe li hinek tiştên ku "hebûna wî bi wî ve tê qebûlîkirin" digerin. Wî çaxî tişteki wisa ji me re lazim dibe ku bibe sedemê hemû tiştan. Ev filozofên kevnar, gava ku behsa ontolojiyê kirine qesda vî tiştî kirine. Bi wan; peywira ontolojiyê ew e ku ji me re heyînê eşkere

bike û rêgezên wê bêje. Wî tiştê ku tu şert raserî wî tune. Ew şertê şertan e. Ew rêgez (prinzipat) ango prensîb e. Prensîb ew tişt e ku ji her tiştî re şert û merc ferz dike lê şert û mercên wî jê çêdibin û tu tişt nikare tiştan li serê ferz bike.

Gelo ev prensîb çi ne?

Li vê derê berî ku em biçin ser van prensîban; em dikarin bêjin ku ev prensîbên dê bên gotin li ser du qadan tîn ravekirin. Ango du ihtimalên me hene:

1-Îhtimala realîst a objektîvîst:

Li gorî vê, birrahiyê û hema bêje hemû heyîn; dibe ku mirov zani-be an jî nizanibe; jixwe çi be ew e. Ango ne bi zanîn û nezanîna însan ve giredayî ye. Ango ne însan wê ava dike, ne însan mane davêje serî; jixwe ew bi xwe çi be dîsa ew e û wisa tê zanîn. Ango ji hemû ceribandî û pêkanîna însanan cuda ye û rêgez û qanûnên wê jê tîn; ne ku însan davêje serê.

2-Îhtimala realist a subjektîvîst: Li gorî vê jî, birrahiya tê qebûlîkirin bi tu awayî ji rola sujeyê ne xalî ye, di têgihîştina heyînê û tiştan de suje (mîrov) xwedî

Prensîb ew tişt e ku ji her tiştî re şert û merc ferz dike lê şert û mercên wî jê çêdibin û tu tişt nikare tiştan li serê ferz bike

bandor e, ew prensîban davêje ser wan. Her wiha hatiye gotin ku birrahi, jixwe ji zanîna însan pêk hatiye. Ango li gorî van, em nikarin bêjin "heyîn çi be ew e" bes emê bêjin "mirov heyîn çawa zanîbe, heyîn ew e".

Herwiha bi vê prensîba subjektîvist –ku bi giştî paşî di nava felsefê de bi pêş ket- maneya "rêgez"ê jî, ji aliyê xwe ve guherand. Beriya ku perspektîfa subjektîvist baş biserûber nebûbû, digotin ku rêgez çi be ew e, ew naguhere. Û wisa îfade dikirin: *Rêgez nayên zêdekirin* (Principia non sunt multiplicanda). Yekîtiya gerdûnê hebû û ew yekîti ji rêgezeke wisa diafiriya ku ew tiştekî xwedayî bû, nediguheriya, xwediyê qanûnan bû û bi wan qanûnan her tişt dihat hebûnê û hebûn bi vî awayî dibû xwedî rêgez.

Lêbelê nêrîna subjektîvist a modern, di felsefê de li ser vê mijarê serdemek nû vekir û herwiha bi vê serdemê maneya rêgezê ji ser objeyê rakir û anî bi sujeyê ve girêda. Di vê nêrînê de êdî rêgez tiştekî wisa bû ku ew kargîrî fêkîrandina însan û sedemê pêşketin û berfirehbûna nêrîna wî bû. Ji ber ku rêgez bi bîr, hiş û hişyariya mirovahiyê ve hat girêdan; êdî bi pêşveçûn û hişyarbûna mirovahiyê ve ew jî bi pêş diket û diguherî. Li vê derê rêgez; bi kurtasî xwediyê du taybetîyan bû: 1) Rêgeza herî bilind ew tişt e ku potansiyela afirîneriya hişyariyê û hişmendiyê li dar dixe. 2) Ev tişt, hêjahiya xwe ji fonksiyona xwe distîne û ev fonksiyon jî, ravekirina siruştê bi xwe ye. Yanê ev yek, her çiqas bikaribe dinyayê ji me re eşkere bike û bide fêhmîkirin, ewqas rast e û hêja ye.

Digel van nîqaşan emê bikaribin bêjin rêgezên heyînê çar in:

1- Rêgeza xwebixwehiyê: Ev prensîb, bi awayê "tişteke çi be, ew e" tê îfadekirin. Yanê A, A ye, kevir kevir e, roj roj e, ax ax e hwd. Her tişt xwebixwe ye, ne tişteke din e. Li gorî vê prensîbê, digel hemî guherandin û hereketan jî ev yek naguhere û her tişt hebûna xwe ji wî tiştê ku nayê guhertin distîne.

Ji aliyê din ve ev rêgez bi awayekî din jî hatiye ravekirin ku ew jî li ser hesabê "cudahiya her tiştan" hatiye qebûlîkirin. Yanê li gorî vê nêrînê, di gerdûnê de her tişt bê emsal e, tu tişt bi sedan sed naxibe tişteke din. Mesela, du tiştên sedan sed eynê bin, tunene.

Wekî din, çawa ku rêgezên heyînê dibin rêgezên her tiştan, di heman demê de ew dibin rêgezên têgehan jî. Naxwe emê bikaribin bêjin; -ji ber ku têgeh, kargîrî mantiqê ne- ev rêgez dibin rêgezên mantiqê jî. Têgehek çi be ew e, ne tişteke din e. Herwiha xwebixwehiya ontolojîk, dibe xwebixwehiya mantiqî jî.

2- Rêgeza bēnakokiyê: Em dikarin bêjin ku ev rêgez wek dewama rêgeza duyemîn e. Lewra eger A, A be; ev dê bibe sedemê qanûna bēnakokiyê jî, ku wisa tê îfadekirin: "Tişteke, di heman demê de nabe hem xwe hem jî tişteke din". Yanê, "A" û "ne A" bi hev re nabin. Mesela, em nikarin bêjin mirov hem zindî ye hem ne zindî ye, ev kompîter hem heye û hem tune ye. Li ser mantiq jî ev yek dikare wisa bê îfadekirin: Rapeyvek, hem erênî û hem jî neyênî nabe. Ji aliyê epîstemolojiyê ve jî em dikarin bêjin "rapeyvek, hem rast û hem jî çewt nabe". Ev prensîb, di ontolojiya qedîm

de ji bo têgihîştina birrahiya tiştan wek formeke bingeş hatiye pejirandin. Lê paşî, bi taybetî jî di serdema nû de ev prensîb hatiye rexnekirin û em dikarin bêjin ku ji qada ontolojiyê derketiye û tenê di qada mantiqê de maye.

Di nava van sîstemên felsefê yên dawî de ev rêgez êdî ne bi awayekî xwerû rêgezeke heyînê ye; jê bêtir ji bo sîstemê ye. Yanê ji bo ku sîstemek ji nakokiyê xelas bibe û di nav hêmanên wê sîstemê de nakokî rabe, wek prensîbeke mantiqî hatiye qebûlîkirin. Ji bo hinkûfiya hêmanên sîstemê ev yek wek şert tê pejirandin. Serqissê, piştî serdema nû, êdî ji bo cewherên heyînê nehatiye bikaranîn, bes ji bo qada fenomenal (diyardeyî) û hinkûfiyeta sîstemên di nava van fenomenan de wek şertekî mantiqê hatiye qebûlîkirin.

Mesela bi kurtasî, gotine ku ji bo tiştan forma "hem, hem"ê gelek caran emê bikaribin bikaribînin lêbelê di mantiqê de ev yek nabe û divê em xwe bi vê forma "yan, yan"ê bigirin. Mesela di elektrîkê de ku qutbên pozîtîf û negatîf hev digirin û wê enerjîyê jê derdixin emê bikaribin ji bo birrahiya vî tiştî, wê forma "hem, hem"ê bikaribînin. Yanê emê bêjin ku pozîtîf û negatîf herdu bi hev re tê de ne, hem pozîtîf e hem jî negatîf e. Lêbelê di qanûna bēnakokiya mantiqê de divê em xwe bi "yan, yan"ê bigirin û em nikarin vê di warê mantiqê de bi "hem, hem"ê rave bikin.

3) Rêgeza bēimkaniya halê sêyemîn: "Tişteke, yan heye yan jî tune ye, halekî din ne mimkun e". Yan jî em bêjin, tişteke an "A" ye yan jî "ne A" ye, halekî din ne di nav ihtimalan de ye. Peyvek yan

rast e yan jî ne rast e, mirov an dimire yan jî namire, Xwedê yan heye yan jî tune ye hwd.. Yanê di vê rêgezê de ji bo heyînê û tiştên di nava heyînê de wextê ku ji bilî du ihtimalan tu ihtimalên din ne mimkun bin; li wê derê em xwe digihînin rêgeza bêîmkaniya halê sêyemîn.

Jixwe li vê rêgezê jî hinek rexne hatine kirin û bi kurtasî gotine ku ev rêgez, tenê ji bo tiştên di nava siruştê de cih girtine mimkun e. Mesela em dikarin bêjin ku "ev yek, yan Jupîter e yan jî ne Jupîter e, ihtimaleke din tune ye." Lêbelê ji bo hinek qaîdên matematîkê û pêkanên mentiqê ev ne mimkun e. Mesela ji bo qaîda bédawîbûnê ne pêkan e. Her wiha tê zanîn ku mentîqa klasîk li ser du pêkanên rastiyê hatiye avakirin. Lêbelê piştî ku di nava mentiqê de çend rexne hatin lidarxistin û bi navê mentîqa modern hinek tişt guherîn, pêkanên rastiyê (?) ji du ihtimalan derketin û êdî vêga "mentîqa pirr pêkaniya rastiyê" tê pejirandin.

Bi rastî em dikarin ji van hersê rêgezan re bêjin ku varyantên hev in. Yanê em dikarin herduyên din ji nava yekî derxin. Bi taybetî jî em dikarin bêjin ku ew herduyên din jixwe varyantên rêgeza xwebixwehiyê ne.

Ev hersê rêgez ji bo destnîşankirina tiştên hene, wek formulasyonên cihê jî dikarin bên qebûlkin.

4) Rêgeza têrîtiya sedemê Ev rêgez jî ji aliyê Leîbnîz (hersiyên ewil Arîstoteles diyar kiribûn) ve li van rêgezan hatiye zêdekirin. Bi vê rêgezê tê qebûlkin ku *eger tiştek hebe, ji bo hebûna wî tiştî sedemên têr hene, loma ew jî heye*. Wextê ji bo hebûna tiştêkî

Şahbanû

Pablo Nerûda

Werger: Mihemed Jiyan

min tu kirî şahbanû.
serwîbalatir hene ji te, bi qed û qamet
zelal hene, ji te zelaltir
bedew hene, ji te bedewtir

lê tu yî şahbanû!

dimeşî di kolanan de,
lê ji kesî ve nenasîyar î.
tu kes nabîne taca te ya billûrîn;
hîç kes nanêre li wê xalîçeya sorzêrîn û pinhanî
ya ku min li ber piyên te raxistiye.

û dema ku dibînim te ez,
têne coşê hemî rûbar
di bedena min de;
naqos dihejînin asoyan
û gerdûn bi lawîjekê tê dagirtin...

tenê ez û tu.
tenê tu û ez yara min!
guh bide min, deng bibe xwe...

sebeb û şertên têr werin cem hev ew tişt jî li dar dikeve.

Herçiqas ev rêgez piştî gelek wextan û şûn de hatibe diyarkirin jî, bi rastî; em dikarin bêjin ku jixwe rêgeza heyînê ya ewil, bi awayekî veşartî ev bû, ev rêgeza filozofan a herî kevin bû. Lewra ji berê ve sedemê bingeşîn ji aliyê filozofan ve hatiye lêpîrsîn. Jixwe di pêşî de hatiye qebûlkin ku ev prensîb ji bo hebûnê prensîbeke hundirîn e û ji bo hemî tiştên ku hene û birra ne lazim e. Tiştên hene, di heman demê de xwedî sedeman in û hêj Platon –wextê ku ev hersê prensîbên din hêj

nehatibûn kifşekirin- gotibû ku: "tu tişt ne bê sedem e".

Tu diyarde hema jixwe çênabin. Û her tişt xwedî sedeman in. Herwiha ev siruşt, gerdûn û hemî diyardeyên hene, jixwe encamên çend sebebên in û birahiya wan bi çend sedemên cihê -heta em dikarin bêjin metafîzîk- ve girêdayî ye. Ev birahiya ku em pê re rûbirû ne, encamek e.

Em dikarin ji bo rastiyê jî vê rêgezê bi awayekî "*her rastî, ji bo rastbûnê xwediyê sedemên têr in, loma rast in*" ifade bikin. ■

Bulanik Kopa rengîn e

Nevzat Eminoglu

Bulanik Kopa rengîn e; qeza Mûşê ye, şîrîn e
Gul û rihan û berfîn e; warê me ye, xweş hêlîn e

Çar demsalan gelek xweş e, biharan ew gula geş e
Zivistan wek laçik nexş e, xemla wê payîz, havîn e

Şên e, bi gol û kaniyan; bi çiya, deşt û baniyan
Çarşî, malbat û xaniyan; bajar û gund û şênî ne

Bilîcan ji bo te şan e, Mûrad û Heftreng nîşan e
Em bi çem û çiyar şa ne, şahidên ken û girî ne

Şahidê Mîrê Serhedan, yê cejn û newroz û eydan
Şîn û şer, sefer, serhildan; wan çi dîne, çi nedîne

Rengê te Gola Qazana, Gola Şêlû bi sazana
Ava Kor, ew barajana; seyrangê û xemrevîn e

Va dîsa bi xêr bihar hat; gulan reng da, Kopa welat
Pê dilgeş bû, gel û civat; nû bihar e, nû vejîn e

Kêf û xweşî kete jînê, lepitîn hestên evînê
Ruh û can hat vê birînê; dilşadî ye, dil bengîn e

Bax û baxçe û bostan in, mêrg û zevî û zozan in
Dehl û devî û xozan in; newal, kendal û gelî ne

Berodana, bêrîvana; dengê bilûra şivana
Bi dengbêj û bi dîlana; şahî, şevbêrk û şevîn e

War û wargehên Medan e, êl û eşîrên Kurdan e
Law û keçikên merdan e, Eyyûbî û Merwanî ne

Mîr Xalid Begê Hesênî, Hevalê Şêxê Pîranî
Şehîdê welat û dînî, hûn rûmet û cennetî ne

Tim xwenda û şoreşvan in, camêr in bi dil û can in
Bi peyman û bi îman in, dew û doz ji wan ra jîn e

Kurd û Terekme cînar in, Turk û Şawşat çar kenar in
Li ba hev, bi cih û war in; bi pir çandiyê, zengîn e

Xwedî gundê dîrokî ye; mînak Melekend, Abrî ye
Sal nêzîkî hezarî ye, navenda ilm û zanîn e

Bi medresên xwe navdar e; camî, mizgeft îftixar e
Bi aliman payîdar e; seyda, mela û feqî ne

Ji Sogutliyê Mela Weysî, tu xwedî dîwan û ders î
Mela Zahîd, Nûr nivîsî, bûn tarîxa pel zêrîn e

Ev mamosteyên serfiraz; Raîf, digel Emin Korkmaz
Kitêb nivîsîn, bûn mumtaz, xwedî eser tim zindî ne

Zahir ji Pîranê deng da, bi wî dengî Kopê reng da
Kopa rengîn, ev leheng da welatê jor û jêrîn e

Ehlê wê zana û jîr in, bi xîret û bi tevdîr in
Xwedî bawerî û bîr in; aliyek Mem, aliyek Zîn e

Me pir xwar nan û ava te, rohnîdar bûn, bi tava te
Hiltînin em silava te, navê te j' me ra evîn e

20.01.2010

Têgeha demê di navbera "Pêşeroj" û "Paşeroj" de

Deham Ebdulfettah

Em dizanin ku zimanê Kurdî demeke dirêj wekî zimanekî devkî maye. Di dirêjahiya wê demê de jî derfeteke dîrokî bidest neketîye da ku bibe zimanekî nivîskî û xebateke zanistî li serê çêbibe. Ji ber vê rewşa dîrokî gelek kêşe û arîseyên aloz di zimanê me de peyda dibin, gerek em wan destnîşan bikin, li ser wan rawestin û wan çareser bikin.

Ji wan aloziyên kêşedar navê dema ayinde (musteqbel) e ku di navbera navlêkirina (pêşeroj) û (paşeroj) ê de bûye cihê têvelî û cîyawaziyê. Rewşenbîrên Kurd, nemaze yên ku bi Kurmancî dipeyivin, der barê navlêkirina dema ayinde (duwaroj) de bûne du beş:

a—pirraniya rewşenbîrên Bakur û Rojava (Tirkî û Sûrî) gotina "Pêşeroj" ê bi wateya dema ayinde (musteqbel) dixebitînin û gotina "Paşeroj" ê jî bi wateya dema borî (mazî) dixebitînin.

b—rewşenbîrên Kurd (Kurmanc) li Başûr û Rojhilat (Iraq û Îran) gotina "Paşeroj" bo dema ayinde (musteqbel) bikar tînin û gotina "Pêşeroj" bo dema borî bi kar tînin. Anku, herdu beşên rewşenbîran, wan navlêkirinan berevajî hev bi kar tînin.

Bêguman her beşek ji wan rewşenbîran navlêkirinên xwe bi hin eger û behaneyan dane pêş û ew pesend

kirine.. Ez jî, wekî xemxurekî zimanê Kurdî, bawer dikim ku gotina "Paşeroj" bi wateya dema ayinde rast û durist e. Bi wê baweriyê jî, ji mêj ve, min ew gotin di nivîsên xwe de, bi wateya dema ayinde xebitandîye. Helbet, min jî ew bawerîya xwe li ser çend behaneyan ava kiriye:

1-Ew kesên ku peyva "Pêşeroj" bi wateya dema ayinde (musteqbel) bikar tînin, ew kes xwe dikin pîvanok û herdu hevalkarên (zerfên) "pêş" û "paş" li xwe dipîvin û dibêjin:

-Pêşeroj: Rojên li pêş me, yên ku hêj nehatine û me ew nedîtine, lê hîn wê bîn û emê wan bibînin (musteqbel).

-Paşeroj: Rojên li paş me, yên ku me ew dîtine û di ser me re buhîrîne (dema borî).

Bi vê têgeha demê jî hemû mînakên xwe yên ronîker şîrove dikin, wek:

-"Di berbanga sibehê de limêjên wê rojê, yên li pêşîya mirov (yên musteqbel) nîvro, esir, mexrib û îşane. Di esrê de êdî limêja mexrib û îşayê bi tenê li pêşîya mirov dimînin, yanî musteqbel in, lê limêja nîvro û ya sibehê buhîrîne, li paş mirov mane"¹.

1 -Rojen Barnas, "Îstîqbal çi ye, Pêşeroj an Paşeroj e". Kovara Nûdem, jimar:39-40, Sal: 2001, Siwêd.

Ez jî,
wekî xemxurekî
zimanê Kurdî,
bawer dikim ku
gotina "Paşeroj" bi
wateya dema ayinde
rast û durist e.

Dema ku mirov cara pêşîn vê mînakê dixwîne guman dike ku demên limêjên destnîşankirî rast û cîgirtî ne. Lê ku mirov li deqqa mînakê vegere û wê bi hûrbînî bixwîne dê bigihîje baweriyekê ku ew gumana wî ne di cihê xwe de ye!

Şaşiya ravekirina vê mînakê jî şaşiya wan kesan hemûyan e, yên ku gotina "Pêşeroj"ê bi wateya rojên li pêşiya me (musteqbel) dixebitînin. Ew şaşi jî ew e ku navekî razber (manewî) wek (dem) ku li navekî heyber (madî) hatiye pîvan û hev kêşîyeke ne rewa ji wan saz bûye, wekî ku di mînakê çûyî de hatiye:

"Di berbanga sibehê de demên limêjên wê rojê, yên li pêşiya mirov (yên musteqbel) nîvro, esir, mexrib û îşayê ne."

Anku, di berbangê de limêjên li pêşiya mirov nîvro ... Ya rast û rawe ew e ku demên limêjên mayî li dema berbangê bîn pîvan:

-[Di berbanga sibehê de demên limêjê yên wê rojê, yên li paşiya (dema) berbangê (yên musteqbel) nîvro û îşayê ne]

Anku limêjên nîvro, esir, mexrib, îşayê li paş limêja berbanga sibehê ne.

Di parçeyê mînakê yê dawî de:

- "... Di esrê de êdî limêja mexrib û îşayê bi tenê li pêşiya mirov dimînin, yanî musteqbel in, lê limêja nîvro û sibehê buhirîne, li paş mirov mane."

Dîsan ew şaşiya pîvanê bixwe ye. Mirov bûye pîvanok û demên limêjan lê tîn pîvan:

-Di esrê de:- Limêja mexrib û îşayê li pêşiya mirov in (musteqbel).- Limêja nîvro û sibehê li paşiya mirov in, buhirîne (borî).

Rastiya pîvanê ew e ku dem li demê bî pîvan, ne li mirov bî

pîvan:

-(Di esrê de:- Limêja mexrib û îşayê li paş limêja esrê ne).

Anku dema mexrib û îşayê li paş dema esrê tîn.

-Limêja nîvro û sibehê jî li pêş (limêja) esrê ne.

Ango dema nîvro û sibehê li pêş dema esrê buhirîne (borî) ne.

Bi vê pîvanê jî em dikarin gotina "Pêşeroj" û ya "Paşeroj"ê rave bikin:

-Pêşeroj: Rojên ku li pêş vê roja me çûne (ne ku li pêş me ne), anku berî vê roja me buhirîne (dema borî).

-Paşeroj: Rojên ku li paş vê roja me tîn (ne ku li paş me mane), anga wê li peyê vê roja me bîn (dema musteqbel).

2-Ji hêla bîjesaziyê ve jî, herdu gotin "Pêşeroj û Paşeroj" lêkdayî ne (hevbend) in û bi şêwazekî rêpîvan saz bûne, wekî ku tîn gotin:

-Gul + sor=gula sor

-Mêr + kal=mêrê kal

-Jin + pîr=jina pîr

-Mar + kor=marê kor

-Ba + reş=bayê reş

-Av + xweş=ava xweş û hwd...

Bi pêşxistina hevalnavan (rengdêran) û paşxistina navan, zêder (veqetandek) tîn avêtin û ew mînak dibin:

-Gula sor=sorgul

-Mêrê kal=kalemêr

-Jina pîr=pîrejîn

-Marê kor=koremar

-Bayê reş=reşeba

-Ava xweş=xweşav û hwd...

Li gora vê pîvanê jî:

-Roj+pêş=roja pêş (pêş vê roja em tîn de)

-Roj+paş=roja paş (paş vê roja em tîn de).

Bi pêşxistin û paşxistina nav û hevalnavan:

-Roja pêş=pêşeroj

-Roja paş=paşeroj

Bi vê dahûrînê em digihîjin baweriyekê ku gotina "Pêşeroj" û ya "Paşeroj" bi şêwekî rast û li gora pîvanê saz bûne.

Tîpa (e), ya ku di navbera her du hêmanên gotinê lêkdayî de (pêş-e-roj) û (paş-e-roj), tenê ji bo sivikbûn û rewanbêjiya bilêvkirina bîjeyên lêkdayî dikeve navbera wan. Anku, eger bilêvkirina gotinê bîyî (e) yê siviktir û xweştir be, ew (e) bikar nayê, wek:

-Sor + gul=sorgul

-Roj + hilat=rojhilat

-Şîn + boz=şînboz

-Ciger + xwîn=Cigerxwîn

-Dil + geş=dilgeş.

Lê ku hebûna (e) yê sivikbûnekê bide bîjeyê, hingê (e) bikar tîn:

-Kesk + sor=kesk-e-

sor=keskesor

-Penc + şêr=penc-e-

şêr=pencesêr

-Pîr + merd=pîr-e-

merd=pîrmerd

Ji hêla rêzimanî ve, nebûna (e) yê rastir e, lê bi egereke fonîtîkî (e) li van gotinan zêde dibe: (Jinbî=jînebî, reşba=reş-e-ba).

Bo vê egerê em dibêjin, herdu şêwe (pêşroj, paşroj) û (pêşeroj, paşeroj) jî rast in, lê şêweyê bi (e) yê pirtir bi kar tîn.

3-Wateya gotina "Paşeroj" di ferhengên zimanê Kurdî de (yên ku li ber destên min) bi van tîgehên hatiye:

A-Elî Seydo Goranî- "Ferhengga Kurdî Nûjen" (Kurdî-Erebî)²:

-Paşeroj: (الوفر المستقبل)

-El - wefir, el-musteqbel

B-Fadil Nizamiddîn- "Estêre

2 - Seydo Ali Gewranî, *Ferhengga Kurdî Nûjen*, Urdin-Emman, 1985.

Geşe", (Kurdî-Erebî)³:

-Paşeroj:- (مستقبل . لاحق . مقبل)

-Musteqbel, lahiq, muqbil

C - Muhammed Cemîl Seyda

-"Ferhenga Jîn", (Kurdî - Erebî)⁴:

-Paşro (paşroj):- (مستقبل)

-Musteqbel

Ç-Gêwî Mukriyanî-"Kurdistan", (Kurdî-Kurdî)⁵:

-Paşeroj: Dûwaroj (musteqbel)

-Paşroj: Ayinde (musteqbel)

D-Hejar Mukriyanî - "Henbane Borîne"

(Kurdî-Farîsî)⁶:

-Paşeroj:- Le we duwa, ayinde, rojanî dûwem (Musteqbel)

E-Selah Sadella-Ferhenga "Ingilîzî _ Kurdî"⁷:

-Future (Musteqbel): Dûwaroj, ayinde, Paşeroj, Pêşdem.

Ê-D. Îzolî-Fergenga "Kurdî - Tirkî":

-Paşeroj: Istiqbal (musteqbel)

-Paşroj: teserruf

Berçav e ku van her heft ferhengan jî, gotina "Paşeroj" bi wateya (dema bê, ayinde, musteqbel) şîrove kirine. Tenê Selah Sadella di ferhenga "Ingilîzî-Kurdî" de gotina Ingilîzî "future" bi dû wateyên hevdişî şîrove kiriye:

-Future-(Paşeroj)

-(Pêşdem)

Ez bawer dikim ku Sadella gotina "Pêşdem" bi mebesta (dema bê) xebitandîye, ne bi wateya wê ya rast:

-Pêşdem: Pêşwext, Pêşeroj.

Ji ber ku ne durist e ku "future", di heman demê de "Paşeroj" û "Pêşeroj" be..!

4-Li herêma Dêrika Hemko û hin gundên dora wê, wek: (Endîwerê) jî ev derbirrîn carinan tê bihîstin: Te çi ji paşeroja xwe re kiriye?!

Anku, te çi ji dawîya temenê (musteqbelê) xwe re kiriye?!

Piştî vê ravekirinê emê li çend gotinên gelêrî veşerin û wan li gora wê pîvana ku me amaje pê kiriye, şîrove bikin:

-(Pêşyên me): Bav û bapîrên me, yên ku di pêş vê dema me de jiyane (dema borî)

-(Gotinên pêşyan): Gotinê wan kesan in, yên ku pêş (berî) vê serdemê jiyane (dema borî).

-(Pêş (3) salan ez çûbûm Wanê: Berî (3)salan. (dema borî)

-(Nuha emê şîvê bixwin, Paşê em ê herin civînê

Paşî (dema) xwarinê (ayinde, musteqbel).

-(Paşîv/paş-şîv): xwarina (dema) paš (dema) şîvê, di rojiyê de xwarina dawîya Şevê ya (sihorê).

-(Paşyên me): Nevî û nevî-çirkên me, yên ku di dema Paş vê dema me de wê bîn.

Lê gotin û derbirrînên weku van gotinan: [pêşveçûn û paşveçûn, pêşverû û paşverû, Pêşketin û paşketin, pêşinyarî, pêşinyazî û pêşwazî (istiqbal).

Pêjina demê (ne pêş û ne paš) ji van gotinan nayê. Ev gotin, li gora pêvajoya hevokên wan, rewş, cih û pileya hizirvanî, zanyarî û şaristaniya mirovatiyê destnîşan dikin, wekî ku em bibêjin:

-T u di xwendina xwe de pêşketî yî. (Tu di xwendina xwe

de zîrekî, li pêş hevalên xwe yî).

- Hûn malbateke pêşverû ne.

(Hûn malbateke, bi hîzr, rewîşt û têkiliyên xwe li pêşiya civaka xwe ne, hûn têgihîştî ne.

- Em çûn pêşiya wî (istiqbala wî).

(Bo rûmetdan û rêzgirtina wî em çûn pêşwazî û dîdariya wî).

- Ev dara li pêş me hişk bûye.

(Ev dara li pêş/cihê/ku em lê ne.)

(cihê darê li pêş cihê me ye)

- Dara li paš me Kesk e.

-(Dara li paš/cihê/ku em lê ne.)

(cihê darê li paš cihê me ye)

- Em îro di roja çarşemê de ne.

- Roja li pêş me (li pêş roja me...) Sêşem e

- Roja li paš me (li paš roja me...) Pêncşem e.

Di her çar mînakên dawî de, cih li cih hatiye pîvan û dem jî li demê hatiye pîvan. Pîvana rast jî ev e, ne ku em demê li xwe bipîvin, wekî ku tê gotin:

-(Roja li pêş me)-pêşeroj e?!

-(Roja li paš me)-paşeroj e?!

Di dûmahîya vê ronîkirinê de dixwazim nêrîna xwe ya di barê mijarê de dubare bikim ku gotina "Paşeroj" bi wateya dema ayinde (musteqbel) rast û cîgirtî ye!

Vêca eger têbîniyên şarezayekî zimên di barê vê nêrîna min hebin, yan jî nêrîneke dîtir hebe, hêvîdar im ku berçav bibin, da ku em bi hev re mijarê gotûbêj bikin û bi hev re vê kêşeya aloz çareser bikin...-!! Ne durist e û nabe jî ku mijareke wisan girîng wekî (dema ayinde) di zimanê me de bi du navlêkirinên hevdişî (dijwate) bê nasîn û bê xebitandin. Bo vê yekê jî divê ev kêşe bilez çareser bibe.!!■

Amûdê 14 /9/2010

3 - *Estêre Geşe*, Bexda, 1977.

4 - *Ferhenga Jîn Lubnan*-Beyrût (Emîral) Sal (....)

5 - *Ferhengî Kurdistan*, Hewlêr, Çap. Aras, 1999.

6 - *Henbane Borîne*, Tehran 1368 K. Hetafî.

7 - *Ferhenga Ingilîzî-Kurdî*, Istanbul, Avesta 2000.

Goyîna xizokê

Hamid Omerî

herikîn bêhnên dilovan
başok firîyan ji hafên dûr
ez di goyîna xizokê de fetisîm

wehlûl ûqdeten mîn lîsanî

li ber xwe ketim
keder jî bi min kenîya
lê axirî êdî kirîn bi kêvir ket
bi ventolinê neket


ventolin inhaler
ava bexdenûsê
tivrên sor
na êdî serê dijminên min jî neêşîne
goyîna xizokê

weleh qesem
bileh qesem
venake venake venake
ventolin inhaler jî venake
xêr û şer tevî hev
ventolin inhaler
bronşên min venake
kefa destên min vala bike
pêjgîra kewandî dayne ser sîngê min

wa şefeq digevize
peya didabilînî hespên rewan
hêy şevçiraxê
çima bêhna wan jî naçike
agir bi mala te ketê
ventolin inhalerê

eynik şikiya
ez tazî mam
di taldeyê rehleyê de

Sermawez 2009 - Stenbol



Kurteceribandin

Husein Muhammed

Kujerên evînê

Me biryar da ku em evîna xwe bihêlin, her yek ji me bi rêya xwe ve bimeşe, em hev ji bîr bikin.

Ax çi biryarek şê û şeydane bû! Ma şopa çeqê birrandî dê çawa ji darê winda bibe!

Bi ken û rûyên bêreng me sorgula evîna xwe perritand û kulîlkên wê yên sor û geş di bin piyên xwe de perçiqandin.

Lê sorgul nemir. Hêza jiyana wê tirsna bû. Perçiqandî jî her pelgê wê hê dilerizî û dibiriqî û çeqên wê yên qetandî jî nalînên xwe yên bêdeng digihanandin ber perrên esmanan. Berfa nûbarî jî çipên xwîna wê sor bû û hilmek xwînawî hilda hewa.

Di nav wê hîlma xwînawî re awirên me herduyan, du kujeran, bi hev ketin. Em herdu behecin û me berê xwe ji hev bada.

Dinyaya delal

Dinya tijî wîşiyên tirî ye, bi tacgulên beybûnan dagirtî ye, miştî kulîlkên sîs yên sosina ye. Mêrg bi gulên sor, zer û şîn şepolên şê û şeyda didin.

Ma çi bêhn wek vê biharê xweş û pîroz e! Havîn me mest û mendeşoş dike.

Bijî, bijî, bijî! Vê gava xurt ya jiyane bi har û hêçî bijî! Pelên kulîlkên xwe bi temamî li ber rojê veke, bila jiyana te pişkiyê be, meya av û tava jiyane vexwe!

Madem ku carekê jiyana te pişkiyê, êdî ne xem e ku dê carekê mirin te bigire, ne derd e ku delaliya rengin dê paşî biçilmise û biwere.

Ne baz im, ney im!

Ne şervanek alahilgir im, ne rêber dilbaz im ku rêya spêdeyek nû nîşanî we bidim.

Rûlek li ber çemî me, bayên biyanî mêvanên min in.

Giyane serhildêr davek min dipiçîne da ku awazekê pê bistire, awazek tijî bahoz, jan û evîn û belkî piçek ronahiya spêdê jî.

Bi şev li nav baxçê havînê

Şev tarî û giran in, mêwe diweşin, diweşin. Ma gurmîna nav cinînan nabihîzî? Dinya wek daholek dêwane ye, di şeva şîntarî de hêdîka dilerize.

Bi mêweyan şevên havînê dişewitin, bi sêvan şevên sîs! Bacanên sor distrin: Leşê me roj û tav e!

Cejna mêweyan e, ez mest kirime! Pûşiyê zevîyan agirek gurr û geş e. Ma gurmîna nav baxçeyan nabihîzî? Dinya wek daholek dêwane di şeva şîntarî de hêdîka dilerize.

Li benda mirinê

Dema ku zarok bûm, dema ku hevalê dinyaya delal, tava geş û darên hejok bûm.

Ji te gelek ditirsîm mirinê.

Niha li beravê di nav rêvingan de bendewarî te me. Em bi çavên westiyayî li deryaya tarî dinêrin ka kengî keştiya te dê bêt.

Em tu tiştî ji jiyane zalimtir nanasin loma em bo rizgariyê li benda te ne, te ya ku em qet nas nakin. Dema ku îşaretê bidî me, em dê bi bêdengî bikevin keştiya te, bi hêviya qencyê, delaliyê, belkî azadiyê yan ronahiya.

Yar û heyva bextiyar

Min şûnpiyên te di nav xîzî de dîtin û tacgula te çend kulîlk bo rêberiyê werandibûn ser rêya min.

Hemî rojên min ê rebûn ji dûr ve çavdêriya te dikirin. Kenê te li gel hevalên te wek dilopên dilveker li min dibarî, dest û yên qemirî sivik wek çivîkan tacgul li serê te ve dihûnand.

Piştî ken û stranên te yan li ber têhna tava nîvro êdî westiyayî, yar! Lê niha jî bihêle sîbera bijangên te li rûyê te yê zêrîn bibînim!

Behr li beravê bêhna xwe vedide û dihêle ku heyv endamên leşê wê maç bike. Xwezî tu derya bûyayî yar! Û ez jî heyva hextiyar. ■

Nexweşiya siyasetê û zihniyeta Xaricîtiyê

Zilkîf Xweşhêvî

Dema mirov li kitêba Xweda mêze dike û taybetmendiye bawermandan dixwîne, mirov tu carî îhtimal nade ku ji mirovên mumîn karên xirab sidûr bibin. Lê mixabin dîroka Îslamê û dîroka însaniyetê nîşan dide ku siruştê beşerî ya îfratî pirî caran li ser siruştê insanî ya mutedîl zal bûye û di bin navê dîn û baweriyên de gelek karên nerewa hatine kirin. Dema mirov li dîroka Îslamê dinêre, xwînrêjiya navxweyî bêtir li ser du zemînan çêbûye: Yek jê teessuba kora-ne ye ku ji aliyê Xaricîyan ve tê temsîlkirin, ya din jî xîrsa siyasî ye ku ji aliyê desthelata Emewî ve tê temsîlkirin. Her çend navê Xaricî û Emewîyan di nav rûpelên dîrokê de mabin jî lêbelê mentiq û zihniyeta van herdu koman hîna jî di nav Misilmanan de berdewam in. Bi dîtina min ev bêserûberiya îro piranî ji ber van herdu nexweşiyên muzmîn in.

Ji bo têgihîştina zihniyeta Xaricîtiyê û encamên wê yên xirab, nimûneya herî diltezîn û cîgersoj, şehîdkirina Hz. Elî ye. Ev bûyer ji bo analîzkirina zihniyeta hinek misilmanên îro jî gelek watedar û rênîşander e

Ji bo têgihîştina zihniyeta Xaricîtiyê û encamên wê yên xirab, nimûneya herî diltezîn û cîgersoj, şehîdkirina Hz. Elî ye. Ev bûyer ji bo analîzkirina zihniyeta hinek Misilmanên îro jî gelek watedar û rênîşander e. Lewra

çawa başî û qencî li ser bingeheke dîrokî heta îro hatiye, wisa jî fitne û fitnekarî jî li ser bingeheke dîrokî şîn hatiye û gulî û çiqlên xwe dirêjî roja îro kiriye.

"Dema Hz. Elî dibe xelîfe, waliyê Şamê Miawiye bi behaneyê teslîmnekirina qatîlên Hz. Osman xelîfetiya wî qebûl nake û bi arîkariya Emr ibn As serî hildide. Li ser vê îsyane şer dest pê dike û demeke dirêj dikişîne. Dawiyê artêşa Hz. Elî zora asiyan dibe û nêzikî serkeftinê dibe. Li beramberî vê, Emr ibn As dest bi hîllekariyê dike. Alîgirên wî rûpelên Qur'anê bi serê şûrê xwe vedikin û doza hukmê Qur'anê dîkin. Fermandarê Hz. Elî, Malîk Eşter vê hîleyê fêm dike û dixwaze karê xwe temam bike, lêbelê koma ku dê paşê wekî Xaricî bîn binavkirin li dijî biryara Malîk Eşter derdikevin û dibêjin divê em hukmê Mushefê qebûl bikin. Piştî vê bûyerê biryar tê girtin ku ji herdu aliyên ve du hekem bîn tayînkirin da ku biryara dawî ji aliyê van kesan ve bê dayîn. Şamî nûnertiya xwe didin Emr ibn As ê ku bi dehaya xwe ya siyasî û hîlebaziya xwe ya şer tê naskirin.

Hî. Elî jî dixwaze li ser navê wan fermanîdarê wî yê aza Malîk Eş-ter bibe hekem. Lêbelê dîsa vê koma kêmaqil li dijî biryara Hî. Elî radiweste û Ebû Mûsayê sofi pêşniyar dîkin. Li ser vêya Hî. Elî neçar biryara wan qebûl dîke.

Pîştî vê biryarê, Emr îbn As bi hîleyên xwe, Ebû Mûsa dixapîne, Hî. Elî jî xelîfetiye ezl dîke û Miawiye di şûna wî de destnîşan dîke. Pîştî vê rûdanê, tevlihevî zêdetir dibin û beroşa şer dîsa dîkele. Di vê navê de koma ajawegêran careke din dîkevin nav hewldanan. Di nava xwe de civînan çêdîkin, di dawiyê de Ebdullah bîn. Wehb er-Rasîbî wekî serokê xwe hildibijêrin û dest bi belavkirina fitneyê dîkin. Li gorî wan; ji ber ku Hî. Elî hekemî qebûl kiribû bûbû kafir û Ebû Mûsa jî ji ber ku rê dabû vê biryarê bûbû kafir, herwiha ji bo ku xelk jî bi vê biryarê razî bûbûn, ew jî bûbûn kafir. Divabû di serî de Hî. Elî, herkesî tobe bikira û ji nû ve bihatana ser îmanê. Bi vî awayî di nav xelkê de dest bi propagandayê kirin. Rastî kê dihatin ji wan re digotin: "Hûn der heqê herdu hekeman de çi difikirin?" Eger wan kesan bigotana "Em ji hukmê wan bêrî ne" dest nedidane wan, lê eger wisa negotana dihatin kuştin.

Pîştî vê qetl û qîtalê, Xarîcî û Hî. Elî rû bi rûyê hev bûn, berî ku şer çêbibe Hî. Elî dixwaze wan ji vê şaşîtiyê rizgar bike. Ji ber vê çendê bi serkirdeyekî Xarîciyan re, bi Îbnul Kewwa re gotûbêjê dîke. Îbnul Kewwa ji bo ku Hî. Elî, Ebû Mûsa hekem tayin kiribû, ew bi kufrê tawanbar dîkir û doz lê dîkir ku bê ser îmanê. Îmamê Elî jî bi rêbazeke mentiqî fikrê wî pûç dîkir û jê re digot: "Ebû Mûsa be-

Xîrsa siyasî û xwesteka gihîştina desthilatdariyê jî di dîroka Îslamê de bûye sedemê gelek rûdanên diltezîn. Ji bo vê jî nimûneya herî baş şehîdkirina Hî. Huseyn û rêşasiya Emewiyan e

riya vê biryarê bû kafir yan piştî wê?" Îbnul Kewwa got: "Pîştî vê biryarê." Hî. Elî got: "Madem bi gotina te, piştî vê biryarê bûye kafir, min dema ew tayîn kir Misilman bû û ez jî vî karî berpirsiyar nînim." Lê Îbnul Kewwa qebûl nedikir û careke din hemaqeta Xarîciyan isbat dîkir. Pîştî vê gotûbêjê şer dest pê kir û Hî. Elî ew ji nav birin.

Her çend koma Xariciyan ji nav çûn jî, alîgirên wan di nav komelgehê de fitneya xwe belav kiribûn. Dema Hî. Elî xwast artêşa xwe amade bike û asiye şamî bîne ser îtaetê, alîgirên wî sistî kirin. Li ser vê helwesta wan, Îmamê Elî qehirî û wisa deng li wan kir: "Gelî saxtemêran! Ey xewna zarokan û aqilê jinan! Wellahî min dixwest Xwedê min ji nava we derxe û bi bal rehmeta xwe ve bikişîne. Xwezî min hûn nedîtana û nas nekirina! Wellahî we qefesa sînga min tijî kerb kir. We du eş bi min dan tamijandin. Bi îsyan û terikandina xwe, we fikrê min xerab kir. Ji ber vê ye ku Qureyşî dibêjin: Eliyê Ebu Talib mirovekî wêrek e, lê hunera şer nizane!... Hêja ez negihîştibûm bîst saliya xwe min dest bi şer kir. Îro ez jî şêst salî derbas bûm, lê

fermandarê ku pê neyê îtaetkirin fikrê wî jî nîne."

Pîştî vê axaftinê tenê sêsed kesan da dî Hî. Elî û bi vî awayî Îmamê Elî tenê ma. Divê navê de Ebdurehman kurê Mulcem, Nezzal kurê Amîr û Ebdulah kurê Malîk di nav xwe de biryar dan ku Hî. Elî, Miawiye û Emr îbn As bikujin. Pîştî vê biryarê Ebdurehman kurê Mulcem di nimêja sibehê de çû pêşiya Hî. Elî û bi şûrê xwe yê jehrîn ji nişka ve derbek li nav serê Hî. Elî xist û bû sebebê şehîdbûna wî."(1)

Encama Xarîciyê

Ev rûdan nîşan dide ku dostên ehmeq ji dijminên baqil tehlûketir in, herwiha Misilmantiya çewt û teessubane ji neyartiya kufrê bêtir xirabkariyê derdixe holê. Xariciyan bi çend taybetmendiye xwe yê diyar mîrateyeke xirab li dî xwe hiştin. Taybetiye wan ên berçav: Bêferasetî, serhişkî, nezanî û mêrkujî bû. Ji wê çaxê heta niha van taybetmendiye wan wekî ruhekî xebîs di nav Misilmanan de digerin û di her serdemekê de peyayên munasib ji xwe re peyda dîkin. Lê di vê serdema dawî de mîratgirên Xariciyan hin taybetmendiye din jî li taybetmendiye xwe yê berê zêde kirin, ew jî xîrsa siyasî û xwesteka gihîştina desthilatê ye. Xîrsa siyasî û xwesteka gihîştina desthilatdariyê jî di dîroka Îslamê de bûye sedemê gelek rûdanên diltezîn. Ji bo vê jî nimûneya herî baş şehîdkirina Hî. Huseyn û rêşasiya Emewiyan e.

"Pîştî ku Miawiye mir Yezîdê kurê xwe li şûna xwe danî, Hî. Huseyn jî ji Hîcazê rabû û ber bi Kufeyê ve bi rê ket. Lê waliyê

Yezîd, Ubeydullah kurê Ziyad bi hêzên xwe dor lê pêça. Kurê Ziyad ji fermanarê xwe re name şand ku rêya avê li Hz. Huseyn û alîgirên wî bigire û eger serî danyeyn divê bîn qirkirin. Hz. Huseyn tevî heftê û du alîgirên xwe ve hatin dorpêçkirin. Dema ku şer dest pê kir hemû hatin şehîdkirin û tenê Hz. Huseyn ma. Piştî ku Hz. Huseyn birîndar ket kurekî xwe yê biçûk kir hembêza xwe, lê eskerên Ubeydullah kurê Ziyad ew kurê biçûk jî di hembêza Hz. Huseyn de kuştin. Paşê Hz. Huseyn taseke av xwest. Dema ku av ber bi devê xwe ve bir, ji bo ku avê venexwe tîrek weşandinê û tîr di nav devê wî de çikiya. Piştî vê yekê Şibl kurê Yezîd hat û serê Hz. Huseyn jêkir. Serê Hz. Huseyn û alîgirên wî bi serê rimê xwe ve kirin û ber bi qesra Ubeydullah kurê Ziyad ve çûn. Dema serê Hz. Huseyn avêtin ber Ubeydullah kurê Ziyad, kurê Ziyad bi gopalê destê xwe li diranên Hz. Huseyn xist. Di wê gavê de sahabiyê Hz. Pêxember Zeyd kurê Erkam giriya. Jê re got: "Wisa meke! Gopalê xwe ji ser van diranan hilîne! Min dît ku Hz. Pêxember ew radimûsan." Li

ser vê gotina wî, Ubeydullah hêrs bû, jê re got, eger tu pîrekî fanî nebûyayî minê niha serê te jî bida jêkirin." (2)

Vê rûdana cîgersoj nîşan dide ku dema xirsa desthilatdariyê bikeve dilê mirovan, çawa ji rê derdikevin û dibin sedemê qetî û qîtalên xwînavî. Yezîd ji bo ku li ser textê xîlafetê rûne û Ubeydullah kurê Ziyad jî ji bo bikeve çavê Yezîd û postê walîtiyê ji bo xwe misoger bike, bûn sedemê vê zilma mezin. Mirov dikare bibêje piştî vê bûyera xwînavî, "bêferasetî, serhişkî, nezanî û mêrkujî" ya Xariciyan digel hevalbendiya xesletên zalimane yên Emewiyan pêşî li peyama rasteqîneya Îslamê girtin û bûn sedemê tevliheviyên mezin ên siyasî û qewmî.


Roja îro zîhnîyeta Xariciyan û xirsa siyasî ya Emewiyan di şexsê hinek tevgerên radîkal û tundrew de careke din serî hildane. Ew şerê ku li Iraq, Efxanistan û hinek deverên din tê dîtin tenê bi dagirkeriya hêzên derveyî yan jî bi zordariya desthilatên navxweyî nayê ravekirin. Ji bo mebestên siyasî serbirandina însanan, teqandina mizgeftan, xwekuştina di nav ba-

zar û kuçeyan de ji bo van tevgeran bûne karên rojane û asayî.

Ev tevgerên siyasî yên ku xwe di bin perdeya Îslamê de vedişêrin, bi rêbazên xwe yên çewt, karên wisa kirin/dikin ku ji ber xirabkariyên wan îro navê pîroz ê Îslamê di dunyayê de bi "terorê" re tê hildan. Ew xelkên ku di vê serdemê de muhtacî peyama arambexş a Îslamê bûn, ji ber van dirindetiyan wan bi çavekî gumanbar li Misilmanan û Îslamê mêze dikin.

Çawa ku di hiqûqê de usûl jî bi qasî esasê girîngiya xwe heye, herwiha di dîn de jî ev qaîde wisa ye. Misilmanbûn, bê rêbaza Îslamî ya rasteqîne, bi tena serê xwe nikare rastiya jiyana Îslamî derxe holê. Dibe ku gelek kes bi gotinên ji bejna xwe mezin-tir doza nûnertiya Misilmanan bikin, lê bi vê nezanî, bêusûlî û bêmerhemetiya xwe nîşan didin ku li ser şopa Xariciyan qatîlê Hz. Elî û Emewiyan qatîlê Hz. Huseyn in û vê xetê temsîl dikin. ■

(1)-(2): Ji bo van agahiyên dîrokî binêrin: *İslam Tarihi* (el-Exar et-Tiwel), Ebu Hanife Ehmed Dineweri, Hivda Yay., İstanbul 2007



Ji çelengê şagirdên Rîsaleyên Nûr: Şêx Tahirê Şoşî û kitêba wî Gulzar

Tehsîn Îbrahîm Doskî
 Latînzekirin: Ayhan Geverî

Rîsaleyên Nûr yên Ustad Bedîuzzaman Seîdê Norsî nivîsîn -wekî em hemû dizanin- di demekê zû û bi lez de li gelek cih û welatan belav bûn û berhemeke îmanî ya biha û xwedanqîmet pê ve hat. Başûrê Kurdistanê (devera Behdînan) jî yek ji wan deveran bû yên karlêkirin û tesîra Ustad û nivîsînên wî geheştîyê. Û di vê nivîsîna xwe ya kurt de me divêt yek ji wan edîb û zanayan bideyne naskirin yên xwe dihejmart yek ji "Şakirdên Nûr". Ew jî Şêx Tahirê Şoşî ye.

Şêx Tahirê Şoşî kî bû?

Şêx Tahir, kurê Mihemed e, kurê Tahir e, kurê Şêx Îslamê Şoşî ye... û ew ji malbata şêxên Şoşê ye. Ewa di neseba xwe de digihê Şêx Şemseddînê kurê Ehmedê Şoşî (di sedsala yazdehê Hicrî de jiyabû) û ya navdar li deverê ew e ku ev malbat Ebbasî ne.

Şêx Şemseddîn yek ji şêxên navdarên devera Behdînan e û tirba wî niha li gundê Şoşê ye, ew dikevite rojhilata bajarê Duhokê, li nêzikê bajarê Akrê... Û malbata yek ji malbatên dînî û ilmî tê jimartin û jimareke zana û edîbên mezin di nav vê malbatê de hene. Mîna: Şêx

Şemseddîn, şairê navdar Seyfî (Şêx Ebdulletîf), Şêx Îslam û Şêx Tahir (ewê gotara me li ser)...

Şêx Tahir di dawîya sala (1332-Hicrî) 1917-Zayînî de li gundê Şoşê hatiye dinyayê û destpêka zanîna xwe li Şoşê, li ber destê babê xwe Şêx Mihemedî û Şêx Memdûhê Şoşî û gelekên dî wergirtiye... Paşî ji bo feqîtiyê qesta çend gund û bajarên Kurdistanê kiriye û dawiyê di sala (1367-Hicrî) 1947-Zayînî li bajarê Hewlêrê îcazeya melatiyê li cem Seyda Mela Ebdullahê Botanî wergirtiye.

Piştî wergirtina îcazê karê melatî û dersdanê kiriye û ji bilî melatiyê û dana dersan wî destêkeke baş di edebiyatan de jî hebû. Her di gencîniya xwe de wî dest dabû vehandina şî'ran bi zimanê Kurdî.

Seyda xettatekî (başnivîsekî) jêhatî bû û wî îcazeya xetî jî Xettatê Kurdê navdar Mehemed Tahirê Mekî wergirtibû... û gelek caran wî bi xettê xwe yê ciwan kitêbên Ustad Bedîuzzaman dinivîsîn û belav dikirin.

Zanîna wî bi ilmên şer'î û fennên nû jî hebû û têkiliyên wî bi zana û rewşenbîrên serdema wî re jî dixurt bûn.

Şêx Tahir, kurê Mihemed e, kurê Tahir e, kurê Şêx Îslamê Şoşî ye... û ew ji malbata şêxên Şoşê ye. Ewa di neseba xwe de digihê Şêx Şemseddînê kurê Ehmedê Şoşî (di sedsala yazdehê Hicrî de jiyabû) û ya navdar li deverê ew e ku ev malbat Ebbasî ne

Di dawiya jiyê xwe de tûşî nexweşiyeke giran bû, heta sala (1381-Hicrî) 1962-Zayînî li nexweşxaneyeye bajarê Bexdayê çûye ber dilovaniya Xwedê. Paşî ew bo Goristana Şêx Şemseddîn li Şoşê hate veguhastin û li wê derê hate veşartin.

Berhemên wî:

Wekî me gotî Seyda zana û edîbekê jêhatî bû û wî di vehandina şîira xwe de çav li Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî dikir. Şîira wî di dereceya şîira klasîk ya Kurdî bilind de tê jimartin. Ji berhemên wî:

1- *Kitêba Gulzar*, yan "Riyadennûr" wekî wî bi Erebi nav lê kirî. Ev kitêb şîireke mesnewiyê ye, sêzdeh hezar (13.000) beyt in. Behsa sîreta Hezretî Pêxember (s) diket. Herwiha sîreta xelîfeyên wî yên raşidî... û pişkek ji vê kitêbê ji layê kurê şairî ve Seyda Hemze Şoşî de di sala 1987ê li Hewlêrê hatiye çapkirin.

2- *Wergêrana Jiyana Ustad Bedîuzzaman bo ser zimanê Erebi*: Ev li Bexdayê hatiye çapkirin.

3- *Şerha Vehînoka Şêx Me'rûfê Nudêhî di ilmê 'erûzê de*: Ev şîir e û bi zimanê Erebi ye, pênsed û sih û pênc beyt in.

4- *Fenul-Qafiye*: Ev jî şîir e, bi Erebi ye, 98 beyt in.

5- *El-Muntexeb fî Zîkrîa Mîlad Seyîdîna Muhemmed Fexrul-Ereb wel-Ecem*: Eve bi Erebi ye li dor mewlida Pêxember e (s).

6- *Tehqîqa Dîwana Melayê Cizîrî*.

7- *Kurtiya Jiyana min û ew tiştên girîng yên min dîtî*: Eve bi zimanê Erebi ye.

Û jibîlî wan, Seydayî hejmareka şîiran jî hene, di hindê helkeftinan de vehandine.

Şoşî û peywendiya wî digel Ustad:

Dema Şêx Tahir feqîti dikir, carekê ji nişka ve wî çav bi kitêbeka Bedîuzzaman kevt, piştî wî ew kitêb xwendî kêfa wî gelek bi uslûb û rêka hizirkirina Ustad hat. Hêviya wî ew bû rojek bê ew vî zanayê mezin bibînit, belê ji ber mujûliya wî bi jînê ve ew nekarî vê hêviya xwe bi cih bîne. Piştî hingî heta feqîti xilas kiriye û bûye mela agahiya wî ji Ustad û kitêbên wî nemaye. Û piştî nozdeh salan carekê wî behsê Ustad bihîst û dema rêkek dîtî nameyek bi dest bo Ustadî hinart û tê de daxwaz ji wî kir ew wî hesêb bike yek ji telebeyên xwe "Şagirdyên Nûr". Ustad bersiva nameya wî da û gotê: "*Ev nozdeh sal e min tu yê hisêb kirî şagirdyê xwe...*" Dema Şêx

Tahiri hizra xwe kir, dît ew berê nozdeh salan bû wî bo cara yekê kitêbeka Ustadî xwendibû! Lew ew ji vê îlhama Ustad heybetî û ecêbgirtî ma.

Her çend Şêx Tahir, Ustad bi çav nedîtibû û bi muqabala wî şad nebibû, belê wî her dem kitêbên Ustad dixwendin. Bi xettê xwe yê ciwan dinivîsîn û di şîirên xwe de jî wî gelek caran pesnê Ustadî û telebeyên wî dikir. Vîna wî bo Ustad û şagirdyên wî di kitêba Gulzar de baş xuya dibit. Dema wî kitêba xwe bo "Tulab el-Nûr" kiriye diyarî û di cihekê de ji kitêba xwe ew behsa Ustad diket û dibêjî:

"Ya Rebb tu min û xulamê Qur'an
Seydayê Mezin Melayê Kurdan

Seydayê Heman Se'îdê Meşhûr
Ustadê me cumle Talibê Nûr

Hemyan me bikî fîdaiyê tenzîl
Aza me bikî bi sayeyê tenzîl

Çil salê me ew pitir li heştê
Ya Rebb me heman bibî beheştê

Vêkra tu me û ewan 'efû key
Dilxwoş bi lîqayê zatê xwo key"

Şoşî û halê Îslamê:

Şêx Tahirê Şoşî di *Gulzarê* de behsa halê Îslamê diket û dibêje:

"Sed heyf û mixabinî bo Îslam
Evroke we bê rewac û bê nam

Gava ku hebûn hemû li gel yêk
Wan şol bi dilî hemû dibûn rêk

Evroke hetûv e lêk cuda yîn
Lêk dî ne hezîn û labela yîn

Bê nav û nişan û bê delîn in
Pêş kafir û dujminan zelîl in

Roja me bûyîn yek û bi quwet
Dujmin me li pêş bi dered û zillet

Evro ne tifaq û labela yîn
Lew hinde di jar û berbela yîn

Hîna dixurîn penah bi Barî
Ew yarê me bû bi harîkarî

Evro dixurîn bi navê dujmin
Lew hinde şerr î nî çavê dujmin

Hetta me dikir emr bi çakî
Wek nehyê li pîsî û nepakî

Hukmê me hebû li tev zemînê
He li Endelûsê hetta Çînê

Serbeser dijîn bi naz û 'îzzet
Hem dîn e û hem cîhan û dewlet

Evro me bibîne ew çewan î nî
Dûr negire xirabtirê cîhan î nî

Bê şer'î gelek bi çav dibînî
Nabînî kesê xwo têbigehînî

Hindan şer û şor û natîfaq e
Hindan bi xiyamet û nîfaq e

Wez'ek tu dibînî zor bed û reş
Îslamê dibînî zor muşewweş

Nê heyf e ji bo me em di ho bîn
Evrenge neyarê dînê xwo bîn

Sed ah û esef bo ehlê îman
Dûr keftine ew ji rahê Qur'an

Ev kare ne karê 'eqî û jîn e
Ev hale nê laîqê me nîne

Ya Rebb tu bi cahê pakê Qur'an
Mewla ku tu yî Rehîm û Rehman

Nik xwo ve bidey me hewl û quwwet
Îslamê hemî bigêrî dewlet

Îslamê bikey qewî û tunde
Dînê xwo bikey tu serbilinde

Ya Rebb tu bikey bibînî Tahir
Ser kafirî em di nêr û zahir" ■

Bo celebên serbixêlî

Bamed Serdar

her roj kuştina xwe hildigirim
hespekî giyankuj, dengekî xeniqî
giriyeke nêvizî me

her sibeh xwîna laşê xwe dimalim
ji ber deriyê we yî bêhêvî
tebat li min nemaye bûme qeşmerê zarokan
hestiyê nimandî didim serhev ji
şikeftên mûze yên bê ziman
ji axa qelişî yî fedîkar û ji goristanên deyindar

keçê Rojê...!
bi Xwedê dûrî pelên papîrusa me
ya na minê navê te li ser wan nenivîsanda?
ma derewan bikim...!
nêzîkî vî dilê xwe yî çarçeper im ku te lê bihewîn im
nêzîkî vî eyarê xwe yî çar tilî me ku te lê bicebirînim
da ku ez û tu bûbûna berdilk û beyarên hev
wê demê min ê kezeba te yî sor di luleyên
bêvila te de biguvaştana
ji celebên serbixêlî re
pîrozbahiyek wê li ser welidandina te yî wê
rojê bibariya

wê rojê ...Rojê!
bila kesek bes bigiriya
ji dêvila herkesî ezê bigiriyama



Li ser şehadeta Şêx Bahaeddîn û wefata Ebdulmelîk Efendî

Abdulîlah Firat

Werger: Rêbaz Şoreş

Divê em ne bi çavê hezkirin û şehwetê, bi çavê îbretê li dinyayê mêze bikin. Gere em xwedî wê hişmendiye bin ku dê heçî tiştên di dinyayê de heyî tunebibin; ê herine binê axê. Yên ku ji mala wan cenaze derdikeve dersa xwe ji vê yekê negirin, ne ilim, ne îrfan, ne hikmet û ne jî nesîhet fêdê nade wan. Berî niha bi çendakî me Şêx Ebdulmelîk Efendiyê ku ji ehfadê Şêx Elî Sebtî û rihspiyê malbatê bû wînd kir. Bi munasebeta salvegera wefata Ebdulmelîk Efendî me xwest ku em wî bi minnet û rehmet bibîr binin.

Agahî û belgeyên li ser nav û memleketê kujerên ku tevlî şehadeta birayê Şêx Seîd Efendî, Şêx Bahaeddîn Efendiyê alim, şehîd û muderris bûne û xatiraten Şêx Bahaeddîn Efendî bi xwe ketine destê min. Ez van belgeyên ku dema Ebdulmelîk Efendî li heyatê bû gelekî dixwest bixwîne, lê mixabin nebû nesîbê wî; bi munasebeta salvegera wefata wî pêşkêşî hizûra ferdên malbatê û dostên wî dikim.

Xwedê teala wiha ferman dike: “Ey yê ku bawerî anîne! Sebir bikin û li pey dijminên xwe nem-

înin, ji bo cîhadê hazir û bi rabite bin û ji Xwedê bitirsin da ku hûn bigihên xelasiyê.” (3/200) Yê ku dide jî û yê ku distîne jî Xwedê ye. Ji ber vê sedemê emê sebir bikin. Emê ji Xwedê teala ji bo miriyên xwe daxwaza ecrê bikin û li hember mûsîbeta mirinê jî emê sebrê bikşînin. Tehemulkirina mûsîbetê, bi êş û giran e. Înşallah dê gelek eziyet û cefa bi sebir, sebat, berg-er û lavekirina ji Heq teala ji holê rabin. Ey Rebbê me! Tu li dinyayê qencyê bike nesîbê me. Li axretê jî qencyê bike nesîbê û me ji ezabê cehnemê biparêze. Bêguman, em aîdî Xwedê ne û em dê her vegerin bi bal wî ve. Ya Rebbî! Em bergîdana mûsîbetan, tenê ji te hêvî dikin. Wî û me bibexşîne, piştî wî peyrewekî bi xêr û baş bide malbata me.

Şêx Melîk Efendî, kesekî xwedî nirxekî gelekî mezin, tîmsalê ilim û exlaq, ê ku dîroka bi rûmet ya malbatê bi awayê herî baş temsîl dikir, cudatî nedixiste nava mezin-biçûk, dûr-nêzîk, alim-cahil û bi herkesî re bi nezaket tevdigeriya. Ew bi xulqê xwe kubar bû û ji sadebûnê hez dikir. Xwedî xulqekî ku hîç qiymet nedida malê

Şêx Melîk Efendî,
kesekî xwedî nirxekî
gelekî mezin, tîmsalê
ilim û exlaq, ê ku
dîroka bi rûmet ya
malbatê bi awayê herî
baş temsîl dikir, cudatî
nedixiste nava mezin-
biçûk, dûr-nêzîk, alim-
cahil û bi herkesî re bi
nezaket tevdigeriya

dinyayê, qencî û camêrî ji dest bernedida, mêvanperwer, kesekî ku zora nefsa xwe dibir û dilnizm bû. Di bara meseleyên ilmî de kûrbîn bû. Azad difikirî, di munaqeseyên ilmî de reqîbên xwe yên ji xwe gelekî bi bawer, bi belaxet, fesahet û uslûba xwe ya nazik, bêyî tawîz têk dibir. Xizmeta ji bo mezinên malbatê wekî mezheriyet qebûl dikir. Digel ku xwedî ruhekî hessas bû jî, bi saya liyaqeta xwe gihîştîye payeyeke bilind. Nufûsa ku hem di qada ilmî de û hem jî di qada siyasetê de bandora wî li serê hebû bi xerabî neemiland, ji pêwistiyên fikr û bawerîya xwe jî tawîz neda. Xwedî zihnekî wisa bû ku axaftinên xwe bi hikmet û mew'izan dixemiland. Hem bingeheên ilim û exlaqê Îslamê perwerde dikir û hem jî bi ragihandina nesîhetên filozofê kevin axaftina xwe dineqîşand. Bi şerîetê girêdayî dima; ji ber ku mexsed başbûna exlaq bû ji nesîhetên feylezofên Yûnanî Eflatûn, Arîsto û Sokrat û ji Qur'an, hedîs, û nesîhetên alimên Îslamê yên ku dihatin bîra wî bi Tirkî vedigotin. Digel serdestiya zimanê Erebi ku zimanê ilmê ye, bi Farisî jî baş dizanibû. Ji xeynî van zimanan, zimanê xwe yê dayikê Kurdî bi şêwazeke pir xweş diaxifî.

Ji bo kuştina misilmanekî di rêya Xwedê de Şehadet tê gotin. Xwedê teala dibêje: "Ji yên ku di rêya Xwedê de hatine kuştin re nebêjin kuştî, nexêr ew sax in lêbelê hûn nikarin vena fêhm bikin. Ger cehdkirin û şehîdbûna di rêya Xwedê de ji nefsa we re giran were jî, di heqîqeta hal de gihîştina seadeta ebedî ye. Ewana di rêya heq de heyata fanî terk kirine û gihîştine heyata ebedî. Ewana di meqamên bilind yên

ku ji wan re hatiye texsîskirin de riziqdar dibin. Ew digihên gelek nîmetên rûhî û manewî."

Îdî em çawa dikarin ji wan re bibêjin mirî! Nexêr, ewana her li heyatê ne. Mezinê me, kalkê me Şêx Bahaeddîn Efendî jî, yek ji wan kesan e ku gihîştîye şehadetê. "Xwedê di muqabilê cennetê de mal û canên mûminan kirriye, ewana di rêya Xwedê de cengê dikin, di meydana herbê de dibîne şehîd û xazî. Ev we'dekî Xwedê ye, di Tewratê de jî, di Încîlê de jî û di Qur'anê de jî sabit e. Ma kî ji Xwedê çêtir, we'dên xwe bi cih tîne. Ji ber vê danûstendinê kêfxweş bibin. Aha fêde û xelasiya mezin ev e." (9/111)

Zilamek hat cem Resûlullah û jê pirsî: "Kîjan mirov çêtir in.?" Resûlullah got: ' Ew mûminê ku bi can û malê xwe di rêya Xwedê de cîhadê bike."

Şêx Bahaeddîn Efendî li Xînûsê, di mala xwe de, di esnayê xwendina Qur'ana Kerîm de, rastî sûîqasta qatilan hat û xwîna yî ya mubarek wekî ya Hz. Osmanê ku xelîfê Pêxember bû li ser Qur'ana 'ezîm rîjiya û gihîşt rûmeta şehadetê.

Ezê kurtahiyên hinek ewraqên ku min bi dest xistine teqdîmî we bikim:

1-Wereqa li ser nivîsa ter-cuma halê wî yê Mehzûn e:

Navê wî Muhemmed e, mexlesa wî Bahaeddîn e. Ji ehfadê Hz. Elî Sebtîyê Paloyî ye ku ew jî yek ji Xulefayê Hz. Mewlana Xalidê Şehrezorî yê li Şamê Medfûn e. Hz. Elî Sebtîyê Paloyî li bajar û bajarokên wekî Palo, Darahênê, Çebexçûr, Diyarbekir, Wardo, Xînûs, Melezgirt, Mûş û Elezîzê ilim belav kiriye û feyza wî mîna çemê

Firatê diherikî. Ji mezhebê Şafîî bû û tabîiyeta wî jî Osmanî ye. Di tarîxa 1288ê hicrî de ku teqabulî 1871ê Mîladî dike li Paloyê hatiye dinyayê.

Di tarîxa 1300ê hicrî de li medresa bavê xwe yê merhûm Şêx Mehmûd Fewzî Efendî dest bi tedrîsatê kiriye. Di sala 1321ê hicrî de kitêbên fiqhê û ilmê Erebi bi awakî kamil û ekseriyeta kitêbên Tirkî, Erebi û Farisî jî xwendine. Piştî qedandina tehsîlê, îcazetnameya xwe ya li ser wan babetan heq kiriye û wergirtiye. Sûretekî îcazatnameya xwe daye meqamê Şeyxulîslam. Bi Tirkî, Erebi, Dimilî û Kurmancî hem diaxifî û hem jî dinivîsî.

Şêx Bahaeddîn Efendî

Îmza- Muhur

2-Bi kurtahî malûmatên li ser şexsê wî:

Gundê wî: Qolhîsar

Navê bavê wî: Şêx Mehmûd Fewzî Efendî

Navê diya wî: Gul Xanim

Qama wî: Bejînbilind

Çavên wî: Genimî

Di sala 1925an de, di esnayê ku liqa 2yan tabûra 3yan ku bi Alaya 53. ve girêdayî ye talîma eskeriyê dikir, Kadir Çavuşê kurê Ebdullah ku ji gundê Akçeagîla girêdayî Kırşehirê ye û Bekirê kurê Mustafa ku ji gundê Emre yê girêdayî bajarê Akdağmadenî ye, sûîqastê li Şêx Bahaeddîn Efendî dikin. Di Kela Xînûsê de dema ku li malê Qur'an dixwend ji 150-200 metre mesafê, jî di pencerê de herduyan bi hev re gulên tîfîngê şehîd kirin.

Ez van agahî û belgeyan îthafî ruhê Melîk Efendî dikim. Ji Xwedê teala niyaza bexşandin û merhemetê ji bo wî dikim.■

Adat û Rusûmatnameê Ekradiye û çend gotin

Murad Celalî

muradcelali@gmail.com

Geşedana di warê jinûveweşandina berhemên Kurdî yên di bin xweliya dîrokê de mane hêviyê dide mirov. Ji ber kêmbûna berhemên Kurdî—yan jî ji ber ku winda bûne, negihîştine roja me—yên nivîskî û qedîm, divê em wanên heyî wekî zêrê zerîn biza-nibin û wisa li wan xwedî derkevin. Bi rastî ji van berhemên giranbiha, di mijara xwe de tekane ya Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-1867) "*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*" ye. Ev pîrtûk li ser jiyana Kurdan ya civakî berhema herî pêşîn e ku bi destê Kurdekî hatiye nivîsîn. Piştî ku Mela Mehmûd li Erzeromê A. Jabayê (1803-1894) ku balyozê dewleta Rûs e nasdike, di jiyana wî de herwiha di dîroka edebiyata Kurdî de jî qona-xeke nû dest pê dike. Dema A. Jaba ji Mela Mehmûdê Bazîdî fêrî Kurdî dibe, berêka dibe çavnasê wêjeya Kurdî jî. Loma seba berhevkirina berhemên Kurdî helanan dide Bazîdî û di encama vê de gelek berhemên ku îro bingeha klasîkên wêjeya Kurdî pêktînin di encama vê têkiliyê de ji windabûnê xelas bûne û gihîştine navenda Kurdolojiyê. Lewra Mela Mehmûdê Bazîdî berhema hêja û giranbiha *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, *Yûsif û Zuleyxaya* Selîmê Silêman,

Leyla û Mecnûna Harisê Bedlîsî, *Şêx Sen'anê* Feqiyê Teyran, *Bersîsê Abid û Qewlê Hespê Reş* wekî çîrokî nivîsandine. Piştî A. Jaba ew derbasî alfabeya Latînî kirine, wergerandine Frensî, pêşgotinek ji wan re nivîsandiye û ew ji Akademiya Zanistî ya Petersbûrgê re şandine.¹

Wekî ji vê jî tê fêmkirin Mela Mehmûdê Bazîdî merivekî xwendî û dinyadîtî bû. Ji bilî zimanê Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî jî dizanibû. Di jiyana xwe ya rojane de merivekî çalak bûye, bi karê bazirganiyê re jî mijûl bûye. Lewma civaka xwe gelekî baş nasdikir û çavkaniya adet û baweriyên Kurdan qenc dizanibû. Em vê yekê di "*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*" de bi awayekî eşkere dibînin. Çawa ku me li jor jî qala wê kir Mela Mehmûd merivekî çalak bû, lewma li cem dewleta Osmanî jî merivekî serpêsekinî bû. Di serhildana Mîr Bedîrxan ya di sala 1847an de ji hêla dewleta Osmanî ve ji bo navbeynkariyê bike hatibû şandin. Wekî din meriv pê derdixe ku navbera wî bi Siltan

Wekî ji vê jî tê
fêmkirin Mela
Mehmûdê Bazîdî
merivekî xwendî
û dinyadîtî bû. Ji
bilî zimanê Kurdî,
Erebî, Farisî û Tirkî
jî dizanibû. Di jiyana
xwe ya rojane de
merivekî çalak bûye,
bi karê bazirganiyê
re jî mijûl bûye


1 Ziya Avcı, Mele Mehmûdê Bazîdî,
<http://www.kovarabir.com/mele-mehmude-bazidi-1799-1867>

Evdilmecîd re xweş e. Lewra di "Adat û Rusûmatnameê Ekradiye" de dua dike dibêje edaleta wî berdewam bike. Lê ji ber ku mijara vê nivîsa me ne hûrgiliyên jiyanê Mela Mehmûdê Bazîdî ne em zêde pê de naçin, emê tenê navê berhemên wî bidin û derbasî mijara xwe bibin.

Mela Mehmûdê Bazîdî cara pêşîn pirtûka Şerefexan Bedlisî Şerefnameya ku qala mîrekiyên Kurdan dike ji Farisî wergerandîye Kurdî. Lê li gor ku Ziya Avcî di nivîsa xwe de dibêje, zimanê wê pir baş e û ji bo mirov bikaribe di heqê Kurmanciya wê demê de bibe xwedî fikrekê derfeteke gelekî baş e. Lê di hinek ciyan de di ser mijaran re qeviziye, wergerandine û hinek cî jî bi kurtaşî wergerandine. Ev wergera Mela Mehmûdê Bazîdî ya Şerefnameyê bi pêşgotina Qanadê Kurdo û J. C. Musaelyan ve wekî destxet di sala 1986an de hatiye çapkirin. Di sala 2007an de jî ew destxet ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatiye transkrîbekirin û ji aliyê Weşanxaneyê Spîrêzê ve li Duhokê hatiye weşandin.

Berhemên Mela Mehmûd

Kîtêba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan: Li gor agahiyên heyî, Mela Mehmûdê Bazîdî di vê pirtûka xwe ya ji yazdeh beşan pêk tê de li ser mîrekiyên Kurdan rawestiye û qala bûyerên di navbera salên 1785 û 1857an de qewimîne kiriye. Lê mixabin ev pirtûka ku di sala 1857an de hatiye nivîsîn win-da bûye. Tenê pêşgotina wê ya ji pêncî rûpelî pêk tê ji teref A. Jaba bi bal Frensî ve hatiye wergerandin û em wisa di heqê naveroka wê de dibine xwedî agahî. Hêviya



me ew e ku ev pirtûka bi qasî hezar rûpelî were peydakirin û em jê îstifade bikin.

Adat û Rusûmatnameê Ekradiye: Ev pirtûka Mela Mehmûdê Bazîdî ya herî hêja ye. Lewra herçendî qîlafetê wê piçûk be jî, bi naveroka xwe ve tîr tijî ye û ji bo nasîna civaka Kurd, Adet û kevneşopiyê wan gelekî girîng e. Ev pirtûka hêja jî bi destê A. Jaba bo Frensî hatiye wergerandin. Herwiha di sala 1963an de Rodenko ev pirtûk li Moskovayê bi Ruskî daye weşandin.

Ferhenga Kurdî-Frensî (Dictionnaire Kurde Francais): Ev jî ferhengeke Kurdî û Frensî ye. Mela Mehmûdê Bazîdî û A. Jaba ev berhama bi tevayî amade kirine û çap bûye. Wekî pirtûkên Mela Mehmûd yê din, Kurdiya wê jî bi tîpên Erebi ye.

Ferhenga Kurdî ya Devoka Hekarî-Rewendî: Ev pirtûka piçûk ji 49 rûpelan pêk tê. Mijara wê hinek taybetî û cihêtiyên di navbera devokên Kurmanciya Hekariyê û Rewendiyê de ye. Destxeta wê di sala 1858an de bi destê merivekî bi navê Şehnezer hatiye nivîsîn. Di sala 1858an de Frensiya wê jî hatiye weşandin. Herwiha di sala

1984an de ji teref Prof. Maruf Xeznedar ve hatiye serastkirin û ji nû ve çap bûye.

Ferhenga Kurdî-Rûsî-Frensî û Rûsî-Frensî-Kurdî: Mele Mehmûdê Bazîdî, ji bo amadekirina vê ferhenga Kurdî-Rûsî-Frensî û Rûsî-Frensî-Kurdî alîkariya A. Jaba kiriye. Ev ferhenga ku ji 15.000 kelîman pêk tê mixabin heya îro çap nebûye. Lê tiştê hêviyê dide meriv ew e ku ev pirtûk li Akademiya Zanistî ya Petersbûrgê hatiye parastin. Tê hêvîkirin ku di demeke nêz de were weşandin.

Rêzimana Erebi Bi Zimanê Kurdî: Navê wê yê rastî 'Serf û Be'dê Usûl Lazimeyê Te'lîma Bi Zimanê Kurmancî' ye. Elî Teremaxî (1591-?) di destpêka sedsala 17an de ew nivîsiye. Mele Mehmûdê Bazîdî ew pirtûk li cem melayekî xelkê Hekariyê peyda kiriye, ji nû ve rêkûpêk kiriye, nivîsandiye û pêşgotinek jî jê re amade kiriye.

Cami'iyê Risaleyan û Hikayetan: Ev berhema hêja ya Mele Mehmûdê Bazîdî, ji sê meqale û çil çîrokan pêk hatiye û wekî kitêb bi hev re hatine çapkirin. Ji van hersê gotaran yek qala eşîrên Kurdan dike û der heqê jiyan û adetên wan de agahiyên dide. Di gotara dudan de jî qala heşt şairên Kurdan dike. Gotara sisêyan jî danasîna pirtûka Elî Teremaxî ya der heqê rêzimana Erebi de ye. Beşa dinê ya pirtûkê jî ji çil çîrokên bi îbret pêk tê.

Çavdêriyek li ser Adat û Rusûmatnameê Ekradiye

Di vê nivîsê de armanca me ne ew e ku em qala jiyanê Mela Mehmûdê Bazîdî bikin û yan jî

Wekî din kesê vê pirtûkê bixwîne dikare bi hêsanî di heqê xebatên wan kesên xerîbên li ser berhemên Kurdî bibîne û dibe ku ev yeka ji bo wan bibe helan û li ber van xebatan pozê wan bişewite û şerm bikin

berhemên wî danasînin. Lewma em bi kurtasî qala van dikin û derbasî mijara xwe dibin.

Di meha Gulanê de Weşanên Nûbiharê berhemeke hêja ya ji gencîneya Kurdî derxist-e ronahiyê. Ev berhem *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* ya Mela Mehmûdê Bazîdî ye. Bi rastî Nûbiharê bi jinûvewêşandina klasîkên Kurdî karekî qenc kiriye û bi weşandina vê berhemê jî ev xebata xwe berdewam kiriye. Amadekarî û lêkolîna vê xebatê Jan Dost kiriye. Birêz Jan Dost beriya vê jî li ser Mem û Zîna Ehmedê Xanî xebitîbû û bi Kurmanciya îro di nav Weşanên Avestayê de dabû weşandin. Herwiha bi helbest, roman û çîrokên xwe ve jî tê nasîn. Ev pirtûk nêzîkî 390 rûpelî ye, ji bilî pêşgotinê, wekî sê beşan hatiye amadekirin. Di pêşgotinê de Jan Dost qala xebat û lêkolînên rojhilatnasan yên di barê Kurdistan û Kurdî de dike. Piştî wê behsa jiyan û berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî dike û di barê A. Jaba û têkiliya wî ya bi Mela Mehmûdê Bazîdî re agahiyên dide. Pey vê re li ser xebatên vê berhemê radiweste. Herî dawîn jî qala rêbaz û xebata xwe ya li ser vê berhemê dike. Di beşa pêşîn de tîpguhêziya metnê eslî cih digire û piştî wê jî Kurmanciya wê ya îro tê pêşkêşkirin. Jan Dost ji bo beş û mijar ji hevdu veqetin û baş bîr fêmkirin ji bo her beşekê sernavek daniye û li

ciyên pêwist dîtiye di jêrenotan de şîrove kirine û agahî dane. Seba bingeha van tiştên qala wan tîr kirin werine peyitandin jî şairên Kurd mînak dane. Ev ji bo fêmkirina metnê eslî pir bi kêrî mirov tê. Di beşa dudan de jî lêkolîn û xebatên cihê yên di barê *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* de ji teref kesên cihê cihê ve hatine amadekirin hene. Herwiha ji berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî hinek beş ji bo nimûne hatine dayîn. Ev beşa jî seba xwendevan di heqê dîroka vê xebatê de, girîngiya wê ya di pirtûkxaneyên Kurdî de nîşan dide. Wekî din kesê vê pirtûkê bixwîne dikare bi hêsanî di heqê xebatên wan kesên xerîbên li ser berhemên Kurdî bibîne û dibe ku ev yeka ji bo wan bibe helan û li ber van xebatan pozê wan bişewite û şerm bikin. Di beşa dawîn de bi tîpên Erebi eslî pirtûkê heye. Bi rastî ev beş ji bo kesên dikarin tîpên Erebi bixwînin baş e û ji bo meriv muqayesa navbera metnê bi tîpên Latîni û Erebi bike derfeteke baş e.

Ya rastî beriya vê min *Adat û Rusûmatnameyî Tewayîfî Ekradiye* bihîstibû, bes heta îro ji serî heta dawiyê nexwendibû. Lê gava min ev pirtûk xwend, pirtûk ji bo min bû mîna tiştêkî li erdê dîtî. Çawa meriv tiştêkî xwe winda bike, ji ber vê li ber bikeve û rojekê gava gûr û gumana xwe jê birîbe, bêje êdî nayê dîtin lê

nişka ve derkeve pêşiyê, ya min jî ev mesele ye. Lewra hemû adet û baweriyên qala wan tîr kirin di jiyana min a rojane de derdiketine pêşiya min, di nav gotin û şewran de dihatine bihîstin. Ji van tiştan ezê qala çend heban bikim. Li hêla me Serhedê, dema mezin li ber zarokan bigerin, dê û xwuşk ji bo zarok û birayên xwe yên nexweş dua û laveyan dikin, li ber dilê wan tîr dibêjin ez li dora te bigerim. Gava min ev pirtûk xwend jêdera vê gotinê û tiştê ji vê baweriyê re bûye bingehe ji bo min derkete holê.² Herwiha gava du meriv li ser meseleyekê li hevdu nekin, têkevîne nîqaşê û yan bibezine hevdu, ji wan re tê gotin: Hûn çima dikevîne cînaqê. Gava min ev pirtûk xwend min dît ku ev ji lîstikeke berê di nav Kurdistan de hebûye maye. Li gor vê du meriv hestiyekî du nikul tînin, ango mîna heçî û çetel, her yek bi aliyekî de digre ber bi xwe ve kaş dike. A hestî di destê kê de bişkê ewê din jê dibe. A ev gotina îro di nav Kurmancan de bûye biwêj û ji bo bigirveş û nakokiyên bi mecazî tê bikaranîn.³ Ji van tiştan ezê yeka dawîn jî bêjim bes e. Lewra wisa nebe divê ez ji hemû tiştan re mînakekê bidim, ev jî ji bo nivîsekê ne pêkan e. Dema meriv, hay ji tiştêkî tunebe, di heqê meseleyekê de bibêje ez mezûr im, ji bo parastina xwe dibêje: Çima min pîlê xwe bîr kiriye û min destê xwe bîr kiriye. Di vê pirtûka hêja de jêdera vê jî heye.⁴ Bi rastî ev gotin û adet îro

2 Mela Mehmûdê Beyazîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Jan Dost, r. 102, Nûbihar, Stenbol, 2010.

3 H.b, r. 91.

4 H.b, r. 132.

jî di nav me Kurdan de hene. Lê heya niha kesek li ser nesekeye, mereq nekiriye ka gelo ev çi ye û ji ku derketiye. Piştî min ev xwend min çû ji mezinan pirsî lê tu bersi-veke baş nedane min. Lewma ez vê pirtûkê pêşniyarî hemû Kurdan dikim.

Di vê pirtûka xwe de Mela Mehmûd hemû tişt bêyî guherandin, hema çawa be wisa nivîsîne. Heta di gelek ciyan de dema qala hinek bawerî û adetan dike wana wekî kevneşopiyên cahiliyeyê bi nav dike û rexne jî dike. Ev jî ji bo nixandineke baş rêbazeka qenc e. Ji bilî vê, zimanê berhemê gelekî hêsan e, îro kesekî bixwîne bê zehmetî dikare têbigihîje.

Lê divê ez vê jî bêjim hinek tişt jî wekî umûmî hatine nîşandan, bi baweriya min ev ne rast e. Bo mîna Mela Mehmûd dibêje: Ekserêd Ekradan bi navê dayan têne gazîkirin. Mesela: 'Eloyê Fatimê, Simoyê 'Eyşê, Reşoyê Helê.'⁵ Ya ez dizanim, ne bi piranî lê bi îstisna meriv wisa bi dayika xwe têna nasîn. Ew jî heke bavê wan zû de, hê dema zarok bin miribe û yan jî diya wan jineke wekî mêran be, hukmê wê li ser mêrê wê hebe, wisa jin deng dide û zarokên wê bi wê tên nasîn. Herwiha di mesela kumreşiya mêran ya ji bo dê, xwuşk û jinên xwe de jî wisa mînakên îstisnayî wekî rewşa gelemperî hatiye nîşandan.⁶

Piştî vê ez dixwazim der heqê vê nusxeya hatiye weşandin de jî çend tiştan bêjim. Bi qasî min dît, kesê ev metnê bi tîpên Erebi nivîsiye nehatiye diyarkirin û ne kifş e ka di çi demê

Di vê pirtûka xwe de Mela Mehmûd hemû tişt bêyî guherandin, hema çawa be wisa nivîsîne. Heta di gelek ciyan de dema qala hinek bawerî û adetan dike wana wekî kevneşopiyên cahiliyeyê bi nav dike û rexne jî dike. Ev jî ji bo nixandineke baş rêbazeka qenc e. Ji bilî vê, zimanê berhemê gelekî hêsan e, îro kesekî bixwîne bê zehmetî dikare têbigihîje

de hatiye nivîsîn. Wekî din gelo navê pirtûkê yê resen *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* ye yan *Adat û Rusûmatnameyî Tewayîffî Ekradiye* ye? Ji van kîjan rast e? Herwiha di metnê rastî de navê nivîskar wekî Mela Mehmûdê Beyazîdî hatiye nivîsîn yan Mela Mehmûdê Bazîdî ye? Lewra gelê Bazîdê tu car nabêjin Beyazîdî. Evna bihatana diyarkirin dê baştir bibûya. Li gel vê bi baweriya min divê ew metnê ku tîpguhêziya wê hatiye kirin bêyî şîrove, jêrenot û kevanokên di nav hevokan de bi xurî bihata weşandin, ew şîrove û agahiyên pêwîst di wê beşa ku metin bi Kurdiya îro hatiye pêşkêşkirin bihatana dayîn. Bi vî qaydî xwendekar ê bi tena serê xwe metin bixwenda û ji bo wî derfeta muqayeseya Kurmanciya wê demê û îro derketa holê.

Beriya vê jî me got, jêrenot û şîrove kêrhatî ne. Lê mixabin di hinek ciyan de zimanê hatiye bikaranîn lê nehatiye û bi baweriya min bêhurmetiyeke mezin li muxateb bûye. Bo mînak dema qala jêdera peyva Kurd tê kirin ka gelo ji ku hatiye, wateya wê çi ye, wê çîroka bê bingehe a der heqê Hz. Suleyman û qerwaşên wî tê neqilîkirin: "...di dema Hz. Suleyman de, komek cin bazdane ser kinîze cêriyên Hz. Suleyman...

"⁷ Herweha ev peyv di rûpela 107an de dîsa tê bikaranîn. Bi baweriya min divê ev rîwayeta bê bingehe –ya rastî di heqê esl û zimanê Kurdî de baweriya Mela Mehmûdê Bazîdî ji binî ve xelet e, lê ev ne mijara me ye- bi zimanekî munasib bihata diyarkirin. Lewra ev berhemê cidî û ilmî ye, divê li gor rê û rêbaza wê bihata nivîsîn. Jixwe wekî di vê kitêbê de jî derbas dibe û nivîskar jî ji bavê xwe mînak dide, di civakê de ji bo xebirdan û şêwr bi edeb be, peyvên munasib tên bikaranîn.⁸ Lê wekî îddiaya nivîskar ev ne ji bo neyê fêmkirin, berevajî vê wekî nîşana exlaqekî bilind tê dîtin.

Di rûpela 121an de dema qala zikatê dibe, Jan Dost di heqê zikatê de agahiyê dide û mixabin di wê de xeletiyek kiriye. Ew dibêje: "Li gor şerî'etê, zekata mal, yanî ya pereyan ji sedî bîst û pênc e, ango ji çilî yek e, weke ku Beyazîdî dibêje." Lê ka hûn hesab bikin, ma "ji çilî yek" û ji "sedî bîst û pênc" eynê tişt in? Di hevokê bi xwe de nakokî heye. Ya rast divê ji sedî didu û niv bûya. Ev xeletiyê maddî ye. Dîsa di vê jêrenotê de ji bo çêlekana/dewaran dibêje **pezê**

5 H.b, r. 98.

6 H.b, r. 105.

7 H.b, r. 37.

8 H.b, r. 83.

reş. Bi qasî ez dizanîm ji bo dewa-
ran ango ga, gamêş û çêlekan pez
nayê gotin û herweha ji bo pêz jî
peyva reş nayê bikaranîn, ji bo wê
peyva qer tê gotin.

Di vê pirtûkê de çend tişt
bala min kişandin, ji wan yek
peyva urtê ye ku -wekî orta hati-
ye nivîsîn- tê wateya esl, malbat,
ocax û sulaleyê. Lê di vê lêkolînê
de wekî nîrx û îtibarê hatiye ma-
nekirin. Mîna vê tiştekî din jî di
heqê tewilandina hespan de
derketiye holê. Jan Dost goti-
ye: "Tewîle jî axura hespan e."
Gava meriv vê dixwîne, peyv di
hişê meriv de baş rûnanê. Lew-
ra tewl, tewilandin ji bo li derva,
li çolê nav mêrg û çayiran tên
bikaranîn. Bo mînak dibêjin: Ka
vê sika hespê hilde bibe di nav
wê hêşînahiya han de bitewilîne.
Bi min divê hinekî din jî bihata di-
yarkirin.

Herwekî din di pirtûkê de hi-
nek kêmasî û xeletiyên nivîsê jî
hene. Navên taybet, hinek caran
bi tîpên mezin dest pê dikin û
carna bi yên piçûk. Navek bi çend
awayan hatiye nivîsîn. Bo minak
navê Minorsky di rûpela 7an
de wekî Minorsky, 8an de wekî
Mînorskî û di 99an de jî Mînosrky
hatiye nivîsîn. Di jêrenotan de jî
hinek peyvên tîp ketine, lewma
xelet derketine.

Lê li gel van kêmasiyan dîsa
jî bi saya lêkolîner Jan Dost û
Nûbiharê berhemeke hêja û gi-
ranbiha gihîştîye berdestê me.
Mala wan ava be. Dê keda wan
winda nebe. Bi van nîrxandinan
armanca me tenê ew e ku ev
çewtî di çapên din de werine
serrastkirin û berhemeka tekûz
derkeve holê. ■

Tîr Meh

Jan Ziryan

ji bo mirinên bêwext

av bi çavan diherikî
bi deng diliviya ba
şîn û jîn li cem wî ma

diafirand deryayan
ji kilamên bav û kalan
di sawek dereng de
li bin siya pira stranan
bi çar gavan
weke simbilek tije bêrî
weke keskesorek bi hêvî
hembêz kir avê wî


niha, cêwî ye dil
cêwî!
baranek bi bar
li pê wî!
havînek tamsar
bê wî ye
rojên ne li ba wî
bawî ye!
sûlavên xwekuştî
avên neşûştî
çemên fetisî
li ber bayê wî
li xwe diheyirî
xwezaya heft rengî

qewirandî ye
bi keser e qewmê wî
bi kerbên sedsale
bi welidandinek derengmayî
bi kurmê neşikenandî
bi serê ew latên gurrî
ewê şîn bibe erdê wî

bi avek reng sorî, diherikî
herikîm!
bi ser darên hişkbûyî

li dû wî, bû şîn,
li dû wî, şîn bû dinya!





Bi serokê Komela Nûbiharê re hevpeyvîn

Hevpeyvîn: Paşa Amedî
pasaamedî@gmail.com

Xwendevanên Nûbiharê, di 26ê Adara 2010an de li bajarê Batmanê Komela Nûbiharê ava kirin. Ji wê rojê vir de gelek kar kirine û karên xwe didomînin.

Komela Nûbiharê di konferans û panelên ku di nava şeş mehan de lidarxistiye bi Kurdî dipeyîve û bi malpera xwe jî bi Kurdî difikre û dinivîse, ji ber vana balê dikişîne ser xwe.

Bîrêz Nurî Mehmetoğlu li Batmanê dijî, parêzer e. Xwendevan û hezkiriyê Nûbiharê ye. Mirovekî xîretkêş û hemiyetperwer e, ji hêla dînê Îslamê, çand û zimanê Kurdî ve hestiyar e û di vî karî de jî bi xîret e. Di avakirina Komela Nûbiharê de cih girt û bû sekreterê komelê, paşê jî di kongra komelê de bû serokê Komela Nûbiharê.

Me bi serokê Komela Nûbiharê parêzer Nuri Mehmetoğlu re di heqê komelê de gotûbêjek kir, me hinek pirsên cuda jê kirin û wî jî ew bersivandin.

Paşa Amedî

- Bîrêz parêzer, ewil vebûna komela we pîroz dikim û bi xêr be. Ji kerema xwe hûn dikarin hinekî behsa xwe bikin?

- Ez di sala 1962an de li Batman hatime dinyayê. Piştî min xwendina dibistana seretayî û navîn qedand, di TEK-TEÎAŞê de dest bi kar kir. Paşê min AOF Îqtîsad xwend û di pey re jî min li Zanîngeha Stenbolê Hîqûq xilas kir. Di navbera 1981-2009an de li derve (Riha, Stenbol, Mêrdîn, Amed) mam û 2009an de li Batmanê bi cî bûm û min dest bi parêzeriya serbest kir.

- Vekirina Komela Nûbiharê çawa çêbû?

- Niyeteke me û hevalan hebû ku em bi awayekî nav û dengê Nûbiharê geş bikin û ji aliyê çandê

ve xizmetekê ji gelê xwe re bikin. Bi vê fikrê me li ser avabûna komelê bîryar da. Di avakirina komelê de serokê komelê hevalê me yê mamoste Mehmet Şirin Aslan bû, M. Şirin Aslan di kongreya yekemîn de nebû namzedê rêvebiriyê û hevalan dengê xwe dane min.

- Navê komelê çima "Nûbihar" e?

- Nûbihar bêjeyek Kurdî ye û tê maneya bihara nû, di nav Kurdan de Nûbihara Ehmedê Xanî gelek bi navdar e, car jî di 1992an de mirovên hemiyetperwer bi navê "Nûbihar"ê kovarek derxistin. Ev hejdeh sal e ku kovara Nûbiharê weşana xwe dewam dike û di nav Kurdan de gelek cih girtiye. Nûbihar kovarek pir bi qedr û qîmet e. Li Batmanê gelek mirovan Nûbihar dixwendin

û dixwînin. Em xwendevanên Nûbiharê ne.

- Rol û cihê kovara Nûbiharê di nav Kurdan û bi taybetî jî Kurdên dîndar de cih girtiye û bi qedr e, rola Nûbihar-DERê wê çi bibe û hûn çi difikrin di vî aliyê de?

- Rast e. Rola me ya komelê jî dê qedrê kovara Nûbiharê zêdetir û pêştir bixe, bi komelê em dixwazin bigihîjin gelê xwe. Hêviya me heye ku dê baştir bibe. Beriya niha xwendevanên Nûbiharê yên ku dizanibûn bi Kurdî bixwînin, bi saya komelê wê zêdetir bibin. Bi vî awayî wê çand û zimanê Kurdî pêşdetir here îşellah.

- Di nava komela we û Kovara Nûbiharê de têkiliyek heye yan na?

- Di nava komela me û Kovara Nûbiharê de têkiliyeke organîk tune. Em komeleyeke serbixwe ne. Em wekî sazî ji wan cuda ne û wan jî wek xwe qebûl dikin, ji vî yekê em karin bibêjin ku em bi dilê xwe yek in. Lêbelê ev herdu rêxistin jî hev cuda û serbixwe ne.

- Armancên we çi ne?

- Ez bawer im ku mirov dikare bawerî û çanda xwe bi hev re bijî. Bawerî ne astengê çandê ye û pêşiya çandê nagire. Û Armanca me ew e ku em çand û baweriya xwe bi hevdu re bidin jiyandin. Çanda me çanda Mezrabotan e, baweriya me jî Îslam e. Lê em ne li hemberî tu bawerî û çandan in. Deriyê me jî temamê alema mirovahiyê re vekirî ye, em temamê mirovahiyê hambêz dikin. Lê distûrek me jî heye ku em siyasetê nakin û tevî siyasetan nabin.

- We li bajarê Batmanê li ser çand û perwerdehiyê Nûbihar-DER ava kir, çi hewcehî hebû?

Ez bawer im ku mirov dikare bawerî û çanda xwe bi hev re bijî.

Bawerî ne astengê çandê ye û pêşiya çandê nagire. Û Armanca me ew e ku em çand û baweriya xwe bi hevdu re bidin jiyandin. Çanda me çanda Mezrabotan e, baweriya me jî Îslam e

- Niyeta me ew e ku em bi komela xwe xizmeta gelê xwe bikin li çand, ziman û dîroka gelê xwe xwedî derkevin da ku çanda gel jîndar bibe. Armanca komelê jî ev e.

- Navenda komelê li Batmanê ye, di pêşerojê de hûn difikrin ku li derveyê Batmanê şaxan vekin?

- Hevalên me yên li derveyê Batmanê bixwazin, emê ji wan re şaxan vekin, heta ku ji destê me were emê bi dil û can alî wan jî bikin. Lêbelê şertê me ew e ku xwendevan û hezkiriyên kovara Nûbiharê bin.

Car jî di pêşerojê de li bajarên dinê jî komelên Nûbiharê vebin, em karin bi hevdu re alîkariyê bikin û di demên pêş de federasyon yan konfederasyonê ava bikin, lewra bihevrebûn qewet e.

- We vebûna komelê bi kokteylekê vekir, elaqe gelê Batmanê çawa bû?

- Ji bo vebûna komelê me di salona Şaredariya Batmanê de kokteylek da, mirovên ku me dawet kiribûn tev beşdarî vî kokteylê bûn. Ji komeleyê re

elaqeyek mezin çêbû. Ji me re sipasiyên xwe kirin û serkeftin xwestin. Em jî kêfxweş bûn û me jî spasiyên xwe ji wan re kir.

- Di nav dawetiyan de kî hat beşdariya vî kokteylê bû? Bi kurtî hûn dikarin bibêjin?

- Ji ber ku salon piçûk bû, me gelek mirov dawet nekirin. Me nêzîka çarsed kesî dawet kiribûn û tev beşdariya vî kokteylê bûn, di beşdariya vî kokteylê de wekîlê Şaredariya Batmanê, serok û nûnerên civak û saziyan hatin.

- Piştî vekirin û kokteyla komelê we tu çalakî kirin?

- Avakirina me di bîst û şeşê Adarê de bû, me di diduyê Gulanê de kokteyla xwe ya vebûnê da û me dest bi karên xwe kir. Birêz Suleyman Çevik jî hatibû kokteyla me. Piştî kokteylê, me kongra xwe ya yekemîn çêkir.

Di pêncê Hezîranê de jî me konferansek lidarxist. Mijara me "Îslam û Civak" bû. Prof. Dr. Kadri Yıldırım hat û konferans da. Konferans pir xweş û geş derbas bû. Salon tijî bû. Birêz mamoste Kadri Yıldırım nêzî seet û nîvekê peyivî, dora seetekê jî pirs bersivandin. Konferans bi Kurdî bû û pir elaqaya gel kişand.

- Paşê we hîç çalakî çêkirin yan na?

- Belê; di meha Remezanê de me du heb panel dan. A yekemîn der heqê rojiyê de bû; panelîstên me ji aliyê îbadet, civak û tendirustiyê ve behsa rojiyê kirin. Panêla me ya duyemîn jî der heqê Qur'anê de bû. Di jiyana de Qur'an, peyama Qur'anê û di Qur'anê de mafên mirovan bi her sê alîyan ve hatin axaftin û pirs hatin bersivandin.



Elaqa gel baş bû. Ji bela ku panêlên me bi Kurdî bûn, bêtir elaqe hat nîşandan. Em jî spasîyên xwe ji gelê xwe re pêşkêş dikin.

Ji xeynî panêlan, di nav meha Remezanê de her rojê îr û şemiyê piştî nimêja terawîhê me li naven-da komelê civîn û sohbetên çayê çêdikin. Gelek endam, heval û hogirên me dihatin. Hevdîtinêk xweş çêdibû.

- Di demên pêş de hûnê wekî din çi bikin?

- Li gor xwestin û haziriya me niyeta me heye ku em qursa ziman-nan bidin. Halê hazir di bernama me de qursa zimanê Kurdî, Erebi û Ingilîzî heye, lêbelê wê girîngî li ser zimanê Kurdî be.

Ji xeynî qursan, emê li gorî îmkane xwe panel û konferan-san bidomînin. Di demên pêş de emê çalakiyên xwe berdevam bikin îrşellah.

- Hûnê li ser mijarên çi konfe-rans û panêlan çêbikin?

- Emê der heqê Ehmedê Xanî, Bedîuzzaman Seîdê Kurdî, Rîsaleyên Nûr, Selaheddînê Eyyû-

bî, Mewlana Xalid, Şêx Seîdê Pîranî, Pîrsgirêka Kurd û Mafê mirovan û hwd. de konferansan li dar bixînin.

- Di amadekirina çalakiyan de pisgirêkên we çi ne?

- Pîrsgirêkên me tenê aborî ye. Ne ji aliyê mijar, amadekirin, panelîst û pêşkeşkirina konferan-san, problemeke ku em nikaribin ji holê rakin tune. Lêbelê ji aliyê aboriyê ve kêmasiyên me hene.

- Hûn ji bo roja îro, di ede-biyata Kurdî de çi kêmasiyan dibînin?

- Ez ewil dibêjim ku zimanê Kurdî gelek dewlemend e, lêbelê bê xwedî maye. Wêjeya Kurdî di dîrokê de û di halê hazir de li Turkiyeyê û li Îranê ji sedî deh encax heye, zimanê Kurdî gelek dewlemend e lêbelê xwediye wî tune ye û pere nake.

Ku heta niha bi zimanê Kurdî li dibistanan bihata xwendin û di saziyan de pere bikira zimanê me wê niha gelek pêşketî ba.

Li Kurdistana Başûr niha ge-lek mekteb û zanîngeh vebûne,

ez bawer im ku wê gelekî baş bibe.

- Em mêze dikin ku di dîrokê de çanda Kurdan pêş neketiye, sedemên wê çi ne?

- Di dîrokê de di bajarên Kur-dan de Kurd bi xwe nejiyane û pîrraniyên Kurdan li gundan mane û nexwendine. Li gund ji-yane, karên cotkariyê kirine û bi ajalan mijûl bûne. Di bajarên Kurdan de jî Ermenî, Suryanî, Erebi, Faris û Tirk ji-yane û karê bazirganiyê û bajariyê kirine. Memûrên parêzgehan û saziyên hikûmetê tev ew bûn, di mekte-ban de wan bi Tirkî, Erebi an bi Farisî perwerde kirine.

Di dema Merwaniya de jî em mêze dikin ku zimanê ilmî Erebi ye, li bajarê Heskîfê Erebi ye, heta 60-70 sal berê jî li bajarê Diyarbekirê ziman bi Tirkî bû... nivîs û çanda ku hatiye nivîsandin tev zimanên wan in.

Ustad di dema meşrutiyetê de jî gotiye ku "ji Kurdan hezar yek nikare rojnameyekê bixwîne" ji bo wê zimanê Kurdî û çanda Kur-dan pêş neketiye.

Sedem ev e ku çand, ziman, wêje û dîrok di bin bandora Kîjan dewlet an hikûmetê de be ew dibe zimanê ilmî û her tişt li ser wî ava dibe

Îro li Kurdan mêze dikim ku rewşa Kurdan ji ya gelek miletan baştir e; di salê de nêzî 9-10 zi-man li dinyayê wînda dibin. Lê Kurdan zimanê xwe wînda ne-kirine, mesela Çerkez li Anadolê zimanê xwe wînda kirine û wînda bûne.

Em di pratîkê de paş ketine. Ji bo me Kurdan Kurdewarî çênebûye



ku pirtûkên Kurdî pir bibin.

- Ma ji Kurdan re pirtûkên Kurdî ne hewce bûn ku ji bilî Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran hwd. kesekî ji gelê xwe re tişt nekiriye, çima?

- Sedemê vê rewşê ew e ku zimanê Kurdî di mekteb û zanîngehan de bihata xwendin dê gelê me bi Kurdî binivîsandina, zanyar û alimên me dê Kurdî pêxistibana. Car jî xurtbûna ziman li ser peran e û ziman bi vê qîmet digire. Ên ku bi zimanê Kurdî nivîsandine jî ne ji bo peran, ji xîret û hemiyeta xwe nivîsandine.

Sedemek din jî Kurd ne bajarî ne. Yanê, em ne bajarî ne, em tim li gundan jiyane û li gundan mane. Mesela em nikarin çar bajarên Kurdewarî nîşanê xwe bidin. Di dîrokê de heta şêst heftê sal berê, li bajarê Diyarbekirê Ermenî, Suryanî hebûn li Mûsilê zêde Erep dijiyan li Urmiyê Azeriyan dîrok bi zimanê xwe nivîsîne û pêş de çûne.

- Hûn pirsgirêka Kurd çawa dibînin? Di çareserîya pirsgirêka Kurd de rola komela we dê çi be?

- Wekî milletên din Kurd jî

hene û nayêne înkarkirin, ger Kurd hebe ziman jî heye û çand jî heye. Û ferz e ku Kurd bi zimanê xwe li mekteban bixwînin û çanda xwe pêşbixin, ev mafê mirovan e, xwedîderketina li vê yekê ji baweriyê ye.

Emê wekî Nûbihar-DERê li gor rêznameya armancên xwe, li çanda gelê xwe xwedî derkevin. Ji bo pêşdeçûna gelê me, ji alî çand û perwerdehiye tiştê ji destê me bê emê bikin û wê xebatên me li ser vê rêyê bin.

- Hûn "Vebûna Pirsgirêka Kurd" çawa dibînin?

- Ji bo ku di barê Kurdan û gelek civatên din de gavine baş werine avêtin em baş dibînin. Em "Vebûna Pirsgirêka Kurd" baş dibînin lêbelê hikûmet lê xwedî derneket û bi dawî neanî. Kîjan hikûmet dibe bila bibe, ger gavên baş bavêje emê piştgiriya bidine wan. Em dixwazin ku "pirsgirêka Kurd" zû û bi aştîyê çareser bibe ku mirovên me nemirin. Em daxwazê aştîyê ne.

- Qasê ku ez dizanim, bawerîya gel û civatan tev jî bi Komela Nûbiharê heye û bi we bawer in?

Emê wekî Nûbihar-DERê li gor rêznameya armancên xwe, li çanda gelê xwe xwedî derkevin. Ji bo pêşdeçûna gelê me, ji alî çand û perwerdehiye tiştê ji destê me bê emê bikin û wê xebatên me li ser vê rêyê bin

- Ez jî wisa dibînim. Bawerîya gel bi me heye û bi hêvî ne. Me hîna komela xwe nû vekiriye, gelek mirov tîn seredana me, ji me re serkeftinê dixwazin û spasiya xwe dikin. Çima? Em dîndar in, şakirdê Rîsaleyê Nûr in, çand û zimanê gelê xwe dixwazin û ji gelê xwe re tewsiya dîndariyê dikin. Te-weccuha gel ji me re gelek e.

Car jî kom û civakên Kurdan xwedî çi fikran dibin bila bibin, em gelê xwe hembêz dikin, tu kesî ji xwe re dijmîn nabînin û bi kesî re jî dijmintiyê nakin, cudakerî dijê Kurdewarî û dîne Îslamê ye

- Gelo, mirov dikare bi çi awayî ji we agahdar bibe û bigihîje we?

- Gelê me dikare di ser malpera me re ji me hayedar bibe û bi mailê jî dikarin peyamên xwe bişînin. Ên ku bixwazin emê wan di lista mailên xwe de binivîsin û ji çalakiyan agahdar bikin. Malper: nubiharder.org, mail: nubiharder@gmail.com

- Ji bo bersiv û agahiyên we, pir spas dikim.

- Ez jî spas dikim û Xwedê ji we razî be. ■

Tebax, 2010 - Batman

Eşîrên herêma Botan (I) Eşîra Harûna

M. Munîr Tîmurtaş

Bingeha eşîran, ji malbateke piçûk dest pê dike. Malbat berfireh dibe û dibe çend gund an çend famîle û dibe eşîr. Dema ku qanûnên semawî yan beşerî tunebin an hebin lê hikûm tunebe, wê demê însan bi rêvebiriyên eşîrî xwe îdare dikin û jiyana xwe berdewam dikin. Yanî eşîrî awayekî îdarekirin û birêvebirinê ye. Çimkî her eşîrek axayê wê heye û her gundekî yan her famîlekî malmezîna û rihspiyê wan hene ew jî bi axê ve girêdayî ne. Çi bi mirovatî çî jî bi hovîtî evên hanê di rêvebirinê de ji hevdu re alîkar in.

Qeweta axa, di warê ragirtina hikûmdariya xwe û di danûstandinên xwe de bi xulam û bi çete ye. Li hemberî eşîrên xerîb, eşîr bi tevahî ji hevdu re qewet e. Eşîrî di nav Kurdan de rûmetek e. Kesekî ne eşîr be, nikarê xwe biparêze û mecbûrê bindestiya hinekên di dibe. Wekî di vê demê de kesê ku bê dewlet be nayê naskirin û mehkûmê bindestiyê dimîne. Bindestî bêrûmetî ye, çimkî azadî li wir nîne.

Eşîrî sistemeke kevnare ye ku berî Îslamê jî hebû, di dema Hz.

Muhemmed (s) de jî eşîrî hebû. Di ayetekê de tê gotin: *"Ya Muhemmed tu eşîra xwe ya nêz şiyar bikî."*

Eşîra Harûna

Eşîra Harûna, di herêma Botan de ciyekî xwe yê girîng heye. Ji hêla coxrafiyê ve raserî çemê Dîclê ye. Ev eşîr, ji 20 gundan pêk tê. 12 gund li milekî Dîclê ne û 8 gund li milekî din ê çemê Dîclê ne. Ew 12 gundê li milê navçeya Hezexê ev in:

1-Bafê: Gundekî boş e, nêzî 150 malî ye. Keleheke gund heye jê re dibêjin Keleha Bafê, raserî Dîclê ye. Qesra Elo Dîno jî di tixûbê vî gundî de ye. Gund niha ava ye.

2-Elcanya: Gundekî ji 35 malan pêk tê. Gund ava ye.

3-Eyndar: Gundekî 30 malî ye, lê mixabin niha mîrate ye.

4-Kehniya Reş: Xerabe ye.

5-Cerahî: Xerabe ye.

6-Xerabî: Weke navê xwe xerabe ye.

7-Erese: Xerabe ye.

8-Xerabîkur: Weke navê xwe xerabe ye.

Malbat berfireh dibe û dibe çend gund an çend famîle û dibe eşîr. Dema ku qanûnên semawî yan beşerî tunebin an hebin lê hikûm tunebe, wê demê însan bi rêvebiriyên eşîrî xwe îdare dikin û jiyana xwe berdewam dikin

9-Dînowa: Xerabe ye.

10-Fîtik: Xerabe ye.

11-Xendek: Ev gund niha ji 20 malan pêk tê û ava ye.

12-Hespist: Vê gavê 50 mal e û ava ye.

Ew heşt gundên dîtir girêdayiyê bi navçeya Basa/ Güçlükonak ve ne. Ew jî ev in:

1-Dilopkê. 35 mal e û ava ye.

2- Basa: Di dema Şîrnex bû welayet de ev gundê gelekî boş jî bû navçe. Ji 500 malî zêdetir e. Bi meqamekî ev paytexta Harûna ye.

3-Cêleka: Vê gavê 20 mal tê de ava ne û nêzî 200 malî jî jêveder e.

4-Şehrika: Vê gavê 30 mal tê de hene. Ava ye û nêzî 50 mal jî veder e.

5-Şewê: Ev gund di eslê xwe de mezra Şehrika tête hesabê. Niha 15 mal tê de ava ne û nêzî çil malî jî veder e.

6-Kehniya Hejîrê: Vê gavê 5 mal tê de ava ne û nêzî 100 malî jî veder e.

7-Şikefta Spî: Niha 50 mal tê de ava ne û nêzî 100 malî jî veder in.

8-Gundikê Exmûr: Mixabin Xerabe ye.

Di dema Osmaniyan de Eşîra Harûna girêdayiyê Cizîra Botan bû û danûstandinên wan jî bi Cizîrê bûn. Herêma Harûna bi qasî 30 km. dûrî Cizîrê ye û 45 km. ji çiyayê pîroz Cûdî dûr e. Ew çiyayê ku Hz. Nûh ji Xwedê xwest ku wî li cihekî mubarek deyne û Xwedê jî ew li ser danî.

Debara eşîra Harûna li ser çandinî, rez, pez û karê ji derve ye ku çûne nav Anadolê. Ev gundê me gotin yên xerabûyî yan hindik jê mayîn sebebê wan gelek siyasî ne, hinek jî aborî ne, hinek ji ber neyartîya xwebixwe ne. Eşîra Harûna weke qedera her eşîrê Kurdan ew jî belavbûyî ne. Îro ev eşîr bi zehfî li van bajarên jêr bi cih bûne: Stenbol, Antalya, Mêrsîn, Edene, Ceyhan, Nisêbîn, Hezex, Cizîr, Batman, Entab û jimarek ne hindik jî li Binxetê ne.

Eşîra Harûna di dema mîrê Cizîrê de ji gundê Dîfnê yê ku niha girêdayê Heskîfê ye hatine. Dîfnê, di stratejiya xwe de cihekî girîng e; milekî wê çemê Dicle ye, milê dî newalek kûr e. Di du milê wê re rêyên bazirganiyê derbas dibin; yek li ser çem û ya dî, di bejahiyê re derbas dibe û herdu rêyan jî çavnêr dike.

Di Dîfnê de beg hebûn. Van began zilm û neheqî tê de li hev dikirin û hevdu dikuştin. Mesele, kurê

Harûniya piştî 20 rojî xwe pêkanîn û hatin nêzî Cizîrê. Harûn gote hevalên xwe: Dema em gihîştin Cizîrê û çûne koçka mîr, çekê xwe daneynin, kî bêje we, guhê xwe nedine wan

Harûn yê piçûk begê Dîfnê dikuje û piştî ew bi bira û famîla xwe ve derdikevin û diçin dikevin Şikeftê Siyanê.¹ Li wê derê debara xwe bi pez dikin û ji xwe re reza jî diçînin. Rezên wan çêdibin heta niha jî ji wê derê re dibêjin Rezkê Harûna.

Piştî mayîna Harûniyan di Şikeftê Siyanê de de-meke dirêj hinekên bi wan hayedar çûn gotin mîrê Cizîrê: Hinek ketine şikeftên Siyanê ji zû de li wir in, ma tu pê agahdar î? Mîr dibêje: Na. Mîr radibe du qasidan rêdike. Dibêje: Herin binêrin ka ew kî ne. Çawa gihîştin wê derê qasid pêşiyê diçin liqayî şivanê wan tên. Qasid dibêjin: Çima hûn hatine vê derê? Yek ji qasidan û yek ji şivanan, minaqeşê dikin. Yê şivan berê tivinga xwe ya Kurmancî dide qasid û wî dikuje, yê dîtir direve û tê dibêje: Mîrê min! Mesele ev e; hevalê min kuştin ez jî bi zorê xelas bûm. Mîr vê carê heyeteke bîrbir dişîne û dibêje wan: Bi zanebûn nêzî wan bibin û binêrin ka ew kî ne.

Heyet bi rê dikeve û diçe nêzî şikefta wan dibe. Ji nav xwe yekî dişînin nav malê wan. Dibêje: Eger îzna we hebe me divê em werin aveke we vexwin. Qasid vegeyîya, hat û got: Temam kerem bikin. Heyet çû mala Harûn û rûniştin, qedr û qîmet dane wan. Heyetê ji Harûn pirsî: Tu kî yî? Harûn got: Ez Harûnê bistirî me. Nûnerê heyetê got: Belê, em ji Cizîra Botan hatine, silavê mîr ji we re hene û we gazî firavîneke li Cizîrê dike. Harûn got: Bila ser çawa. Heyet vegeyîya hat Cizîrê.

Harûniya piştî 20 rojî xwe pêkanîn û hatin nêzî Cizîrê. Harûn gote hevalên xwe: Dema em gihîştin Cizîrê û çûne koçka mîr, çekê xwe daneynin, kî bêje we, guhê xwe nedine wan. Hevalê wî gotin, tamam. Dema hatin ber deriyê qesra mîr, xwe dane naskirin û gotin em Harûnî ne. Xeber dane mîr, mîr got bila werin. Xulam û xizmetkaran gotin: Çekê xwe deynin wisa herin, belê Harûniyan guhê xwe nedan kesî û çûn dîwana mîr. Mîr bixêrhatina wan kir û got, ma

1 Siyanê, cihek li ber çemê Dicle ye, nêzî gundê Dîlan e.

Eşîra Harûna bi exlaqê xwe, ji axa, malmezin, feqîr, alima û ji qismê însanên oldar re û bi rêz û hurmet in. Harûnî, merd in, mêvanperwer in, serhişk in û di warê aborî de ne dewlemend in

tu yî Harûnê bi stirî? Harûn got belê. Mîr got: Ma ka stiriyên te? Harûn bihişkayî got hevalên xwe: De rabin ser xwe. Hemû bi hev re rabûn û berê çekên xwe dane mîr. Mîr got: Temam e qeweta mêran stiriyên wan in. Vêca keyfa mîr ji wan re hat û pirsî ma hûn ji ku hatine? Harûn mesela xwe ji serî heta binî ji mîr re got. Mîr gote wan: Ma ka lazimiyeke we yan daxwazeke we heye? Harûn got: Mîrê min! Cihê me teng e, tu cihekî bidî me baş dibe. Mîr got: Dilopkê ji we re ye. Harûn got: Mîrê min! Dilopkê cihekî kêma avê û kaniya wê dilop dilop diherike. Mîr got: Îro dilopekê wê sibe bibê şirik. Gotina mîr piştî 500 salî hate cih.

Harûniyan qebûlîkin, çûn Dilopkê û mîr Bafê ji da wan. Hinek çûn ketin Dilopkê û hinek çûn ketin Bafê. Belê di Bafê de Fileh hebûn. Piştî demeke kin fileh ji Bafê derketin û Bafê bi tevahî ji Harûniyan re ma.

Eşîra Harûna bi exlaqê xwe, ji axa, malmezin, feqîr, alima û ji qismê însanên oldar re û bi rêz û hurmet in. Harûnî, merd in, mêvanperwer in, serhişk in û di warê aborî de ne dewlemend in. Harûnî di axaftina xwe de edîb in yanî dema yek ji Harûniyan bi axave ji bo axaftina xwe piştrast bike, divê wê mesela xwe re mînanekê bixe piştbalgih.²

Harûnî girêdayîbê bi urf û edetê xwe yê wekî cil, xêl, zêw, serdan, hewar, silh û selahet, te'zî, alikarî û dam in.

Eşîra Harûna di nav gelek serhatî û serboriya re derbas bûye; geh şerê eşîrên xerîb, geh şerê xwexwetî, geh nakokiyên wan û yê dewletê:

-Eşîra Çiya, Dêrşewiyan hatin bi ser kozçira axayê Harûna Siloyê Ferho de girtin û ji Geravînê talanê Siloyê Ferho birin. Harûnî li hev kombûn, bi qewetê ke mezin çûn ser Dêrşewiyan de û talanê xwe girtin û yê Dêrşewiyan ji anîn û zivirîn. Neyartî di nava herdu eşîran de dewam kir.

-Şerê ku qewimî di navbera Mala Resûlê Mihemeda û di nav Mala Osmanê Emerê Tanzihî de: Harûnî ji tevî wî şerî bûne û alîkariya Mala Resûlê Mihemeda kirine. Ev ji sebeb merivatiya ji milê jinan ve yan ji ber berjewendiyê xwe.

-Şerê Harûniyan û yê Eşîra Kiça çêbû, 2 zilamê Kiçiya hatin kuştin û sê-çarek hatin birîndarkirin. Şer gelek berfireh bû, eşîrên derdor û bi mela û şêxan ve ketin nava wan û aştî çêkirin, şer temirandin.

-Şerê Harûniya û yê Mema çêbûye. Eşîra Mema li hev kom dibin, li Gundê Hoser yekîtiya xwe çêdikin û dibêjin emê îşev herin ser gundê Harûna ku Bafê ye bigirin û talanê wan binin. Yekî Memî tê malê, zirtê xwe dide ji jina xwe re û dibêje, îşev xêr dewrane serserê mala bavê te Bafê ye. Jinik gelekî aciz dibe. Dema mîrik xwe dixê nav ciyan û radize, ji qehra xewa jinikê nayê. Radibe zaroka xwe têr şîr dike, dawa xwe li xwe dipêçe û wê şevê berê xwe dide Bafê, diçe ber deriyê mala bavê xwe, ji wan re dibêje, mesele ev e û vedigere mala xwe û hê mîrê wê ji xew ranebibû. Mesafa di navbera herdu gundan de 15 km. heye. Bafeyî wê şevê radibin kemînên xwe çêdikin. Memî wextekî şevê yê dereng têne ser Bafê û dikevin kemîna Harûniyan. Vêca ji Memiyan gelek mirov têne kuştin hingî.

Memî vegeriyan û civînek çêkirin û pê derne-xistin bê kê xeber daye wan. Belê çûn dora Hoser meyzandin bê ma dewsek heye; belê heft kirîv, kirine qevzekê, lê nezanîn kî ye. Ev îşaret dide ku jina Harûnî gelekî girêdayê malbata xwe ye.

-Şerê Harûniyan û yê Filehên Hezexê çêbûye. Di vî şerî de gelek însan ji herdu aliyên ve hatine kuştin.

-Şerê Harûniyan yê xwebixwetî di nav Basa û Şikeftesipiya, Dilopkiya û Kehnîhejîrya, Basa û Cêleka, Şehrikiya û Şikeftesipiya û Bafê û Elcanyan de çêbûye.

2 Eşîra Harûna alimên mezin rakirine, weke Mele Remezanê Cêlekî, kurê wî Prof. Dr. Muhemmed Seîd Remezan el-Botî, Dr. Muhemmed Tewfîq el-Botî Harûnî ne. Herwiha Abdulhadi Tîmurtaş ku kitêbên wekî Pêxemberê Ummetê, Şark Alimlêrî û wergerên çend kitêban kirine, M. Ebdurrahîm Tîmurtaş, M. Ehmed Tîmurtaş, M. Ehmed Çelepkulu, M. Ehmed Erdem, M. Elî Çelepkulu, M. Mehmet Pişkin ev yê ji gundê Cêlka ne. Yê vê dema paşî. Ji Basa M. Evdila Aktuğ, M. Mûsa Aktuğ, M. Mehmet Damar, M. Resul Kayran, M. Resul Damar. Ji Şehrika M. Şîrîn Kılıç. Ji Dilopkê M. Xelil.

Di dema Ezdînê Hesama de, ew jî wê demê axayê Harûniya yê milê Hezexê ye, yek bi navê Tetu Îbrahîm, ew jî Harûnî ye kurê Ezdîn dikuje û nexweşî çêdibe. Rojekê Tetu Îbrahîma, li gorî adeta hingî heçî mîrekî bikujê kefenê xwe digire û diçe xwe davêjê mala yê hatî kuştin û dibêje, ev e stûyê min û ev e şûrê we û ev e kefenê min. Wê demê xweyê malê dibêje tu efû û aşîtî çêdibe û bext dikeve nava wan. Belê dema Tetu Îbrahîma diçe mala Ezdîn tu kesî li mala wan nabîne, hema Tetu Îbrahîma diçe di mal de tu kes tune ye xwe tavêje pişt dergûşê qederekê dimîne, dinêre ev e Ezdîn hat. Wekî Ezdîn tê mal û dinêre zilamek li pişt dergûşê ye, Ezdîn dibêje tu kî yî? Tetu dibêje, Mamo ez Tetu Îbrahîma me. Min kurê te kuştî ye û xwe avêtiye pişt dergûşa te û ev e kefenê min û ev e şûrê te. Te bivê min efû ke, te bivê min bikuje. Ezdînê Hesama, dibêje, kuro tuwî te beranê çavreş kuştî û hucûmê dide Tetu. Tetu destê xwe hilnade. Tetu nêrî Ezdîn bêmerîfet rabû wî jî dest hilanî, herdukan xwe avêtin hevdu, hevdu birin anîn, pêre pêre xulamê Ezdîn ji dara tê, hêstira wî barkirî ye ji daran û navê histêrê Xecê ye. Xulam dibêje, ji hêstira xwe re şoo! Ezdîn bangdike xulam, kuro were eve qatîlê beranê çavreş, were arî min û xulam radihêje bivir tê arî Ezdîn. Tetu dikuji û wê rojê pîreka Ezdîn çûye cilan bişo. Dema jina Ezdîn tê malê dinêre ewqa xwîn li wê erdê. Pîreka Ezdîn dibêje, ev çi xwîn e? Ezdîn dibêje: Ez kilê çavê te me, min heyfa beranê çavreş hiland, min Tetu Îbrahîma kuşt. Jina Ezdîn jê dipirse: Tetu hatibû xwe avêtibû mala me û te ew kuşt? Ezdîn dibêje belê. Jina Ezdîn dibêje Ezdîn: Zilam telaqê jina berdidin lê soza Xwedê li min ketibe ezê telaqê te berdim, ez nemînim li vî welatî. Piştî jî diçe û tu kes nîzane ev pîrek bi ku ve çû. Heta niha jî tu kes nîzanê û jina Ezdîn ev bêdaiya hanê kir û got: Eve ez çûm Xweda yeka te neke du. Hê jî ev gotin meşhûre di nava Harûniyan de. Vêca wiha jî têtê gotin ku yeka wî pîsebavkê Ezdînkane nebûye du.

Nakokiya di navbera Harûnan û dewletê de. Dema fermana axa de, Mala Resûlê Mihema heft cendirme kuştibûn û zaten fermana axa jî hatibû. Ew hatin cem Mala Ferho, ew axayê Harûniyên milê Basa ne û yê jî wê derê derbasî Sûrî bibana. Vêca wekî Mala Resûlê Mihema tîne nav Harûna, li wir dimênin heta rêya xwe bibînin. Esker wan dişopîne. Yekê jî gundê Hêma sîxurê devletê ye, tê dibêje, esker: Mala Resûlê Mihema li dora dilopkê ne, werin

ezê cihê wan nîşa hewe bidim. Radibe bi esker re tê, diçin Germikê.³ Dewarê xwe ser avdidin. Wekî diçin Germikê li ber wan bîran hinek sîtilik û teştik hene; Dilopkî pê peze xwe avdidin. Ewê sîxur dibêje, ev firaxê xwarinê ne, esker wan firaxan dibin Dilopkê, gundiyan kom dikin û dibêjin, ev firax yên kê ne? Firax dibin yên şeş mala:

1-Resûlê Çiliya

2-Brahîmê Resûlê Çiliya

3-Yûsufê Xelef

4-Smaîlê Miho. (Eskeran ev her çar li gundê Kehnehejîrê girtin û birin Findikê û li wir kuştin.)

5-Emerê Musa.

6-Mihoyê Emoyê Remo. (Ev herdu li Bamêşê kuştin)

7-Hesenê Eliya. Vî şexsî bazda, esker ew ne-girt.

Piştî hal û rewş nexweş bû, Mala Ferho kelek-kek çêkirin, Seloyê Şemsikî çû ser kelekê û kelek birêket. Eskeran jî milê Torê ve gule berdan kelekê. Selo xwe jî kelekê avêt, kelek bi avê de çû. Hinek hatin kuştin hinek xelas bûn. Li ser kelekê Harûnî jî hebûn û dema esker jî milê Torê ve diavêt, kelek Harûniyan jî bersiv da; ji ber vî qasî zêde kuştî çênebûn. Dema wiha nexweşî derket, mala Ferho jî bazdan çûn Binxetê. Hesenê Eliya jî bazda bi mala Ferho re çû Sûrî. Dema çûn gihîştin xetê, di xetê de şer qewimî, Emerê Ferho, Smaîlê Ferho û Hesenê Smaîlê Ferho di hidûd de hatin kuştin û Sadiq jî hate birîndarkirin. Yê sax man çûn Sûrî, yên hatin kuştin dewletê ew birin veşartin. Dema mala Ferho çûne Sûrî, yekî jî gundê Kehniyahejîrê diçe kewên Siloyê Ferho tîne hinekan serjêdike û dixwe, didu-sisêka jî dibe ji midûrê nahiya Findikê re. Midûrê Findikê jî wan kewan digurîne û dixwe.

Jixwe di despêkê de yekî Hêtmî bûbû sîxur, esker biribûn ser Germikê û çar zilamên Dilopkiyan dabûn kuştin. Dema Mala Ferho li Sûrî bicihdibin kurê Siloyê Ferho Sadiq hingî destgirtiyê Hiznaya keça Mihemê Mîrza, axayê koçerê Dîdêra bû. Sadiq radiibe xwe hazir dike û bi çend pismamên xwe yên çekdar tîne nav Harûnan. Pêşî diçin mala wî zilamê Kehnehejîrî, ewê ku kewê Silo biribûn, digirin. Piyanekê dixin nava agir heta sor dibe û piştî

3 Ewder jî cihekî kevn e, şikeft û bîr tê de hene.

dixin serê wî zilamê Kehnehejîrî. Zilam namire, ji mirinê difilite. Piştî li wî nê Hêtmî digerin, wî bi dest naxin û birayê wî digirin û ji tehtekî tavêjin wî dikujin.

Piştî midetekî Sadiq, li midûrê Findikê digere, wîne kewê Silo serjêkir û xwar. Rojê Sadiq, midur di rêkê de digire û bi xwe re dibe çolê, xwe bi midûr dide nas-kirin û dibêje: Ez Sadiq im. Midûr gelekî ditirsê, Sadiq meşkekê tijî av dike, dide piştî midur û bi xwe re li wan çolan digerîne, gelekî li midur dide û dişîne. Sadiq dibêje midur: Rabe here ser vê darê weke kewan bixwîne. Midûr diçe ser darê weke kewan dixwîne. Sadiq dibêje midur: Seyê kurê se tu bi Tirkî dixwînî, bi Kurdî bixwîne. Welhasil bi gelek awayan midur diêşîne. Midur tobe dike ku heta ew li wê herêmê be zerê nade kesekî, wî diberde û azad dike.

Belê vê carê serfermandarê qereqola Findikê Yehya onbaşî bela xwe ji Sadiq venake û Sadiq dişopîne ku wî bigire. Sadiq dibêje ku terbiyekê nedim vî, ewê zerarekê bide min. Sadiq agahiyê distîne ku wê Yehya onbaşî bi eskerê xwe re here nav Harûnan. Sadiq bi hevalên xwe re diçe piştî ta govê Silêman, çep-rast çeperê xwe çêdikin û dimênin heta Yehya onbaşî tevî eskerên xwe werin û bikevin kemîna Sadiq. Sadiq gazî wan dike û dibêje, çekên xwe deynin. Ew mecbûr dibin ku çekê xwe deynin. Sadiq, wan girêdide û dibe newaleke kûr stiriya bi wan dide komkirin. Yehya onbaşî û esker bi hev ve girêdide û dibêje: Pêlavê xwe derxin. Pêlavê xwe derdixin û bi wan gêra stiriya dike. Hingî dikin hewar û qîrîn, Sadiq guhê xwe nade wan û bi

Çima

Pîrê Kal

Hêj nizamim ez kî me, bê nav û bê xweyî me
Ez bindest û birçî me, ez hêja raketî me
Ez çima şiyar nabim?

Li warê xwe bê cî me, wek mûma pêketî me
Ez sax im, lê mirî me, ez hêja raketî me
Ez çima şiyar nabim?

Welatê min çar par e, yar bindestê neyar e
Alem şad û şiyar e, ez çima raketî me
Ez çima şiyar nabim?

Neyarê me dijwar e, xûnî ye, gurê har e
Jehrî ye koremar e, ez hêja raketî me
Ez çima şiyar nabim?

Zordar bûne hikûmdar, jiyan bûye ar û bar
Ez têkevim axa sar, ez hêja raketî me
Ez çima şiyar nabim?

Gelo ez pîr xirab im, bi gotinê çenabim
Ji cîyê xwe ranabim, ez hêja raketî me
Ez çima şiyar nabim?

Bira ez pur nezan im, ez ji xwe bê guman im
Birîna Kurdistan im, ez hêja raketî me
Ez çima şiyar nabim?

şivika li wan dide; gêrê dewam dike heta dilê Sadiq li wan rehet dibe. Piştî fîşekê wan ji wan distîne, çekên vala dide wan û wan berdide. Ji wê rojê pê de Yehya onbaşî ne Sadiq şopand û ne zarar da kesekî.

Di vî midetî de heft sal derbas bûn hê jî Sadiq bi destgirtî ye û dinya hinekî dî rihettir dibe, Sadiq radibe diçe teslîm dibe û dikeve hepsê. Piştî jî diçe eskeriyê. Eskeriya xwe li navça Stenbolê Çar-

talca dike û dizivire malê. Wekî Sadiq ji eskeriyê dizivire, piştî ku çardeh salî destgirtî dimîne xêlê xwe dike û dizewice. Dema Sadiq dizewice pîreka xwe Hiznê tîne (ji ber ku Sadiq ceza xwariye nikarê bibe muxtar) dike muxtar. Jiyan wiha berdewam dike, heta sala 1984an bi derketina PKKê, zehmetî û zordestî derketinê holê. Sadiq mecbûrê derketinê bû û mala xwe bir Sêrtê, heta li wê derê çû ber rehma Xwedê. ■

Ez mamoste

Hesen Polat

Bi salane dixwînim ku bibim mamoste. Piştî çend mehan xwendina min ya li vir qediya. Min heqê mamostetiyê stend. Îcar mam li benda tayînê. Ecêb dê min tayînî ku derê bikin? Heyecanekê ez girtim, di aliyekî de jî tirsekê. Dema ez tayînî cihekî dûr bibim, ezê çi bikim? Mirov naxwaze ji nas û dostên xwe dûr bikeve. Lê her tişt jî li gor xwestina mirov nîne. Hinek tişt jî ji aliyên hinekan ve mexsûs dijî xwestina mirov tên kirin. Xwezî wisa nebûna. Xwedê kiriye ku cihên ez dixwazim cihên mehrûmîyetê ne. Pir kes naxwazin herin wan deveran mamostetiyê bikin. Loma şensê min heye ku tayîna min a mamostetiyê li gor xwestina min be.

Belê, rojekê muxtarê gundê me nameyek di dest de hat cem bavê min. Got:

-Kek Elî, ez mizgîna xwe dixwazim. Îroj li bajêr ev name dan min. Texmîna min der heqê tayîna kurê te de ye.

Bavê min bersiva wî da û got:

- Mizgîna te mizgîna xêrê be muxtar. Ka em binêrin bê tayîna

wî ji ku re derketiye? Hêvîdar im ku nedabin devereke dûr û xerîb.

Bi rastî heyecanekê ez girtim, bû gulpe gulpa dilê min. Destên min lerizîn. Te digot qey erd ji bin lingên min kişandine û ez wer di hewa de mame. Canê min xwê da, çavên min tarî bûn. Min bi acizî zerfa nameyê vekir û xwend. Ez tayînî gundekî rojhilat ku ne pir dûrî me ye bûbûm. Piçek ruh hate min. Ez bi xwe qet bi wî alî ve neçûbûm. Lê bavê min şukra xwe anî ziman û got:

- Şukir ji Xwedê re. Ez li wan deveran geriyame, bûme mêvan. Ew kesana jî mîna me ne. Pir cihekî dûr jî nîne. Rojên baş û nebaş hene, rojên şahiyê û tengasiyê hene. Mirov di wan rojan de bikare xwe bigihîne hev baş e. Loma ez ji bo cihê tayîna te kêfxweş im. Xwedê duayên dayîka te ya belengaz qebûl kir. Vegeriya aliyê muxtar û jê re got:

- Muxtar bi rastî te jî xelatek baş heq kir. Ezê mizgîna te bê xelat nehêlim.

Ka we carê halê diya min bidîtana. Dema bihîst ku tayîna

Bi rastî heyecanekê ez girtim, bû gulpe gulpa dilê min. Destên min lerizîn. Te digot qey erd ji bin lingên min kişandine û ez wer di hewa de mame. Canê min xwê da, çavên min tarî bûn. Min bi acizî zerfa nameyê vekir û xwend

min derketiye cihekî ne dûr, nezanî çi bike. Xwe li ser çongan da erdê, çû secdê, dûre jî herdu destên xwe rakirin û dua kir, şukiriya xwe anî ziman. Hêsirên çavên wê mîna çilkên baranê rûyên wê dişûştin. Kêfxweşiya wê mîna heyvê di rûyê wê de dihat dîtîn. Ji ber kêfxweşî û kirinên diya min ez kelogirî bûm, dilê min nerm, hemû giraniya li ser min jî belav bû. Min xwe wê demê mîna zarokekî pak û bê xem, mîna perperikek li asîmanan, mîna perek li ser ava golê hîs kir.

Çend roj dû re bavê min pirs kir û got:

- Dema tu bixwazî em dikarin sibe an jî dusibe herin serlêdana wî gundê ku tayîna te lê derketiye. Em hem gund dibînin, hem jî bi rîspiyên gund re nasîtiyê datînin.

Diya min çend roj bûn hêviya xwe ji bavê min birîbû. Dixwest ku rojekê berî roja din der heqê wî gundî de agahdar bibe. Dema ev gotina bavê min bihîst, pir kêfxweş bû. Bi xwe jî dixwest were. Lê bavê min razî nebû. Jê re got:

- Rojên Xwedê neqediyane. Ka lawik bila dest bi kar bike. Em wê demê dikarin herin û çend rojan jî li ba wî bimînin.

Ez û bavê xwe sibehê zû rabûn, ketin rê. Rêwîtiya me ya heya qezaya wî gundî du seat kudand. Em pêşî çûn daîreya Miduriyeta Perwerdê ya Netewî. Me serî li midur da û xwe pê da naskirin. Berî xatirxwestina min midur ji min re got ku:

- Jibîr meke ku tu mamosteyê dewletê yî. Li gor wê divê li hal û hereketên xwe dîqqet bikî, bi gundiyan re wisa zêde semîmî

nebe. Noqteya herî girîng jî ew e ku gerek mamoste di gund de her dem bi Tirkî biaxivin û ji bo axaftina Tirkî çî ji destê wan tê bikin. Ya herî girîng jî axaftina zarokan e. Zarok gerek Tirkî hîn bibin û bi Tirkî biaxivin. Xêrek wî zimanê gundîtiyê ne ji me re, ne jî ji wan re heye. Hin meselên din jî hene. Di heqê wan de emê du rojan berî destpêkirina dibistanan ji we hemû mamosteyên re civînekê çêkin û ji we re biaxivin.

Dû van gotinên midur bîna min teng bû, gumanekê ez girtim. Êdî min zanî ku ev bêbavana tu carî rehetiyê nadin me. Heya niha wek xwendekar çî hat serê min, dê were serê xwendekarên dibistana gund jî. Lê ya herî giran jî ew e ku tiştên bi destên mamosteyên me li me hatin kirin, ji îro şûn de jî dê bi destên me ji xwendekarên me bînin xwestin. Hawar, ev çî ye hatiye serê me! Emê qet rehetiyê nebînin û li gor dilê xwe bi hevûdin re neaxifin. Çire ew tiştên ji xwe re heq dihesibînin ji me re sûc; tiştên xwe yên pê xwe dipesinînin, ji me re şermazar dikin...

Ji bo berdewamiya xwendin û dibistanê înkarkirina kesayeta me ya Kurdî ji me dihat xwestin. Li serî de jî zimanê me yê zikmakî ji me re hatibû qedexekirin. Her roj, her seet, her deqqe pesnê Tirkîtiyê ji me re dihat kirin û dihat xwestin. Ji roja yekemîn a dibistanê û vir ve perwerdehiya me li ser durûtiyê hatiye lidarxistin û hîn jî wisa berdewame. Min hêvî dikir ku ezê di mamostetiya xwe de vê durûtiyê ji holê rakim. Wer tê dîtîn ku ew jî ne bes in, di serde jî ji îro şûn ve ezê bibim failê wê durûtiyê. Xwedêyo! Ev çî hal

e hatiye serê me. Ya hatiye serê me, neyê serê gurên çîyan jî.

Bavê min di gavê de pê hesiya ku tişteki nebaş bi min bûye. Ji min pirsî ku çima rûçikê min guheriye û ez wer bê kêf bûm? Bersiva min mîna her carê kurt bû. Lê wî fêhm kir ku ji min re çî hatiye gotin û ji min çî hatiye xwestin. Vegeriya, ji min re got:

- Kurê min! Me bi zor û zehmet tu dayî xwendin. Me xwest neçariya ku me dît tu nebînî. Hinek tişt pir zora te jî herin gerek tu wisa qebûl bikî. Keda me ji bo pêşeroja te re kiriye nabe ku tu berhewa bikî!

Di vê dudiliyê de em çûn gund. Gundekî piçûk û xweşik bû. Di navbera gundê min û wî gundî de tu ferq mezî tunebû. Gundekî ji gundên Kurdistanê bû. Çend sal bûn ku di vî gundî de dibistan hatibû çêkirin. Piştî vekirina dibistanê kesî bi Tirkî nedizaniyê biaxive. Mêr li eskeriyê hinekî hînî Tirkî bûbûn, lê di gund de her kes bi Kurdî diaxive. Jinên ku bi Tirkî bizanin, bi qandî ez dizanim qet tunebûn. Tenê keç û xortên diçin dibistanê bi Tirkî dizanibûn. De xwelî li serê me Kurdan be. Em bizanin jî, nezanin jî gerek bi Tirkî biaxivin. Kurdî ji me re qedexeyê. Ma qet wisa dibe.

Ez nizamim ku çî bikim? Li aliyekê dilê min dibêje ku: "Nalet li pere û mamostetiya wisa were. Ezê heya kengî vê jiyana durûtiyê bidomînim." Di aliyê din de jî eqelê min dibêje: "Ma te weqasî xwend, tu bûyî mamoste. Êdî tu xwedî meaş î. Ji îroj şûn ve ne şivantî, ne jî gavantî li te tê. Li karê xwe binêre û rehetiya xwe bibîne. Ma rastkirina van şaşîtiyan bi te maye!"

Ax rehetî li ku ye! Ma tu caran ji jiyanekê durûtiyê re rehetî peyda dibe. Zanîna ez dizanim, jiyanê herî zor jiyanek wisa ye. Mirov her dem dudil e û mîna kesekî di nav diranê mengeneyê de tê guvaştin, bi xwe re di şer de ye.

Mehek e ku min di gund de dest bi mamostetiyê kiriye. Ez ji zarokên ji dê û bavekî Kurd re, li gundekî Kurd, mamostetiyê dewleta Tirk dikim. Dewleta ku hemû kesên li Tirkîyê dijîn Tirk qebûl dike û kesên ne Tirk in înkâr dike. Dizane herkes ne Tirk e, lê dixwaze herkesî bike Tirk. Mebêjin ev çer dibe? Ez jî nizamim, lê ji me mamosteyan, ev tê xwestin. Ew tiştên ku di civîna mamosteyan de hatin gotin û dan ber me nayên gotin ku ez li vir ji we re bi lêv bikim.

Bi zilm û zorê tu tiştên baş nayên kirin. Em çî dikin bi xwe dikin, dewlet çî dike bi xwe dike, yanê bi me hemûyan dike. Hinek kes wer bawer dikin ku ji bo berdewamiya dewletê lazîm e ku ev tişt bên kirin. Lêbelê zû û dereng dê ev zilm serê dewletê jî bixwe. Ez vîna wisa bizanîm jî çoyê destê zaliman im. Yanê mamosteyê kiryarê van çewtiyan im. Ez Kurd bim jî, mamosteyekî Tirk im. Û

bi vê durûtiya xwe zarokên delal perwerde dikim. Perwerdeyek derewîn, perwerdeyek çewt, perwerdeyek durû û perwerdeyek li ser înkârê ...

Em di gund de du mamoste ne. Hevalê min bi xwe Tirk e. Berî tayînbûna xwe bi zimanê fermî çî hatibe gotin, ji hemûyan bawer kiriye. Ez dinêrim ku di navbera mehekê de çiqas hat guhertin. Di serî de min ew mîna ajanekî dewletê didît û li ba wî her tim bi rûyê xwe yî derewîn, yanê bi maskeya xwe ya Tirk bi wî re diaxivîm û min xwe wisa nîşan dida. Bi salane ku em Kurdên xwendevan bi maskeyan jiyana xwe didomînin. Niha dibînim ku Kurdên memûr jî nikarin bê maske bijîn.

Hevalê min ê mamoste hêdî hêdî pê hesiya ku Kurd jî min wan mirovên xwedî malbat, xwedî zarok, xwedî mal û kar in. Yek bi yek bi virên fermî yên dewletê hesiya ku rojekê ji min re got:

- Bi rastî ez carna ji xwe şerm dikim. Min jî hebûna Kurdan înkâr dikir, bawer dikir ku di vî welatî de Kurd tunin. Dijmînen Tirkîyê ew kesana xapandîne û kirine bela serê me. Lê niha ez li ba wan dijîm. Pir tiştên di derheqê wan

de ji me re dihatin gotin jî ne rast in. Mirov çer dikane hebûna van însanana înkâr bike, ziman û kultura wan qedexe bike. Bi rastî ev zordestiya li min bihatana kirin ezê jî li hemberî wan rabama. Xwezî di dibistanan de ji dêvla zimanên Ewrûpî dersa zimanê Kurdî ji me re bihatana dayin. Wê demê minê bi dilê xwe bi van rîspiyên gund re sohbet bikira.

Ev gotinên hevalên min hinekî bêhna min fireh kir. Xwezî hemû kes mîna vî hevalê min bi pirsgrîka Kurd bihesiyana. Ez bawer im ku pir kesên Tirk dê rojekê bi derew û înkara dewletê ya fermî bihesin û ji şaşitiyên xwe dûrbikevin. Xwezî ku dereng nebe. Her roj bi van şaşitiyan em hinekî din ji hevûdin dûr dikevin.

- Xwezî em Kurd nehatana înkarkirin, xwezî ziman û kultura Kurdan nehatana qedexekirin, xwezî di dibistanan de dersa Kurdî û Tirkî bi hev re bihatana dayin, xwezî herkesî kariba bi zimanê xwe yî dayikê biaxivîya, xwezî evqas zilm û zorî nehatana kirin. Xwezî ez ne mamosteyekî perwerdeya durûtiyê bûma. Xwezî min jî bikariya bê tirs û xof bi Kurdan re bi zimanê wan biaxivîyama. Xwezî... ■

Sibat 2010, Stuttgart.

Înna lîllahî we îinna îleyhî racîûn

SERSAXÎ

Seydayê hêja **Mela Refik Okumuş** di 11ê meha tebaxa 2010an de li Diyarbekirê çû ber rehma Xwedê.

Em ji Seyda re ji Xwedê rehmê û ji malbata wî re jî sebreke cemîl niyaz dikin. Xwedê wî bi rehma xwe şa bike û bixe bihuşta xwe ya rengîn.

Nûbihar

Şagirdê Bediuzzeman **Mela Yûsif Bildirici** di 16.07.2010an de çû ber rehma Xwedê.

Em ji Seyda re ji Xwedê rehmê û ji malbata wî re jî sebreke cemîl niyaz dikin. Xwedê wî bi rehma xwe şa bike û bixe bihuşta xwe ya rengîn.

Nûbihar

Reşikê Reşikî

Hatîce Mollakendî

haticemollakendi@hotmail.com

Êşên ku însan nekujîn, wî zeximtir dîkin
Nietzsche

Rabû. Jixwe rûniştî jî nebû. Rabû li ruhê nivîsê geriya. Çi bû ku nivîs dixistin berhemên nemir? Gava ku berhemek nemir dihate xwendin, ew çî bû ku porê seriyan dixist wek şûjin? Hêstirên çavan ji ser pala dêman dianî xwarê. Ew çî bû? Nivîs bi çî ruhî bihata nivîsîn sînor gav diavêt? Bi van pirsan li ruhê nivîsê geriya. Dît: Ruhê nivîsê êş bû.

Êş... Serê xwe fetiland û li paş nihêrî: Paşerojê bi xapandineke şewat jan dida... Yar tenê şabûn parvekiribû... Kenî... Derewên xwe parvekiribû. Êş, girîn û xapandin jê re hiştibû... Û pişt dabûyê çûbû. Ji xwe re malek ava kiribû. Malên ku li dû xwe dilên bi nalîn bihêlin çiqas û çawa ava dibin, nizanibû... Yar jê re êş hiştibû.


Kete nava tûrikê xwe yê nivîsan: Ca vê êşê di wan deman de çî bi min daye nivîsîn? Ca yar çiqas bêwefa bûye? Devê tûrikê nivîsan bi heft bendên zexim girêdabû. Vekir... Yek êş yek êş vekir. Her nivîs êşek bû, xwend... Şefeq dût ket bi her nivîsê re. Tarîti giran bû... Ji bo şevan tav hebû gelo? Gazî peyvan kir: Gilgazinek li dar xist û bang li Frantz Fanon kir:

-Ey Mamê Fanon, tava min a vê şevê! Tu di pirtûka xwe de bi nalîn behsa reşikiya xwe û

sosyopsikolojiya gelê xwe dikî.* Tu dildax dibî ji bo ku qewmê te tê bişaftin. Ji bo ku amade ne ji asîmilasyonê re. Qewmê min û qewmê te di wan mijaran de dişibin hev. Na, naşibin hev! Dewsa hev digirin. Min ji her hevoka te "zencî" derxist, "Kurd" danî şûnê. Eynî wate derket. Êşa ku li te dida, li min jî da. Lê tu tenê reşik î Mamê Fanon. Ez reşikê reşikî im. Yanê ji qewmek bindest im, ji qewmek reşik im. Di nava wî gelê bindest de jî bindest im. Lewra keç im. Bindestê bindestan im. Reşikê reşikî im. Tu qet di nava reşikî de bûyî jin, gelo? Tu qet bûyî reşikê reşikî? Tu çiqas însan bûyayî jî, tu tenê bi cinsiyetê hatî pîvandî? Nivîsên te yên evîne, ji bo ku tu keç î, bi awayekî sergirtî hatin qedexekirin? Te qe yar ji nav reşikî hilbijart gelo? Yar bi gavên xwe yên reş û qirêj hate ber bi te ve? Ku tu reşikê reşikî bûyayî, te yê çawa binivîsanda? Ez çiqas pênûsa xwe tûj bikim, ku qelema min rojek bû şûr, bila pêşî serê reşikiyê bifirîne yan serê reşika reşikiyê?

Ku kela dilê xwe bi ser Fanon de rijand, nivîsek din jî, êşek din jî ji tûrikê xwe derxist û xwend: "Em bidin xatirê dilê min ê dilsoz, em hevdu jibîr nekin. Tenê jibîr

Min ji her hevoka te "zencî" derxist, "Kurd" danî şûnê. Eynî wate derket. Êşa ku li te dida, li min jî da. Lê tu tenê reşik î Mamê Fanon. Ez reşikê reşikî im. Yanê ji qewmek bindest im, ji qewmek reşik im

Frantz
Fanon

nekin; Wek payîzeke zipîziwa... Wek dareke belg zer... Wek rojek ber êvarî... Wek xatirxwestineke melal... Wek çûyînek bêveger... Tu kesî qasê te di dilê min de rê nekudand. Kesî qasê min di dilê te de rê?! Nizanim. Na na, dizanim! Lê ji min re çi dilê! Dudiliya te û du evînên te. Herkes bi eyna dilê xwe û bi ola xwe beşdarê evînê dibe. Ji min re çi durûtiya dilê te! Tu kesî qasê te di dilê min de rê nekudand. Were xewna min, bila şabim. Ez kîjan deriyî vekim, kîjan deriyî, kî li min veke, tunebûna te sîleke zexim e li rûyê min dikeve. Agir ji ber dijene û min li erdê dixê. Nava xwelî û xubarê de di-pilpitim. Dixeriqim û ji xwe diçim. Xewek şîrîn dikeve çavên min. Di xewnê de te nabînim; xewn li min dibe tofan. Xew li min diherime. Tu li ku derê yî, were. Were xewna min ku rabim, ku şabim.

Ez li benda gulvedana darekê bûm: Dê bihar bihata. Dê darekê gul vedaya. Tu dê bihatayê. Te her zivistan wisa digot. Her zivistan li benda gulvedana darekê bûm. Li benda biharê bûm. Bihar çi-qas dereng hat. Te çi-qas dirêj, qirêj û geremol kir gotinên xwe yên evînê. Ew bihar nehat. Tu

nehatî. Te qet ez amade nekirim ji nehatina wê biharê re. Lê tu nehatî; kesên ku bi xwe nebin, nikarin berpirsiyariya gavên xwe jî hildin. Wijdan li ba wan miriye. Ew tenê laş in. Laşê wan zindî ye. Lê ne muhîm e. Mezlûm, delalîkê kesên bêkesan in. Kesê bêkesan, nalînan jî dibihîze. Bi rev tê he-wariya nalînan. Eşq, dilopek ji navê wî yê Wedûd e. Gava min dengê te seh dikir, dinya tev bi bêhna gulan bêhn dida. Navê Wedûd di dilê min de çiq û şax dida. Wêneyê te yên ku te ji min re şandibûn, min rojekê ew bilind kirin û nîşanî rebbê xwe da. Min got: Rebbê min, ha vaye yê ku bi dilê xwe ve tê ba dilê min. Dilê min dilek rezîl nîne. Dilek dilsoz e. Dilek bi bext e... Em qasê êşa xwe mirov in. Qasê xemsariya xwe jî ji mirovatîyê dûr in, hov in. Ma meriv dikare hemû tiştî bike, hemû tiştî bêje lê paşê jî mina qet tu tiştek di navberê de derbas nebûbe, meriv dikare pişt bide hev? Evî ez ji te hîn bûm, berdilê min. Min dixwest min jî hinek tişt hînî te bikirana: Rastîyê, bêrîkirinê, şermê, evînê... Min dixwest min evîna Muhemmed û Xedîce hînê te bikira mesela. Min dixwest min Xedîce hînê te bikira. Muhemmedê Emîn û dadperwer û Xedîca serbilind û heqnas mesela.

Bila rojek tîlên porê te yê weşiyayî bihejin. Ji wan hejan bayek çêbe. Bila ew ba bi aliyê mala min ve were. Ez jî derî û kulekan vekim jî bo ku bayê porên te bikeve hundir. Ku ma qasek bikeve hundir, tu berê bayê bide bi cihekî din ve, berdilê min. Û here. Lê jibîr neke: Gava min dengê te seh dikir, dinya tev bi bêhna gulan bêhn dida. Lê aniha êdî gul jî bêhn nadin. Kesera te di rûyê erdê de jî bi cih nabe. Berî daye ezmanan û hilpask dibe. Wa dorpêç kir asoya

min... Û "Min tu dît!

Min tu dîtî, ronîbû roja min

Min tu dîtî, refek kevok firiyan ezmanan

Min tu dîtî, keriyê xezalan hat ser avê

Min tu dîtî, gul û reyhan rabûn ser piyan**

Nivîs xilas. Lê girîn û îskeîska wê hêj hebû. Çaxmax vêxist. Nivîs da ser agir. Eşq şewitî. Bû pizot... Pizota reş. Êş ma. "çima" yên wê destpê kirin. Çima tovê van hîsan reşand dilê min? Evan tovan bi şev, bi roj xweyî kir. Tov şîn bûn. Her liba tovê bû hîsek. Her hîs bû nivîsek. Her nivîs qasê ku bibe pirtûkek kûr bû. Kûr çû, dûr ket... Min jî nivîsand. Û yar piştta xwe da min û çû. Çima hatibû naxwe? Çima derê dilê min, derê mala min vekir? Li oda pembe rûnişt, çima? Gava ku dilpakî û dilsoziya min dilewitand, qet ji Xwedê şerm nedikir? Wijdan xwe aniha çawa dide sikûtîkirin? Çima hêvî hilda, lêbelê êş firot! Ku ev zilm di dewra sehaban de bihata kirin, ji bo vê zilmê dê çend ayet nazil bibûna? Însan çawa tenê dibe laş? Li bersiva van pirsan digeriya... Digiriya: Disincirî... Şev nezîkî berbangê bû. Berbang ber bi vejîneke azad û serfiraz ve direwiqî?...■

* Frantz Fanon: Siyah Deri Beyaz Maske

** Ali karadeniz: Şopa Pinpinîkê, Nûbihar, jmr: 91

Çîrokek ji Kabûsname, Îskender bîn Kavûs (Keykavûs)

Ji Farisî: Mihemed Jiyan

Di rojêke zivistanê ya sar de, melayek ji bo kirina nimêjê ber bi camiyê ve dimeşîya. Di hewşa camiyê de sekinî û ji bo ku xwe hinekî germ bike, xwe da ber tîrêjên rojê.

Li hemberî wî çar kurik rûniştibûn û firavîn dixwarin.

Kurikê yekem nan û helaw dixwar. Kurikê duyem û yê sêyem nan û penêr dixwarin. Kurikê çarem jî tenê nan dixwar.

Kurikê duyem ji kurikê yekem yê ku nan û helaw dixwar pirsî: "Gelo tu hinekî helawê nadî min?"

Kurikê biçûk bersiva wî da: "Eger tu ji bo min wekî kûçik bikî ewte ewt, ezê helawê bidime te." Wî jî kire ewte ewt û hinek helaw jê stend.

Kurikê sêyem jî got: "Ez jî helawê dixwazim, helawê bide min jî."

Kurikê gote wî: "Heke tu bibî kerê min û ji bo min wekî kerê bizirî, ezê helawê bidime te."

Wî kurikê jî hem xwe daqûl kir û hem jî mînanî kerê ziriya. Li ser vê yekê kurikê biçûk helaw da wî jî.

Kurikê çarem yê ku tenê nan dixwar, gotê: "Madem ku te helaw da du kesan, hinekî bide min jî."

Kurikê biçûk gotê: "Heke tu bibî

pisîka min û ji bo min bikî miyaw miyaw, ezê helawê bidime te."

Kurikê çarem gotê: "Nexêr, ez naxwazim bibim heywanê tu kesî, tu dibînî ku ez însan im, heke tu bikaribî, helawê bide hemû însanan."

Kurikê biçûk gotê: "Nabe, heke tu helawê dixwazî, divê tu bibî pisîka min."

Di wê gavê de çavê kurik bi mela ket, nêrî ku bala wî li ser wan e. Ji wî pirsî: "Seyda, li gorî we meriv helawê bixwe û bibe heywanê yekî din baştir e, an meriv helawê nexwe û însan bimîne baştir e?"

Mela gotê: "Ez nizanim çi bêjime te delalê min. Çimkî hûn zarok in, hûn bi hev re dilîzin. Lêbelê ya baştir ew e tu bizanibî ku ev sî sal e min helaw nexwariye. Vaye tu dibînî ku ez wekî mirovan mame. Însanên herî xweşbext jî, hê hurmetê şanî min didin. Lêbelê cîranekî min yê pir zengîn heye, her roj helawê dixwe. Belam tu kes hurmetê şanî wî nade."

Kurik got: "Naxwe ez jî helawê naxwim. Ezê her tim nanê tîsî bixwim û nabim heywanê tu kesî. Mafir wextê meriv sî salî helawê nexwe jî tiştêk nabe, wê demê meriv dikare sed salî jî nexwe!...■

Bexçey bi gulan a Medîne bi to ya weş a

Ö. Faruk Çetinkaplan

I.

Mazûbanê ma ti yê
Çend şewî yê meymañê to ya ez

Cila to sero
Ne vêşan menda ne zî teyšan
Comerdeya to şalanê ma sero ya
Gulan ra boya areqê to yena
Muhebbetê to kewto kuçanê Medîna ser
Sey şewrayênda wesarî
Serê zeriya ma de çitê çimî roşenê
Tiya de
Ser diwês mengî wesar
Û
Pancêsê menga gulan a

Mu'mînî to sero benê yew can/yew beden
To tenya nêverdanê şew/roj
Dinya to sero arêbyena
Sûr
Sipe
Siya
Esmer
Pêro tiya dê
Helqêya rengîn viraşta mu'mînan
Qelbê dinya tiya de erzeno

Dengizî miyan de çilkêna
Qelbê aşiqan tiya de erzeno
Dorçoşmê to de ronîştê duay kenê
Qur'an wanenê
Hêsrar varnenê cila to ser
Gunayan rijnenê
Şoyenê roj bi roj
Sersiya to bindi yaxerên vareno
Hêsr û yaxerî kewnê têmiyan
Hendê qeçekên şên
Hendê bewranên şenik a ewro

Tiyanan di xerîbî nêkena zerî
Sinasnayê ma yew ti yê
Xerîbî zî bi to ya weşa ya Muhammed!

II.

Şermayena
Muy ro mi benê cax caxî
Giran giran hewadana linga
Bi şerma yena
Mi qarşûya qubbet-ul hadra
Çimanê xo to ra nimnena
Aşiqêko bêwefa ya
Sozê xo de bêqerar a
Kîştê ra şerm /kîştê ra heyecan
Eza yena
Kêberanê xo ak Ya Resûlellah!

Kêberê mescîdê to nêhumarênê
Minaran, destê xo akerdê vera asmenan

Mescîdê to di qeçekên bermenon
Ti yenê mi vîrî Ya Nebî!
Qeçê bê pî û may, pawokê destanê to yê
Destê kokimê, to dest de telesî vînenê

Sûka Medîna di çim çarnena ummet
Kewta şopa linganê to
Gêrena xatiranê to

Bexçey bi gulan a
Medîne bi to ya weş a Ya Resûlellah!

Mescîdê to de
Sereyê xo ronana secde
Boya binê linganê to ancena xo zerre
Tiyê ma serra çim çarnenê
Pawokê meymananê xo yê
Ez zana

Kîştê to de, di rikatî nimaj
Bergendê malê dinya yo
Nefesî benê muqeddes
Her nefes/her gam/
her nezer ma rê muqeddes

III.

Ya nebiyyo muhterem!

Roja mehşerî mi xo vîr ra meki
Kêberê to ver de, şekalêna
Şekalênda vîndîbiyaye ya
Ma xo vîr ra meki
Ummet heyran! Ez qurban!

Huzûrê Ellay de
Şewa mî'racî de
To bi namê kâinat a
Bi wekîleya 'erd û asmen a
Bi ziwano şîrîn
Û zerrî ra
-"Ettehiyyat û selat û selam to rê ya Rabbel
'Alemîn!"
Ez zî bi wekîleya dost û embazanê xo ya
Bi nameyê ma û pêr dê xo ya
Bi nameyê way û biraran a
Bi nameyê qeç û qûlanê xo ya
Mi to rê selat û selamî ardî welat ra
Welatê Îbrahîm Xelîlî ra
Welatê Seleheddîn û Seîdan ra
Welatê dîjle û feratî ra

IV.

Koyê Uhûdî xerîb mendo nê êjan de
Roja herbî ra yo ke
Xewf û tersê kewto Uhûdî
Lerze kewto ey gân
Dindan şikiyayo, lew dirbetyayo
Qeyamdo biqlayose do ewro biqlayo
Meymano 'ezîz xo eşto kêberê Ellay
Bi şefqet û hurmet a qebûl kerdo Uhûdî
Xewf û tersên kewto Uhûdî
Hana
Teliyan sero yo Uhûd

Kişte ra şîn tepişto
Şehîdî kerdê xo virar
Hana bermeno Uhûd
Şînê şehîdanê xo keno
Qehiryaye yo /bikeder o
Hewrê siyay girêdayê çarqirne

"Uhûd ma ra hes keno
Ma uhûdî ra hes kenê."
Pesnê ey dayo Pêxemberî

V.

Ma do meştêrî ray kewê
Yanê to ra dûrî kewê
Bi rojan a
Bi mangan a to ra dûrî
Kes kelegirî beno
Kê qirdi çiyê manena
Sey qeçekên do bermok
Hêrsî bixoy benê rêzil
Bêzerrî erzena gaman

Ez zana
Ti hucra di tenya niyê
Dostê toyê qedîmî
Ebûbekir
Ömer
Osman
Ti tenya niyê
Ti hucra di zî niyê

Tewa xurbetî dekewena mi pîze
Ma do şîrê
To ra dûrî de
Çolû çîyan de
Vergan miyan de

Ronişta
Mi çogî şikîto to qarşûya
Seat; diwêse şew a
Hewnêdo şîrin da
Verê kêberê hucraya to ya
Pêxemberî meymanê to yê daîm

Kêberê to vero şîra hewna
Hewnêko şîrin de raştê to bêra
Destê mi to dest de bê
Ez
Hendê qeçekên şên ba
Sereyê xo rona verê êşîga to
Îmbiryanê sehabandê to ba
Dunya mi çim de bêrc kertên de vîndero
Sivîngalê bananê to ser bewranê ba
Û biperra vera asmenan

Medîna-2009

Ji çanda Kurdî hin navên li ber windabûnê

Dilazad ART

dilazadart@gmail.com

Ç

and malê gel e. Bi qasî kurahiya çanda xwe mirov dibin netew. Rastiyeke jiyanê ye ku çand, li gor dem û waran tê guhertin. Mirov heta bêjeyekê avadike an sazdikeye gelek dem dibihurin. Her bêjeyek berhema mêjiyekî giran e. Bi pêşketina zanistê mirov roj bi roj bêjeyên xwe yên kevin jibîrdikin. Ev di navbera dîrok û jiyana rojanê de tengasiyê derdixe. Ango nîfşê nû ji berhemên bav û kalên xwe tiştêkî fêr nakin. Ev di dîroka netewan de dibe xeleta winda.

Gelek bêjeyên Kurdan hene ku li ber windabûnê ne. Her alav an torekeye nû ku derdikeve ji bo ku bi navkin li navên nû digerin. Zimanekî çêkirî avadikin. Ev zimanê çêkirî zimanekî bi zorê ye ne ku zimanekî siruştî ye. Ev rastiya jiyanê divê neyê jibîrkin. Her alava nû li gora ku karê dibîne divê were binavkirin. Bi vî awayî dewlemendiya ziman winda nabe.

Ferhengsazî di jiyana netewan mirovan de cihêkî gelek girîng digire. Ji ber vîna ye ku netewên bê ferheng li ber windabûnê ne. Bi vî armancê, min hin bêjeyên ku li ber windabûnê ne ji devê dê, bav, bira û xwişkên xwe girtin û nivîsîn. Ez hêvîdar im ku bêjeyên di ferhengan de cih negirtine ji îro pê ve di ferhengên Kurdî de cih bigirin.

Navên listikên me

Şûpelik

Heramê Qurçê

Xar

Qaqlîkê Reşko

Kerko Kerko Kê Tu Ajotî

Hingulîsk



Perê Dîwara	Destar	Kardî	Cirît
Leşker û Qaçax	Tenûr	Qîfal	Kahrê Aziba
Derbik	Cirn û Mîrkut	Pîşkulk	Mewlid
Kerkê Dirêj	Êtûn	Şinêrek	Hina
Pîp	Tifik	Tûzik	Zarfê Pera
Qışto	Gindor	Kelbêş	Xelatkirina Bûk û
Qaluç	Teşî	Sersîpîk	Zavê
Xwişk	Kurtan	Strîzerk	Ser Sibahiya Bûkê
Benkê Xalo	Arzêl		
Qoncalk	Kolik	Çend kevneşopiyên	Alavên cot
Haftik	Kaloka Şe'ra	dawetên me	Halet
Sîtilk		Darikê Zavê	Gêsin
Pîra Mast	Navên giyayên me	Sevilkê Bûkê	Şira
Qafik	Kereng	Pîşt Dêrî	Bosta
Gur û Mirîşk	Gurîz	Ser Sebat	Mijane
Xwişka Fileha	Surim	Revandina Şekala	Nîr
Kab	Pîrpar	Bûkê	Umbûr
Çavgirtînk	Xerdel	Revandina Desmalka	Bermilk
	Gezgezk	Zavê	Misas ■
Alavên	Tolik	Ser Doşek	
kevneşopiyên me	Şoqil	Rê Girtin	

04.09.2010

Nisêbîn

Jiyana me ya xewn

Bargiran Şanaz

Xewnên xwe bike gotin

Û

Bireşîne ser lêvên min

Her şev jîn dibe bayek

Û

Li dilê te diwere sar, seqem

Dibaye çar mil şîneşîn

Û

Du dil dibayin ber banga sibê

Ji asoyan tîn

Ji tîkiliyên kurmî tîn

Tu wan digevizînî

Û

Paşê wan saf dikî

Dikî bendera mirinan

Xwestinan bi milekî ve

Û

Tirsan bi milekî ve diavêjî

Dibînim û dibêjî

Hem seeta te xweş

Ez her dem di nava hêviyan de me

Sor im û ji lêvan sortir

Ji alayeke nehatî aliqî çêbûme

Û

Bayên xewna te jî, nikarin min

bihejînin

Te zanî dimila xeydok

29.08.10

Wexta ez zarok bûm

Harun Aykaç

W

ext dihat nêzî esrê, du zarokên pismamê hev li ber berxan bûn û berx diçêrandin. Bavê yekî li gund, yê din jî li Almanyayê bû. Dem, demsala havînê bû. Çêre jî pir li ser erdê nemabû. Yê ku li ser erdê mabû jî pez û dewaran hêdî hêdî bi devê xwe rûçikandibûn. Weke her tişt tevlihev bûbû. Şahî û xemgînî dest dabûn hev. Bi nêrînên zarokan her tişt gelek hêsan bû. Mirin tune, hebe jî mirov çend seeta diçe gorê dîsa tê cem xizmên xwe û malbata xwe. Wexta ew tiştêkî bînin bîra xwe ew tişt dê di wê demê de were holê. Belê ew lehengên me yê jîr hîn nizanîbûn asîman xeyal in, erd jî tiştên rast û teqez in.

Ji wan lehengên me yê ku navê wî Cegerxwîn bû, ji pismamê xwe Talib re got: "Talib, tu dibînî ji binê gund teqsiyeke spî tê li serê tabût heye!" Talib jî heyirî mabû û li teqsiyê dinêrî. Li ser vê bûyerê Cegerxwîn xwe negirt û bi rev berê xwe da gund.

Di wê demê de ji gundê Çawirma Xelîl Axa du mirov li nexweşxanê bûn. Yê yekem Apê Etîk Axa ew jî nêzî şêst yan jî heftê

salî bû. Ya duyemîn jî dayika Cegerxwîn bû. Ew jî sî yan jî sî û pênc salî bû. Gelek hêvî û xeyalên wê hebûn. Wê Stenbol dîtibû û demekê li wir jiyabû. Di nav gund de pir dihate hezkirin. Hîna ji mala tiyê xwe cihê nebûbû, di van deman de û karên malê herî zêde wê dikir. Diçû bêriyê, ji derve ji bo xwarin, vexwarinê û şûştinê av dianî. Cil û bergên malê giş bi destê xwe dişûştin. Şîrê malê dîkeland û di nav mişkê de dibir û dianî dikir rûn û toraq. Qederê salek bû ji mala tiyê xwe cihê bûbû. Maleka nû ava kiribû. Wek zarokan bi kelajan bû, li derûdora mala xwe dihat û diçû. Zilamê wê li Stenbolê xanî û dikan kirîbû. Ji cîranên xwe re digot: "Ezê herim Stenbolê, ji bo zilamê xwe û zarokên xwe jiyaneke nû ava bikim. Bila zarokên min bixwînin bibin karmend." Di vê demê de ducanî bû. Li benda qîzekê bû. Ji cîranên xwe re digot: "Ezê qîza xwe bidim xwendin. Bila bibe karmend navê wê jî Fewziye be."

Di wan rojan de lawikê wê Cegerxwîn li derve bi hinek kesan re şer dikir. Dîsa rojeke vî şerûdî bû. Bi qêrîn û werîna wî re

Ji wan lehengên me yê ku navê wî Cegerxwîn bû, ji pismamê xwe Talib re got: "Talib, tu dibînî ji binê gund teqsiyeke spî tê li serê tabût heye!" Talib jî heyirî mabû û li teqsiyê dinêrî

dayîka delal bi halê hemlebûne xwe davêje jêr, laşê xwe gelek diêşîne û gelek xwînê winda dike. Kesekî wê bibe nexweşxanê jî di vê demê de tune ye. Çend roj şûn de apê Cegerxwîn ji Stenbolê tê û bûka xwe Feryaz dibe ser bijîşk. Cegerxwîn direviya nav gund û berê xwe dida mala Apê Etîk, xwe bi xwe digot: "Ev tabuta li ser teqsiyê gelo ya wî ye." Lê malxirabo nizanibû ku dê ew teqî demek şûn de here li ber mala wî bisekine.

Dûv re Cegerxwîn hinekî sekinî, bala xwe da teqsiya bi tabût, dît ku ew li ber mala wan e. Xaltî, amojîn, ap û cîranên wî digirin, xwe dipêrtînin. Ji wî re jî dibêjin: "Ronîya çavên dayika xwe êdî ma

stûxwar" lê ne xema Cegerxwîn e. Li gor wî mirin lîstîkek e. Wexta ku mirov dimire demekê di gorê de dimîne û dîsa tê nav malbat û civata xwe. Wê rojê wî dîsa têra xwe lîst. Carekê xaltîka wî hat destê wî girt û bir ber teneşoya dayika hêja. Dayika wî navê wê Feryaz bû. Laşê wê pir raweste û sar bû. Ji Cegerxwîn re gotin: "Bexikê min ê delal dayika xwe cara dawî jî maç bike dibe ku ji vir şûn de tu wê nebinî." Cegerxwîn bi gotina mezinên xwe kir, laşê dayika xwe yê sar maç kir û vegeriya ser lîstika.

Pîştî merasima veşartinê her kes belav bû û çûn mala xwe. Lê şev tarî bûbû, wext jî pir dereng bû, zikê wî jî birçî bûbû. Berê xwe

da malê çû li derî xist. Pir li ber derî sekinî, li bendê bû ku dayika wî were derî lê veke. Lê dayika wî tu carî nehat, destê wî negirt û zikê wî yê birçî jî têr nekir. Qudûmê wî şikiyabûn, hêviyên wî nemabûn, fêr kiribû ku yên bimirin ji wir şûn de nayên dinê. Bi seetan giriya û di nav xweliya tenûre de hetta nivê şevê çû û hat.

Wexta yek dimire, gel dibêje "Kî li zarokan dinêre?" Lê mirov nizanin ku kê ew şandibin dinê, yê li wan binêre û biparêze jî ew e. Belê, Xweda kire nesîb, Cegerxwîn jî xwend Fewziye jî. Herdu jî bûn mamosteyên ziman û wêjeya Tirkî... ■

Ez te dibînim

Kenanê Nado

Ez te du deman de dibînim.
Yek pir melûlî bû,
Yek jî şayînedar


Ez te du cihan de dibînim.
Yek zehf tarî bû,
Yek jî ronî

Ez te du xeyalan de dibînim.
Yek zehf tevlihev bû,
Yek jî sade

Ez te du kesan de dibînim.
Yek tu bû yî,
Yek jî ez

07.01.2010





Ji kaniya edebiyata Kurdî, edîbekî nenas

Mele Eliyê Baqustanî û helbestek wî: Ey felek

M. Zahir Ertekin

zahirertekin@hotmail.com

Mele Eliyê Baqustanî, di sala 1912an de li gundê Tîzyanê (yê bi Stewra Mêrdînê ve girêdayî) hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mihemed û navê diya wî 'Edlê ye. Bavê wî Mele Mihemed, melê gund bû. Mele Mihemed, ji xeynî Tizyan li Baqustan û li Ewîna jî meletî kiriye. Bi eslê xwe ji Zîvinga Hecî 'Elya ye, ku aniha ev gund bi navçeya Diha Sêrtê ve girêdayî ye. Bavê wî Mele Mihemed dema ku diçe hecê li wir wefat dike. Li texma wadî Fatma medfûn e. Piştî ku bavê wî (Mele Mihemed) wefat dike, malbat ji gundê Ewîna dîsa vedigere Tizyanê.

Mele Elî, li ba bavê xwe dest bi xwendina xwe ya pêşî dike. Piştê diçe 'Ewîna li ba Mele Evdilezîz dixwîne. Paşê diçe gundê Qerepêçê ku niha bi navçeya Bismilê ve girêdayî ye, li ba mele Evdilwehabê Xîrbê Hecî xwendina xwe didomîne. Piştî ku Mele Evdilwehabê Xîrbê Hecî ji vî gundî bar dike, ew di şûna wî de meletiya vî gundî dike. Paşê tê

Baqustanê û li wir dest bi meletiyê dike. Di salên nodî de, gund tê şewitandin, Seyda ji Baqustanê bar dike û li Amedê bi cih dibe. Nêzikî wefata xwe, dîsa diçe gundê xwe û li wir wefat dike. (2002) Tirba wî jî li Baqustanê ye.

Dema ku li Baqustanê melatî dikir, sê salan bi çûnûhatina 'Ewîna, li ba Mele Ebdullahê Sergelya xwendina xwe temam dike û ji Mele Ebdullahê Sergelya îcazetê distîne. Mele Elî, li gundê xwe, bi dehan feqî û mela perwerde kirine.

Sê berhemên wî yên bi Kurdî hene: Dîwan, Siltan Şêxmûs û Mewlida Nebî.

EY FELEK¹

Ey felek dîsa te xef kir dilbera çavreş ji min²
Ah û hesret bê hîsab kir kerb û efxanê di min


Can û dil tev dax û kul kir cumle ehşar³ tev jî kerr kir
Te cîhan zîr û zeber⁴ kir wergerand şahî ji min

Muhcet û⁵ rûh û rewan min serwer û zewq û sefa
Mûnîs û sebr û heyat min te temam dûr kir ji min⁶

Serxweş û sukran⁷ te hiştim mislê perwan te birîştim⁸
Mewcê behrê hiştî geştim bê 'eded zarîn ji min

Firqeta dilber çî zor e behrekî agir û kûr e
Qe'rekî⁹ gelekî dûr e lew diçe pêti ji min

M. Elî
û neviyê
wî
M. Zahir
Ertekin
-1999 /
Amed



Ketye pişt perd û nîqabê ne li me pirs û cewabê¹⁰
Ne sûal û ne xîtabê kengî bê mêhvanê min

Zekirîm dûrî ji yarê tirsîya aşîq ji 'arê¹¹
Ya ne xo têtê bi xarê¹²çadir û sîwanê min

Çareya derdê me kêr bi ya bi xo Loqman Hekîm bî
Calînos¹³ û sertebîb bî nadêre dermanê min

Ma gelo ew jî di bîr e dilbera şah û emîr
Ez dibêm ageh xebîr e lelle¹⁴ û zindanê min¹⁵

Çi dema mehbûb xuya bî ayîna¹⁶ dil afftab¹⁷ bî
Berq û lami¹⁸ bê hîsab bî zor dibit ahanê¹⁹ min

Ey nesîmê subhê rabe zû li rê hemma tu kar be
Çar teref dilber xuya be bêj ji wir ehwalê min²⁰

Merheba û sed selaman 'îzzet û şêrîn kelaman
Daneya bellorî²¹ canan tevî 'e'zarê²²di min

Bêje aşîq dil kebîb²³ e hêsir û ruhnik zerî be
Dem bi dem sohtin 'ecîb e tîn ji kûr awazê min²⁴

Çav li rasta pal xuya ye ya ku dilber têt ne haye
Meskenê dilber seba ye hudhudek bêtêbê min²⁵

Rûh û ten min tev di rê de dê bidim mizgîn di rê de
Nahêlim qet yek ferîde mûyek î cismanê min

Palekî tîbul menaxe²⁶ eslekî zêrîn û ax e
Tim li dor şînî û şaxe hogir û eqranê min²⁷

Axekî gelek şîfa ye tozekî wî kîmiya ye
Cumleê eş'ar dewa ye tim dibe dermanê min

Tarîxa dilber têt xef bû, sanî teşrîn yewm ehed bû
Xeyn û şîn û hê yû eyn bû, el yeqîn agahê min²⁸

Ey Elî bes bêje zarî qedrê wanî pir biha yî
Xew di çavan qet menayî bêt qîmet pertalê min

Her dema dewrê bimînim des du'ayan tev hilînim
Fatîha şêx ra bixûnin hadir û guhdarê min ■

Jêrenot

- 1) Mela Eliyê Baqustanî, ev qesîda bi munasebeta wefata şêxê xwe (Şêx Seyfeddînê Ehmedî ku ji gundê Hemîdiyê ye) nivîsandiye. Şêx Seyfeddîn weke ku ji helbestê jî têt fêmkirin, di sala 1958an de li gundê Hemîdiyê wefat kiriye. Helbest jî, di heman salê de hatiye nivîsandin.
- Mela Elî, dema ku şêxê wî wefat dike, li gundê Ehmediyê dere ser tirba wî. Li ser tirba wî çil rojî dimîne. Di vê demê de, çil xitmên Qur'anê jî şêxê xwe re dixwîne. Mela Elî bi xwe jî gotiye ku di wî çil rojî de qet xew û xwarin nehatiye bîra min. Lawên şêxê wî, ji wî re dibêjin (Şêx Arîf, Şêx Ismet û Şêx Eflî): Belê Şêx Seyfeddîn bavê me ye, lê em nikarin weke te bikin. Ev helbest jî di vê çil rojîya ku şîna şêxê xwe kiriye de, nivîsandiye (Ji devê qîza wî, Hamide Ertekin.)
- Baqustan:** Gundekî bi navçeya Stewrê ve girêdayî ye. Mela Elî, li vî gundî 52 salan melatî kiriye û tirba wî jî li vî gundî ye. Seyda li ser gundê Baqustanê bi xwe jî helbestek nivîsandiye. Lewra Baqustan, gundekî avî, bi dar û ber û şînayî ye. Weke aşîqekî li ser gundê xwe helbest nivîsiye. Ev helbest jî di nava destxeta diwana wî de ye û hîn nehatiye çapkirin.
- Hemîdî:** Bi wateya gundê wî yê Ehmedî ye. Ehmedî gundekî bi navçeya Stewrê ve girêdayî ye.

- 2) Ey felek! Te dîsa dilbera min a çav reş ji min bi dûr xist.
- 3) **Cumle Ehşâ:** Tevdê hinavên min.
- 4) **Zîr û Zeber:** Serobino, tevlihev.
- 5) **Muhcet:** Burhan, delil.
- 6) *Muhcetû rûh û rewan min serwerû zewqû sefa Mûnîs û sebr û heyat min te temam dîr kir ji min*
Di vê malikê de helbestevan ji wefata dilbera xwe dibêje ku huccet, rih, rewan, serwer, zewq, sefa, sebr û jiyana min tev de ji min bi dûr ketin. Yanî ez ne di tu halî de me.
- 7) **Serxweş û sukran:** Serxweşî û sergêjî.
- 8) **Mislê perwan te birîştîm:** Weke perwanê ez birâştîm, pijandîm, qelandîm.
- 9) **Qe'rekî:** Qelişandin.
- 10) Di vê malikê de helbestvan ji hesreta wefata şêxê xwe bi ziravbîhîstiyariyekê devê dilê xwe vedike û hin lava û siteman rêz dike.
- 11) **Ar:** Eyb.
- 12) **Bi xarê:** Bi ecele.
- 13) **Calînos:** Navê Loqmanê Hekîm e. Rojavayî, wî bi vî navî dinasin.
- 14) **Lelle:** Toqa ku dixin stûyê mehkûman.
- 15) *Ma gelo ew jî di bîr e dilbera şah û emîr*
Ez dibêm ageh xebîr e lelle û zindanê min.
Dibêje qeyd di stûyê min û ez di zindanê de me.

Gelo ez di bîra wî de me? Û cardin bi hêvî dibêje,
bi texmîna min haya wî ji min heye û wî min
jibîrnekirîye.

16 **Ayîn:** Kêf û zewq.

17 **Afîtab:** Roj.

18 **Berq û lami':** Birûsk û ronî.

19 **Ahan:** Pirjimara ahê ye.

20 *Ey nesîmê subhê rabe zû li rê hemma tu kar be*

Çar teref dilber xuya be bêj ji wir ehwalê min.

Ey bayê sibehê! Rabe û zûka xwe amade bike û bi
rêkeve. Li her deverê li dilbera min bigere. Wê bibîne
û halê min jê re vebêje.

21 **Bellor:** Billûr, keviyekî bi qîmet.

22 **'E'zar:** Pirjimara 'uzr e.

23 **Kebîb:** Bi mana kebab e.

24 *Bêje aşîq dil kebîb e hêsir û ruhnik zerî be*

Dem bi dem sohtin 'ecîb e tîn ji kûr awazê min.

Bêje ku dilê aşîq, ji eşqa te şewitiye bûye kebab û
hêsirên min weke ava merzîvê diherike. Hêdî hêdî di-
şewitim û axîn û nalînên min ji kûrahiya dilê min tîn.

25 *Çav li rasta pal xuya ye ya ku dilber tê ne ha ye*

Meskenê dilber seba ye hudhudek bê teb'ê min.

Rast li min weke kaşan e. Ez şaş û mat mame. Dema

ku ez li rastan dinêrim weke ku ez li kaşan binêrim
û herwiha kaş jî, ji min re weke rastan xuya ye. Lê,
dilber hê jî ne xuya ye. Ciyê ku dilber lê ye weke ku
Bajarê Seba dûrî Silêman Pêxember bû, dûrî min
e. Çawa ku çûkê Hudhud xeberek di heqê Belqis de
anî, ancex hudhudek wisa agahiyekê ji min re bîne ku
hinekî pê kêfxweş bibim.

26 **Menax:** Navê bêhneke Xweş e.

27 *Palekî tîbul menaxe eslekî zêrîn û ax e*

Tim li dor şîn î û şax e hogir û eqranê min.

Weke girekî bêhna tîbul menaxê ye, bi eslê xwe jî axê
be jî weke zêr e. Tim li dora wî hevalên min di şahiyê
de ne.

Tîbûl Menax: Navê bêhneke xweş e.

28 *Tarîxa dilber tê xef bû sanî teşrîn yewm ehed bû*

Xeyn û şîn û hê yû 'eyn bû el yeqîn agahê min.

Di vê malikê de helbestvan dîroka wefata şêxê xwe bi
hesabê ebcedê eşkere dike û dibêje, wî di sala 1378 ê
hîcriyê (1958) wefat kiriye. Li gorî hesabê ebcedê tîpa
xeyn: 1000, tîpa şîn: 300, tîpa hê: 8 û tîpa 'eyn: 70 ye.
Dema ku meriv wan bi hev re dihesibîne, dîroka wefa-
ta wî derdikeve pêşberî me.

Dilopek azadî

Janda Serfiraz

Xezalek rêwindayî me di xaka dilistana te de
Tî me, birçî me
Hevalbendê şevê me
Tîrên evîna te li ser dilê min ketine
Wêran bûye bostanê hestên min
Dîl mame ji ber bayên payîzê
Baskên min hatine şikestin
Bê esman mame
Ewran roja min ji min veşartine
Di tariyê de mame
Bêçare me
Gelo tu ji kehniya evîna xwe ava hêviyê nadî min
Min xweyî nakî
Naparêzî ji ber demên agirî
Tu min ji ewrên xwe yên dildax xelas nakî
Tu nabî rênas di çolistanê dilê min de
Ka bêje tu nabî war û welat ji min re
Ez muhtacê te me
Ey azadî!...

(11.07.09)



Mela Muştîq

(1936-2009)

Sîpanî

Di sala 1982-1983an de tê gundekî Tetwanê melatîyê dike. Di sala 1983-1988an de li navçeya Sêwaz Gemerekê li gundekî wê pênc salan melatîyê dike. Di sala 1988-1997an de li gundê Gênceliyê yê bi Patnosa Agiriyê ve girêdayî, neh salan melatîyê dike

Seyda di sala 1936an de li gundê Şêxweliya ku bi Kopa Mûşê ve girêdayî ye hatiye dinê. Navê bavê wî Mela Ebdullah e. Navê diya wî Hemîde xanim e. Dersa Qur'anê û ilmê fiqhê li ba bavê xwe xwendîye. Wextê bûye deh salî bavê wî wefat kiriye. Dema dibe diwazdeh salî dest bi xwendina medresê dike. Li Kurdistanê zarok li medresan dest bi xwendinê dikin. Li herêmê Mela û medreseyên navdar li Norşînê bûn. Seyda jî li bal Şêx Taha xwendîye. Piştî li ba seydayê Mela Zahirê Tendûrekî domandiye. Taliyê li navçeya Bedlîsê Motkî, li medresa Oxînê li ba Şêx Xalid, Şêx Mezher û Şêx Asim xwendîye. Perwerdehiya xwe jî li vê medresê xelas kiriye. Di feqîtiya xwe de gelek zîrek û jêhatî bûye. Di wextê feqîtiyê de meşhûr bûye. Dema temenê wî bûye bîst û du salî li gundê xwe Şêxweliya dest bi melatîyê kiriye.

Li Şêxweliya 22 salan melatî û muderristî kiriye. Feqiyê wî gelek hebûne. Di herêmê de ji der û doran jî xwendevan li cem Seyda xwendine. Heta ji Qonyayê, ji Çorimê, ji Erzeromê û gelek ciyan xwendevan hebûne. Ji bilî

xwendevanên Kurd feqiyên Tirk jî hebûne ku li cem xwendine. Di van salê muderristiya xwe de, her salê jimara feqiyên seyda 30-40 hebûne. Li herêma Mûşê bi ilm û bi îrfana xwe seydayekî meşhûr bûye. Di wî zemanî de li herêma Mûş û Kopê ku behsa aliman bihata kirin, di qisedanê de mutleqa navê Seydayê Mela Muştîq jî digotin. Di herêmê de du heb alimên mezin hebûn. Yek ji wan seydayê Mela Muştîqê Şêxweliyan yek jî Mela Îbrahîmê Gulçîmenê ye.

Di sala 1982-1983an de tê gundekî Tetwanê melatîyê dike. Di sala 1983-1988an de li navçeya Sêwaz Gemerekê li gundekî wê pênc salan melatîyê dike. Di salên 1988-1997an de li gundê Gênceliyê yê bi Patnosa Agiriyê ve girêdayî, neh salan melatîyê dike. Di sala 1997an de tê Mûşê. Salekê li vir disekine. Paşê di salan 1998an de tê Wanê û li Wanê diji. Di 21ê Çilê paşîn 2009an de piştî nimêja 'esrê wefat dike.

Seydayê Mela Muştîq daîmî mijûliya wî li ser naskirina Xwedê teala bû. Wextê Qur'an dixwend wiha digot: "Fesub-

hanellah Qur'an alav dide". Sî cuzû Qur'an tev dikaribû bê tefsîr mane bikira. Wextê ku mijûl dibû dîsa wiha digot: "Me bi awayê Qur'anê Xweda tam nasnekiriye." Daîmî li ser tewhîdê de mijûl dibû. Li ser xulqiyeta însanan difikirî. Di kitêbên seydayê Bediuzzaman Seîdê Kurdî de gelek mutebehir bû. Zehf caran digot Ustad di dîrokê de cihê wî cuda ye. Lewra ew tewhîda, ew heşra ku Seyda îzah dikir kêman însan digihîştin wê mertebê. Her tim Mesnewiya Erebi û Îşaret-ul Îcaz dixwend. Ji feqiyê xwe ra bi daîmî tewsiya Risaleyê nûr dikir.

Celcelutiya ku ji kerametên Hezretî Elî dixwend, zehfên wê jiber bû. Seydayê Mela Muştâq têkoşîna wî ev bû ku însan bigêhêje tewhîdekî xalîs merîfeta Rebanî jêra çêdibe. Rebê xwe nas bike, li pey wî here. Seyda Mela Muştâq tiştê mixalîfê Qur'anê bûya, li kîjan meclise bûya qebûl nedikir. Tu cara nedihîşt ku heq were ketimkirin. Li her cihî teblîxa dîne mubîn dikir.

Jiyana wî ya ilmî

Seyda di famîleke xwendî û zane de mezin bûye. Di piçûktiya xwe de ji hevalê xwe bi ferqtir, bi hêz û heyecantir bû. Dîsa di piçûktiya xwe de xwediyê xûyekî munazerê û muzakerê bû. Di xwendina xwe de, li gelek medresan seydayê wî be jî dema ku li ser meselekê dudilî çêbûya li hember derdiket. Di feqîtiya xwe de bi vê helwesta xwe zehf bi nav û deng bû. Xwediyê fêmkirineke tijefehm û mentiqeke bihêz bû. Piştî wê dest bi muderrisiyê kiriye. Di demeke kin de di nav dersdaran de tê naskirin. Di axaftina zîmanê Kurdî de gelek hosta bû.



Di mijarên zor ên fiqhê, nehwe û serfê de bi awakî fesîh bersiv dida. Feqîyan ji bo vê yekê libal wî dixwendin.

Xwedî xûyekî siruştî û bînefs bû. Îsanekî mutefekkir bû. Bi seeta, bi roja meriv bi Seyda re hevaltî bikira meriv ji sohbeta wî têr nedibû. Di meselê dînî û civakî de xwedî gotin bû. Carina meseleyên herî muhîm, bi henekî dibersivand. Xeberdana Seyda bi îqna bû, wî ji hiş û dilê meriv re xîtab dikir. Bi her însanî re têkiliya wî çêdibû. Li gor her mirovekî û hişmendiya wî muheqeq rêyek şanî dida. Bi xortan re xweş diborand, guhdariya wan dikir. Ehemmiyet dida wan. Temenê wî gihîştibû heştê salî, hêj zehf rehet bi xortan re têkiliyên wî çêdibûn. Yên ku Seyda bidîtana, li sohbeta wî guhdarî bikirana; hercar diçûne ziyareta wî. Sohbeta wî carna bi seeta dikişand û meriv ji sohbeta wî aciz nedibû. Seyda tu carî ji distûrên xwe tawîz nedida. Mesela di jiyana xwe de şaşika xwe dernexistiye. Wextê ku li menfîtiyê bûye, zehf zor û zext dîtiye lê, dîsa jî şaşika xwe dernexistiye.

Seyda di ray û ramanê xwe de bi piranî di bin bandora Mela Seîdê Kurdî û Îmamê Rebbanî de mabû. Risaleyên Nûr û Mektûbata Îmamê Rebbanî rind zanîbû. Di axaftinên xwe de ji van herdu muceddidan mînak didan. Referans nîşan dida. Seyda dixwest ku terîqet û tessewîf wek nêrîna Îmamê Rebbanî be. Seyda ew şêx û melayên ku ne xwenda bûn rexne dikir. Çimkî evana dibûn sedemê xerabkirina navê melatî û şêxîtiyê. Seyda girêdana bi şêxan ve wek nezanî rexne dikir. Karê sofîyan yê dijî yekîtiya Xwedê û muxalîfê şerîetê jî rexne dikir. Ji bo rastkirina vê rewşê dixebitî. Nemaze li Serhedê, dixwest ku wirdên sofîyan yê ji ferzên dînî muhîmtir digirtin îslah bike. Yek jî, hinek şagirtên Risaleyên Nûr û Seîdê Kurdî li gorî xwe şîrove dikirin, Seyda şaşîtiyên wan şanî dida û ew rast dikirin.

Cihê wî behîşt be. Di nav nûra Xwedê de be û cîranê wî Pêxember be. ■

Werin em ji dil dua bikin

Mele Dawud

meledawud@hotmail.com

Buxarî û Muslim hedîseke Pêxember bi şiklekî çîrokane rîwayet dîkin:

Sê heb rêwî ji bona şeva xwe biborîn xwe dispêrin şikeftekê. Wextê sibê şiyar dibin, mêze dîkin ku zinarekî mezin deriyê şikeftê girtiye. Dîkin nakin nikarin zinar ji ber derî dûrbixin. Sê heval di nav xwe de dişêwirin. Dîbêjin ku: “Em nikarin bi qeweta xwe vî zinarî dûrbixin. Li der kes tune ku ji me re alîkariyê bike. Werin em destê xwe ji Xweda re vekin û me di umrê xwe de ji bona riza wî çî qencî kiribe, bikin wesîle. Wî çaxî belkî Xweda were ber kerem û rehme, me ji vê tengasiyê derîne.” Li ser vê biryarê yek ji wan mirovan destê xwe li ber Xwedê vedike û dibêje:

“Ya Rebbî! Wek tu dizanî, dotmameke min hebû. Min jê pir hez dîkir. Tu peyayî wek min ji wê hez nedikir. Rojekê ji min sed dînar pere xwest. Min hema pere kire bêrîka xwe û çûm ber mala wê. Dotmam mebesta min tavilê fehm kir û ji min re got: “Ji Xwedê bitirse! Dest navêje namûsa min. Min ev xirabî heq nekiriye.” û li ber min geriya. Li ser van gotinan, min pere da dest û tu xerabî lê nekir. Bi lez ji malê derketim der.

Ya Rebbî! Ger ev hereketa min sirf ji bona qezenckirina rizaya te be, deriyê şikeftê li me veke.”

Li ser vî duayî, zinarê li ber deriyê şikeftê hebki vebû û sê hevalan tîrêjên rojê pir xweş dîtin.

Dûv re hevalê din destê xwe vekir û wisa dua kir: “Ya Rebbî! Wekî tu dizanî, dê û bavê min îxtiyar bûne. Dema ez her şev diçûm malê, min ewilî şîrê bav û dayika xwe dida wan; paşê min xwarina zar û zêçên xwe dida. Rojekê ji daristanê bi derengî vegერიyam malê. Dema ji bo şîr bidim vexwarin, min li dê û bavê xwe mêze kir, razabûn. Hetta ku min şîr neda dê û bavê xwe, min xwarina zar û zêçên xwe jî neda. Hetanî serê sibê di destê min de tasa şîr min hişyarbûna wan pa. Wexta hişyarbûn min hema şîr da wan. Dûv re çûm bal zar û zêçên xwe.

Ya Rebbî! Ger ev hereketa min sirf ji bona qe-

zenckirina rizaya te be, deriyê şikeftê li me veke.”

Li ser vî duayê zilamê duyemîn, deriyê şikeftê hebki din vebû. Lê ev vebûn ji bo derketina hersê hevalan tîr nedikir.

Dûv re hevalê sêyemîn destê xwe vekir û wisa dua kir:

“Ya Rebbî! Wek tu dizanî, demekê çend karkerên min hebûn, li bal min dixebitîn. Wexta karên xwe qedandin, min heqê wan çiqas pere girtibe dan wan karkeran. Lê tenê ji wan yek ji ber ku çend deqe zû ji kar veqetiya bû, min nikaribû pereyên wî bidayê. Pereyên wî zilamî li bal min sekinî. Min ev pere xebitand. Pere pir û pir bû. Rojek hat ku ev pereyê hindik bû serwet û saman. Piştî zemanekî dûr û dirêj ev zilam derket pêş min û got: “Ey evdê Xwedê! Kanî wan pereyên min bide.” Min jê re got: “Ev deve, çêlek, mih û bende/kole hemû ji pereyên te hatin holê, giş yên te ne.” Zilam li hember bersiva min şaş bû. Bi hêrs got: “Gelo tu qerfa xwe bi min dikî.” Min bersiv dayê: “Nexêr! Ez qerfan bi te nakim. Gotinên min hemû rast in.” Li ser vê axaftinê zilam hemû malên xwe rakir û çû.

Ya Rebbî! Ger ev hereketa min sirf ji bona qezenckirina rizaya te be, deriyê şikeftê li me veke.”

Li ser vî duayê dawîn, zinarê mezin ji ber deriyê şikeftê vekişiya. Ew her sê heval bi selameti ji hundir derketin der.

Gelî xuşk û birayên Hêja! Werin em jî ji dil “dua” bikin. Li ber Rehma Xwedê qencyên xwe bikin wesîle.

Ji nexweşiyên maddî û manewî re derman,

Ji bindestan re serfkeftin,

Ji nezanan re xwendin,

Ji zaliman re cehennem,

Ji gunehan re tobe,

Ji dijminatî re aşitî,

Ji tengasiyan re ferehî,

Ji teraliyê re xebat,

Bixwazin, bixwazin, bixwazin...■

Perçeyak ji jiyana pîroz

M. Burhan el-Hedbi

mburhanelhedbi@hotmail.com

Hinek ji wezîfeyên pêxemberan ev in: Vexwendina îbadeta ji Xweda re. Vexwendina guhdarîkirina emr û nehya Xweda. Ango; însanan vedixwînin ji îbadeta Xweda re û vedixwînin guhdarîkirina emr û nehya Xweda. Çima? Ji bo afirîndêrê xwe nas bikin û baweriyê bi yekîtiya wî bînin

Xwedayê Teala sed û bîst û çar hezar pêxember şandine dinyayê. Pêxemberê me, Hz. Muhemmed (s) pêxemberê dawîn e, di pişt wî re pêxember nayên. Ji destpêka mirovahiyê heta dema Pêxemberê me, xebat û keda pêxemberan, azar û tengasiyên wan, ji bo yekîtiya Xweda fêrî mirovahiyê bikin bû. Tevaya pêxemberan, pêşkêşên karwanê tewhîdê bûn.

Hinek ji wezîfeyên pêxemberan ev in: Vexwendina îbadeta ji Xweda re. Vexwendina guhdarîkirina emr û nehya Xweda. Ango; însanan vedixwînin ji îbadeta Xweda re û vedixwînin guhdarîkirina emr û nehya Xweda. Çima? Ji bo afirîndêrê xwe nas bikin û baweriyê bi yekîtiya wî bînin. Ji bo bi tenê, bendetiya ji Xwedê re bikin, ne ji pût û seneman re.

Emr û nehya Xweda teblîxî mirovan dîkin. Bi gotineke din; ewamir û newahiyên Xweda ji însanan re dibêjin. Rêya rast şanî însanan didin û pêşîvanîyê ji mirovan re dîkin. Da bi însanan bidin zanîn, ka însan ji ku derê hatiye û dê bi ku ve biçe? Ka ji bo çi hatiye dinyayê? Piştî mirinê, ji sedema

wan rojên di paşerojê de derbas-kirinin, dê çi bi serê wan bê?

Berê însanan ji jiyana fanî din jiyana baqî ya cawîdan. Da hizra wan ji dinyayê zêdetir, axret be. Yek ji sedemên pêxember hatine şandin ev e: Da roja qiyametê, însan îtiraz nekin... Ango; nebêjin: Ya Rebbi! Heke te pêxember şandibûna, me dê îman bi te anîba...

Mekke piştî Hz. Îbrahîm (e) careke din bêxwedî mabû. Mişrikan di Mekkeyê de, bi navê dîne Henîf, bi navê tewhîdê, bi navê Îslamê oleke nuh, lê li gorî berjewendiyên xwe anîbûn holê. Cehalet, şîrk û dîne Henîf, bi awayekî ku êdî ji hev nedihat cuda-kirin, tevlihev bûbû. Li Mekkeyê teb' û toreya cehaletê bi her rengî dijiya.

Kuştina keçan, xwarina ajalên mirar! Zarokên qîz bi saxî dixistin gorê!

Vexwarina araqê û kirina şûlê zînayê!

Û bendetiya ji pût û seneman re, di jiyana însanan de, cih girtibû!

Heta ew Beytullaha herdem di şopa enbiya û pêxemberan de bû,

bi sedema cehaleta mişrikan, pût û senem ketibûn nava wê bi xwe jî. Belê mişrikan êdî Ke'be kiribûn wargeha pût û seneman.

Bi mebesta wan nêzî Xweda bikin, îbadet ji kevir û pûtan re dikirin...

Wan jiyana Îbrahîmê putşikên ji bîrve kiribûn û ji wan heye dê bi vî rengî, nêzî rêya Hz. Îbrahîm (e.s.) bibin.

Di dema cehaletê de, însanan sedema ku ji bo wê hatibûn afirandin, ji bîrva kiribûn. Însan bê sermiyan, bêxwedî û bê rehber mabûn. Hingê di nava cehaletê de mabûn, cehalet ji wan re bûbû tebîet. Bajarê pêxemberan Mekke, bêxwedî mabû.

Mekke li bendî dînê tewhîde bû! Çavênê dînê tewhîde bû Mekke!

Mekke li bendî xwediye xwe bû. Mekke li bendî pûtşikênêkî nuh bû! Mekke li bendî pêşivanê tewhîde bû! Feqîr, yetim û bêkes, li bendî heyva ummetê bû! Bi gotineke din, Mekke çavliwêra xwediye xwe Hz. Muhemmed bû. Bi hatina Hz. Muhemmed (s), ew Mekkeya di demekê de, ji ber çavsorî û zilmê, cihê bindestî, feqîrî û miskîniyê bû, bû cihê serbestî û azadiya misilmanan û hemû gelan. Mekke bû bajarê ewle û cihê komara misilmanan! Ey xwediye feqîr û bêkesan! Ey mizgîna dinya û axretê! Ey şefî'ê roja mehşerê! Ey xwediye hewdê kewserê! Ey parêzerê yetim û bêçaran! Ummeta te îro jî li bendî te ye û pêdiviya wan bi te heye. Belê, di pînsed û heftê û yekê mîladî de, diwanzdehê meha rebî'ul ewwelê, êvara duşemê, destê sibehê, li mala 'Ebdullahê kurê 'Ebdulmuttelib, hate dinyayê!

Cumle zerratê cihan da ev nîda,

Kirne gazî pêkve gotin merheba

Merheba ey sirrê furqan merheba,

Merheba ey derdê derman merheba,

Merheba ey rehmeten-lil-alemîn,

Merheba ente şefî-ûl muznibîn

Di wê dewra wehşetê de, hat heyva kaînatê! Muhemmed Mustefa ew roj, dibêjin; hat dinyayê! Ew heyv, pêxemberê axir zeman bû! Bi çêbûna Hz. Muhemmed, textê kafir û zaliman mîna dergûşê hejiya. Dema em li pey wî û Qur'ana pîroz bimeşin, dê îroj jî, biheje.

Ew şev, di mewlida şerîf de, wiha hatiye ziman:

Wê şevê pirr bûn 'elamet bê jimar,

Text û kursiyê mulûkan ketne xwar

Textê Qeyser hat qelabtîn ser devî,

Dist û hev werbûn senem 'eynê şevî

Şeq bû eywana melîk Kîsra yeqîn,

Hem şikestî textê îblîsê le'în

Di wê şevê de, bircên eywana Kîsra hedimîn! Di wê şevê de, agirê Mecûsiyan ku hezar salî vêketî bû, vemirî! Di wê şevê de; gola sawê zuha bû! Çimkî wê şevê Amîne, pêşivanê ummetê yê bi navê Muhemmed anîbû dinyayê. Xwedê Teala, duayê Hz. Îbrahîm û Hz. Îsmâîl, bi çêbûna wî pêşwazî kiribû.

Di Qur'anê de wiha dibêje:

"Ya Rebbî! Tu pêxemberekî ji wan, ku ayetên te ji wan re bixwîne, wan fêrî kîtab û hikmetê bike û wan paqij bike, ji wan re bişîne. Bêguman, tu tim serdest î û her tiştî bi cih dizanî."¹

Di ve mijarê de, Hz. Mesîh jî, mizgîniya hatina pêxemberê me dida gelê xwe û wiha digot!

"Îsayê kurê Meryemê got: Gelfî benî Îsraîliyan! Ez pêxemberê Xweda me, ji we re hatime şiyandin, ji bo tesdîqa Tewratê bikim û mizgîniya resulê di pey min re dê were ku navê wî Ehmed e, bidim we."²

Belê;

Masiyê behran de, mizgîn dane hev

Teyr û heywan kirne hemdê heq bi dev

Hûr û Xilman û Melek erd û sema

Kirne kêf û şahiy û hemd û sena

Muhemmed! Dua Îbrahîm û Îsmâîl, mizgîna Îsa û Mûsa ye. Muhemmed! Ji temamê 'aleman re rehmet î. Muhemmed! Tirsî dilê xayin û kafiran î. Ferqa pêxemberê me Hz. Muhemmed (s) û pêxemberên din, ayetên pîroz wuha diyar dîkin: "(Ey Muhemmed!) Me tu ji temamê însanan re şiyandiyî."³

Hz. Muhemmed, ne ji bo milletekî... Ne ji bo 'eşîrekê... Ji bo temamê însanan hatiye şiyandin. Di ayeteke din de, Xweda wuha ferman dîke: "(Ey Muhemmed!) Me tu ji 'aleman re, rehmet şiyandiyî."⁴

1 el-Beqere 2/129

2 es-Saff 61/6

3 Sebe 34/28

4 Enbiya 21/107

Beriya Hz. Muhemmed bihête dinyayê, bi şeş meha, bavê wî 'Ebdullah malê bazirganiyê, ji Mekkeyê dibe Şamê... Piştî li Şamê malê xwe difroşe û vedigere, tê Yesrîbê/Medîneyê. Diçe mala xalê xwe...

Li cem xalanên xwe, demekê bi mêvanî dimîne. Di wê demê de, li Yesrîbê nexweş dikeve. Nexweşiya wî giran dibe. Teqdîra îlahî li Yesrîbê dimire, 'Ebdullah li Yesrîbê wefat dike û li wir tê veşartin.

Hz. Muhemmed, hê di zikê diya xwe de, yetîm dimîne. Belê, Hz. Muhemmed, yetîm tê dinyayê.

Piştî wîladeta Hz. Muhemmed (s), diya wî Amîne, sê rojan an heft rojan şîr dide wî.

Paşê diya wî ya şîr, Helîma Se'dî, şîr didiyê. Heta temenê pêncan, li cem diya xwe ya şîr Helîma Se'dî dimîne. Hz. Muhemmed (s) dikeve sala şeşan. Ew, diya xwe Amîne û Ummu Eymen ji bo dîdariya gora 'Ebdullah, bi hev re diçin Yesrîbê, cem xalanên xwe (Navê Medîneyê, berê Yesrîb bû) Piştî ku ji Yesrîbê dizivirin, diya wî li Ebwayê wefat dike û li wir tête definkirin.

Hz. Muhemmed bê dê û bê bav dimîne. Wê gavê Hz. Muhemmed şeş salî bûye.

Melayê Bateyî çendî xweş gotiye:

Taha tu Resûlê melîkê 'erşê 'ezîm î

Der behrê cemala te tenê durra yetîm î

Ehsentirê ez Yûsifê siddîqê helîmî

Lulu û sîfetê der sedefê behra 'ezîm î

Hz. Muhemmed du salan di bin parastina⁵ bapîrê xwe Ebdulmuttelîb de dimîne.

Gava jiyê Hz. Muhemmed dibe heşt, bapîrê wî Ebdulmuttelîb jî wefat dike.

Wê gavê apê wî Ebû Talib wî diparêze. Apê wî Ebû Talib, wî ji çavsorî û zordariya mişrikan, diparast. Dema temenê wî dibe bîst û pênc, bi keça Xuweylid, Hz. Xedîce re, li ser daxwaza wê, dizewice.

Di sala şesed û şeşan de, Ke'be dihate tamîrkirin. Di vê tamîrkirinê de, êl û 'eşîrên 'ereban ji bo Haceru'l-Esved deynin cihê wî li hev nedikirin. Her êl û 'eşîrekê ev cihdayin ji xwe re maf didît û nakokî di nava wan de derket holê. Paşê yek ji wan dibêje: Kî jî vê hêlê de were, bila ew di nava me de, dadiyê bike. Pêxember dertê û tê. Tev kêfxweş dibin. Belê kêfxweş dibin, çimkî yê ku tê, Muhemmed-ul Emîn

e, yê ku ewleyiya herkesî pê te. Hz. Muhemmed 'eba xwe radixe, Heceru'l-Eswed datîne ser û dibêje: Her êl û 'eşîrek bi hêleke 'ebayê bigire û bilind bike. Ew jî bi wê şewazê bilind dikin heta Heceru'l-Eswed tê texma cihê xwe. Pêxember, Heceru'l-Eswed digre û datîne cihê wî. Bi vî awayî, wê nakokiyê ji holê radike û ew êl û 'eşîr jî bi vê dadiya wî razî dibin.

Di sala şesed û dehan de, li şikefta Hîrayê dest bi îbadetê dike. Gava jiyê wî dibe çil; jê re wehiy tê û bi kar û erka pêxemberiyê tê wezîfedarkirin. Di wê demê de, vexwendin û daweta dînê Îslamê sê salan bi dizî dihête kirin. Di sala şesed û sêzdan de, vexwendin êşkere bû...

Zilm û zordariya li hember misilmanan di wê demê de, gelek bi alozî dest pê dike... Gelek ji misilmanan, ji ber zilm, zorî û stûriya zaliman, koçberî Hebeşîstanê bûn.

Di dehê pêxemberiyê de, di sala şesed û nozdan de, Ebû Talîb wefat dike. Piştî wî bi sê rojan diya me Hz. Xedîce wefat dike. Jiyê wê şest û pênc bû. Tê ragihandin ku di veşartina wê de bûyerek wiha ciryaye: Hebîbê Xweda, dadikeve gora wê û dibêje; barê ummetê, mirina te û ya Ebû Talib li ser min gellek giran e, ez tênahîjim bê ez bi kîjanî biêşim. Ji bo van bûyeran, Pêxember ji wê salê re dibêje: Senetu l-Huzn.

Di sala şesed û nozdan de, Ebû Talib û Hz. Xedîce wefat dikin. Ji wê salê re tê gorin: Senetu l- Huzn. Belê ji sala ev herdu tê de wefat dikin re hat gotin: Sala xemgîniyê, sala derd û kederan...

Hz. Muhemmed her roj dihat mala xwe, derd û kederê xwe ji diya me Xedîce re digot!

Lê êdî Hz. Xedîce jî tunebû, dê bêhna wî bi kê derketa û hilma wî dê bi kê fireh biba, Xedîcê wefat kiribû!

Dema apê wî dihat hizr û ramana wî, kederên wî zêdetir dibûn! Belê, gelo ka dê li deriyê kê bixe û gilî û gazine xwe dê bi kê bike! Di van hizr û mitalan de, Taîf tê bîra wî!

Di sala şesed û bîstan de, Hz. Rasûlullah, ji bona vexwendina îslame diçe Taîfê!

Çûndin û hatina wî dibe yek... Xelkê Taîfê elaqê şanî wî nadin. Bi vexwendina Resûlullah (s) elaqedar nebûn.

Zarokên Taîfê, bi telqîna zalimên wekî 'Utbe, Şeybe û ebû Cehl, bi kevira li Hz. Muhemmed (s) xistin! Wan kevirên li Pêxember (s) diket, lingên wî xwîn kiribûn!

Xwîn ji lingên wî diniquft!

Pêxember (s), destê xwe bi bal Rebbê xwe vedike û dibêje:

"Ya Rebbî! Ez kêmhêziya xwe, 'erzî te dikim, Tu li hemberî mirovan arîkarê min bî. Û şikayeta kesên min biçûk dikin, 'erzî te dikim! Tu, Rebbê kêmketiyên û rebbê min î! Tu, dê min ji kê re bihêlî!"⁶

Tu min ji dijminin dûr re dihêlî, da êrişî min bikin! An ji dijminin nêzik re dihêlî, da serdestî min bibin!"

Lêbelê çawa di Qur'ana pîroz de jî hatiye ferman- kirin, Xweda tu carî ew bi tenê nehiştiye:

"Xwedayê te, ji te nexeyidiye û tu ji bîrve nekiriye!"⁷ Ango; Xweda, tu bi tenê nehiştiye û ji kesî re jî, nehiştiye!

Di vê bûyerê de, Cibraîl mîna 'ewrekî li ser wî xuya dibe û dibêje: Ya Muhammed selat û salamên Xweda ji te re hene! Awaz, şikayet, gilî û gazinên te bihîstîye!

Rebbê te dibêje: Heke hebîbê min Muhammed bixwaze, ez dê 'Ekşebeyn⁸ li wan bînim hev, ez dê van herdu giran bi ser wan de bihejînim û bixînim!

Dema Cibraîl ev tişt digotin! Xwediyê şefqet û merhemetê Hz. Muhammed digot; na ya Rebbî!

Ya Cibrîl! Heke piştî hezar salên din, dê di vî milletî de hinek îmanê bînin, bila Xweda wan helak neke! Di nava xwînê de, ji Taîfê vedigere!

Di sala senetu l- Huznê de! Di wê sala zorî û bin- destiya mu'minan de!

Rojekê Hz. Muhammed (s) bi weqar û teslîmiyet, da ji rebbê xwe re îbadetê bike tê Ke'beyê. Dikeve hewşa Beytullahê! Nêzî Beytullahê dibe, serê xwe datîne, da secde bike...

Kafirê le'în! Îbn Ebî Mu'îd, diçe hûrê deva serjêkirî tîne û di secdê de, bi ser serê Hz. Muhammed werdike. Bêhna pîs û ava kirêt bi ser serê wî yê mubarek de diherike!

Dema serê pêxember (s) li erdê û di wê rewşê de bû, kafir û zalimên Mekkeyê tinazên xwe pê dikirin û pê dikeniyên.

Di wê demê de, keçek ciwan bi rev dihat! Bang dikir û wiha digot: "Wa ebeta! Wa ebeta!" Wax li minê! Wax li minê, ev bavê min e.

Belê, ew keça ciwan û dil sotî Hz. Fatîme bû (r.e.) Keça pêxember, diya mezinê şehîdan; diya Hz. He- sen û Huseyn!

Bi xemgîniyeke jidil, hêsrê çavan mîna tavên buharê dibarandin û xwe diavêt ser Pêxember (s), û ew hûrê kirêt ji ser milên bavê xwe diavêt.

Dema keça xwe di wê rewşê de dibîne, ew jî li halê wê dide girî û jê re wiha dibêje:

لا تبكي يا بنيتي فإن الله ناصر أباك

Negri keça min! Xweda bavê te naxîne! Xweda, dê arîkariya bavê te bike!

Rojek dê were keça min, ev tev dê li dor min bicivin, dê rastiya rêk û pak bibînin û nas bikin!

Lêbelê kesên dijî Pêxember (s), wiha zû bi zû Xweda û pêxemberê Xweda nas nekirin!!

Hûn guman nekin, wan zû bi zû Xweda û pêxemberê Xweda naskirin û pêşwazî kirin!!

Belê, sal sala xemgînî û huznê ye! Ebû Talib tu- neye! Sal sala huznê ye! Jina wefadar û fedakar, Xedîcetu l- Kubra tune! Pêxember mehzûn, qelbê wî bi huzn e û li dostekî digere!

Dostê dosta, xwediyê bêxwedîya, da dilê dostê xwe şadûman bike, di dehê Nubuwwetê de, ya teqabulî sala huznê dike, dostê xwe dibe cem xwe.⁹ Mûcîzeyâ Îsra û Mîracê, beriya hicretê bi sal û nivkê, bîst û heftê meha Recebê **dicire**. Hz. Cibraîl, Pêxember (s) li Boraqê siwar dike û ji Mescîdu l- Heramê dibe Mescîdu l- Eqsayê. Paşê ji Mescîdu l- Eqsayê dibe li heft tebeqê asîmanan digêrîne.

Û vê şevê dîsa vedigere Mekkeyê, digihêje mala xwe... Xweda di Qur'ana kerîm de, wiha ferman kiriye: "Ew Xwedayê 'ebdê xwe (Muhammed), ji Mescîdu l- Heramê biriye Mescîdu l- Eqsayê, pak û munezzeh e."¹⁰

Xweda Teala, li Mîracê, wehyê bê navgîn dide pêxember (s) Di wî meqamî de, Xwede sê tişt daye Pêxember (s): Ya yekem: Pênc wext nimêj. Ya duyem: Du ayetê ji dawîya sûretê Beqere, *ango*; Amenerresûlû. Ya sêyem: Mizgîniya; Ji ummeta Pêxember (s) kesê şîrîkan ji Xwedê re çêneke, dê here bihuştê. Lêbelê, qewmê wî dîsa bawerî bi mûcîza wî nedikirin, heta hinan jê re gotin; kahîn, sêhîrbaz.

6 Bi gotineke din: Tu min ji kê re bi tenê dihêlî.

7 Dûha 98/3

8 Ekşebeyn; navên du girikên li Taîfê ne.

9 Teqrîbî-Sal 621 Miladî.

10 Îsra 17/1

H. Muhemmed (s), ji ber çavsoniya mişrikan, di sala şesed û bîst û dudan de¹¹, bi emrê Xweda ji Mekkeyê hicretî Medîneyê dike! Mişrikên Mekkeyê çawa li vexwendina Pêxember xwedî derneketin, wî li welatê wî, bi rehetî jî, nahêlin! Dibin sedemê ku ji welatê xwe hicretî Medîneya munewwere bike! Mişrikên Mekkeyê li Medîneyê jî dev ji pêxember bernedan. Piştî hicretê¹², zorçoxî û çavsoniya mişrikên Mekkeyê tê asta herî bilind û -piştî têkçûna cenga Bedrê- careke din êrîşî Medîneyê dikin. Li hember pêxember û eshabiyên wî artêş û şerrekî mezin li dar dixin. Weke tete zanîn navê wê cengê; cenga "Uhûdê" ye.

Bi hêzên siwarî, peya û tîrendazên/okçû xwe, êrîşî heyva cihanê H. Muhemmed Mustefa û Misilmanan dikin! Di wê cengê de; derbeyên şûr û tîrendazan, li heyva kaînatê H. Muhemmed (s) jî, dikevin!

Mîxfer dişkê û hêlek ji mîxferê di lêva wî ya mubarek re dihere! Diranê mubarek dişkên! Xwîn ji serê wî diherike! Bi destekî xwîna ser çavên xwe paqij dikir û bi destê din jî, dua dikir. Di laşê mubarek de, birîn çêbûbûn! Lê ew dîsa nedixeyidî û rik ji kesî nedigirt! Xwîna xwe bi destê xwe paqij dikir û wiha digot: "Ya Rebbî! Tu milletê min bibexşînî, ew nizanin." Heke zanîbûna wuha nedikirin! Destên xweyî bixwîn radike û dibêje; Ya Rebbî! Tu milletê min hidayet bikî! Ê ser û diranê min şikandin, Tu wan hidayet bikî! Ew nizanin ez kî me! Ew dibên qey lawê 'Ebdullah e! Ew dibên qey yetîmê Ebû Talib e! Ya Rebbî! Tu milletê min hidayet bikî! Ew nizanin ez kî me!

Pêxember (s), di sala şesed û sî û dudan de, di sêzdehê Rebî'û l- Ewwelê de, ometa xwe yetîm dihêle. Li Medîneya munewwer e, wefat dike û li wur dihêt defin kirin.

Bajarê Pêxember Medîne!

Bajarê 'aşiq û me'sûqan Medîne!

Bajarê hicretê Medîne!

'Eşqa di dilê Siyahpoş û Mewlana camî de, Medîne!

'Eşqa di dilê Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî de, Medîne!

Bi evîna di dilê Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepeyî bibêjin:

*Eger Îsa ji sema bête xwara
Birîna min selîm nabe tu cara
Ji xeynî sakinê rewda mubarek
Selatullah eleyhî sed bi carek*

Bi evîna dilê Siyahpoş bêjin:
*Sed wekî Îsa û Eflatûn û Calînûs hekîm
Çareê li derdê me nake bê te ey luqmanî ma*

Bi evîna dilê Mewlana Camî bang bikin:
*Ya Resulullah! Tali'a segê eshabul-kehf pîr baş e
Ji bo panêrî û hevalî bi wan ra kiriye, dê here
bihuştê*

*Heke ew segê Eshab-ul Kehf be, ez segê
eshabê te me*

*Ma rew a ye? Ew here bihuştê û ez herim
dojehê.*

Bi çêbûna Muhemmed erd û ezman şad bû. Bi wefata wî jî, şeva reş û tarî girt ser me.

H. Muhemmed ummeta xwe yetîm hişt û çû.


Pêwist e em jiyana Pêxember (s) ji xwe re bikin mînak û mestere.

'Adet û exlaqên pêxember, di jiyana xwe, malbat û zarokên xwe de tetbîq bikin.

'Eşq û evîna Pêxember (s) têxin dilê wan.

Ka em dê çawa jiyana Pêxember (s) ji xwe re bikin dustûr û em dê çawa rêya wî bişopînin...

Gelo em dê bikaribin exlaqên Pêxember (s) di jiyana xwe û zarûyên xwe de tetbîq bikin... ■



11 Teqrîbî-Sal 622-623 Mîladî.


12 Teqrîbî-Sal 625 Mîladî.

Deriyên cîhanê ji Kurdî re vekin: **Ez Kurdî Hîn Dibim – Pratik Kûrtçe Dersleri** **bi Almanî derket!**

Kitêba ji bo hînbûna Kurdî „Ez Kurdî Hîn Dibim – Pratik Kûrtçe Dersleri“, ku me par çap kiribû, ji hêla weşanxaneya Alman Reichert Verlag ve bi zimanê Almanî hat weşandin. Ev kitêba ku zimanzan Abdullah Incekan amade kiriye, bi navê **Kurdisch Kompakt** di refikên kitêbfiroşên Almanan de cihê xwe girt. Zimanzan A. Incekan, ku li zanîngeheke Almanî dersên Kurdî dide, ji bo xwendevanên Almanîxêv ev

kitêb bi Almanî amade kiriye. Ji ber ku di çapa Stenbolê de xwendevanên Tirkîxêv zêde li ber çavan hatibûn girtin, ji bo xwendevanên Alman hin guhertin hatine kirin û ji ber vê jî di navbera herdu kitêban de hindik be jî hin cihêbûn hene. Weku tê zanîn, şewirmendiya kitêbê Dr. Rosemarie Neumann kiribû û wênayên wê jî ji aliyê resamekî hatibûn çekirin. Da ku meraqdarên Kurdî tamê ji ahenga zimanê me bigrin, cdyek ku hemû metin li ser hatine xwendin ji pê re tê belav kirin.

Hêjayî gotinê ye ku „**Ez Kurdî Hîn Dibim – Pratik Kûrtçe Dersleri**“ di çapemeniya Kurdan û Tirkan de dengekî baş da û di gelek rojnameyan de bû xeber. Meraqdarên Kurdî jî lê xwedî derketin û di nava çar mehan de çapa xwe ya duyemîn kir. Hemwelatiyên Ewropayê û xisûsen yên Almanyayê bi pirranî di heqê çand û zimanê Kurdan de zêde agahdar nînin û hêvî ew e ku bi xebatên vî terhî Kurd jî derê xwe ji cîhanê re vekin.




Abdullah Incekan
**Ez Kurdî Hîn Dibim –
Pratik Kûrtçe Dersleri**

Weşanên Nûbiharê
www.nubihar.com
ISBN: 978-9944-360-47-0



Abdullah Incekan
Kurdisch Kompakt
Lehr- und Übungsbuch mit
Lösungsschlüssel und CD

Reichert Verlag
www.reichert-verlag.de
ISBN 978-3-89500-720-0



Şorbe û Fedî; Xela û Xeyîdî

Ayhan Meretowar

Di demeke ku pêdiviya me zehf zêde bi xwendinê heye de, hebûna berhemên têrders û têrbretî li ber destê me siûdeke baş e. Gelekî ku di nav metirsiya windakirina ziman, edebiyat û dîroka xwe de binale, berî her tiştî pêdiviya wî, bi "bîr"eke têrdersî heye

J i Mela Mehmûdê Beyazîdî heta îro, nivîsandina çîrok û hîkayeyên¹ Kurdiya Kurmancî di gelek merheleyan re derbas bû. Bi M. Mehmûdê Bayezîdî, ser û berê wê, li edebiyata cîhanê vebû; çî heyf negihîşt amanca xwe. Bi Fuat Temo, hindik mabû ku kirasê nûjeniyê li xwe bikira; lêbelê qederê nehişt. Her çendî hîkayeya Kurdî bi Kurmanciya Başûr derê nûjentiyê bi xêra Ahmed Mûxtar Caf (1925) û Cemîl Saîb (1926) li xwe vekiribe jî, bi awayekî ku dilê mirov bixwaze, ciyê xwe di nav hîkayeya nûjen a cîhanê de nedît. Ev serê vî deh-panzdeh salên ha ye ku bi saya serê çend karkerên qelemê, va ye êdî cûreyê hîkayeyê, bi awayekî zebareyî, li ber geşedaneke edebî ya li gor şert û mercên îro, xwe xweş kirîye.

Yek ji van berhemên ku li hîkayeya Kurdî zêde bûye, berhema bi navê **Şorbe û Fedî; Xela**

û Xeyîdî ye. Ev pirtûk, ji aliyê Edîb Polat ve hatiye hilberîn û di nav weşanên Pêrî de derketiye.

I Di demeke ku pêdiviya me zehf zêde bi xwendinê heye de, hebûna berhemên têrders û têrbretî li ber destê me siûdeke baş e. Gelekî ku di nav metirsiya windakirina ziman, edebiyat û dîroka xwe de binale, berî her tiştî pêdiviya wî, bi "bîr"eke têrdersî heye. Îca mala Xwedê ava, va ye bere bere karkerên fêhm û feraseta aqilê paşî yê Kurmancan zêde dibin. Bi gotineke hîn rasttir, zanayên mîna Edîb Polat ku ji aliyê temen, tecrûbe û tefekkure ve wisan têrbaş piştrast in û mil û mîxê xwe didin ber zexmkirin û xurtkirina bîrbirina gel, -belkî ne ji bo nîfşê îro be- bes min tu şik û guman jê tune ye ku ew dê bi van lêhûrbûnên rûdanan, li ser ciwanan karîger bin. Tiştê ku ez wekî xwendevanekî ji van nuwazeberhemên vî hikayenûsê me fêhm dikim ew e ku wî, ew tecrûbeyê xwe ya têkoşîna fiilî -camêr ji berê ve, çawan ku fêmberî xwe bûye, dest bi dest

¹ Ez bi zanetî peyvika "hîkaye" di şûna peyvika "çîrok"ê de bi kar tînim. Çimkî bi baweriya min, çîrok metelok e; hîkaye jî şûna van çîrokên nû digre.

di milê azadîxwazên demokrat ên medenî de bûye- , gihîştina xwe ya edebî, piştqewîtiya xwe ya zimanî, hemû dane hev û bi dilê 'emeleyekî karperwer ku ji tarîtiya berdestê sibehê heta derengiya şevê, bi şîrhelalî dixebite, li ber hişmendiya netewîtiyê, hewla xîretkêşiyê kiriye.

Zarokên gundan ku ji bo xwendinê tên bajaran, li malan dimînin û dikevin çî rewşê, ew zarokên xizan ku nesîbê xwe ji bêsiûdiya xwendinê digirin, ketine ber roniya wê çiraya geş a vê berhemê.

Ew jinên neçar ku di bin zordestiya korekor a mîrên nezan de jiyar li wan dibe girtîxaneke [temenwext] heta mirinê û ew malbatên ku ji ber xizaniyê ketine bin nîrê birçîtiyê, bûne sermijarên vê berhemê.

II

Di vê pirtûka nivîskar a pêşî ya hîkayeyan de, du beş hene. Beşê pêşî, ji çend hîkayeyên modern pêk tê; beşa duduyan jî, ji du çîrokên gelêrî pêk tê. Ev çîrokên gelêrî ku tevî hîkayeyên nû, di he-man pirtûkê de hatine bicîkirin, -digel ku bi rêbazeke nûjen hatine biteşekirin jî- helbet ne rest e; bes em dê hewl bidin ku bigihîjin tehma hîkayeyên wê.

Mijarên van hîkayeyan, giş li ser jiyana civakî ya vî gelê hejar e. Hîkayeya pêşî, **Şorbe**, li ser aqilwendakirina mîrekî çavbirçî ye ku ji ber xelayê filitiye û kela dilê xwe yê "hesreta şorbenîskê" di serê rebena jina xwe de hêdî dike. Ev hesreta wî ya li ser şorbeyê, dike ku êdî ji xeynî şorbenîskê, tu xwarineke dî di mala wan de nepije û jinika reben xwe davêje ser tor û bextê malbavanên xwe. Malbavanên wê jî, bi rêbazeke

ku derûniya enteresan û qerfî ya civaka Kurdan nîşan dide, vê problema gewre hell dikan.

Fedî, hîkayeya jiyana ciwanên gundî yê me ye. Çi ciwanê ku mala wan li gundan be û ew jî ketibe ber bayê xwendinê û hatibe xwe li mala lêzimekî xwe girtibe, vê zorî û zehmetiya ku heta mirinê naqede, jibîra nake. Îro jî, halê hazir, ev derdê bêderman ê ciwanên -heta şikir ji Xwedê re keçên me jî ketine nava karwanê xwendekaran- gundan birîneke kul e û kesî hemiyetperwer ku melhem lê bike naxuye. Yên ku destê xwe didin bin vî barê gundiyan jî, malûmê her kesî ye ku çûye di ku de derketiye.

Hîkayeya sisiyan **Xela** ye. Ev jî her çendî ji me re weke mijareke ku tenê xasê bi wan zemanê berê ye were jî, di eslê xwe de îro jî karker û gundiyan me, bi derî û dertûlê xelkê dikevin, rewşa wan a xwarinê di bin sînore xelayê de ye û bi awayekî modern(!) kole-tiya sermayedarên bêîman dikan. Motîfên dînbûn û aqlavêtinê ku ji ber birçîtiyê hatine serê mirovên me, bi tehereke têra xwe xweş hatiye vegotin. Îca ew kul û kederê ku mîrên malan di zemanê xwe yê herî bixêr û bêr de diçine eskeriyê; zar û zêçên wan jî li ber dîwarê malan ji birçînan tên dikevin delavê hêsrîr, rebenî û pepûkiyê, hîna jî di dilê însanên me de zindî ye û hîna jî zerar û zedeyên ku ji ber vê mîrata eskeriyê gihîştine derûniya nîfşên me, bi tu awayî naye tedawîkirin. Gelek kurebav ku ji kambaxa eskeriyê hatine malê dîn bûne; gelek xweşmêr ji wê mîratê venegeriyane û gelek malbat jî, xera bûne.

Keyd, jî mijareke balkêş e. Ew zîlamê Kurd ku ji ber zîlm û zorda-

riya serdestan çawa kela dilê xwe yê reben di serê belengaza jina xwe de derdixe û ew jina reben jî dûçarî çî bêbextiyan dibe, hemû di vê berhemê de bi awayekî têrbaş hatine rêzkirin.

Bi rastî ev hîkayeya bi navê **Kincên Jiyana Pînekirî** jî, ji bo wan sosyologên mîna Îsmail Beşikçi ku kula wan, kederê wan û derdê wan, naskirina derûniya Kurdan e, heta mirov bibêje bes, çavkaniyeke hêja ye. Ew sosretiya bi deh salan a xizaniya me, hîna jî berdewam e, hîna jî zorê dide me, hîna jî bêhnê li me ferdên vî gelî diçikîne.

Hîkayeya bi navê **"Berfedimsk"** kula wan Alayiyên Hemîdî ku çî daye Kurdan û çî ji wan standiye, bi bûyereke sosret û gelek zêde ecêb derketiye hemberî me. Di şexsê serpêhatiya fermanbarekî Kurd, rêberekî Ermen û serfermandarekî Tirk de, dîroka sitembar a Kurd û Ermen; Tirk û Rûsan bi vê hîkayeyê, tevî tamamê enteresaniya xwe, derketiye pêş çavê me. Bi rastî ev bûyera dilşewat, bi her awayê xwe hêjayî lêhûrniherin, nîrxandin û şîrovekirinê ye. Çi heye ku bêhtir bala min diçe ser wê hîkayeya bi navê **"Leyistoka Pelixandî"**. Ji ber ku du berhemên dî yê mayî, du "çîrok/metelok"ên gelêrî ne, em dê qet bala xwe nedin ser wan.

III.

Binemaleke bixîret, ji ber qebûlnekirina çeka cerdevaniyê, koçî bajarekî kiriye. Roj hatiye, êdî dinya li serê wan bûye tara bêjîngê, hesreta gundê wan zorê dide wan û mirina xwe didin ber çavê xwe û rast berê xwe didin gundê xwe yê xerabe. Kom û kilfet, tevî zarokan, bi kêfa roja îdekê, didin ser rê. Hejmara

koçepîliya wan, bîst û pênc e. Lehengê ku bala mirov dikişîne, lawikekî masûm e. Di rê de rastî çend gundên ku bûne kavil jî tên. Gava digihîjin gund, bi dengê çekên çavnebar ên gundiyan xwe(!) yên berê çavtirsandî dibin. Peyre serfermandarê kinceskan li ber wan disekine. Helwesta wî ya berbiçav, ji ya cerdevanan xweştir e. Piştî ku çend astengan ji wan re derdixe, di rûberê wan de, dengê xwe nake û diçe. Ew jî konekî ji xwe re vedigirin û xwe didin binî. Heyf û xebînet ku pir pê nakeve, du destbiçekên diltarî, parçeyek hesinê jiyansot davêjin nava wî kom û kulfetî û ... û ew gedeyê masûm dimire..

Ev hîkaye, wê rastiya tal û jehrîn a birakujiyê, tevî wan mercên sosyolojî û dîrokî radixe ber çavan. Ew erdperwerî na; belkî "erdperesti"ya civaka me, xweş derketiye ber ronikahiyê. Diyar e ku tehma wan şaxên zanistê yên mîna derûnî, civaknasî û dîrokê jê tê. Ew bêsiûdiya me ya ku bûye mîna qedera me, bi çavekî bêlayan hatiye vegotin. Ew êş û jana wî pakrewanê bêguneh, di vê hîkayeyê de bi zar û ziman bûye. Ez bi rehetî dikarim aliyê lîrîk ê .vê berhemê bidim ber wê hîkayeya Fuat Temo ya "Şewêş" û ya Anderson û wê hîkayeya "Keçika Kibrîtfiroş" ku hema hema li temamê zimanên cîhanê hatiye wergerandin û heta roja qiyametê, kî wê bixwîne, dê kezeba wî biperite.

Li gor dem û dewrana ku ev hîkaye tê de hatiye nivîsandin, mirov dişê bibêje ku heqqê xîretkêşîya welatperwerên vî miletî, bi awayekî têrbaş hatiye dayîn. Bi saya vê berhemê, bûyereke ku qet bi şerefa mirovahiyê nakeve, ji wî sînore

teng û tarî yê bi qasî nûçeyekê, xelas bûye; ketiye nava rûpelên edebiyatê.

Aliyê şayesandinê, bi têrkirina hestên mîna dîtîn, bihîstin, tamkirin û pêbûnê, xweş bûye.

"Bi rê ve min li zeviyên pembo yên ku deşta Bismil xemilandibûn temaşe kir û bêhna zebeş û petêxan kişand û sînga xwe pê nepixand."(r:44)

Di paragrafên jêr de jî hesreta gund û xwendinê ku di dilê bavê kurikî de şax daye, wiha herikiye:

"Egîdê min, berxikê bavê xwe, tu ketiyê etra mektebê? Va ye em dizivirin gundê xwe, nava zevî û baxçeyên xwe. Nava gûşiyên tirî, bastêq û dimsê, mewij û behîv û gûzan. Li wir darên fêkiyan gûşî digrin, ava kaniyan havînê jî qeşem digre. Êdî dibistan jî li wir heye, ez dê qeyda te çêbikim, li gund bixwîne."

Aliyê rasteqînê e vê berhemê, jixwe ne hewceyî nîqaşê ye. Bûyer bi carekê ripîrast e, lehengên wê diyar in, ciyê wê diyar e, dema wê belî ye.

IV.

Awayê vegotina berhemê, bi cihêrengiya xwe balê dikişîne. Nivîskarê wê, bi rêbazeke henûn kariye ji xwe re şewazeke xweser bibîne. Gava hestên lîrîk/dilovan zor dayinê û di nav şop û şîpa vegotinê de dilê wî bi vegotina pexşanî rehet nebûye, rabûye ji xwe re bi awayê nezmî çend bend jî, lê zêde kirine. Ev lêzêdekirina nezmî jî balkêş e ku ji edebiyata gel hatiye eyîşandin:

Pirpizêk karik dizê/ Yeka min yeka Ezê/Ya Ezê çû newalê/Ya min ma dortira salê..

Di berhemê de dilovaniya

bavekî dilbikûl, di lûtkeyê de derketiye pêşîya me. Bavekî ku êşa zarokên vî gelî tam di nîvê orta kezeba xwe de dikişîne û dibîne, bûye vegoterê vê berhemê. Hemû cûreyên vegotinê, ketine bin barê derbirîna jana xedirlêhatiyên vî welatî. Car hatiye awayê vegotina tehiyeyê, car hatiye awayê vegotina şayesê ketiye dewrê.

Ew peyvên xweşik û qedîm ku hîn jî bi awayekî siruştî di nav gel de tên bikaranîn û sohbetên nava malan pê xweş dibin û şevbihêrk jî pê şîrîn dibin, bi hemû bedewiya xwe ciyê xwe dibînin di zimanê berhemê de. Car hatiye ku wan peyvîkên têrwate, dilê vegoter rehet nekirine, îca biwêj gihîştine hawara hestan. Gurûgeşbûna hevokên biqewet, destê berhemê bi qewet kiriye û bersiva pêdiviyên xwendekar dide.

Îfadeyên berhemê, bêyî ku li tu kelemî biarqile wilo xweş diherike diçe digihîje binê hişê mirovan. Rewaniya vegotinê, bi hin teswîrên zêde kuliyaye; bes tu hevokeke ku têgihîştinê zehmet bike rastî mirov nayê. Derbirîneke sade, xwerû û bi zimanê gel ê rojane, bi tehma Kurdiya nû ya edebî ve hatiye girêdan û ji wan nepenîkirinên sembolîk hatiye xalîkirin heye. Ev jî, ji wan birînen kûr ên dilê xwendevanên ku mexdûrên herba rûmetê ne re bûye melhema ser birînê.

Romana Charlis Dickens a bi navê Oliver Twist, gava derdikeve, li welatê Ingilistanê, li ser mafê zarokan, gengeşîyeke mezin dest pê dike û dest bi xebatên mezin dikin. Gelo em dê kengî bi çavê serê xwe, li vê dinyaya gewrik bibînin ku bi saya serê berhemeke me ya edebî, siyasetmedar û çapemeniya me, dest bi hewl daneke qenc bikin? ■

Mol Axa

Rojbin Ozkan

Germa havînê bû, di-
vîyabû gundî wek her
sal biçûna zozanan, lê wê salê
biryara neçûyîna zozana hatibû
dayin. Sedema wê jî, çend meh
berê di navbera du eşîran de
şerekî giran qewimîbû. Gundî
ji tîrsa neyaran newêrîbûn biçin
cihê dûr. Neçûyîna zozanan, me
zarokan, xistibû nav xem û fika-
reke giran, lewra me her sal li
zozanan gelek wextên xweş der-
bas dikirin. Ji ber ku em neçûbûn
zozanan, me jî hemû wextê xwe
di nav gund de derbas dikir. Her
çi ez bûm, min hemû wextê xwe
bi hevala xwe Seyranê re der-
bas dikir. Dayik û eta Seyranê jî
gelekî ji min hezdikirin. Rojekê
eta Seyranê Xezalê bang li min
kir got:

"Ez dibînim hûn zarok ji
ber neçûyîna zozanan gelekî
xemgînî, ma ne we ye?" Min
got:

- Belê rast e em gelek xemgîn
in, lê tiştêk ji destê me nayê,
înşallah emê saleke din biçin.

"Tu qet xemê nexwe, miz-
gîniyeke min heye" Kelecane-
kê ez girtim, min got: "Çima eşîr
li hev hatin?" "Nexêr mixabin
hê ew aşî çênebûye, lê emê bi
mêvanî biçin zozanên Mol Axa."
Min got: "Mol Axa kî ye? Ev cara
pêşî ye ez navê wî dibihîzim."

"Tu çawa nizanî! Mol Axa
mirovekî bi nav û deng e ev de-
verana hemû wî nas dîkin. Xwedî
zazon û gundekî ye hertim şal û

şapikên belek li xwe dike, heft
xulam û heft xidamên Mol Axa
hene. Ê baş e em ji boy çi diçine
zozanê Mol Axa?" Emê biçine
dahweta Mol Axa. Mol Axa go-
tiye: "Ku hûn zarokan neynin
neyên daweta min" Lewra ew
mirovekî zarokhez e. "Ê baş e
emê kengî biçin?" Min pîrsa
xwe bi kelecane pîrsîbû. "Emê
piştî heftekê biçin, divê heta wê
demê em karê xwe bikin" Min
got: "Hema ez amade me hûn
kengî bivên ezê werim" Ê ez bi
lez hatime malê min ji dayika
xwe re got: "Divê tu ji min re
fistanekî xweşik bidûrî ezê biçim
dawetê."

Ê min gotinên Xezalê yek
bi yek ji dayika xwe re got. Diya
min got: "Zozanên Mol Axa ji
ku derket? Keça min xezal te
dixapîne." "Heye dayê, tu nizanî,
dayê tê ji min re fistanekî sor
bidirû ji bo dawetê?" Diya min
got: "Çima Mol Axa ewqas dew-
lemend e, ma nikare ji mêvanê
xwe re fistanekî diyarî bike" û bû
tîqetîqa diya min, keniya. Paşê
got: "De baş e ezê ji berbûka Mol
Axa re fistanekî sor bidirûm."

Ez nizamim ew hefte çawa
borî, êdî diviyabû em biçûyana
zozanên Mol Axa. Ez sibê zû
şiyar bûm çûme mala Xezalê,
Xezal û dayika xwe li ser tenûrê
nan dipatin:

- Ji we re qewet be, ma we
hê şolê xwe neqedandî ye ka emê
kengî biçin dawetê?

- Tu dizanî ji xwe Mol Axa
jî hatiye pey me.

- Çima Mol Axa bi xwe hatiye
pey me! Ma dikarîbu xulamekî-
Ka em biçin jê bipîrsin.

Xezalê destê min girt û ez
birim ser sergo.

- Waye ji te re Mol Axa! De
bipîrse.

Min li der û dorê xwe nihêrî
tu kes tunebû. Min careke din bi
baldarî nihêrî, tenê kûçikê malê
Molo li wir bû. Min serê xwe
rakis, li rûyê Xezalê mêze kir,
Xezalê li min nihêrî û bi dengê
bilind keniya.

- Te ez xapandim. Ez bi hêrs
ji wir bi dûr ketim.

Xezalê wê rojê rûmeta min
şikênandî bû. Ez gelek xemgîn
bûm lê min sond xwaribû ku ez
tola xwe ji Xezalê hilînim. Roja
dîtirê diya min got: "Em îro diçin
beravê. Ezê cila bişom. Diya min
çû beravê. Ez jî rasterast çûme
mala Xezalê, min jê re got:

- Em diçin seyranê, diya min
got bila xezal jî were, em bi hev
re çay vexwin. Xezal gelek şa bû,
em bi hev re çûn ba diya min.
Xezal û diya min, bi hev re heta
êvarê cil şuştin. Piştî wê rojê êdî
Xezalê tu car ez nexapandim,
lewra wê dizanibû ku gava min
bixapîne ezê tola xwe hilînim.
Sala dîtirê eşîr li hev hatin û em
jî wek her sal çûne zozanan.

Rêberdan 2008 ■

Pelda û Zehra

Selman Diloan

Rast e ku zarok bîra gelek tiştan nabin, lê gotinên wan yên ji qama wan zêdetir ji rastîyeke din in ku şehrezatîya wan nîşan didin. Ka li çend gotinên du mixaletîyan, yanî du keçxaltîyan Pelda û Zehrayê binerin, bê çi gotine:

PELDA: (7 Salîye, lê ser pêhatî ji sêsalîya wê ne.)

☆Te kengî destê xwe dayê?

Diya Pelda jê re çakêtek kirîbû. Xaltiya wê jî jê re got: "Pelda çakête te çiqas rind e, pir nerm e jî, eynî mîna Winnie Pooh!" Pelda got:

-Te kengî destê xwe daye Winnie Pooh?

☆Ez naxwazim şer bikim

Xwişka Peldayê Sumeyye-ya jêhatî ku 12 salî ye, digot lîstokeke wê naxuyê. Diya wê jî got, berî niha bi demekê di destê Peldayê de bû. Pelda jî got: Na, min ranehiştiye tiştên wê. Sumeyye jî got, çima te tiştên min girtine. Yek ji vê, yek ji wê dest bi munaqeseyê kirin, lê Pelda hêrs bû û got:

Hema abla, ez naxwazim bi te re şer bikim!

☆Ez baş im loma

Diya Pelda jê dipirse:

-Tu ji min hez dikî?

-Eee, ez ji te hez dikim.

-Çima ji min hez dikî?

-Ez baş im, loma!

☆Kî zarok e?

Êvarekê Pelda li mala xaltiya xaltiya diya xwe bû. Li midbexê, Pelda li ber pencereyê rûniştibû, fikir ku li derve binêre. Xaltiya wê ew tembîh kir:

-Neçe wir, tuyê bikevî.

-Qey ez bebek im bikevim!?

-Ez dibêjîm zarokan Pelda. Nabêjim te.

-Ma xêncî mi kî zarok li vir heye?

☆Derya qet bi Kurdî nîzane

Derya li mala me bû, diya Pelda jî ew danîbû cem xaltiya wê. Derya jî di televîzyoneke Kurdî de bername çêdikirin, lê ka hikmet çi bû, ew û xaltiya Pelda bi Tirkî bi hev re axivîn. Piştî nîvro diya Peldayê ew bir mal, wê jî gilî kir:

-Dayê, welleh xaltiyê bi min re nelîst û Deryayê jî qet bi Kurdî nizanîbû!

ZEHRRA: (3 Sal)

☆Zehra porên xwe boyax dike

Hîn du salên xwe temam nekiribûn:


Zehra û diya xwe rûniştibûn, Zehrayê got:


-Mamî, ez tistekî te le bêzim, lê hêls zî nebe, melak zî neke, temam?

-Temam, hêrs nabim.

-Kengê ez mezin bûm, ez polê xwe pembe dikim. Temam?

☆Çima Ellah nîvro nake şev?





Piştî vê meselê bi heftayekê bû. Êvar bû, diya wê ew bire nav ciyê wê:

-Şev e, dereng e rakeve!

-Mamî çima Ellah dike şev?

-Ji bo mirov rakeve.

Piştî du rojan vê carê nîvro bû, diya wê ew biribû nav nivînan:

-Rakeve qîza min, tu west-tiyayî!

-Mamî, çima Ellah nîvro nake şev?

☆Melo nabêje bimile!

Zehra li mala qîzxaltiya xwe Berfîna nazenîn bû. Xaltî Hediye ji Zehra têr nedibû, sebeb jê jî ew bû ku berî hevalên xwe dest bi xebirdanê kiribû: Xaltiyê jê re got: "Zehra, tu hişk bibî!"

-Mamî, çima xaltî dibêje tu hişk bibî?

-Ji te hez dike, loma.

-Hema wexta melo yekî hez dike, melo naxwaze bimile...

☆Hema ev der sî ye!

Zehra li ber dîwar şekir da diya xwe. Diya wê got:

-Ez bi rojî me, naxwim.

-Rojî kengî xelas dibe.

-Kengî tav çû xilas dibe.

-Hema ev der sî ye!

☆Belkî goştê beraz tê de hebe

Li Ewropayê em çi bikirin divê em dîqqet bikin, ka gelo donê beraz an jî jelaîn tê de heye yan na. Zarok çi şekirî bixwazin divê pêşî lê binerin bê ka ew şekir ji van tiştan xalî ye, yan na.



Zehra pir ji kîrazan hez dike. Sibehê diya wê ew şiyar dikir:

-Zehra, rabe em herin dikanê.

Xewa sibehan gelekî şîrîn bû, canê wê giran bû.

-Na, mamî em neçin.

-Ezê ji te re kîraz bikirim.

-Ez kîraz naxwazim.

-Hema dilê min dîçiyê, ezê bixwim.

-Na mamî, tu jî nexwe, belkî goştê beraz tê de hebe!

☆Apo çer kîtaban nivîs dike?

Êvarê dereng bû, lê Zehra hêncet dikirin û nedixwest here nav ciyan. Ji diya xwe re got

-Hela ka ez binêrim, baba çi dike.

-Bi Mihemed re qise dike.

-Kîjan Mihemed?

-Ew apoyê ku Cemîle nivîsiye.

-Wê çaxê ezê jî hebki mêze bikim hela apo çer kîtaban nivîs dike?

(Ji wê rojê pê ve Zehra navê wî kir Mihemedê Cemîlê.)

☆ Tombiş hînî Almankî dibe

Êdî Zehra sê salî ye, bi hirçikên xwe re Almankî di-axive. Êvarekê dema ku min Seta Cemîle jê re anî, ji bo ku giraniya xwe bide ser Kurdî diya wê jê re got:

-Zehra, Tombiş Almankî nizane, divê tu bi Kurdî pê re qise biki?

-Tişt nabe mamî, ezê wê hîn bikim. Tombiş, mêze: "Ich liebe dich!" yanî "Te hez dikim."

☆Tombîş Almankî niza-
ne

Zehra li siyasûna trêne Tom-
bîş li kêleka xwe rûniştandibû.
Dîya wê got

-Zehra! Tombîş jibîr neke,
tu jibîr bikî wê bitenê bimîne
û wê yek ji xwe re bibe.

-Çîma wê yek ji xwe re
bibe?

-Çimkî nizane ya kê ye,
loma.

-Temam, ez bi destê wê di-
girim.

-Hema mamî, yek Tombîş
bibîne, Tombîş Almankî niza-
ne, wê çaxê çer dibe?

☆Bila baba ji zarokan re
jî binivîse

-Dayê baba hertim li ber

computerê çî dike?

-Dinivîse.

-Çi dinivîse.

-Çîrokan dinivîse.

-Wê çaxê çîma ji min re
naxwîne?

-Baba ji mezinan re dini-
vîse.

-Bêjiyê, bila ji zarokan re jî
binivîse. ■

NAMEYA TOMBÎŞÊ JI ZEHRAYÊ RE

Zehraya xweşik,

Tu dizanî min pir bêriya te kiriye. Piiir, piiir,
piiir! Ez pir ji te hez dikim. Ez dixwazim hinekî
li van deran bigerim û paşê jî ez werim cem te,
çimkî min pir bêriya te kiriye.

Ev der pir xweş in. Ez çûm çarşiyê, hebekî
geriyam. Paşê çûm tevî zarokan listim. Zarokan
bi Almankî qise dikirin min jî hebekî dizanî çimkî
te Almankî rayî min dabû. Du zarokan jî bi hev re
Kurdî qise dikirin. Paşê min jî bi wan re bi Kurdî
qise kir. Navê yekê Zelal bû, navê yê din jî Azad
bû. Zelal ji min re got: "Tu hem Kurdî jî dizanî
hem jî Almankî. Tu pir zimanan dizanî." Kêfa
min pir hat. Tu zanî min ji wan re çî got? Min
got: "Hevala min heye, navê wê Zehra ye. Çar salî
ye diçe kindergartinê. Ew hem Kurdî dizane, hem almankî dizane, hem jî Tirkî dizane. Hem jî
dizane Ingîlîzkî bijmêre jî!" Wê çaxê pir kêfa wan hat, gotin Maşellah Zehra pir jêhatî ye.

Tevî min qala Şîrîn kir, min got, "Zehra mezin bûye bûye abla. Bi Kurmancî yanî hek. Şîrîn
xwişka Zehra ye, yek mehî ye, pir şîrîn e, lê hema pir jî digirî...

Min hebekî jî qala kîtaba Cemîle kir. Min got: "Kîtabên Zehra yê Kurdî pir in. Berî ku em
rakevin ez û Zehra kîtaba Cemîlê dixwînin. Carna jî dayê yan jî bavo ji me re dixwîne. Êvarê
ez û Zehra didanên xwe firçe dikin û di hemêza hev de radikevin. Hema em zû radikevin, çimkî
divê Zehra here kindergartinê."

Ez navnîşana malê dizanim, careke din ku postecî hat, ez tevî Nûbiharê tîm malê. Ez te
hemêz dikim, oyy min pir bêriya te kiriye. Tu dizanî di Nûbiharê de Zarokname heye, bavo û
dayê dikarin ji me re bixwînin. Tê de çîrok jî hene...

Ez niha li Diyarbekir im, li mala dede me. Diyarbekir pir xweş e, Sûra Diyarbekir pir bilind
e. Ku ez hatim malê ji min re kilama "Diyarbekir warê min e" bibêje, tamam Zehra?

Ez te pir pir maç dikim. ■



Hevala te
Tombîş

Ferhenga vê jimarê

ajawegêr tevdanker, fitnebaz
arambexş hizûrbexş, yê
rehetiyê dide
aso ûfûq
belam lêbelê, feqet
berendam namzed,
bigirveş ji hev girokî bûn,
girgirtin
binemal ezbet, sulale
bir 1. kom, grûb. 2. beş, qisim
cadû sêhrebend, sêhribaz
cawîdan nemir, ebedî, mayînde
cerdevan keleş, rêbir, qoricî
dam dav, xefk
daqûlbûn, xwarbûn, berjêrbûn
derbirîn vegotin, qalkirin
dîbeg hawin
dizdar parêzvan, muhafiz
dûrîn çinîn
fermanname emirname,
talîmatname
gencîne, xezîne
geşedan pêşveçûn
giregir eşraf, maqûl, xuyayî
gotûbêj 1. diyalog, muzakere. 2.
hevpeyvîn, dan û stendin
gurmîn hingîn, xurmîn
helan bişivîn
heliz giyayek
helkeftin pêwendî, girêdan
hêman, faktor
hilberandin berkêşandin,
îmalkirin
hilpaskbûn, hilkişîn
hinkûf, deng, wekhevbûn
hûrgilî, detay, teferrûat, analîz
jenîn, hejîn, lêxistin
kargîn, erk, fonksiyon
karîger bandor, tesîr, erk
kenaştin, qelaştin, şikandin
kûl xwelî
kumreşî hesûdî, kîndarî,
nekişandin
lawij îlahî, qesîde, ristikên ku
bi meqamkî li ser pesnên
xwedê têne gotin

lêkudîn domandin, li pey çûna
tişteki.
mafîr naxwe, wê demê
mendehoş mest, jixweçûyî
metirsî xetere, endîşe, tehlûke
mêx zendê derî
mîrgeh cihê di bin fermana mîr
de
miştî tijî
nakokî, tenaquz, paradoks,
tezad
nanê tisî nanê sade
naqos çan, zengila ku li dêran tê
lêxistin
nuwazeberhem berhema
muhteşem, harîqa eser
objektîvist bêalî, nêrîna bê alî
ontolojî hebûnasî, zanista ku li
ser tiştên heyî vekolînan
dike
pal kaş, hevraz
pêkan mimkun
payedar xwedî behr, pardar
perspektîf, nêrîn
peya meriv, zîlam, mêr
pinhanî wersirî, veşartî.
piştbalgîh piştguh, xemsarî,
bêxemi
qed û qamet bejn û bal
qemirîn guherîna rengê tişteki
bi sotina agir an jî bi tîna
tavê.
qer reşê biriqokî
qevz gurz, deste, baq
qût xwerek, zad, erzaq
raser cihê li jor
rasteqîn rastîn, heqîqî
ravekirin vegotin, şîrovekirin
rêwîngî rêwîti
rewiqîn biriqîn, ronîdan
rûdan, qewimîn, pêkhatina
bûyerekê
serekqazî serê qadiyan, mezinê
qadiyan yê ku qadî hemî
di bin emrê wî de ne
serfermandar serleşker

serkîrde pêşeng, serok, lider,
pêşîvan
serpêsekinî, xuyayî, xwedan
îtibar û maqûl
sewkî dik, berbanik, cihê bilind
yê li ber devê derî.
sîber sî, sih
sorzêrîn ji zêrê sor
subjektîvist alîgir, nêrî bi alî
şahbanû keybanû, melîke,
qralîçe
şayes teswîr, sêwirandin
şênî xwecih, ehlî
şepol pêl, şepêl çûnûhatina avê
şerûd şerok, cîrnexweş, şerhez
şeydane dînane, dîwane
teneşo teneşîr, ciyê ku mirî li
serê tê şûştin
toraq çolîk, xwerekî ku ji şûjiya
penêrê teze çêdibe
tundrew zêdegav, radîqal
vegirtin dagirkirin, fetihkirin
vehandin ristîn, vehonandin
werandin rijandin
wesxwe naxwe, mafîr
xêl, dawet, govend
xoşewîst birêz, muhterem, ezîz
xubar toz, xwelî
xweşbext şanaz, bextiyar,
şadûman
xwînavî xwînî, herikîna xwînê
wekî avê
zal hakim serdest
zêw cazîbe, xweşikî
rêgez distûr, îlke, mebde
billurîn ji billûrê, ji qîrîstalê
talde stare, cihê xwesipartinê
haf bilindahî
xêlî paçeya ku davêjin ser rûyê
bûke, perde
peyitandin tesbîtîkirin,
diyarkirin
tewilandin girêdana heywanan
li erda vekirî
dadperwer kesê terefîgîriya
edaletê dike, adil
têmen umir

Weşanên Nûbiharê

Kitêbên Kurdî

Adat û Rusumatnameê Ekradiye / M. Mehmudê Beyazidî / (Şîrove û Lêkolîn Jan Dost).....	17. 50
Antolojiya Çîrokên Nûbiharê/Ayhan Geverî.....	12. 50
Cildên Kovara Nûbiharê (10 Cild, cildi).....	30. 00
Çarîn/ Sabah Kara.....	6. 00
Çil Hedîs / Îmamê Newewî.....	5. 50
Çîrokên Mesnewiya Şerîf... /Sadîk Yalsızuçanlar.....	11. 50
Destana Şerrê Kundan û Qijikan/Gernas Koçer.....	11. 50
Di ronîya Quranê de Dîroka Pêxemberan/Murad Celalî.....	9. 00
Dîwan/ Seyid Eliyê Fındîkî (Çapa Nû)	15. 00
Dîwan/Mela Zahîrê Tendûrekî.....	15. 00
Dubeytî/ Baba Tahirê Uryan.....	8. 50
Ebdullahê Minyeyî / Hekimoğlu İsmail.....	10. 00
Evîna Pinhan/ Sabri Akbel.....	6. 50
Feqîyê Teyran (Çapa Nû ya Berfireh) / M. Xalid Sadînî.....	20.00
Guldan/Seydayê Mela Husnî.....	10. 00
Gaziya Min/ Berhîm Paşa.....	4. 00
Kelîle û Dimne / Beydaba.....	8. 50
Leyla û Mecnûn/ Siwadî.....	7. 50
Leyl-name/ Ayhan Geverî.....	6. 50
Meqamat / Herîrî (Werger M. Ehmed Meylanî).....	6. 00
Nûra Qelban-Tevsîra Qur'anê.....	30.00
Nimêj Dikim/ Komisyon.....	7. 00
Peyîva Bîst û Sêyemîn/ Seidê Norsî.....	4. 00
Meala Firûz û Şerha Qur'ana Pîroz / M.M. Garsî Farqînî.....	25. 00
Mela Huseynê Bateyî / M. Xalid Sadînî.....	15. 00
Peyvên Piçûk/ Seidê Norsî.....	6. 00
Peyxamberê Ummetê Hz. Muhammed/ Ebdilhadî Botî.....	8. 50
Pênc Rîsaleyên Îmamê Xezalî/M. M. Garsî.....	8. 00
Gulşenê Raz/Şêx Mahmud Şebuşterî /M. M. Garsî.....	8. 00
Gulîstan/Şêx Sadiyê Şîrazî/M. M. Garsî.....	11. 50
Rîsala Biratîyê/ Seidê Norsî.....	4. 00
Riyad'ûs Salihîn/Îmamê Newewî/Werger: M.Salihê Dihê.....	35.00
Ronahiya Qurana Pîroz/ M. Muhammed Hekkarî.....	25. 00
Rubaiyat/ Omer Xeyyam.....	6. 00
Seyful-Milûk û Melke Xatûn/ Siyahpoş.....	11. 50
Siyerê Nebî / Milla Cimayo Babij.....	6.00
Teyrê Xerîb / Xurşîd Rûşen.....	1. 25
Vateyê Qijkekî / Seidê Nursî (Tedayox: Serdar Bedirxan)	4.00
Yezdan Dizane / Mezher Bozan.....	6.00
Zêna/Mezher Bozan.....	10. 00

Bi herfên Erebi

Rîsaleyên Eqîde û Exlaq û Edeb.....	15. 00
Diyaariya Kurdî Fiqha Şafî.....	6. 00
Dîwana Hezîn/ Seydayê Mela Huznî	15. 00
Mewlûda Gundî/Seyyid Bedreddin.....	3.00
Fiqha Şafî / S.M. Husnî Hezin.....	15. 00
Mem û Zîn/Ehmedê Xanî (Şerh: Husên Şemrexî).....	17. 50
Mewlûd/Ertûşî Bicild-du rengşamûa.....	15.00
Nûbihar/Ehmedê Xanî (Şerh: Husên Şemrexî).....	8. 50
Kulxaniya Veşartî/S. M. Husnî Hezin.....	6. 00
Reng û Rûyê Pêxember M. Husnî Hezîn.....	12. 50
Serkanî/Mele Muhammed Mahsum.....	8. 50
Eqîde û Tecwîd/Xelîfe Yusuf.....	5. 00
Tuhfetul Sibyan/Xelîfe Yusuf.....	7. 00

Kitêbên Kurdî-Tirkî

Diwan/ Mele Ahmedê Cizirî (Kurdî-Tirkî).....	15. 00
Diwan/ Mele Ahmedê Cizirî (Şamua-Kurdî-Tirkî).....	30.00

Ez Kurdî Hîndibim-Pratik Kürtçe Dersleri/Abdullah İncekan.....	20.00
Gotinên Pêşyan û Botan Atasözleri.../Abdulkadir Bingöl.....	15. 00
Melayî Cizirî Divanî'nın Şerhi/Abdulkadir Septioğlu.....	9. 00
Mersiyên Rojhilat-Dogu Ağıtları/ Sabah Kara.....	6. 50
Nameyên Bêcewab-Karşılıksız Mektuplar/ Sabah Kara.....	6. 50

Kitêbên Tirkî

36. Paralel ve Ortadoğu/ M.Selim Akdoğan.....	5. 50
Asilerin Dönüşü / Gülîstan Çoban.....	6. 50
Bediüzzaman'ın Volkan Yazıları/ Osman Resulan.....	4. 00
Çağdaş İran Şiiri Antolojisi/ Sabah Kara.....	6. 50
İslam Tarihinde Kürt Kadını / Muhammed Hayr Yûsuf.....	6. 50

LÎSTEYA PIRTÛKÊN KENTÊ

Aşk ve Savaş / Necdet Karasevda.....	11.50
Babam /M. Saîd Ramazan el-Bûtî	12.00
Bediüzzaman'ın Hayatı/ Abdurrahman Nursi.....	6. 00
Bütün Yönleriyle Arabkendi / M. Şerîf Eroğlu.....	12.50
Cumhuriyet Öncesi Diyarbakır'de Maârif/M. Şefîk Korkusuz ..	12.00
Çığır Açan Şark Alimleri/Abdülhadi Timurtaş.....	8.00
Çığlığa Duran Sözler/ Misbah Hicrî.....	6.00
Divan/Molla Ahmed-i Cezirî.....	16.50
Divan/Kiğılı Şeyh Selim	10.00
Diyarbakır Eğitim Tarihi/ Mehmet Şimşek.....	8.50
Duru Su Rüyası/Mehmet Özer.....	12.00
Elma Kokusu (Yola Adanan Şiirler) Gülîstan Çoban.....	7.00
Eski Diyarbakır'de Gündelik Hayat/ M.Şefîk Korkusuz.....	9.50
Eski Saîd'in Ehemiyetli Talebesi Hamza / Veysel Aydeniz.....	9.00
İlk Vatandan Gelen Sürgün/ Hasan Hüseyin Çevik.....	10.00
İnsanlığın Ortak Akli/ M. Halit Yalçın.....	30.00
İslâm'ın Anadolu'ya Gelişi/ Ahmet Demir.....	12.00
İtirafçı/ Gülîstan Çoban.....	6.00
Kolay Farsça/ Osman Aslanoglu.....	25. 00
Kuruluş Döneminde Eyyûbiler / Ali Beyyümlü.....	12.00
Mazideki Suruç / A. Kadir İkbâl -	9.00
Mazlum Halepçe / Müştehir Karakaya	7.00
Medreseden Meclis'e Meclis'ten Medreseye/ G. Emre	15.00
Mem û Zîn /M. Saîd Ramazan el-Bûtî	8.50
Muhafazakar Kürt Yoksullar, Muska... / Mehmet Bozgan....	6.00
Molla Muhammed Zıvıngî/ Abdülhadi Timurtaş	7. 00
Seyahatnamelerde Diyarbakır/ M. Şefîk Korkusuz	30.00
Sırr-ı Hanımın Divanı/ M.Şefîk Korkusuz	10.00
Siyamend/ M. Saîd Ramazan el-Bûtî	8.50
Sonsuzluk Histerisi / Mehmet Bozgan	5.00
Süryaniler ve Diyarbakır/Mehmet Şimşek	14.00
Tarihin Adı Urfa/Misbah Hicrî	8.50
Tezkire-i Meşayih-i Amid/M. Ş.Korkusuz	30.00
Urfa ve Çevresi Eyyubiler Tarihi/ Ahmet Demir	11.00
Urfa Efsaneleri/ Mehmet Kurtoğlu	12.00
Vadedilen Günler / Taha Hüseyin	9.00
Zamana İthaf/Mehmet Bozgan	6.00
İslam Aleminde Vakıf Kütüphaneciliği/ Prof. Y.M. Cüneyd ...	10.00


Adres

Büyük Reşitpaşa Cad. Yümnî İş Mrk.



No:22/29 Vezneciler-İstanbul


Telf& Faks: 0212-519 00 09

Berhemên nû!



Di Kurdî de yekem car Tefsîra Qur'ana Pîroz!





Cizîr, Çemê Dicle û Kelek.
Ji arşîva Farûk Özervarî